DR. K. Mezher Ehmed

# ÇEND RÛPEL JI DÎROKA GELÊ KURD

Wergêr: Elîşêr

STOCKHOLM 1991

**ÇEND RÛPEL JI DÎROKA GELÊ KURD**

*Weşan no: 7*

*Utgivare: Apec-Tryck & Förlag*
*Çap û Weşanxana APEC*
*Nivîskar: Dr. K. Mezher Ehmed*
*Wergêr: Elîşêr*
*Adress: Apec-Tryck & Förlag*
*Spångavägen 345*
*Box 3318 163 03 Spånga/SWEDEN*
*Tel: 08-761 81 18 Fax: 08-761 24 90*

**ISBN: 91 87730 11 1**

DR. K. Mezher Ehmed

# ÇEND RÛPEL JI DÎROKA GELÊ KURD

Wergêr: Elîşêr

STOCKHOLM 1991

# Daxuyanîya Weşanxanê

Ev kitêba destê we ya dîroknasê hêja Mamoste Dr. Kemal Mezher Ehmed e ku orîjînalê wê bi Zarava Soranî (Kurmancîya Xwarê) bi navê **"Çend Lapereyek Le Mêjûwê Gelê Kurd"** (beşê yekem) di sala 1985'an de li Iraqê hatîye çapkirin. Di wergerandinê de hin metnên wergerê yên ku ji rojname û kovarên Kurdî (her wekî rojnama Kurdistan) hatine stendin ji bo wergerandinek hîn tekûztir çêbe, karê dana wan ber orîjînalan ji alîyê Mamoste Malmîsanij de hatîye kirin. Em li vir sipasê xwe jê re dikin.

Kitêb ji şanzdeh gotarên Dr. Kemal Mezher ên di cuda cuda deman de hatine nivîsandin pêk tê. Her yek ji van gotaran bi serê xwe quncikek dîroka gelê me yên di tarîtîyê de mayîn didin ronîkirin. Bi kurtî mirov dikare bêje her yek ji van gotaran ji me re wek kitêbek in.

Bêguman afirandinên Dr. Kemal Mezher ne ev tenê ye. Bi dehan gotar û kitêbên wî yên gelek hêja yên di warê lêkolîna dîroka Kurdistanê de hene. Lê gelek mixabin ji ber bikaranîna alfabek cuda, heta îro, nemaze xwendevanên Kurdistana bakur nekarîne îstîfade ji van afirandinên hêja bikin.

Ji ber vê em dibêjin ku gava xwendevan vê kitêba destê xwe de bixwîne biqedîne em bawer dikin wê ew jî bigihîje wê qeneetê ku bi çapkirina Kurmancîya wê, me çawa karekî di cih de kirîye. Ger xwendevarên hêja beşdarîya vê nêrîna me bike em xwe bextîyar dihesibînin.

*PÊŞKEŞ E JÎ BO BÎNEMALA SERBÎLÎND*
*A KERÎMÊ HELEKE !*

# PÊŞGOTÎN

"Çénd Rûpel Ji Dîroka Gelê Kurd", ji beşek wan gotarên min ên di derbarên cuda ya dîroka Kurd ên di çapemenîyên Kurdî de min weşandî, pêkhatine.

Gotarên wisa tê de henin ku temenê wan digihîjin çarîk sedsalek, li gora bawerîya min hemû jî hêjan e. Ji ber vê yekê min pêwist zanî wan berhev bikim û carek din ji nû de pêşkêşê xwendevaran bikim û bi vî awayî jî ji fewtandinê rizgar bikim.

Di hinek cîyên gelek pêwîstî nebe, min dest neda naverok û rênivîsa gotaran, di gelek hêlan de weşandina bi vî awayî baştir e. Lê min bi naçarî hinek cîyan jê derxist yan hinek guherand!.. Evên han jî tenê di hêla şiklê nivîsandina mijaran de guherandin kir.

Ez hêvîdar im bi vê berhemê bikarim xizmetek pêşkêşî xwendevarên Kurd ên xoşewîst bikim. Eva demek bû jî min dixwest gotarek di derbarê Kerîmê Heleke yê Wezîrê Darayî ya Şêx Mehmud û cîyê dîyar a vê binemala serbilind binivîsim, lê carek bila ev dîyarîya min a han di cîyê wê de be. Bereketa Xwedê navê be, di saya Xwedê de şûnewarê Kerîmê Heleke winda nebû... Tu bêjî yek ji wan Kurdan heye ku Mamoste Mesîh Îskender binase û bi dilek xweş rêzê jê re negre. Qet dûr nîne ger Mesîhê mezin zindî be, dê destê xwe yê pîroz bi serê wî de bîne û jê re bêje:

"Ez bextewar im mirovek wek te hilgirê navê min e!"

# MIJARA YEKEM

# ROLA KURDAN Dİ DÎROKA ŞARİSTANÎYETÊ DE

Ger çiqas car caran di nav gotarek yan rûpelek de ev behsa han di nav çend perçe rêzek kêm de bê dîtin, lê ez dikarim bêjim(*) kesek heta niha di warê şaristanîyetê de behsa dîroka Kurdan nekirîye.

Netawê Kurd, her di kevin de niştecîyê şûnewareke gelek girîng bûye. Bêguman Kurdistan wek piştmazî wisa ye ji bo Rojhilata Navîn.

Her ji ber vê yekê, ji bo van samanên (serwetên) bê ser û bin, hemû dewletên emperyalîst çavên xwe kirinê û dixwezin bikin bingehên xwe.

Qet guman di wê de nîne ku Kurdistan di kevin de jî her wiha girîng bûye, ji ber ku wî wextî jî ketibû nîverasta şaristanîyetên kevin ku piranîya wan li Rojhilata Nêzîk peyda bûn û ber bi firehbûnê de çûn, li ser hemûyan re jî şaristanîyeta Faris û ya Ereban ya İslamîyetê ku di İraqê de,

---

(*) Sala 1959'an, yanî wê sala min Unîversîta Bexda xelas kir, ev gotara han di hejmara 5 û 6'ê kovara "Balêse" de hat belav kirin. Di vir de cîyên pêwîst nebe destkarîyek kêm li naverok û awayê nivîsandi-na wê nehatîye kirin.

dema hukmê Ebbasîyan de, gihîşt bilindtirîn dereca pêşkevtinê. Ger wiha be, em dikarin bêjin rolek netewa Kurd di van şaristanîyetan de hebûye, yanî tesîrek wî li ser çêbûye, her wek çawan ewan jî tesîrê li ser ya Kurdan kirine. Eva han bi tevayî ji bo me ronî dibe eger mimkun be em bizanîn, şaristanîyeta kevin û a nû di nav hev de helîna bîr û bawerî û berhemên gelek netewên cuda pêk hatîye, ji ber ku wek aşkera bûye têkelbûna bîr û bawerî û berhemên çend netewan, dibe sebebê peydabûna şaristanîyetê û encama têkelbûn û firehbûna sinorê bîrkirinê. Bêguman ev têkelbûnên han jî bi awakî gelemperî di navbera wan netewên ku nêzîkê hev in, dibin.

Ew qismê ji netewa Kurd ên li ser sinorê Faris û Ereban jîyane, di dema şaristanîyeta herdu netewan de, her çawan bibe, kêm an zêde, tesîrê li ser wan herdu şaristanîyetan kirîye. Lê belê, ewa ku bala mirov dikişîne eva han e, gelek kes ne şareza ne li ser rola Kurdan, hinek jî dizanin, lê xwe bi zanetî jê dûr dikin.

Ji vê jî xirabtir eva han e ku hinek dîroknivîsên şoven ên kilasîk, sebebê paşvemayîn û bêhêzbûna şaristanîyeta erebî, dikin ser milên hinek netewên din ên bihêz ên civaka Îslamê.

Bi kurtî şarezatîya gelek kesan bi awakî tevayî li ser rola Kurdan a dîroka şaristanîyetê nîne, bi taybetî ew xizmeta bi qîmet a wî netewî ku ji bo şaristanîyeta Îslamê û zanyarîya erebî pêşkêş kirîye. Ji bo zanîna vê yekê pêwistî bi lêkolîneke dûr-dirêj û gelek berfireh a derêxistina holê ya rola Kurdan li ser gelek milên şaristanîyeta Faris û Ereb jî nîne, bi taybetî di hêla bîr û bawerî, civakî, zanyarî û heta sîyasetê de jî ku wek îro ji me re ronî dibe.

## ROLA KURDAN Lİ SER ŞARİSTANİYETA FARİSAN

Netewê Kurd bi sebebê cîrantîyê ve, her wiha paşvemayînên dîrokî yên kevin nîşan didin , beşdarê damezirandin, pêgihandin û pêşxistina şaristanîyeta Farisan bûye. Lê belê, her çend hinek vê yeka han qebul nakin jî, em dikarin eva han bi riyek û bi şêweyek din îspat bikin ku Kurdan tesîrek li ser vê şaristanîyetê kirine. Vêca em ê serê rîya diduyan bigrin û hi-

nek li ser bimeşin heta encama ku em dixwazin jê bigrin.

Gelek dîroknivîsên bi nav û deng vê yeka han qebul kirine ku serokanîya netewa Kurd diçe digihîje Medan. Li ser vê de jî gelek belgên dîrokî yên wisa hene ku bi tevayî nîşan didin , Medî, bapîrên (kalên) mezin ên netewê Kurd ê îro ne.

Medî jî bi kêmasî sêsed sal berê Farisan hatine Iranê û dewlet û şaristanîyeta xwe durust kirine û peyvendîya wan bi şaristanîyeta pêşkevtî ya Iraqê re, bi taybetî bi ya Misrê re hebûye û li gel Kildanîyan (Keldanîyan) gelek rêk û pêk bûne, heta derecek wisa, ji bo holê rakirina Imperatorîya Asurîyan alîkarîya hevûdu kirine.

Bi vî awayî Medîyan gelek feyde ji wê şaristanîyeta kevin wergirtin û qet guman di wê de nîne her piştê wê, Farisan êrîş birin ser wan û wan jî her ji bo rizgarbûna bindestîya ji destê kevnebindestên xwe, xwe dan ber bi çîyayê Zagrosê û şaristanîyeta xwe di welatê xwe yê kevnare de bi cî hiştin. Yanî bê ku mirov bi ser de zêde bike, em dikarin bêjin; kakilê şaristanîyeta Farisan ya pêşkevtî ji wê şaristanîyeta bapîrên kevin ên Kurdan ku damezirandin û bi cî de hiştin, pêkhatîye.

Ji derveyê vê em dikarin bêjin, rol û tesîra Kurdan li ser şaristanîyeta Farisan di vî radeyî de nesekinî, ji ber ku bê rawestandin û serîtewandin, bi Farisên cîranên xwe re di nav hewildana guherîn û pêşxistina vê şaristanîyetê de bûn. Hêvîyek me ya gelek zêde ji wê heye ku lêkolînên di van waran de yên arkeolojîk van xalên han ji bo dîwarojan ronî bike û navê wan zanayên Kurd ên ku xizmeta şaristanîyeta Farisan kirine ji me re aşkera bike, da ku em wan zanayên Kurd ên Musilman dinasin û dizanin kî ne, e wan jî binasin.

Bi vî awayî derdikeve ku netewê Kurd tesîrekê kirîye li ser şaristanîyeta Farisan. Lê ger em van hemûyan jî deynin milek, di milek din de em dikarin tesîr û rola Kurdan a li ser vê şaristanîyetê derêxin holê. Zanayên dîrokê dibêjin; şaristanîyeta kevin a Iraqê karekî gelek mezin kirîye ser şaristanîyeta Farisan. Li vir de pirsek girîng tê pêşîya me; li ku û kîjan riyê de şaristanîyeta Iraqê li ser şaristanîyeta Farisan tesîr kiriye?.

Tenê yek bersîv heye ji bo vê pirsa han, ew jî eva han e ku ev

karê han di riya Kurdistanê ve gihîştîye welatê Farisan. Ji ber ku dema em li nexşê(xerîte) binêrin, em dibînin; Kurdistan û zincîrên çîyayên wî ne ku İran û İraqê ji hev cîhê dike. Ji derveyê vê qet ne mimkun e Kurdan wek muhafizên ser sinorên xwe, xwe ji şaristanîyeta Farisan parastibe, ji ber ku bi gelemperî wiha ye; tiştên nû dayê û her weko jê jî wergirtîye. Ji ber ku karaktera (tebîet,siruşt) şaristanîyetê, li ser feyde bexşîn û feyde wergirtinê hatîye danîn.

Dûr nîne kes hebin wiha bizanin ku gelê Kurd gelekî paşvemayî bûye, ji ber vê di hêla şaristanîyetê de bê ku tesîr kiribe li ser qet tu şaristanîyetê, bi her awayî tesîr li ser hatîye kirin. Lê belê ji bo wan em vî bersîvê didin û dibêjin ku du gelên cîran, herdu jî bi her awayî tesîrê li ser yek û du dikin, her çendîn yek ji wan paşvemayî din jî pêşkevtî be. Baştirîn belge ji bo vê yekê İndîanên Sor (Kizilderîlî) ên Amerîkayê ne ku li gel wan hemû paşvemayînên xwe jî, mezintirîn tesîrê kirîne ser muzîk û stranên Amerîkayê. Madem wiha ye, ji me re bi aşkera derdikeve ku netewê Kurd ger çiqas paşkevtî jî be, her çendîn wiha jî nebûye, ji ber ku damezrênerê şaristanîyeta Medîyan ew e, her tesîra xwe ser şaristanîyeta Faris kirîye, ji ber ku, her wekî me got; şaristanîyetek a tik û tenê ya netewek nîne, belko di nav hev de helîna bîr û bawerî û berhemên çend netewan e.

## MIJARA DIDUYAN

# BALKÊŞANEK DÎROKÎ LÎ SER ZÎMANÊ ME

Ev gotara han(*) lêkolînekê dîrokî ye ser zimanê me, bersîvek e ji bo wan kesên ku dibêjin zimanê me şaxek ji zimanê Farisî ye.

Hejmarek ji dîroknivîsan wisa dizanin ku zimanê Kurdî beşek yan zaravayek ji zimanê Farisî ye.

Em gelek dûr neçin, Nehru jî di nivîsa xwe ya "Le-Mehat Min Tarixu'l 'Alem", rûpela 259'an de wiha dibêje: "Kurd, bi zimanê Farisî yê kevin diaxivin".

Lê belê, rexne li wî nayê kirin, ji ber ku bi xwe di pêşgotina kitêba xwe de, ji bo hemû kil û kêmasîyan daxwaza lêborînê kirîye, ji ber ku di wextê nivîsîna kitêba xwe de li bendîxanê de bûye û bê ku bikare ji tu serokanîyek îstîfade bike ku wan kil û kêmasîyan ji mijaran derbixe û wan nivîsên xwe jî bi riya naman re ji keça xwe(**) re şandîye. Qet dûr jî nîne gotina Îranî ya di nivîsê de bi gotina Farisî hatibe wergerandin. Şaşîtîya vê yeka han jî dikeve ser milê wan kesên ku kitêbê

(*) Di hejmara sisîyan a sala yekem ê kovara "Balêse" hatîye belav kirin (Teşrîna Yekem 1959, rûpel; 35-42).

(**) Mebest Îndra Gandî ye.

wergerandine ser zimanê Erebî. Ji ber ku gelek dîroknivîs gotina Îran di şûna Îndo-Awrupî de bikartînin. Lê gelek nivîskarên din ku qet dûr nîne ji ber hinek sebebên veşartî zimanê kurdî li ser zimanê farisî hesêb dikin û eva han jî di bingeha xwe de bîr û bawerîyek çewt têt hesêb kirin. Madem ku wiha ye, em dê hinek li ser vê mijarê bi awakî dîrokî û zanyarî ya rastî bisekinin.

Lê wan jî hemû bi avakî sererast ser vê behsa han nenivîsandine, ji ber ku her wek Mamoste Emîn Zekî dibêje; em dikarin wan bikin sê beş. Beşek, tenê navê wan dîroknivîs e û qet mebestek wan di nivîsên wan de tune bûye. Beşa diduyan li gor bingeha riya ji wan re hatîye tesbît kirin, nivîsandine. Em qet dûr neçin, ger yek ji wan niha bixwaze li ser Kurdan binivîse û tiştek dilê wî/wê de ber bi Tûranîyan de hebe, ew, yekser bê ku ser bifikire gelê Kurd dike Tirk jê re jî "Tirkên çîyayî" dibêje. Beşa sisîyan jî ew zanayên payebilind in ku di nivîsînên xwe de ji bo çend quruş pere û zêran rîya rastî ya zanistîyê bernedane. Tenê evên han in ku bi başî navên wan tên bibîranîn û di rûpelên dîrokê de cîyên xwe girtine.

Vêca ji bo ku ev deste zanayên han riya rastîyê girtine, nivîsên wan bi feyde ne, lê ew ên ku Kurdan li ser regeza Tirk û Farisan dihesibînin yan jî dibêjin zimanê wan zimanekî serbixwe nîne, ji ber ku bi zaravê zimanê cîranên xwe diaxivin, evên han tev ji desta yekem yan yê diduyan in ku ji bo firotinê ji ber xwe ve van bîr û bawerîyan durust kirine. Lê behrek zelal û xweşik bi pîsîtîya çûkek qirêj nabe.

Ji xwe eva han jî gelek aşkera ye ku ji gelê Kurd hejar û bêkestir nîne heta ku em bikarin bêjin zanayên desta sisîyan han dabe ku di derbarê ziman û dîroka Kurdan de li gor daxwaza gelê Kurd binivîsin. Ew çax ronî dibe, tenê evên han in ku rîyeka rast a zanyarîyê ji bo lêkolîna bingeha Kurdan û zimanê wan dane ber xwe. Evên han jî van karên xwe ne ji bo xatirê çavê gelê Kurd, ji ber ku di riya zanyarîyê de dikin. Vêca bîr û bawerîya van kesên han nebe, qîmetek bîr û bawerîya wan herdu destên din qet nîne û kêra tiştek nayên.

Ji bo wan kesan, ger Kurd be yan ne, ev gotinên han tenê bes e:

Çi kesê regeza Kurd yan zimanê wan li ser regezek yan li ser zimanek din bihesibîne, ew ji rastîyê dûr e û ji ber sebebek veşartî van derewên han ên mezin dike, dîrok tu wextî ji van derewan razî nebûye!

Ev ên ku me nivîsandin, bersîvek sivik e ji bo wan kesên ku dibêjin zimanê Kurdî Farisî ye. Lê ka em hinek din ser vê mijara han bisekinin û pena bibin ber bîr û bawerîya rojhilatnasên ku riya zanistîyê bernedane.

Sîr Sidînê Şems di bin navê "Kurdistana Kevin" de bi kurtî wiha dibêje: Qet guman tê de nîne ew Karduxîyên ku Ksenefon (Xenephon) behs dike her gelê Kurd bi xwe bûne. Vêca ka em bizanin Ksenefon kî bûye û di derbarê gelê Kurd de çi gotîye.

Birayê biçûk ê Artakserksesê paşayê Farisan Kyros (Kîros), serokatîya kar û barên Asya Biçûk dikir. Dor û berê sala 404'ê berê zayînî, Kyros dixwest cîyê birayê xwe bigre û bibe paşayê Farisan. Ji ber vê yekê ordîyek mezin pêkanî û vê armanca xwe bi cî kir. Ji derveyê vê ordîya han a mezin ordîyek din jî ji bo alîkarîya vê ordîya yekem ji Grekîyan (Oriman) pêkanî. Ev ordîya han a ji Grekîyan pêkhatî di dîrokê de bi navê "Ordîya Dehhezaran" têt naskirin.

Piştî kuştina Kyros li İraqê, Ksenefon ku yek ji wan serbazê Grekîyan bû, kar û barê ordîyê xist destê xwe, bû serokê ordîyê û bi ordîya xwe ve ber bi welatê xwe Yunanîstanê ve meşîya. Ewî behsa meşîna vê ordîyê û hemû serpêhatîyên xwe bi awakî dîrokî eynî wextî di kitêbek de nivîsandîye(***) ku behsa Kurdan jî tê de kirîye. Ksenefon wiha dibêje: Wextê ordîya me gihîşt navça Zaxoyê em rastê gelekî aza û şerker hatin, navê wan Kartuxî bû... Ev gelê han di navçekê çîyayî de dijîya û daxwazek wan a cîhêbûnê ji Şah hebû û ji jiyana serxwebûnî û azadîyê hezdikirin.

Her wiha di vir de jî bi awakî aşkera derdikeve ku tînîtîya wî gelî ji serbestîyê û daxwaza wan ji azadî û cîhêbûnîyê ji ber wê bûye ku zimanê wan zimanek serbixwe bûye, ne wek zarava an zimanek bîyanî.

Vêca em vegerin ser behsa Sîr Sidînê Şems ku di cîyek din ê

---

(***) Mebest kitêba bi nav û deng "Anabasîs" a Xenephon e.

gotara xwe de wiha dibêje:

Di van dawîyan de bîr û bawerîya wan zanayên ku li ser zimanê Kurd lêkolîn dikin bi tevayî hat guhertin, ew di vî warî de wiha dibêjin: Zimanê kurdî, ne ji farisî û ne jî ji zimanek din nehatîye wergirtin, ji ber ku zimanek taybetî û serbixwe ye û her di kevin de bi serê xwe tê de guhertin çêbûne. Sidînê Şems, dawîya gotara xwe bi vî awayî diqedîne: "Ew kesên ku dibêjin zimanê kurdî zaravayek farisî ye, dîrok û zanistî di eksê bîr û bawerîya wan de ye".

Lê Mamoste Sayis û hejmarek ji rojhilatnasan wiha dibêjin: Zimanê Medîyan yan ev kurdîya îro bûye yan jî hîmê vî zimanî.

Ev yeka han bi tevayî kevnîtîya zimanê kurdî derdixe, ji ber ku Medî ji Farisan kevintir in û di pêşîya wan de hatine welatê Farisan û dewleta xwe danîne. Di sedsala 7'an a berê zayînî, mezintirîn dewlet durust kirin û berfireh bûn, wisa lê hat ku di sala 612'ê berê zayînî de navê Dewleta Asurîyan ji holê rakirin ku a nîvê cîhanê di bin destê wê dewleta girîng de bû.

Wan deman Faris di bin destê Medîyan de bûn û wisa man heta dor û berê sala 550'an a berê zayînî, piştê vê Kyrosê Mezin derket holê û karî Farisan bin destê Medîyan derîne û dewletek ji wan re pêk bîne.

Li vir pirsek têt pêş, ew jî eva han e: Gelo rê lê diçe, gelek serdest bi zimanê gelê bindestê xwe biaxive?!!.

Gelek ku ewqas kevin be û 270 sal berê gelê Faris hatibe wê navçê û dor û berê sed salan berê wan, dewleta wî ya serbixwe hebe û heta Faris jî di bin destê wî de be, êdî çawan rê lê diçe bê gotin ku wan bi zimanê farisî axivtine!! Eva han dimîne wî ku mirov bêje; gelê Tirk di Tirkîyê de zimanê kurdî... diaxive!!.

Belê em bêjin Medî ku serokanîya gelê Kurd in û bi zimanê farisî diaxivtin, ger wiha be, Faris û Medî herdu yek gel bûne, ji ber ku zimanê wan yek bûye.

Ger wiha be ev herdu pirsên han dertên pêşîya me û me derew dertêxin:

Yekem: Ger ev herdu gelên han yek bin û ferqek di navbera

zimanê wan de tûnebe, gelo çawan Medîyan demek dûr û dirêj Farisan kirin bin destê xwe?

Duyem: Ji ber çi Farisan hewlê cûdabûnê ji di Dewleta Medîyan dan, ji bo ku dewletek nû ya serbixwe damezrînin?

Ji derveyê vê bersîvê pê ve qet tu bersîvek vê pirsê nîne ku bê şik zimanê wan ji zimanê Medîyan cîhê bû û gel jî bi ziman ji yek û du tên cuda kirin.

Her wek ji me re aşkera bû gelê Kurd ji gelê Faris gelek kevintir e û her wiha zimanê wan jî. Vêca ger em nebêjin farisî ji kurdî hatîye wergirtin, ew çax çi rû li xwedîyê van kesên bîr û bawerîyên xwefiroş heye bêjin, kurdî ji farisî hatîye wergirtin. Wisa dixuyê wan heta îro gotina şermezarîyê seh nekirine, ji ber vê li ba wan derew qet tiştek nîne, wek derewek wiha mezin ku zimanê kurdî bi wî kevnaretîya xwe ve bikin zaravayek farisî. Bi rastî tiştek wisa ne her tenê kena mirov pê têt, li wî diçe ku mirov bêje ev mirovê han kurê kurê xwe ye û yan ev jina han a heştê salî, keça wê jina bîst salî ye!.

Vêca li ser bîr û bawerîya rojhilatnas Major Soane (Bînbaşî Soane) ku di kurtebehsa xwe de wiha dibêje: Di sala 401'ê berê zayînî, wî wextî ku Ksenefon gihîşt nav gelê Karduxiyan Kurdistan bingehek gelek kevin û xwedî zimanekî xwe yê taybetî bû. Vî gelî han, xwe û zimanê xwe ji hemû têkelbûnê parastîye û her wek dema em zimanê Kurdî bi zimanekî din re muqayese dikin, em dibînin Kurdan zimanê xwe ji yê hemû gelên din hîn zêdetir parastîye, bi derecek wisa ku ferqîtîya di navbera îro û yê sed sal berê niha ewqas mezin nîne.

Belê wek Soane dibêje; gelê Kurd di her wext di şuura zimanê xwe de bûye û parastîye. Bêguman, ewên ku alîkarîyê daye ber vê parastinê tebîet (siruşt) e, ji ber ku Kurd cîyekî çîyayî yê asê de jîyane. Ji ber vê yekê ew gelên cîranên wan nikarîne bi hêsanî peywendî li gel wan deynin û tesîr ser zimanê wan bikin, bi taybetî peywendîyên aborî, bazirganî û sîyasî ku mezintirîn sebebên têkelbûnên ziman in. Nebûna peyvendîyan wisa mezintirîn mertal e ku zimanê kurdî pa-rastîye. Tenê çend gotinên erebî di netîca belavbûna İslamîye-tê ya di sala 18'ê koçî di Kurdistanê de ku têkelê nav Kurdî bûye, zimanê kurdî her paqij maye. Ev tesîra han tenê li ser kurdî çênebûye,

heta niha jî dema em li zimanê tirkî û farisî dinêrin, ji nîvê wan zêdetir ji gotinên erebî pêkhatine.

Niha jî gelê Kurd hest bi vê yeka han kirîye, ji bo vê yekê hemû cure gotinên bîyanî yên di zimanê me de hene, ber bi windabûnê de diçin. Muqayesek biçûk di navbera wan şi'rên bi gotinên kevin û yên nû de, yan nivîsên kevin û yên nû de, bi rastî vê yeka han ji me re ronî dikin, keft û lefta pîroz a paqijkirina zimanê me ji gotinên bîyanî zû ve destpê kirîye, niha jî dike ku bigihîje armanca xwe.

Ger wiha be sebebê nêzîkbûna zimanê kurdî û farisî çî ye?. Qet guman di wê de nîne ku nêzîkbûnek gelek zêde di navbera zimanê kurdî û yê farisî de heye, lê ev yeka han nayê wê manê ku kurdî zaravayek farisî ye. Hewce ye çend sebebek ji vê nêzîkbûnê re hebe, vêca ka em hinek li ser bisekinin û bizanin ev sebebên han çi ne.

Çi kesê ku piçek zanyarîya wî ser dîroka kevin a Kurdan û coxrafya Kurdistanê ya kevin hebe, dikare bi me re be û bêje; du sebebên vê nêzîkatîyê hene:

Yekem: Herdu ziman kurdî û farisî, beşekê ji yek famîlya ziman in, eva han jî famîlya zimanê İndo-Awrupî ye.

Ji ber vê yekê em dibînin ku ne tenê di navbera zimanê kurdî û farisî de, lê di navbera kurdî û zimanên din ên di vê famîlyê de nin jî nêzîkbûnek gelek zêde heye. Gelek gotin henin di frensizî û kurdî de, yan kurdî û îtalî de tên eynî manê. Wek "birî", "çav" û "ejno" (çok) yê kurdî û frensizî yan "biro", "kî" û "karwan"î kurdî û îtalî.

Ji derveyê van gelek kelîmên din jî di nav kurdî-îtalî û kurdî-frensizî, ingilîzî û gelek zimanên din de ku ji famîlya zimanê İndo-Awrupî ne, henin, wek hev in û mana wan jî wek hev e... Lê ma gelo ev nêzîkbûyîna han têt wê manê ku kurdî zaravayek frensizî yan îtalî ye?.. Ku wiha be, nêzîkbûyîna farisî û kurdî jî tiştek din e, yanî sebeb ew e ku herdu ji yek famîlya ziman in.

Duyem: Aşkera ye ku nêzîkbûna di navbera zimanê kurdî û farisî, ji zimanê din ên ji famîlya İndo-Awrupî zêdetir e. Sebebê vê jî, nêzîkbûna Kurdistan û İranê ye, ev nêzîkbûna han bûye sebebê têkelbûna çend gotinên wan di nav zimanê me de û

yê me jî di nav zimanê wan de. Li ser van tevan de, herdu gel jî Musilman in, eva han jî bi hindikî bûye sebebê wekhevbûna piranîya wan gotinên ku peywendîya wan bi dîn (ol) ve heye.

Ji derveyê van, ev herdu sebebên han dikarin bi kêmasî sebebek dîrokî yê din jî peyda bikin, ji ber ku eger yek lêkolînê li ser dîroka Medîyan û awayê fewtandina dewleta wan bike, dikare ji me re sebebê nêzîkbûyîna Kurd û Farisan bi vî awayî ronî bike:

Dor-berê sala 550'yê berê zayînî, Dewleta Medî, piştê şerek mezin di navbera şahê Medîyan İstyaczo û Şahê Farisan Kyrosê Mezin de qewimî. Bi vî awayî Farisên ku berê di bin destê Medîyan de bûn, wisa lê hat Medî ketin bin destê wan, ewan jî ku serxwebûyîna xwe winda kirin, beşek zêde ji wan ber bi çîyayên Kurdistanê ve çûn û li wir têkelê nav gelên din ên wan navçan bûn û gelê Kurd pêkanîn. Vêca qet tu guman di wê de nîne ku têkilîyek di navbera wan û Medî û Farisan de peyda bûye, ji ber ku Faris demek di bin destê Medîyan de û Medî jî di bin destê wan de bûne. Bêguman ev têkîlîya han tesîrê li ser herdu zimanan û bi kêmasî nêzîkatîyek di navbera wan de peyda kirîye.

Hejmarek ji dîroknivîsan di derheqê vê nêzîkbûyînê de dibêjin ku gelek hebûye navê wî Parsî bûye û ji gelê İndo-Awrupî bûye û beşek ji wî gelî têkelê nav Farisan û beşek din jî têkelê nav Kurdan bûye û di nav wan de helîyaye, eva han jî bûye sebebê wê ku çend gotin ji zimanê wan têkelê nav kurdîyê û çend jî nav farisîyê be. Niha jî ev gotinên han bûne sebebê peydabûna nêzîkatîya kurdî û farisîyê.

Piştî bi kurtî muqayesekirin û lêkolîna ser zimanê kurdî û farisî, carek din em vê pirsa han nû dikin:

Gelo çi rû li hinek kesên bîr û bawerfiroş heye ku bêjin kurdî zimanek, yan zaravekê farisî yan bîyanî ye??!!

Dîsa cara duyem em ê birsîva wan bidin û bêjin: Behreke zelal û xweşik bi pîsîtîya çûkek qirêj nabe!

**Çend îzahet :**

1) Aşkera ye serokanîyên serekî yên van herdu gotarên min, berhemên Mamoste Emîn Zekî û Taha Baqir bûn.

2) Gotara yekem temam nebûye. Çûna min a ji derve ya sala 1960'an de ji bo xwendinê, bû sebebê nenivîsîna beşên din.

3) Min "zarav" di cîyê lehçê de bikaranîye.

4) Hest û turrebûn bi herdukan ve dîyar in.

## MIJARA SISÎYAN

# ŞEREFNAME Dİ KURDNASÎYA SOVYETÊ DE

Xwendevarek Kurd yan rojhilatnasek tune ku navê Şerefnamê û Şerefxanê Bedlîsî sehnekiribe. Heta niha bi gelek ziman û dehan car kurt an dirêj di derbarê Şerefnamê de hatîye nivîsandin(*). Bi gelemperî rojhilatnasên Sovyet û bi taybetî Kurdnasên Sovyet, qîmetek dîyar û giranbahayekî mezin bi herdu cildên Şerefnamê û nivîskarê wê dane. Hejmarek gelek zêde ji rojhilatnasên Sovyetê, çi ji bo nivîsandinên xwe yên ser lêkolîna dîroka Kurdistanê û çi jî yên ser lêkolîna herêmên din ên Rojhilata Navîn, gelek ji Şerefnamê îstîfade kirine. Di salên 30'an de, ji rojhilatnas û Kurdnas F.P.Rastopiçin(1) hat

---

(*) Di sala 1973'an de, li gel pêşgotinek çapa Kurdî ya Şerefnamê hatîya belav kirin.

(1) Rojhilatnasê Sovyet F.P.Rastopiçîn, di salên 30'an de çend berhemekî bi qîmet di derbarê gelê Kurd de belav kirîye. Rastopiçîn, di cîhanê de yekem zana ye ku yekem bîblîyografya li ser Kurdan nivîsandîye û di wextê xwe de bin navê "Bîblîyografya Derbarê Mesela Kurd" di kovara Rojhilata Şoreşgêr de belav kirîye. (Binêre: Rojhilata Şoreşgêr, bi zimanê Rusî, hejmar: 3-4, sal: 1933, rûpel: 292-326 û hejmara eynê salê, rûpel: 159-173). Yek ji gotarên bi qîmet ên

daxwaz kirin ku Şerefnamê wergerîne Rusî lê belê gelek mixabin, mirina bêwext musa'eda cîbicîkirina vî karê zanistî yê pêwîst neda.

Qîmetdana rojhilatnasên Sovyet bi Şerefnamê di dawîya 50'an de, gihîşt bilindtirîn derecê. Di vî navî re Beşa Kurdî Leqa Lenîngradê ya Unîversîta rojhilatnasî ya Akademîya Zanyarî ya Sovyet, wergerana Şerefnamê ji zimanê Farisî bi ser zimanê Rusî siparte Yefgina Vasîlîva. Cîbicîkirina vî karî pêwistîya çend salek bêrawestandin dixwest. Di sala 1967'an de, cilda yekem a Şerefnamê hat çapkirin(2) . Çend meh piştê vê, fermanberê zanistî yê Unîversîta Gelên Rojhilata Nêzîk û Navîn a ser Akademîya Zanyarî ya Azerbeycana Sovyetê, Memet Şemsî, ew xebata bi navê Şerefnama Şerefxanê Bedlîsî Wek Serokanîya Dîroka Gelê Kurd(3) ku ji bo lêkolîna Şerefnamê amade kiribû û berhemê karekî bêwestan ê çend salan bû, nama doktorayê pê sitend.

---

Rastopiçîn "Serenc Derbarê Kurd" e, di hejmara 13-14 ya sala 1932' an de, di kovara "Dengûbehsên Rojhilata Navîn" de belav kirîye (Binêre: Kovara navê wê derbaz bû, rûpel; 72-93).

Rastopiçîn, vê berhemê ji bo lêkolîna birek milên girîng ên jîyana aborî û civakî ya Kurdan amade kirîye. Di destpêka vê gotarê de Rastopiçîn êrîşekê gelek tund û tuj kirîye ser wan dîroknivîsên kurtbîn ên ku xebata gelê Kurd lekedarî kirine. Di eynî wextî de Rastopiçîn, bi awakî tundî rexne li wan nivîsarên Sovyetê jî kirîye ku bi nezanî, wek dibêje; "di bin perdeyek teng a Marksîzmê de" tuhmeta kevneperestîyê dane ser hemû tevgerên rizgarîxwazî yên Kurd.

(2) Li gel temambûna wergerandina cilda yekem a Şerefnamê, Vasîlîva, dest avêt wergerandina cilda diduyan jî, ku di sala 1976'an de, ewê jî bi Rusî çap kir. Ji ber ku ev pêşgotina han berê weşandina cilda diduyan a Şerefnamê hatîye nivîsandin, tê de behsa cilda diduyan nehatîye kirin. Di derbarê cilda diduyan a "Şerefnamê" de, binêre: Dr.Kemal Mezher, Mêjû, Kurte Basêkî Zanistî Mêjû, Bexdad 1983, rûpel; 110-126.

(3) Vê nama han bi zimanê Azerî nivîsandîye, kurtîya wê bi Rusî çapkirîye. di wextek şûn de namê bi xwe jî di ketêbekê serbixwe de li Bako çapkirîye.

Ev herdu şarezayên han bi awakî zanistî ketin nav kurayîya qîmeta Şerefnamê û gelek milên wê yên ku nedihatin zanîn û jîyana Şerefxanê Bedlîsî yekem car bi awakî rêk û pêk xistin ber destên rojhilatnasên xwe û yên derve. Bêguman, bi kurtî be jî behsa wan di pêşgotina çapa yekem a Kurdî ya Şerefnamê de, karek di ciyê xwe de ye û pêwîst e.

Cilda yekem a Şerefnamê ya bi Rusî 619 rûpel e(4) , tenê 412 rûpelên wê ji nivîsandina Şerefxan bi xwe pêkhatîye. Yên din ji pêşgotin, paşgotin û kurtebehsek bi ingilîzî ku ser kitêbê hatîye nivîsandin, pêkhatîye, evên han tev ji alîyê berêz zanayê Sovyetî Y.Vasîlîva ve hatîne amade kirin.

Y.Vasîlîva, di 55 rûpelên pêşgotinê de ser giringîya Şerefnamê sekinîye û qîmeta wê ya bilind a zanistî daye dîyar kirin û gelek bi zanyarîyên nû yên di vî warî de belav kirîye ku piranîya wan ji alîyên xwendevarên Kurd de nedihatin zanîn.

Di vê pêşgotinê de zanayê Sovyet, bi dirêjî behsa dîroka lêkolîna Şerefnamê û destnivîsên wê yên kevin û ew kitêbxanên ku ev destnivîsên han tê de nin û gelek behsên din ên wek van babetan kirîye.

Wek Vasîlîva nivîsandîye, Hêrbîlo, di sala 1776'an de, di rûpelên 836, 841'ê wê kitêba xwe ya bi navê Kitêbxanên Rojhilat Yan Ferhenga Giştî ya bi zimanê frensî belav kirîye, yekem car behsa Şerefnamê gîhandîye cîhana zanyarî ya îro(5) . Agahdarîya Hêrbîlo yê ku navê wî derbaz bû ser Şerefnamê, di rîya nivîsên gerokekî Tirk ê bi nav û deng ê sedsala 17'an, Katib Çelebî ve çêbûye(6) . Piştê wî, J.Malcolm(7) yekem

---

(4) 1300 lib ji cilda yekem a Şerefname bi Rusî bi awakî qîmet hatîye çapkirin û gelek bi zû hemû hatine firotin û niha bûye berhemek antîke.

(5) Li gor wan zanyarîyên ku di Bîblîyografya J.S.Musaelyan de hatine belav kirin, Hêrbîlo, di pênc ciyên kitêba xwe de behsa Kurdan û Şerefnamê kirîye ku ew di rûpelên; 317, 706, 807,836 û 841'an de nin. (Binêre: J.S.Musaelyan, Bîblîyografya Kurdnasîyê, bi zimanê Rusî, Moskova 1963, rûpel; 55).

(6) Binêre; rûpela 14'an a pêşgotina Y.Vasîlîva.

(7) J.Malcolm (1769-1833), yek ji karbidestên naskirî yê Brîtanya

Awrupî ye ku detsnivîsên Şerefnamê bi dest xistîye. Malcolm, di warê zanistîyê de jî feyde ji Şerefnamê wergirtîye. Ewî di cilda diduyan a kitêba xwe ya bi nav û deng de ku di derbarê dîroka Îranê de ye(8) , bê ku navê kitêbê û nivîskarê wê bîne, çend caran zanyarîyên xwe ji Şerefnamê girtîye.

Bêguman, di wî çaxî de bikaranîna Şerefnamê wek serokanî ji alîyê şarezayek wek Malcolm ve, belgeyek dîrokî ye ji bo bihayê bilind û qîmeta mezin a Şerefnamê .

Bîst sal piştê J. Malcolm, dîroknivîsê Frensî Etienne Marc Quatremère, di gelek cîyên wê kitêba xwe ya di sala 1836'an li Parîsê bi navê Dîroka Moxolîyên Îranê weşandîye, feyde ji "Şerefnama" Şerefxanê Bedlîsî wergirtîye.

Y.Vasîlîva, bi dirêjahî behsa cîyê Şerefnamê di nav rojhilatnasîya Rusî de kirîye. X.D.Frên, yekemîn zanayê Rus e ku di sala 1826'an, di rojnamekê Peterborga paytext de behsa Şerefnamê wek "serokanîyek dîrokî ya herî girîng" kirîye (9).

Sê sal şûn de cardin Frên di nivîsek xwe de behsa Şerefnamê kirîye, daxwaz kirîye ku bi zûtirîn wext Farisîya wê bê belav kirin û bê wergerandin ser zimanek Awrupî.

Bi qasek şûn de zana û karbidestê Akademîya Zanyarî ya

---

bû, demek dirêj li Hîndistan û Iranê kar kir, şarezatîyekî wî ya gelek zêde di derbarê welat û gelên Rojhilatê de hebû, gelek nivîsên bi qîmet ên di van waran de li pê xwe hîşt. Li Îranê, hejmarek gelek zêde serokanî û destnivîsên kevin bi destê Malcolm ketîne, Şerefnama Şerefxanê Bedlîsî jî yek ji wan bûye.

(8) J.Malcolm, The history of Persia from the most early period to the present time, Vol.II, London, 1815, pp. 207-208.

(9) Mamoste K.Kurdo, di gotarekê de wiha dibêje; M.Volkov, yekem kes e, ku di sala 1826'an de, bi dirêjî behsa Şerefnamê kirîye. Li gor zanyarîyên Mamoste Kurdo, ji derveyê Frên ê ku navê wî derbaz bû, hejmarek din a rojhilatnasên Rusî jî di wî wextî de doza belav kirin û wergerandina "Şerefnamê" kirine. (Binêre; K.K.Kurdoyev, Kurdnasî, kitêba "Muzexana Asya-Liqa Lenîngradê ya Unîversîta Rojhilatnasê Akademîya Zanyarî ya Yekîtîya Sovyet", Moskova 1972, rûpel; 386-387).

Rusya, Vilyamînov Zîrnov(10) , wezîfa belavkirina Şerefnamê bi Farisî girt ser milê xwe û karî di sala 1860'an de, cilda yekem bi pêşgotinek bîst rûpel ya bi qîmet a bi zimanê Frensî ve belav bike(11).

Du sal piştê vê, cilda diduyan jî bi pêşgotinek heft rûpel a bi zimanê frensî ya heft rûpel hat belav kirin(12). Cîbicîkirina vî karî han, ewqas dereca zanistîya Vilyamînov Zîrnov bilind kir ku ji bo Akademîya Zanyarî wek endamek çalak hat bijartin.

Vasîlîva, beşekê gelek bi feyde ya pêşgotina xwe ji bo behsa destnivîsên Şerefnamê amade kirîye, wek dibêje; hejmarên van destnivîsan gelek zêde ne. Hejmarên berhevkirî yên destnivîsên Şerefnamê , tenê yên di kitêbxanên naskirî yên cîhanê de, digihîjin 22 liban(13) . Eva han jî, bêguman, belgek din a girîngîya Şerefnamê ye ku wisa dixuyê gelek ji kevin de dîqeta zanayan kêşaye û hejmarek zêde ji van kesan li ser nivîsandine(14) .

Li gor wan zanyarîyên ku Y.Vasîlîva kom kirîye; kevintirîn, bi qîmettirîn û rasttirîn destnivîsa Şerefnamê ya ku têt zanîn, nusxa bi destxetê pîroz ê Şerefxan bi xwe ye ku bi navê "Şerefname Tarîxa Kurdistan" hatî nivîsandin û ku niha di Kitêbxana Bodleîan a Unîversîta Oxfordê de ye.

Ev destnivîsa han a bi qîmet a Şerefnamê , 246 rûpel e û bi

---

(10) Vilyamînov Zîrnov (Viladîmîr Viladîmîrevîç 1830-1914) yek ji rojhilatnasên Rusya yê naskirî ye, şarezayekî baş ê ziman, arkeolojî û dîrokê bû, gelek zimanan dizanî, di sala 1861-an de, bûye endamek çalak ê Akademîya Zanyarî. Beşek zêde berhemên Vilyamînov Zîrnov, ji bo lêkolîna ziman û dîroka gelên rojhilat ên nav Rusya Çarîtîyê de hatîye amade kirin. Ji ber vê yekê yek ji wan zimanên Zîrnov bi rewanî dizanî, farisî bû û di saya wî de Şerefname belav kir.

(11) Beşa Farisî ya vê cilda han a Şerefnamê 459 rûpel e.

(12) Beşa Farisî ya cilda duyemê "Şerefnamê", rûpel; 459.

(13) Binêre; rûpela 17'an a pêşgotina Y.Vasîlîva.

(14) Dûr nîne ku niha jî hejmarek zêde destnivîsên kevin ên Şerefnamê li Kurdistanê yan jî di ciyên din ên Rojhilata Navîn de hebin.

bîst wênên antîke ve hatîye xemilandin, di dawîya Zulhîcca sala 1005'ê koçî (hicrî) de (13'ê Tebaxa sala 1597'zayînî-mîladî) Şerefxan dawîyê bi nivîsîna wê anîye. Yanî ev destnivîsa han yekem nusxa nivîsandî ya Şerefnamê ye, ji ber ku Şerefxanê Bedlîsî meha di Tebaxa sala 1597'an nivîsandina cilda yekem û di meha Gulana sala 1599'an de jî nivîsandina cilda diduyan xelas kirîye.

Nusxa diduyan a bi qîmet a Şerefnamê ew liba ku di Kitêbxana Giştî ya Lenîngradê de ye. Dîroka nivîsîna vê nusxa han di sala 1598 an û Şerefxan bi xwe redakte kirîye û bi destê xwe yê pîroz muhra xwe ya taybetî ser daye. Gelek mixabin, çend ciyên kêm ên vê destnivîsê nemane. Hêjayê gotinê ye, ev destnivîsa han a Şerefnamê yek ji wan berhemên bi qîmet bûye di Kitêbxana bi nav û deng ya Sefewîyan de ku Rusan di wextê Şerê 1826-1828'an ji Erdebîlê anîne bajarê Peterborgê.

Destnivîsekê Şerefnamê ya kevin ku di sala 1606'an, li bajarê Kilîsê ji alîyê Hesenê kurê Nureddîn ve li ber nusxa yekem a Şerefnamê hatîye nivîsandin, 327 rûpel e û li Kitêbxana Bodleîan de ye.

Ji derveyê van, Y.Vasîlîva behsa çend lib destnivîsên kevin yên Şerefnamê, yên wek wan destnivîsên li Muzexana Brîtanya, Kitêbxana Stenbol û çend ciyên din hatine parastin, kirîye(15) .

Heta niha çend caran Şerefname ji zimanê farisî hatîye wergerandin ser çend zimanên din. Li gor gotina Vasîlîva, kevintirîn wergera Şerefnamê ew herdu wergerandinên cîhê kirî yên bi zimanê tirkî ne. Yek ji van kurtebirîya Şerefnamê ye, ya din jî temamê wê ye. Heta niha du destnivîsên yekê û destnivîsek jî ya diduyan hatîye dîtin, lê yek ji van jî nehatine belav kirin. Kurtebirîya Şerefnamê ji alîyê Mihemmed Begê Ehmed Begê Mîrza ve di sala 1078'ê koçî (1667-1668'ê zayînî) hatîye wergerandin, ya din jî di salên 80'î sedsala 17'an de, ji alîyê kesek ku navê wî Samî ye, hatîye wergerandin(16) .

---

(15) Binêre; rûpelên 17-20'an ên pêşgotina Y.Vasîlîva.

(16) Rûpelên 20-21'an ên eynî serokanîyê.

Dor û berê du sed sal piştî van, cilda yekem a Şerefnamê ji alîyê rewşenbîrekî herî zîrek ê sedsala 19'an a Kurdistanê, Mele Mehmûdê Beyazîdî ve(17), yekem car wergerandîye kurdî. Mele Mehmud, dor û berê salên 1858-1859'an, bi handana Kurdnasê bi nav û deng ê Rusî, Aleksander Jaba ve vî karî han kirîye(18) . Destivîsa vê nusxa kurdî ya Şerefnamê di Kitêbxana Giştî ya Lenîngradê de hatîye parastin.

Her di wan dor û beran de jî li bajarê Vîyanayê, paytextê Nemse(Avusturya), Şerefname ji alîyê G.A.Barbe ve bi Almanî hatîye wergerandin û beş bi beş di navbera salên 1853, 1859'an de, li gel pêşgotinekê werger de hatîye belav kirin.

Bi qasek şûn de karekî zanistî yê girîng di derbarê Şerefnamê de hat kirin ku ev karî han bûye sebebê nasandina Şerefnamê ji alîyê temamê akademîyên zanyarîyên Rojava ve. Vî karî han Prof.F.B.Charmoy ku di wî wextî de mezintirîn Farisîzanê Awrupa dihat zanîn, karî di navbera salên 1868 û 1875'an de, li Peterborgê herdu cildên Şerefnamê bi zimanê frensî belav bike.

Ev karê han berhemê bê rawestandin a berdewamî yê 30 sa-

---

(17) Mele Mehmudê Bayezîdî, zanayekî payebilindê Kurd e. Dor û berê dawîya sedsala 18'an ji dayîk bûye, gelek ji zimanên Rojhilatê zanîye û hejmarek gelek zêde berhemên bi qîmet li pê xwe hiştîye ku navek re diqeta Kurdnasan kêşaye û qîmetek zêde pê dane. Wergerandina Şerefnamê bi kurdî ji alîyê wî de, bi serê xwe karekî mezin e. Di derbarê jîyan û berhemên Mele Mehmudê Bayezîdî de binêre; Mêjû, rûpel; 126-131.

(18) Aleksander Jaba, wextê xwe de konsolosê Rusya bûye, demek di nav Kurdan de jîya ye, di nêzîk de Kurdan naskirîye û gelek berhemên bi qîmet di derbarê wan de nivîsandîye.

Yek ji berhemên Jaba "Cam'îyê Risalayan û Hikayatan Bi Zimanê Kurmancî" ye, ku ji hejmarekê gelek zêde pend û çîrokên folklorî yên kurdî yên berhevkirî pêkhatîye, evan tev kirîye frensî û di sala 1860'an de, li Peterborgê di kitêbekê serbixwe de çapkirîye. Jaba, havrêyekî gelek nêzîkê Mele Mehmudê Bayezîdî bûye, bi alîkarîya wî, karibûye gelek destnivîsên bi qîmet peyda bike û gelek alîyên ziman û jîyana rewşenbîrî ya gelê Kurd bikole, ku ciyên wan di kitêbxana Kurdnasîyê de dîyar in.

lên Charmoy bû, Şerefnamê ji çapa Wilyamînov Zîrnov ve wergerandîye, lê ser vê de jî ji du destnivîsên din ên kevin jî îstîfade kirîye.

Çapa Fransî ya Şerefnamê , çar cildên serbixwe ne, beşa yekem a cilda yekem di sala 1868'an, beşa diduyan a cilda yekem di sala 1870'an, beşa yekem a cilda diduyan di sala 1875'an de hatine çapkirin(19). Charmoy, rîayetê hemû prensîbên mercê zanyarîyên wergeranê kirîye. Bîr û ray û wan rastî û ronîkirinên xwe yên pêwistî zanîye, di perawêzên kitêbê de belav kirîye. Her wiha pêşgotinek jê re nivîsandîye ku tê de behsa Şeref-namê, hinek milên jîyana Kurdewarî û coxrafya Kurdistanê kirîye.

Vasîlîva, çend rexnên di cîyê xwe de li pêşgotina F.B.-Charmoy girtîye, lê li gel vê jî, vê yeka han qebul kirîye ku ev wergerandina han "heta îro jî ji qîmeta xwe ya zanistîyê tiştek winda nekirîye"(20) .

Piştê van zanyarîyên bi qîmet yên di derbarê wan de kêm hatine zanîn, Y.Vasîlîva dikeve behsa pesn û girîngîya Şerefnamê , bîr û bawerîya xwe di vî warî de dixe holê û bi vî awayî didomîne:

Qîmeta zanyarîya vê serokanîyê ewqas zêde ye, pêwistî û îhtîyaca wê bi methê nîne, qet nebe ji ber wê ku bi alîkarîya Şerefnamê mirov dikare ciyê girîng ê windabûyî yê gelê Kurd di dîroka Rojhilata Navîn de dîyar bike(21), bêguman qîmeta vê yeka han jî nayê pîvan, ji ber ku gelê Kurd, her wekî rojhilatnasê herî bi nav û deng ê Rusya û Sovyetê Orbelî(22) dibêje; "tesîrekê bi yekcarî mezin kirîye ser jîyana rewşenbîrên

---

(19) Binêre; rûpelên 21 û 49'ê pêşgotina V.Vasîlîva.

(20) Rûpela 23'an a eynê serokanîyê.

(21) Rûpela 37'an a eynî serokanîyê.

(22) Arkeolog û dîroknivîsê Sovyetî yê bi nav û deng Isuv Abgarovîç Orbelî (1887-1961), yek ji wan zanayên paye bilind e ku bi kurayî û berfirehî ziman û dîroka gelê Kurd û rewşa jiyana sîyasî û civakî ya wan têgihîştîye, bi çavekî rêz li wan nêrîye û xizmetekê zêde ji Kurdnasîyê re kirîye. Desteki wî yê bilind têgihandina hejmarek ji zanayên Kurdên Sovyetê de heye. Hêjayê gotinê ye, Isuv Abgarovîç Orbelî, Ermenî ye.

Rojhilat. Kurdan, gelek hebûnên xwe di bin navê Faris, Tirk, Ereb û Ermenîyan de(23) ji destê xwe kirîye, wek eva han ku kesên ji wan ên şair, hunermend û cengawerên nemir dîroka çend gelan xemilandine. Vê yeka han jî tesîrekê wisa kirîye ser zanayên Awrupa û Rusya ku di nav wan de bibe adet û belav be; guya Kurd, ne tenê nikare tiştek di warê rewşenbîrîyê de bîne holê belko xwedan hêzek wisa jî nîne heta bikare tiştekê ji biyanîyan jî hîn be". Lêbelê, wek Vasîlîva dibêje; bi alîka-rîya Şerefnamê mirov dikare vê valatîya mezin a dîroka gelên Rojhilat tejî bike û ciyê rasteqînî yê netewa Kurd tê de bide dîyar kirin.

Yek ji wan encamên girîng ên ku zanayê Sovyet Y.Vasîlîva di derbarê naveroka Şerefnamê de daye fam kirin eva han e ku kurdnas bi alîkarîya vê serokanîya dîrokî ya esîl, dikarin bi awakî berfireh gelek rûyên jiyana sîyasî û civakî ya îro ya Kurdan tê bigehin, reh û rîşên xebata rewa ya vî gelî "ya di rîya rizgarîya ji bindestîya netewî û ji bo wekhevîya wî li gel gelên din" dîyar bike(24) .

Ev tesbîtên Vasîlîva gelek rast û durust in, ji ber ku "Şerefnama" Şerefxanê Bedlîsî, gelek milên girîng ên xebata asê ya netewa Kurd ên sedsalên borî de weşandîye ku ji alîyê dîroknivîsên me û yên bîyanîyan de nedihatin zanîn. Ji ber ku heta îro jî bi tevayî nehatine zanîn, eva han jî bûye sebebek mezin ê tênegîhiştina tevgera rizgarîxwazîya netewî ya gelê Kurd ji alîyê bîyanîyan de.

Vasîlîva, ji 120 rûpelan zêdetir ji dawîya kitêba xwe ji bo têbînî, ronî kirin, muqayese û rastkirin, navên serokanîyan, melbend û kurtebehsekê jî di derbarê Şerefnamê de amade kirîye. Bêguman, evên han jî hîn zêdetir bihayê zanyarîya karê wî bilind kirîye. Hêjayê gotinê ye ku rojhilatnasên Sovyet qîmetekê gelek zêde dan vî karî han ê Vasîlîva û vê yeka han destkevtineke aşkera ya Kurdanasîyê hesibandin(25) .

---

(23) Hewce bû Azerbeycan jî bêxe li ser.

(24) Binêre; rûpela 67'an a pêşgotina Y.Vasîlîva.

Zanayê Azerî Memed (Mihemmed) Şemsî, ji derveyê nama xwe ya doktorayê, zencîrek gotarên zanistî di derbarê Şerefxanê Bedlîsî û Şerefnamê de belav kir, wek "Dîroknivîsê Bi Nav û Deng ê Kurd Şerefxanê Bedlîsî"(26) û "Behsa Serîhildanên Sedsala Şanzdehan a Eşîrên Kurdan Di Şerefnamê de" (27) .

Dr.Şemsî, di nama xwe ya doktorayê de, bi dirêjî behsa jîyan û serpêhatîyên Şerefxan û rewşa jiyana sîyasî û civakî ya Kurdistanê ya sedsala 16'an dike û ser naveroka Şerefnamê disekine. Ji bo ronîkirina van behsên han hejmarekê gelek zêde serokanîyên wek "Nuzhetu'l-Qulub" a Hemdulla Qezwînî û berhemên birek dîroknivîsên hevçaxê Şerefxan bikar anîye, wek berhemê Qazî Ehmedê Xefarî.

Dr.Şemsî jî wek Vasîlîva, bi dirêjî behsa qîmeta Şerefnamê kirîye û di vî warî de wiha dibêje: Dîroknivîsên piştê Şerefxan, ên wek Katib Çelebî, Ewlîya Çelebî û gelekî din, di berhemên xwe de ji hemû serokanîyan zêdetir Şerefnamê bikaranîne. Di eynî wextî de Şemsî vê şaşîtîya han jî rastkirîye ku wek grubek dîroknivîs dibêjin, guya Şerefxan Şerefnamê bi handana Şahê Îranê nivîsandîye. Di rastîya xwe de, wextê Şerefxan Şerefnamê nivîsandîye nêzîkatîya wî bi Sultanên Osmanîyan re zêdetir bûye, li gor gotina Dr.Şemsî; heta Osmanîyan alîkarîya wî jî kirine.

Li ser van tevan re jî di naveroka Şerefnamê de heta radeyek gelek zêde hest bi bê alîgirîyê têt kirin. Wek mîsal, Şerefxan, mihêldarîya Şah Tehmasb û ya Sultan Muradê Sêyem yek curê kirîye û xwe ser şûr û tirkêşana wan ji hev re bêdeng kirîye.

Şerefxan, bi awakî gelek aşkera wan sebebên ku wî han

---

(25) Binêre; Kovara Gelên Asya û Afrîka, bi zimanê Rusî, hejmar 6, sal 1968, rûpel; 201-202. Kovara navê wê derbaz bû, vê yeka han qebul kirîye ku karê Y.Vasîlîva, di hemû milan de destkevtinek girîng ên Rojhilatnasîya Sovyetê ne.

(26) Binêre; kovara Hevalên Akademîya Zanyarî ya Azerbeycana Sovyetê, bi zimanê Rusî û Azerî, hejmar 1, sal 1967, rûpel; 67-72.

(27) Eynê kovar, hejmar 1, sal 1968, rûpel; 40-46.

daye ji bo nivîsandina Şerefnamê, ronî kirîye. Di destpêka kitêba xwe de wiha dibêje: Ji bo ku heta îro dîroknivîsan qet tiştek di derbarê Kurd û Kurdistanê de nenivîsandine, min xwest li gor îmkana xwe di vî warî de kitêbek binvîsim û navê wê jî deynim Şerefname. Armanca min ji vê jî ew e ku navê xanedanên Kurdan wenda nebin!

Madem wiha ye, berê her tiştî û pêşîya hemû sebeban; gîyan û hestê Kurdayetîyê Şerefxan han daye ku Şerefnamê binvîse. Belgên vê rasteqînîya han gelek caran di nav Şerefnamê bi xwe de têt dîtin. Wek mîsal, ji serî heta binî di Şerefnamê de, bi awakî aşkera bê ku nav û unvanê Sultan hilde, bin lêv re wiha dibêje:

"Kurdistan, welatek e ne ji alîyê kesek de tê îşgal kirin û ne ji bo kesekî sernizmîyê dike!"

Ji derveyê van hemû tiştan, Şerefxanê Bedlîsî yekem kes e bi awakî durust sînorê Kurdistanê dîyar kirîye. Berê Şerefxan, bi taybetî dema Selçukîyan de Kurdistan ji wan melbendan re dihat gotin ku ketibûn navbera Azerbaycan, Loristan û rojavayê zincîrên Çîyayê Zagrosê. Lê di Şerefnamê de, sinorên Kurdistanê ji Meletyê destpê dike û ser qeraxên Xelîcê dawî pê têt.. Evên han jî di rastîya xwe de nîşanên wan in ku her di sedsala 16'an de, destpêka durustbûna hestê netewî di nav serokên Kurdan de ber bi ajardanê de bûye.

Milekê girîng a din a karê zanistî yê Dr. Şemsî ya di derbarê Şerefnamê de eva han e ku bi alîkarîya naverok û ser ronahîya rêbazekî zanyarî ya durust, karîye çend milekê aloz û kêmhatîzanîn a jîyana civakî û aborî ya çend navçên Kurdistanê yê dawîya qerna navîn de ronî bike. Li gor zanyarîyên di nav Şerefnamê de, bingeha jîyana aborî ya Fermanrewatîya Bedlîsê ya Qerna Navîn, ser awakî hebûna axên biçûk hatibû damezrandin, bindestîya cotkaran jî qalibê xwe yê taybetî wergirtibû, bi wî awayî ku tenê di çarçova berhemanînê de hatibû girtin. Cotkaran, dibû ser vê de jî parêzgerîya berjewenda siyasî ya serokên xwe bikin û di hemû şerên axayên xwe de beşdar bin. Ev şerên han beşek encamê dijîtîyên serokên mîrîtîyan bi xwe bûn.

Hêjayê gotinê ye, Memed Şemsî, nama doxtora xwe wek ki-

têb jî bi eynî navî belav kirîye. Ev kitêba han jî, destkevtîyek din a Kurdnasîya Sovyetê ye, kitêb, ji 144 rûpelan pêkhatîye û 1700 nusxe jê hatîye çapkirin. Dr.Şemsî, ji 134 serokanîyên cur bi cur îstîfade kirîye û navên wan di dawîya kitêbê de belav kirîye.

Qanadê Kurdo jî di sala 1972'an de, di wê gotara xwe ya bi navê "Kurdnasî" weşandi, behsa Şerefnamê kirîye(28). Di vê gotarê de Q.Kurdo, bi taybetî bal kêşaye ser destnivîsên kevin ên Şerefnamê(29) .

Wek Q.Kurdo dibêje; M.Volkov, yekem kes e di salên 20'ên sedsala 19'an de, di çend rûpelan de behsa destnivîsên Şerefnamê kirîye û X.D.Frên jî yekem kes e, her di wan dor û beran de di gotarên xwe de behsa qîmet û pêwistîya weşandin û wergerandina Şerefnamê kirîye(30). Piştê vê, Mamoste Qanadê Kurdo, têt ser behsa dîroka lêkolînên Şerefnamê yên ku ji alîyê rojhilatnasên Rusya û Sovyet ve hatine kirin.

Bi vî awayî ciyekê berz û hêjayê Şerefnamê di Kurdnasîya Sovyetê de heye. Wan rastîyên ku me li jorê behs kirin, heta derecek yarîderên dîyarkirina qîmeta zêde ya çapên Kurdî yên Şerefnamê didin(31). Bêguman, Mamoste Hejar, bi wergerandina Şerefnamê ser zimanê Kurdî, valatîyek mezin di kitêbxana kurdî de tijî kir û "Akademîya Zanyarî ya Kurd" jî bi belavkirina wê, wezîfek girîng a ser milê xwe bicî anî.

---

(28) Derbarê vê gotara Kurdoyev, binêre; perawêza hejmara 9'an.

(29) Bi taybetî ewên ku di arşîvên Lenîngradê de hatine parastin.

(30) K.K.Kurdoyev, serokanîya navê wê derbaz bû, rûpel; 386-387.

(31) Mebest ji vê, wergera Mamoste Hejarê şair e ku di wextê xwe de bi alîkarîya "Akademîya Zanyarî ya Kurd" çapkir.

# MIJARA ÇARAN

# KURD LI BA GORDLEVSKI

## GORDLEVSKI (1876-1956)

Eva demek dirêj e Kurdnasî bûye beşekê dîyar a Rojhilatnasîya Sovyetê. Çend rojhilatnasên bi nav û deng ên Rusya demek gelek dirêj berê Şoreşa Oktobrê ya sala 1917'an, bingeha Kurdnasîyê danîn[1]. Wisa lê hat ku beşek ji destê diduyan ê wê rojhilatnasîyê bibe hevçaxê du dewir û du rejimên cûda, yanî yên serdema Rusya ya berê Oktobrê û yên serdema Sovyetîstana piştê Oktobrê. Yek ji van rojhilatnasên bi nav û deng V.A.Gordlevskî bû.

---

(1) Şarezayên me heta niha gelek berhemên bi feyde di derbarên Kurdnasîya Rusî û Sovyet de belav kirine û wergerandine. (Wek mîsal binêre:

D.Ebdurehman Hacî Marif, "Di Warê Kurdnasîyê de Rusya û Yekîtîya Sovyet", "Kovarî Korrî Zanyarî Kurd, hejmar, 1-2, 1974, rûpel; 499-568.

Tarîxu'l Istîşraq we el-Dirasatu'l-Erebîyye we'l-Kurdîyye fî el-Methefu'l Asîyewî we Me'ehede'l-Dirasatu'l-Şerqîyye fi Lenîngrad: 1818-1978, telîf mecmû'e min'l-musteşriqîn el-Sovyet. Tercemehû we 'elleqe 'eleyhî we qeddeme lehû el Dr. Maruf Xeznedar, Bexdad, 1980.

Vladîmîr Aleksander Gordlevskî[2], roja 19'ê meha Çirya Yekem a sala 1876'an li bajarê Sivyaborgê ji dayîk bû. Bab û bapîrê (kalê) wî efserên eskerî yên Çar û ji wan kesên xwenda yên dema xwe bûn, lêbelê wî rîya serbazîyê negirt û bi awayê xortanîyê hulya Rojhilatê kir serê xwe. Sala 1899'an li Moskova beşa Zimanê Rojhilat di Unîversîta Lazerîyev de temam kir, pênc sal şûn de liqa fîlolojîyê ya li ser Unîversîta Moskova qedand.

Gordlevskî, piştê vê, di sala 1907-an de, Unîversîta Lazerîyev de bû mamoste, ji vir şûn de ket nav saheya nivîsîn, lêkolîn û hînkirinê. Bi vî awayî hîndekarîya ziman û dîroka edebîyata Tirkî jê re hat dan û di navbera neh salan de gihîşt dereca bilind a profesorîyê. V.A.Gordlevskî, di sala 1929-an de, bû endamê yarîder ê Akademîya Zanyarî ya Sovyetê û di sala 1946-an de jî bû endamek çalak (aktîf). Salên dawî yên jîyana xwe bû serokê beşa Ziman û Edebîyata Welatên Rojhilata Nêzîk û Navîn a li ser Unîversîta Rojhilatnasî ya Akademîya Zanyarî ya Sovyetê.

Karên zanistî yên Vladîmîr Aleksandrevîç Gordlevskî, valatîyek mezin di kitêbxana rojhilatnasîyê de tijî kirîye. Hejmara wan karan digîhîje nêzîkî 300 gotar û kitêbên cûr bi cûr. Tenê Berhemên Helbijartî yên wî, çar cildên serbixwe ne ku bi ser hev de 2310 rûpelên mezin in(16x25 cm). Berhemên V.A. Gordlevskî berên bêxewî û zehmetîya pêncî salên bê sekin ên zanakî fedakar û zîrek in.

V. A. Gordlevskî, di berhemên xwe de ji hemû tiştî zêdetir qîmetê bi ziman, edebîyat û dîroka Tirkan daye, bi taybetî yên dewra Selçukî û Osmanîyan. Ji ber ku gelek ziman dizanî, di tirkî de bi temamî şareza bû, serokanîyên behsên wî babet babet û dewlemend in.

Bîhna bê terefî, hessasî û zanistîyê ji berhemên wî tên. V.A.Gordlevskî, berê Şerê Cîhanê yê Yekem, di salên şerê de û piştî temambûna wî, çend caran çûye nav erda Tirkîyê, gav bi

---

(2) Ji bo nivîsîna kurtejîyan û çalakîyên zanistî yên V.A.Gordlevskî, me feyde ji çend serokanîyên ansîklopedî û pêşgotina Karên Helbijartî yên wî wergirtîye.

gav gelek navçan gerîyaye û di nêzîk de têkilîyê bi axa, mîr, gundî, karker, senetkar û fermanberên vî welatî re danîye. Mebesta wî ya serekî ew bûye ku ji wan hîn zêde zanyarîyan werbigre û bi vî awayî berhemên xwe hîn zêdetir pê dewlemend bike. Li gor gotinên şarezan ew kitêba di sala 1916'an de bi navê "Tekstên Folklora Osmanî" belav kirîye, heta niha jî emsalê wê tune. Gordlevskî, rûpelên wê kitêbê bi wan stran, beste, pend, gotinên bi nirx û metelokan tijî kirîye ku evan ji devê xelkê û di nav axa Tirkîyê de berhev kirine.

Zanayan, zehmeta bê rawestandin a Vladîmîr Aleksandrevîç Gordlevskî gelek berz nirxandine. Erebnasê bi nav û deng û endamê hejmarek akademîyên zanyarî yên welatên Rojhilat ên wek Y.Yu. Giraçîkovskî di namekê taybetî de jê re gotîye:

"Tu ne wek kesekî, heta derecek wek hemûyan
Di dîroka zanistî ya rojhilatnasîya me de bê emsal î".

Hemû ser hev, çar sal ser koça dawîya V.A.Gordlevskî de neçû (roja 10'ê Îlona sala 1956'an koça dawîyê kir), Beşê Dîrokê ya Akademîya Zanyarî ya Sovyetê, roja 8'ê Kanuna Duyem a sala 1957'an, biryarê belavkirina karên wî yên helbijartî derxist û ji bo cîbicîkirina vî karî han komîtekê taybetî ya ji çend kesên şareza pêkhatî damezrand. Wek me got, ev karên han ên V.A. Gordlevskî, di çar cildên mezin de hatin berhevkirin. Cilda yekem[(3)] ji beşek berhemên xwedîyê wî yên di derbarê dîroka qerna navendî ya Tirkîyê hatîye amade kirin. Di cilda diduyan de[(4)], ew lêkolînên ku V.A.Gordlevskî di warê ziman, folklor û edebîyat de kirine, pêkhatîye. Helbijartîyên zincîrek din ji berhemên dîrokî yên V.A.Gordlevskî li gel çend nivîsînên din ên babet babet di derbarê rewşenbîrî de, li ber cilda sisîyan ketine[(5)]. Behsên beşa dawîyê yên van

---

(3) Akademîya V.A.Gordlevskî, Karên Helbijartî, bi zimanê Rusî, cilda yekem (Berhemên Dîrokî), Moskova, 1960, rûpel; 552.

(4) Akademîya V.A.Gordlevskî, Karên Helbijartî, cilda duyem (Ziman û Edeb), Moskova, 1961, rûpel; 558.

(5) Akademîya V.A.Gordlevskî, Karên Helbijartî, cilda sêyem (Dîrok û Rewşenbîrî), Moskova, 1962, rûpel; 558.

karan jî li ser warên etnografya, dîroka Rojhilatnasîyê û berhemên zanayan pêk têt[6].

Di çar cild Berhemên Helbijartî yên V.A.Gordlevskî de navê Kurd Kurdistan û hejmarek zêde ji bajarên Kurdistanê yên serdemên cuda û cuda derbaz dibin.[7]

## ÇEND RUPEL JÎ DÎROKA QERNA NAVÎN A KURD:

Wek zanayek bêhempa, Vladîmîr Aleksandir Gordlevskî, xwe di qalikê Tirknasîyê de negirtîye. Ewî bi awakî gelek payebilind rola gelên Rojhilatê, di dîroka jîyana mirov de nirxandîye. Her wiha di meydana zanistî ya rojhilatnasîyê de jî destek wî yê berz hebû. Ji ber van sebeban û çend sebebên din ên wek van, gelek car qelema V.A.Gordlevskî bi nêzîk ve sînorên wan behsan ketîye ku peyvendîya wan bi dîrok, jîyana aborî, civakî û edebî ya gelê Kurd ve heye. Carên wisa hene, di berhemên wî zanayî de, em rastê rûpelên wisa yên dîroka Kurdan tên ku em bi xwe jî, gelek mixabin ewqas jê nizanin. Ew rastîyên ku tenê li ser Kurdan yên di kitêba "Dewleta Selçukîyên Asya Biçûk" de nivîsandine, her çendîn hecma wan kêm be jî bi naveroka xwe dewlemend û bi qîmet in, bi taybetî hewce ye em vê yeka han jî ji bîr nekin ku ronîkirina dîroka Kurdan a qerna navîn karekî rehet nîne, ji ber ku piranîya wan berhemên ku heta îro dîroknivîsên dilsoz ên me, yên di derbarê wan dewran de nivîsandine, heta derecek perçe perçe û ji hev cîhê ne. Ez di wê bawerîyê de me, zanyarîyên di nav kitêba "Dewleta Selçukîyên Asya Biçûk" de ne alîkarîya tijîkirina çend derz û valatîyên wê dîroka me didin ku pêwîst e bibe proja berhemekî mezin a dîwarojê.

Di sala 1941'an de, V.A.Gordlevskî kitêba xwe ya "Dewleta

---

[6] Akademîya V.A.Gordlevskî, Karên Helbijartî, Cilda çaran (Etnografya, Dîroka Rojhilatnasîyê û Nirxandin), Moskova,1968, rûpel 612.

[7] Wek mîsal, di cilda yekem de sê car navê Kurdistan û gelek caran jî navê bajarên cihê hatine. Tenê Amed(Dîyarbekir) 15 car û Bedlîs nêzîkî 20 caran di wê cildê de derbaz bûne.

Selçukîyên Asya Biçûk" belav kir.[8] Ji ber çend sebeban ev kitêba han ji girîngtirîn berhemên V.A.Gordlevskî têt hesêb kirin. Dîroka Selçukîyên Asya Biçûk, behsek giran û gelek aloz e, ji ber ku bi taybetî êrîşên bêeman ên Moxolîyan ên sedsala 13'an, bûne sebebê fewtîna gelek belge û destnivîsên bi qîmet ên derbarê jîyan, dam û dezgên Selçukîyan. Lê V. A. Gordlevskî, bi alîkarîya serokanîyên tirkî, farisî, ermenî gurcî, suryanîyên kevin û hejmarek gelek zêde ji lêkolînên dîroknivîsên Awrupîyan, karîye gelek milên kur ên vê mijarê bikole. V. A. Gordlevskî, di 16 feslên wê berhemê de bi dirêjî behsa Tirk, Moxol, Oxuz û eşîrên koçer ên Asya Biçûk ên di navbera sedsala 16'an û sedsala 18'an, derebegîyên wan melbendan ên eynê dewrê, jîyan û desthilata sultanên Selçukîyan, pîşegerî, pîşesazî, bazirganî, bajar, gund, esker, ayînî, urf û edetên Selçukîyên Asya Biçûk kirîye.[9]

Selçukî ku yek ji wan eşîrên koçer ên Oxuzên Turkmen bûn, di destpêkê de di wan navçên Asya Navîn dijîyan ku dekevin milê rastê rûbarê Zerefşan yê navbera Buxara û Semerkentê (10).

Şivanên pîşeyî yên wî çaxî Selçukî bûn. Piştê wê, dor û berê xelasîya sedsala 10'an, Selçukî Musilman bûn û piştê musilmanbûna wan guhertinek mezin di jîyana wan de destpê kir, ji ber ku, bi taybetî desthilata serokên wan di bin perda dînê de, rehettir gîhîşt nav axa gelên Musilman ên Rojhilat. Ev yeka han bi serê xwe bû sebebekî mezin a rakêşana Selçukîyan ber bi Asya Biçûk ku beşekê mezin wî çaxî di bin desthilata Ebbasîyan de bû.

---

(8) Yekem behs e ku di Karên Helbijartî de belav kirîye, nêzîkî 300 rûpelên cilda yekem girtîye.

(9) Binêre: V.A.Gordlevskî, Karên Helbijartî, cilda yekem, rûpel; 31-318.

(10) Ji bo kurtebehsa dîroka Selçukîyan, ji derveyê berhemên V.A.Gordlevskî, min feyde ji çend serokanîyên din jî wergirtîye, bi taybetî ji kitêba A.D.Novîçîyev, Tirkîye, Kurtedîroka Wê, bi zimanê Rusî, Moskova, 1965.

Di sedsala 11'an de, wextê ku Selçukî ber bi welatên Rojhilata Nêzîk û Navîn de hatin, pêşîya hemû cîyan berê xwe dan Îranê ku nezîkî wan bû.

Sala 1040'an de, hêzên pêşeng yên Selçukîyan cara yekem ketin nav axa Îranê û di navbera 15 salan de karîn desthilata xwe bigîhînin hemû navçeyan. Girtina Îranê imkanê Selçukîyan zêde kir, vê yeka han wisa lê kir ku bê wan bisilikînin, berê xwe bidin Îraq, Sûrîye, Azerbaycan, Kurdistan û Ermenîstanê. Di navbera salên 1042 û 1051'an de, Selçukîyan karîn piranîya beşên Kurdistanê îşxal bikin û bikin ser dewleta xwe ya fireh, piştê vê jî di sala 1055'an de bi îşxalkirina Bexdayê desthilata xwe hîn xurtkirin.

Bi vî awayî Selçukî, heta nîvê sedsala 11'an, gihîştin ser sînorê Asya Biçûk ku ji ber gelek sebeban dîqeta wan kêşa bû.

Asya Biçûk, welatekî fireh, dewlemend, xweş û kêmnifus bû, wî çaxî piranîya beşê wan navçan destê Bîzansîyên Îsayî de bû. Demek bû fermanrewayên cîhana Îslamê li ser vê yekê difikirîn ku wê perça girîng ya rojhilatê têkin destê xwe. Ji ber ku ev beşa han bibû bingehek tehdîdê ji bo Îsayîyan ku dixwestin bi vê rîyê re bigihîjin melbendên pîroz ên Filistînê. Serdarên Selçukîyan, dizanîn bi rehetî dikarin berê xelkê sade bidin ber bi wan navçan de ku dagîrkirina van deran, bêguman dibû sebebê belavbûna nav û dengê wan di nav seranserê cîhana Musilmantîyê de.

Di nîvê sedsala 11'an de, yekem car Selçukî ketin êrîşbirina li ser Asya Biçûk, lê ji ber hêzên Bîzansîyan êrîşên wan qonaxan perçe perçe û kêmencam bûn, piştê her êrîşekê naçar dibûn paş de bikişin. Her di wî çaxî de jî beşekê mezin ê şerên ku navbera Bîzansî û Selçukîyan de diqewimîn li ser axa Kurdistanê çêdibûn. Di salên 60'î yên sedsala 11'an de, karaktera êrîşên Selçukîyan a li ser Asya Biçûk guherî. Piştê vê, êdî destavêtin avakirina bingehên xwe qayîmkirin û cîbûnê di wan melbendan de ji xwe re damezrînin. Encama vê yekê bû ku di sala 1071'ê li nêzîkî Melazgirdê[11] ya erdê Kurdan eskerê

(11) Menazgirt.

Bîzansîyan şikand. Deh sal şûn de Selçukîyan Îznîkê îşgal kirin û kirin paytextê xwe. Sala 1085'an Îzmîrê jî îşgal kirin ku bi vî awayî Dewleta Selçukîyan di Asya Biçûk de damezra û jê re Mîrnişîna (Fermanrewatî, Derebektî, Mîrîtî/Mîrektî-Elîşêr.) Selçukî têt gotin û ev beşa han ji beşek dewleta Selçukîyan a mezin pêkhatibû. Di sala 1116'an de Selçukîyên Asya Biçûk, bajarê Konyayê kirin paytextê mîrnişîna xwe, ji ber vê yekê jê re Mîrnişîna Konyayê jî têt gotin.

Mîrnişîna Selçukî ya Asya Biçûk hingî diçû berfireh dibû, bi taybetî piştî sala 1180'an gava ku Mîrnişîna Danişmendî ya cîranê xwe ji holê rakirin(12). Bi vî awayî desthilata Selçukîyan gihîşt wê derecê, vêca zêdetir ber bi rojava ve kêşan û heta gihîştin wan navçên Asya Biçûk ên ku ketibûn li ser behrê.

Bi vî awayî di dawîya sedsala 12'an û destpêka sedsala 13'an de, dewletekê mezin a Tirkan di bin serokatîya binemala Selçukî de, di Asya Biçûk de damezra. Ev dewleta han dewra fermanrewatîya Sultan Elaeddîn Keykubatê Yekem (1219-1326) de gihîşt sevîya herî bilind a desthilat û pêşketinê. Di bin sîya wî sultanî de behsa avahîyên Konya, Kayserî, Sîwas û bajarên din ên Asya Biçûk ketibûn ser zimanan.

Li dor û berê nîvê sedsala 13'an li gel êrîşên Moxolîyan, roja Mîrnişîna Selçukîyên Asya Biçûk ber bi avabûnê de çû. Heta destpêka sedsala 14'an bi tevayî têk çû, bi taybetî piştî sala 1307'an li ser birek mîrnişînên biçûk hat par ve kirin. Gelek di ser de neçû, Osmanî bûn mîratgirên wan û cîyê wan girtin.

Bi vî awayî Mîrnişîna Selçukîyên Asya Biçûk, karî desthilata xwe li ser navçekê fireh a Kurdistan, Erebîstan û Ermenîstanê deyne ku dîroka serpêhatî û bûyerên wan bi hezar milan ve peyvendîya wan li gel dîroka Kurd, Ereb, Ermen û

---

(12) Di sala 1067'an Danişmendan ku ev jî eşîretek Tirk bûn, karîn mîrnişînekê serbixwe di navçê Bakûra Rojhilata Asya Biçûk de damezrînin û bajarê Sîwasê jî bikin paytextê xwe.

Bi vî awayî dijîtîyek mezin di navbera Mîrnişîna Danişmendî û Mîrnişîna Selçukîyan de destpê kir ku bi serkevtina Selçukîyan dawî pê hat.

Rûman ve[13] heye. Ji ber gelek sebebên aşkera, gelek mixabin heta îro dîroknivsên me, qasî ku ez pê agahdar im, nekarîne yan jî ji wan re lênehatîye bi hindikî jî be destê xwe ber bi milê vê dîroka han de bikin. Dîroknivîsê me yê mezin Mamoste Emîn Zekî, çend rûpel peyvendîya Kurdan bi Selçukîyên Iranê û Iraqê re ji me re ronî kirîye[14], lê gelek kêm nebe, lêkolînek bi wî awayî li ser behsa peywendîya Kurdan bi Selçu-kîyên Asya Biçûk ve nekirîye[15]. Tenê Ebdulreqîb Yusif, di kitêba xwe de ku li ser Dewleta Dostkîyan e[16], çend rastîyên bi qîmet ên wî çaxî yên li ser Kurdistanê anîye, ji ber ku dor û berê sala 476-478'ê koçî(1083-1086'ê zayînî), dewleta Dostkîyan ji alîyê Selçukîyên Asya Biçûk de hat hilweşandin.

Her wiha têt dîtin ku ev yeka han valatîyek aşkera ye, wek gelek valatîyên mezin ên din, bi vî awayî ronîkirina dîroka Kurdan a qerna navîn bi xebatekî dilsozane ya wekî Ferhad kirî, pê heye. Em mecbur in bi derzî bikevin kolîna çîyayê, da ku bikarin rêzên windabûyî yên dîroka wî çaxî peyda bikin. Car û baran ev rêzên han di nav berhemên rojhilatnasan de tên dîtin ku em hewcedar in van yekan têkin ser xezîna dîroka xwe ya hejar a rojên borî. Hewce ye di vê quncikê de zanyarîyên wan serpêhatîyan bidin zanîn ku V.A. Gordlevskî di derbarê Kurdan ên dema Selçukîyên Asya Biçuk de berhev kirîye.

---

(13) Dîroknivîsên Islamê, navê Rumê li Bîzansîyan danîbûn. Navê bajarê Erzirumê (Erda Rum) jî her ji wir hatîye.

(14) M. Emîn Zekî, Xulasetu Tarîxu'l Kurd we Kurdistan min 'Eqdemî'l-'Usûr î'l-Tarîxîyye Hette'l-An, wergêr M. Elî Ewnî, Qahîre, 1936, rûpel; 145-151.

(15) Wek mîsal, binêre wan çend rêzên di derbarê êrîşa Elaeddîn Keykubatê Selçukî yên ku anîye li ser Dîyarbekrê (eynî serokanî, rûpel; 158-159).

(16) Ebdureqîb Yusif, El-Dewletu'l Dostkîye Fî Kurdistanî'l-Wusta, Dirasete Tarîxîyye we Iqtisadîyye we Ictimaîyye we Hedarîyye, cilda yekem, Bexdad, 1972.

Dema ku V.A. Gordlevskî tê ser behsa dagîrkirina Kurdistana Bakûr a ji alîyê Selçukîyan de, wiha dibêje; eynî wextî Selçukîyan xwestin bigihîjin Gurcistanê, lêbelê, hewildana wan di vî warî de vala çû. Qasek şûn de karîn bajarê Edîsa (Urfa) bigrin, lê gelek li ser de neçû ew ji kîsê wan çû . Çi heye ku di cîyê wî de "karîn bigihîjin nav axa Kurdistanê, vî karê han ê dawîyê riya ji bo hatina Osmanîyan jî xweş kir"[17].

Piştî vê, Selçukî di Bakûr û Başûr ve ketin nav axa Kurdistanê û vêca xwe amade kirin ji bo îşxalkirina Amedê (Dîyarbekrê) ku wî çaxî di destê Kurdên Merwanîyan de bû. Selçukîyan, karîn vî bajarî han jî bigrin, lê gelek li ser de neçû, Amed bû sebebê dijîtîyê di navbera Selçukî û Eyubîyan de. Sultan Elaeddînê Keykubatê Yekem[18] bi lez dixwest Dîyarbekrê bigre, lê di vê daxwaza xwe de du car şikest. Çi heye ku di sala 1241'an de, kurê wî Keyxusrevê Duyem[19] karî vî bajarî bigre. Ji bo ku bikare dilê xelkê bajarê Dîyarbekrê ber bi xwe ve bikşîne, Keyxusrev, fermanekê ji bo holêrakirina birek bac û seranan derxist, bi taybetî ewên kiribûn li ser kel û pelan, fêkî û sebzên nav bajêr, mirovên sultan, van fermanan bi dîwarên mezin ên mizgeftan ve daleqandin.

Ji ber hawar û alozîya êrîşên Moxolîyan, Melik Kamilê Eyubî ku dijminê Selçukîyan bû, karî dest deyne ser Amedê, lê Hulagû Xan, cardin vî bajarî han da destê Selçukîyên bin serokatîya Keykawusê Duyem[20] û birayê wî Rukneddînê Kiliç

---

(17) Min hewil daye li gor îmkana xwe bi giştî mebestên V. A. Gordlevskî bidim zanîn.

(18) Wek me got, Sulta Elaeddînê Keykubatê Yekem, di navbera salên 1219-1236'an de fermanrewayê Mîrnişîna Selçukîyên Asya Biçûk bû

(19) Sultan Xîyaseddînê Keyxusrev, di navbera salên 1236-1295'an de fermanrewatîyê kir

(20) Sultan Izeddînê Keykawusê Duyem, di navbera salên 1249-1257'an de fermarewayê Mîrnişîna Selçukîyên Asya Biçûk bû.

Arslanê Çaran[21]. Di sala 1280'an de, bajarê Amedê di bin destê Keyxusrevê Sisîyan de bû[22].

Çavê Selçukîyan lê bû ku bi îşxalkirina Asya Biçûk desthilata xwe ne tenê li ser hemû cîhana İslamê lê cîhana derveyê wî de jî deynin. Ji ber vê îşgalkirina Dîyarbekrê gelek hêja didîtin. Sultan Keyxusrevê Duyem navê xwe wiha danî-bû: "Qatilu'l-kefere we'l-muşrikîn we Sultan Ul-Rûm we Ermenîyya we Dîyarbekir we Surîya we emîru'l-sewahil"[23].

Di vê yeka han de heqê Sultan Keyxusrev hebû, ji ber ku îşxalkirina bajarê Amedê karekî hêsan nebû. Wek me di pêş de got, du êrîşên Elaeddînê Keykubatê Yekem ên li ser Amedê ser neketin, her çendîn Mîrnişîna Selçukîyên Asya Biçûk di bin serokatîya sultanekî wiha xurt de nejîyabûn jî. Maweyek baş Kela Amedê xwe neda dest û berxweda, heta yek ji serokên Kurd ê bi navê İbn u'l-Dînar, di bin re li gel sultan li hev kir û çekdarên sultan bi dizî ve gîhand nav kelê û bi vê rîyê re derîyên bajêr ji bo îşxalkeran heta pişt da vekirin[24]. İşxalkirina bajarê Amedê ji alîyê sultanê Selçukîyan de ewqas girîng bû û wisa lê kir ku dest bi rez, baxçe û bostanên niştecîyên bajêr nede. Ger ev yeka han nebûya, wek em dibînin dema Selçukî cîyek îşxal dikirin bi lez diketin reh û rîşên dar, daristan, rez, fêkî û hemû hebûnên wek van qir û talan dikirin.

Aşkera ye Selçukîyan piştê vê bûyerê cîyê pê xwe di Asya Biçûk de qayîm kirin û bi tevayî desthilatê girtin destê xwe; axa, beg, mîr û xelkên sade yên gelên din her yek ji wan ji ber sebeb û meramek, der û dorê wan hatin hev.

Di vir de dibû para Kurdan jî hebe. Yekem ji wan zanyarîyên

---

(21) Fermanrewatîya Sultan Rukneddînê Qiliç Arslan ê Çaran, dikeve navbera salên 1257-1265'an.

(22) V.A.Gordlevskî, Karên Helbijartî, cilda yekem, rûpel; 58-59, 183.

(23) V.A.Gordlevskî, Karên Helbijartî, eynî cild, rûpel; 60.

(24) V.A.Gordlevskî, Karên Helbijartî, eynî cild, rûpel; 183.

V.A.Gordlevskî anîye, bi awakî taybetî vê rastîya han aşkera kirîye. Wek ew dibêje; wextê Sultan Elaeddînê Keykubatê Yekem[25] çûye Ewbiruk, 500 evser û serhengên "Rusî, Gurcî, Kurd, Deylemî, Gurganî, Qezwînî, Gurî[26] û yên din çarmedorê wî de bûn. Xwîn ji çavên wî dibarî... di nav xelkê de rê ji Sultan re dihat vekirin..."[27].

Eynê wextî beşek mezin ji eskerên Selçukîyên Asya Biçûk ku carên wisa hebûn hejmara wan digihîşt 250 hezar kesan[28], ji eşîrên Kurdistanê pêkdihatin, bi taybetî jî ew eşîrên ku li Amed û der û dorê wî dijîyan[29]. Wextê tengavîyan de fermanrewayên vê mîrnişîna han, wek ku di serîhildana Baba İshaq de qewimî, pena dibirin ji bo alîkarîya çekdarên Kurd.

Di netîca bindestî, zulm û barên giran ên bac û seranên dam û dezgên Mîrnişîna Selçukîyan, sala 1239'an agirê serîhildaneke berfireh û mezin Asya Biçûk girt. Koçer û niştecîyên wan navçan bi hev re di navbera du salan de di wê serîhildanê de beşdar bûn ku miroveki fedakar yê bi navê Baba İshaq, serokatîyê jê re dikir. Baba İshaq, xwe nîvçe pêxember dihesiband, alîgirên wî bi jin û zarokên xwe ve ketin êrîşbirina li ser mal, zevî û hebûnên derebegên mezin.

Piştî vê, qasek şûn de, şoreşgeran berê xwe dan eskerên mîrî û serîhildana wan di bin banga xelîfetîya Baba İshaq de wisa belav bû, dikir ku sabunê têke binê pê Mîrnişîna Selçukîyên Asya Biçûk. Wî çaxî Sultan Keyxusrevê Duyem ket tirsê "ji Melatyê daxwaza alîkarîya Tirk û Germîyan kir". Mebesta Sultan ji Germîyan ew eşîra Kurdan bû ku pişt re mîrnişîneke bi hêz damezirandin[30]. Bi vî awayî Sultan karî bandorîya

---

(25) Binêre: nota 18'an.

(26) Eşîreteke Afxanî ye.

(27) V.A.Gordlevskî, Karên Helbijartî, cilda yekem, rûpel: 188.

(28) V.A.Gordlevskî, afirandina navê wê derbaz bû(A.N.D.) rûpel: 10.

(29) V.A.Gordlevskî, a.n.d. rûpel: 79.

(30) V.A.Gordlevskî, a.n.d. rûpel:178-179.

xwe li ser kesên dijî xwe tesîs bike, Baba İshaq hat girtin û îdam kirin, qasek şûn de jî hemû serîhildan hat tefandin.

Di kitêba "Dewleta Selçukîyên Asya Biçûk" de, Vladîmîr Aleksandrovîç Gordlevskî çend zanyarîyek girîng di derbarê rola şaristanîyetî û rewşenbîrîya Kurdên wî çaxî kirîye. Wek têt zanîn, Selçukîyan di Dola Zerefşanê, welatê xwe yê yekemîn de, bi koçerî jîyana xwe didomandin, perwerdekirina heywanan û hinek kişt û kal (zîraet) karê wan ê serekî bû. Wî çaxî peywendîya patrîyarkî (babatî) di nav wan de hebû, pişta xwe bi yek û du qayîm kiribûn. Ji ber vê, dema ku gihîştin navçên Asya Biçûk hîn di hêla şaristanîyetê de gelek paş de bûn, ji bo vê gelek tiştan ji mele û derwêşên Kurd, Ereb û Azerîyan hînbûn. V.A.Gordlevskî di vî warî de wiha nivîsandîye:

"Ew derwêşên ku dihatin Asya Biçûk, tenê mamoste û fêrkerê ayînî nebûn, belko eynî wextî de dibûn rênîşanderê kargerîn û rewşenbîrîya koçerên wan melbendan. Evan rolek baş ji bo yekîtîyê dilîstin û xelkê wan navçan dijî Moxolan hîşyar dikirin.. Di çar rîyan re derwêş dihatin navçên Asya Biçûk: Xoresan, Azerbaycan, Surîye û İraq.. Derwêşên İraqê ji Bexdad û Hewlêrê dihatin, cotkar, senetkar û bêkar, der û dorên wan dicivîyan"[31]. Van derwêşên han di serîhildana Baba İshaq de jî rol lîstine. Cardin V.A.Gordlevskî dibêje: bîr û bawerîya ayînî dijî sofîzmê ji Hewlêr digihîşt Asya Biçûk, "niştecîyên Hewlêrê Kurd in, wisa dixuyê wî çaxî meyîldarê şîîtîyê bûn"[32].

Şûnewar, kelepûr û belgên di cî de mayî yên dewra Selçukîyên Asya Biçûk, bi giştî kêm in. Yek ji wan belgên di cî de mayî yê wê dewrê, mîhrabek a di mizgefta Elaeddîn a li bajarê Konyayê ye ku li ser textê wî hatîye kolandin û dibêje; "Hacîyê xelkê Xelatê(Exlat) di sala 1155'an de çêkirîye". Li gor qeneeta V.A.Gordlevskî, ev mîhraba han di wextê xwe de ji Xelatê birine bajarê Konyayê, paytextê Mîrnişîna Selçu-

---

[31] V.A.Gordlevski, eynî serokanî, rûpel; 204

[32] V.A.Gordlevski, eynî serokanî, rûpel; 204-205

kîyan[33]. Her wiha di sala 1183'an şun de wênên ejderhan ên li gor uslûba Çînê ser derîyên Amed hatine kulandin ku ev yeka han jî baş dide ronîkirin ku berê êrîşa Moxolîyan, wek têt gotin, ne di rîya wan re ev hunera han gihîştîye Asya Biçûk[34].

Ji bo lêkolîna peyvendîyên derebegî yên di navbera Selçukîyên Asya Biçûk, ji ber sebebê nebûna serokanîyên kevin, Vladîmîr Aleksandrevîç Gordlevskî çend caran pena birîye ber hebûnên îro yên Kurdistanê. Di vê rîyê re V.A.Gordlevskî hewil daye gelek milên jîyana sîyasî, aborî û civakî ya Mîrnişîna Selçukîyên Asya Biçûk ên wî wextî ronî bike. Li gor bawerîya V.A.Gordlevskî, ev yeka han yekemîn rê ye ji bo têgihîştina milên cûr bi cûr ên jîyana aborî û civakî ya dewra Selçukîyan. Ji ber ku li gor qeneeta wî, ferqîtîyek bi wî awayî di navbera jîyana Kurdistana Bakûr ya destpêka sedsala 20'an û jîyana Asya Biçûk a qerna navîn de nîne[35]. Di vir de V.A.Gordlevskî, feyde ji çend serokanîyên nû yên Tirkî wergirtîye, wek wê kitêba Naşit Hakkî ya di derbarê navça Dêrsimê ya piştê tefandina serîhildana mezin a Şêx Seîdê Pîranî nivîsîye[36].

V.A.Gordlevskî dibêje; Selçukîyan di wextê xwe de bi şev ji tirsa êrîşên koçeran, derî û derwazên bajaran qayîm dikirin, ev adeta han heta dawîya salên rejima Osmanîyan li bajarekî wek Dîyarbekrê dihat domandin[37]. Dema ku tê li ser

(33) V.A.Gordlevskî, a.n.d. rûpel: 160.

(34) V.A.Gordlevskî, a.n.d. rûpel: 164.

(35) V.A.Gordlevskî, a.n.d. rûpel: 96-97.

(36) Naşît Hakkî, Derebeyî ve Dersim, Ankara, 1932.

Xwedîyê vê kitêbê, ev kitêba xwe wek zincîrek gotar di rojnama "Hakîmîyetî Millî" de belav kirîye. Hêjayê gotinê ye, A.D.Novîçev, kurtîya vê bi zimanê Rusî belav kirîye (binêre; A.D.Novîçev, "Derbarê Mesela Derebegî Li Kurdistana Tirkîyê", Kovara Bîblîyografya Rojhilat, Lenîngrad, 1934, rûpel: 54-64).

(37) V.A.Gordlevskî, Karên Helbijartî, cilda yekem, rûpel: 153-154.

behsa muqayesa eşîrên koçer ên Asya Biçûk, nimûnekê ji Kurdistanê tîne û wiha dibêje: Berê destpêkirina Şerê Cîhanê yê Yekem, Tehranê hakimekî nû ji bo navça Urmê şand, lê vî kesî han ji tirsa êrîşa koçerê li wan deran heta sê mehan nekarî ji Tebrîzê xwe nizîkî Urmîyê bike[38].

Her di wê kitêbê de V.A.Gordlevskî, rastîyek girîng di derbarê rewşa demografîk û netewî ya Asya Biçûk ya dema Selçukîyan weşandîye. Di vî warî de wiha dibêje; jîyana Oxuzên Asya biçûk sade û yek cur nebû, her çendîn ew "Musilmanên xirab bûn", lê ayîn di wan navçan de ku piranîya niştecîyên wan Îsayî bûn, bûye mertalekê mezin a parastinê. Çi heye di wan navçên Rojhilata Anadolê de ku piranîya niştecîyên wir Kurd û Ereb û wek wan Musilman bûn, carên wisa hebû ku bi hêsanî di bin desthilata wan de dihelîyan[39].

V.A.Gordlevskî, di berhemên xwe yên din de jî çend carek li ser behsa dîroka Kurd a qerna navîn sekinîye. Di wê gotarê de ku di sala 1922'an de li ser "Jîyana Qizilbaşên Asya Biçûk" weşan-dîye[40], rastîyek li ser Mele Îdrîsê Bedlîsî heta îro ku nedihat zanîn nivîsandîye.

Di vir de dema ku tê ser behsa dijîtîya navbera Şah Ismaîlê paşayê Sefewîyan(1502-1524) û Sultan Selîmê paşayê Osmanîyan (1512-1520) ku pêta agirê vê dijîtîyê piranîya navçên Kurdistanê girtîye, behsa kuştina bi xwînî ya Sultan Selîm a di nav Qizilbaşên wan navçan de dike. Di vî warî de wiha dibêje: Sultan Selîm bû sebebê kuştina 40 hezar kesan. Bi vî awayî didomîne: Mele Îdrîs jî tagirê Sultan Selîm bû, di wan rojan de gelek bi rikoyî dijî Qizilbaşan sekinî, bi taybetî ewên ku di mintiqên Mêrdînê de niştecî bûn. Li ser fermana wî kum û serpêçên Qizilbaşan berhev kirin û bi van, çalên dor û berê bajêr pê tijî kirin.

V.A.Gordlevskî di warê kirinên Mele Îdrîs de wiha didomîne:

---

(38) Eynî cild, rûpel: 174-175.

(39) a.n.d., rûpel: 73.

(40) a.n.d., rûpel: 255-275.

"Li gor bawerîya min kirinek herî ecêb eva han e ku mirovek nikare lêkolînê ser bike: gorra Husameddînê babê Mele İdrîs li Bedlîsê ye, wek li Bedlîsê ji min re gotin, Husameddîn, mirovek xwedî bîr û bawerîyek teng nebûye[41] ... "[42].

Di berhemek din de Gordlevskî, cardin hatîye li ser behsa Husameddînê babê Mele İdrîsê Bedlîsî û wiha dibêje: "Lê kolîn li ser Quranê kirîye, li gora qeneeta wî wiha bû; Musilman û İsayî wek hev diçin Cennetê. Bawerîya wî bi Cehennemê hebû, lê digot ezîyetdana Cehennemê karekî muweqqet e (demî ye), yanî bi çavê E'rafê[43] li Cehennemê dinêrîya". Husemeddînê babê Mele İdrîs, li bajarê Bedlîsê veşartîye û gora wî bûye zîyaret[44]. V.A.Gordlevskî di derbarê Mele İdrîs bi xwe de jî wiha dibêje:

"Hemdemê Sultan Selîmê Yekem, dîroknivîsekî alîgir (pesndayox) [45] û mirovê dewletê, yanî sîyasî bû"[46]

## Lİ SER QİZİLBAŞÎ Û QİZİLBAŞAN

Vladîmîr Aleksandrevîç Gordlevskî, di nivîsînên xwe de qîmetek zêde daye Qizilbaşên Asya Biçûk ku beşek ji wan Kurd in. Li ser ayîn, urf û adet û dîroka wan lêkolîn kirîye, çend carek bi wan re têkelî danîye, gelek zanyarîyên bi feyde û ecêb di derbarê wan de berhev kirîye û di çend berhemên xwe de weşandîye.

---

(41) Mebesta wî ew e ku Husemeddînê ser Mezhebê Sunnî, miroveki bîr û bawerteng nebûye, miroveki riya dîn de bûye.

(42) V.A.Gordlevskî, Karên Helbijartî, cilda yekem, rûpel: 256.

(43) "E'raf" ya "Medher" gotinek dînî ye, ji wî cî re têt gotin ku dikeve navbera Cennet û Cehennemê. Navê gotina "E'raf" , di Qurana pîroz de hatîye.

(44) V.A.Gordlevskî, cilda yekem, rûpel: 391.

(45) Muerrix Meddah.

(46) V.A.Gordlevskî, cilda yekem, rûpel;:391.

Yekem berhemê V.A.Gordlevskî di derbarê Qizilbaşan de, di Berhemên Helbijartî yên wî de bi vî navî ye: "Gera Min a Li Ser Behsa Ayînên Asya Biçûk-Qizilbaşî". Ev berhemê han ji gotarek pêkhatîye ku di sala 1913'an de, di akademîyek zanistî ya taybetî de xwendîye[47].

V.A.Gordlevskî, di destpêka gotara xwe de axaftinek xwe ya li gel Elîşanê kurê Mehmud Paşayê serokê Eşîra Qoçgirî ya navça Zarayê[48] weşandîye.Li ser Mehmud Paşa wiha dibêje; serokê eşîra bidesthilat ya Qoçgîrî bû ku yek ji wan eşîrên Kurd ên wan navçan e. Ew, "dadkar û fermanrewayê eşîra xwe ye, çi tişta ew bêje ji bo Kurdan qanun e". Di sala 1895'an de, dema kuştina Ermenîyan, Mehmud Paşa rê neda mirovên wî di wan kuştinan de beşdar bin, ji ber vê yekê Ermenî bi çavekî rêz û xoşewîstî lê dinêrin.

V.A.Gordlevskî di vî warî de wiha didomîne:

"Min hatina vî axayî han firset dît da ku bikarim pê re biaxivim û bikarim di rîya wî re bigihîjim çend nihênîyên Qizilbaşan. Xwedîyê qonaxa min her çendîn di vê yekê de dudil bû, lê biryar da ku alîkarîya min bike û min bibe li ba wî. Piştî çarîk seet şûn de min bir odekê tenha û derî ser min de girt. Dema ez ketim hundir xortekî bejnbilind, bi cil û bergên Awrupî û rêk û pêk, ji ber min ve rabû. Wi çaxî ku Meha Remezanê bû, ez jî yekser ketim behsa rojîyê. Min jê re got; Qizilbaş îtîraf bi meha Remezanê nakin, ew 12 rojên Muherremê tenê rojî dihesibînin, van rojan bîranîna tînîtîya Huseyn a li Biyabanê Kerbelayê dikin. Dema min daxwaz jê kir ku behsa Xizir İlyas ji min re bike û min jê pirsî kengî destpê dike, reng lê çû, got "ev nihênîyek taybetî ye, ez ê paşê behsa wî ji te re bikim". Wî çaxî ez têgihîştim ku Qizilbaş heta çi derecê dev girtî ne.

Wisa dixuyê ku V.A.Gordlevskî, nekarîye tiştek wisa ji Elîşan hîn be, ji ber vê mecbur bûye di rîya mirovek Ermenî de

---

(47) a.n.d. rûpel: 241-254.

(48) Zara dikeve Başurê Sîwasê.

bigihîje hinek Qizilbaşên din û beşek zanebûn di derbarê wan de berhev bike. Wekî ku dibêje, yekî jê re gotîye Qizilbaş di nav xwe de hev û du baştir nasdikin, yanî her yek ji wan li gora xwe tesîrek wî heye, ji ber vê yekê, kes nabînin.

V.A.Gordlevskî ku têt li ser behsa rî û simbêlê Qizilbaşan, wiha dibêje: piştê sî salan rî berdidin û êdî kurtnakin, "yên wisa hene bi mûyê rîyê wan mirov dikare şalvarek çêke". Wek jê re hatîye gotin, li ba Sunnîyan rîkurtkirin rewa ye. Vê yeka han jî jê re gotine: çawan xêr di hîştina rî de heye, ji ber ku heryek mûyek melekek li ser heye, ji ber vê kurtkirina wî di cî de nîne. Pişta van gotinan bi du "belgan" qayîm dikin; a yekem, guya wextê İmam Elî, Pêxember şûştîye av di navka wî de berhev bûye ku xwestîye wek teberik vê ava han vexwe, rî û simbêlê wî şil dibin û ji ber vê yekê êdî heta mirinê kurtnekirîye. Belga duyem; ji bo "rîyê dirêj" a İsa Pêxember e.

Nivîskar, hejmara Qizilbaşên Tirkîyê mîlyonek hesab kirîye, li gor qeneeta V.A.Gordlevskî ev hejmara han ji bo destpêka sedsala 20'an kêm e, bi taybetî wek dibêje, hewce ye em vê yeka han jî jibîr nekin ku di Asya Biçûk de gelek Qizilbaş hene. Navcergê melbenda Qizilbaşan Dêrsim e û serokên wan yên mezin jî li vir rûdinin. Lê li Başûrê Asya Biçûk de jî melbendên wan yên taybetî hene. Her wiha li Stenbol, Bursa û Kilîkya jî Qizilbaş hene, piranîya wan di van navçan de sen'etkar in. Qizilbaş li bajarê Dîyarbekrê jî dijîn.

V.A.Gordlevskî yê ku bi xwe çûye navça Xinisê, lîstek taybetî yên gundên Qizilbaşên wê navçê çêkirîye. Li gor wan zanyarîyên ku Lînç di dawîya sedsala 19'an de weşandîye, hejmara gundên navça Xinisê ku navçek Kurdewarî ye, tenê 15 ye. Lê li gor lîsta V.A.Gordlevskî, 35 e. V.A.Gordlevskî, navê wan gundan û hejmara malên wan weşandîye. Lîsta wî bi vî awayî ye:

| | | |
|---|---|---|
| Qelacuk | 25 | mal |
| Germek | 6 | " |
| Kemser | 12 | " |
| Siwarem | 30 | " |
| Meydan | 20 | " |
| Heyran | 12 | " |

Derek 8 "
Gewereş 10 "
Mêrgesor 50 " û
Xelîfekî 30 mal in. Wek dibêje, vê lîsta han di salên Şerê Cîhanê yê Yekem de çêkirîye, yanî piştî ku eskerên Rusya gihîştine wan navçan. Li gor axaftina V.A.Gordlevskî, hatina eskerên Rusya bûye sebebê wê ku gelek aîlên Kurdên Sunnî yên wan gundan ji tirsan bar bikin(49).

Eynî wextî Vladîmîr Aleksandrevîç Gordlevskî, hewil daye ku ji hemû firsetek îstîfade bike, ji bo berhevkirin destan, efsane, gotinên pîşîyan, çîrokên bi nav û deng ên nav Qizilbaşan, Kurdan û gelên din ên ku di seranserê Tirkîyê de dijîn.

## DESTAN, EFSANE Û ÇÎROK

Wek me li jor jî got, V.A.Gerdlevskî, gelek qîmet bi berhevkirina folklor daye. Şarezên vî warî, berhemên folklorî yên wî gelek hêja dibînin. Gordlevskî, çûye kîjan navçê, tiştên bi devkî yên di nav niştecîyên wê de yên bi nav û deng berhev kirîye û pişt re jî gotarên taybetî de weşandîye. Li gor van prensîban, dema ku çûye navçên Kurdistanê jî bê rawestandin van cure berhemên han berhev kirîye(50).

Rast e, ewên di navçên Kurdistanê de berhev kirîye, gelek nînin, lê tiştên seyr û balkêş di nav de hene. Wek mîsal: dema ku çûye Bedlîsê, li ser binecî û bingeha danîna vî bajarî ev tiştên han jê re gotine:

**Avakirina Kela Bedlîsê :**

Wextê ku İskender nêzîkî Bedlîsê bû, keleka asê xuyakir, derîyê kelê li ser wî û eskerên wî hatibû girtin.

Yek ji mirovên İskender ê navî wî Ebu Leys, vê kela han ava

---

(49) V.A.Gordlevskî, Karên Helbijartî, cilda yekem, rûpel: 260-261.

(50) V.A.Gordlevskî, sala 1916'an çûye bajarê Bedlîsê û wek bi xwe dibêje, demek dirêj li wir maye (binêre: rûpela 383'an a cilda yekem,

kirîye. Ebu Leys, li dijî İskender çek bikar tîne, lê eskerên İskender ji yên wî xurttir bûne, ji ber vê yekê di netîcê de xwe didin dest. Ji ber asêbûna vê kela han û gelek bi zehmetî sitendina wê, İskender, guya di rikoyî de navê wê dike Bedleys (Bed+Leys) ku niha bûye Bîtlîs[51].

Wek têt zanîn gelek car rûpelên ronak ên dîroka gel, têkelê nav civaka xelkê dibe û wek folklor bi devkî ber bi pêş de belav dibe. Yek ji wan çîrokên ku V.A.Gordlevskî bi navê Şahabeddîn belav kirîye, bûyerekê sade û nemir a serîhildana Mele Selîm Efendîyê Hîzanî ye û demek kurt berê destpêkirina Şerê Cîhanê yê Yekem qewimî[52]. Yek ji xelkê Bedlîsê bi vî awayî çîroka Şahabeddîn jê re gotîye:

"**Şahabeddîn:** Sê şêx li Xinisê dijîyan, diduyê wan; Şahabeddîn û Mehmed Şirîn bira bûn û kurên Seyîd Muhemmed bûn. Yê sisîyan Seyîd Elîyê kurê Celaleddînê kurê Xews (Xaws) bû, miroveki xeybzan bû, ji Xinisê ve dizanî çi li Bexdad diqewime.

Seyîd Elî xwe ji bo axretê sipartibû, ji nimêj û rojîyê pê ve tiştek nedizanî. Şahabeddîn û Mehmed Şirîn jî xwe ji bo xizmeta xelkê amade kiribûn.

Şêx Şahabeddîn, delalê dilê feqîr û bêkesan bû, heft tendurên hilkirî ji bo nandana xelkê amade kiribûn. Gelek rez, zozanên fireh û hezar serî dewarên Şahabeddîn hebûn, hemû di bin xizmeta xelkê de bûn.

Carek çar pel serbaz hatin Hîzanê, Şêx Şahabeddîn bê minetî xwarina tevan dayê, dijminên wî gelek gotin li ser wî zêde dikirin, digotin van peran bi belaş û zorî distîne. Lê qet feydek neda. Agirê şerê di navbera Kurd û Osmanîyan de hilket. Şêx biryarê da biçe Rusya, mixabin firset neketê, esîr hat girtin. Her sê şêxan anîn Bedlîsê û li ber Konsolosxana Rusya îdam kirin. Şêx, berê wefata xwe nifiran li Osmanîyan kir, duayê wî zû bicî hat, alozîyê destpê kir û şerê giştî yê cîhanê

---

(51) V.A.Gerdelvskî, cilda yekem, rûpel: 388.

(52) Di vî warî de binêre: Dr.Kemal Mezher, Kurdistan Di Salên Şerê Cîhanê Yê Yekem de, Bexdad 1975, rûpel: 43-45, 75.

hilket[(53)]. Piştî wefata wan, hemû kesan Şêx Şahabeddîn bibîr dianîn, heta carek keçek Ermenî di pencera mala xwe de çirayek li ser kêla tirba Şêx dît. Keçik ma ecêbmayî, bû sibe çû ser tirba Şêx û îman pê anî. Ji wî rojî şûn de Musilmanan gorra şêx kirin zîyaretgah. Ermenîyan gelek lome li keçikê kirin. Rojên înan niştecîyên bajêr diçin zîyareta meqbera Şêx Şahabeddîn"[(54)].

Destanên bi nav û deng ên Rojhilat di nav Kurdan de jî belav in û qalibên xwe yên taybetî girtine. Li Bedlîsê behsa **"Çîyayê Nemrudê"** bi vî awayî ji V.A.Gordlevskî re gotine:

"Hebû û tunebû, paşayek desthilat hebû, navê wî Nemrud bû. Gelek dewlemend bû. Ji bajarê Tetwanê yê mezin karwan jê re dihatin[(55)]. Nemrud gelek bi zû li ser xwe çû, keleka bilind durust kir, dixwest biçe li ser vê kelê û bi Xwedê re şer bike û goya wî bikuje. Xwedîyê mezin xezebê lê kir û mêşek kir muselletê serê wî, mêş di kuna kepîyê (pozê) wî re çû ket nav mejîyê wî. Vizînîya mêşê serê wî bir. Nemrud, ferman da mirovên xwe û bi takan serê wî bixin û belkî mêş jê bê der, lê çare nekir û mir.

Bi emrê Xwedê mûrî ketin bin kelê û binê wê kolan û hilweşîya. Heta kevirên hîmê wê jî avêtin nav ava Dîyarbekrê [(56)]. Bi vî awayî li ser xwe çûyîna Nemrud dawî pêhat"[(57)].

Bi eynê prensîbê, V.A.Gordlevskî, çend berhemên folklorî di derbarê bajar û şûnewarên bi nav û deng ên Kurdistanê û serpêhatîyên wan de berhev kirîye ku aşkera ye şarezayên van mijaran di rîya van de dikarin bigihîjin hinek netîcan. Evên xwa-

---

(53) Mebesta wî Şerê Cîhanê yê Yekem e.

(54) V.A.Gordlevskî, cilda yekem, rûpel: 391.

(55) Tetwan, bajarekî Ermenîyan bû. Li gor cilda çaran a Seyahetnama Ewlîya Çelebî, navê wî di eslê xwe de "Textê Wan" e, yanî li ser Wanê bûye û di nav Kurdan de bûye Tetwan.

(56) Li gor Ewlîya Çelebî, Şah Tehmasb di sedsala 16'an de, Tetwan kavil kir.

(57) V.A. Gordlevskî, cilda yekem, rûpel: 391-392.

rê jî çend ji wan nimûnan in.

"**Gola Wanê Çawan Çêbû:** Di gelek rojên kevin de, di nav wan navçan de kanîyek mezin hebû. Li nêzîkî wê kunek hebû û ava kanîyê tê de winda dibû. Carekî ji caran jinek li wir hirî dişo, çengek hirî ji destê wê dipeke û diçe dikeve ber kunê, dixitimîne û bi vî awayî av zêde dibe Gola Wanê çêdibe"[58].

"**Dagirkirina Xelatê:** Wextê Pêxember bang ji bo Islamîyetê kir, daxwaz ji putperestan kir ku dev ji putperestîyê berdin, yek ji hevrêyên wî ku navê wî Xalid bû, li gel 40 hevrêyên xwe berê xwe da Xelatê (Exlet). Bi navê bazirganîyê ketin nav bajêr û bi vê bahanê tê de man. Pişt re şer qewimî û Xalid hat kuştin û her li vir jî hat veşartin "[59].

"**Dîroka Xelatê:** Heft paşan fermanrewatîya Xelatê dikirin, Hesen, Beyandir û pêncên din. Hesen, mizgeftek di nav bajêr de ava kir, Beyandir, xezînek gelek mezin pê xwe de hîşt ku niha nema ye. Hesen û Beyandir, kelek jî avakirin, ji wir ve çaverîya êrîşên dijminên xwe dikirin. Wan çaxan Xelat bajarekî gelek mezin bû. Dema heft-heşt hezar kes ji Xelat diçûn Surîyê[60], qet tu valatîyek jê nedihat dîtin"[61].

Ev cure berhemên folklorî beşek in ji samanên rewşenbîrîyên me yên kevin ku di nav hemû gelan de yên wek van hene, pêşkevtinê baş diparêzin. Bêguman, bi gelemperî feyda van berhemên han ji bo rewşenbîran û bi taybetî jî ji bo zimanzanan, dîroknivîs û zanayên edebîyatê gelek heye. Feydek din jî yên van berhemên han heye ku dikarin bibin serokanî ji bo edebîyat û çîrokên zarokan. Her ji ber van sebeban, di wextê xwe de "Akademîya Zanyarî ya Kurd", qîmetek girîng ji bo berhevkirina van cure berhemên folklorî da.

V.A.Gordlevskî, di nivîsên xwe de dema ku tê ser behsa navçên Tirkîyê yên din, ber bi van re car û caran cardin vedigere ser navê Kurdan. Wek mîsal di derbarê **bajarê Erzirumê**

(58) a.n.d., cilda yekem, rûpel: 392.

(59) Cilda yekem, rûpel: 392.

(60) Mebesta wî hatin û çûyîna koçeran e.

(61) V.A.Gordlevskî, cilda yekem rûpel: 392.

de wiha dibêje: di nav niştecîyên wî de belav e ku goya welatê wan di wextê xwe de sê sal li ser hev rastê zivistanekê gelek giran hatîye û ev yeka han bûye sebebê nemana piranîya xelkên wî. Wek dibêjin, tenê 600 mal ji destê mirinê karîne xwe xelas bikin. Di wan navan re Elî Axa yê Kurd û 12 hezar mirovên wî di nav wan navçan de niştecî bûne[62].

V.A.Gordlevskî, wek me got, gelek çîrokên di nav xelkê de belavbûyî weşandîye ku ji wan hejmarek kêm peywendîya wan bi Kurdan ve heye. Di cilda yekem ya Berhemên Helbijartî yên xwe de, van herdu çîrokên han belav kirîye:

"**Muştaq Baba: Di** wextê xwe de ku Muştaq Baba cîgirê melayê mezin Hacî Hesenê Şêrwanî bûye, çûye Stenbol, daxwaza wî ew bûye Sultan Ebdulmecîd bibîne. Dema dizane ku nimêja înê li mizgefta Eyyub dike, bi siwarî bi mirovên xwe yên Kurd ve berê xwe dide mizgeftê. Wextê gihîjtîye wir, Sultan li mizgeftê bûye, pêçana siwarên Kurdan bala wî dikişîne û ji pîremê-rek dipirse, gelo ev kî ne hatine xizmeta me? Dema Muştaq Baba têt jorê, Sultan jê re dibêje: Te ji bo çi zehmet kirîye?

Muştaq Baba di bersîva xwe de dibêje: Muştaq bi dîtina te yê mezin bûm. Bi vî awayî navê xwe têkelê bersîva xwe dike[63].

Sultan, bang dike dîwanxana xwe ku cîyê nimêjê jî li wir bûye. Sultan, ji Muştaq Baba daxwaz dike ku ji xeybê tiştek jê re bêje. Muştaq xwe demek gelek dirêj digre û da ku heta Sultan jê bipirse.

Çi hat bîra te?

Muştaq Baba dibêje:

"Nîyaza te ew e ku tu Guneşê bidî min, yek ji wan jinên herema te ye û dê netîcê de jî bibe sebebê kuştina min".

Sultan jê re dibêje:

"Ca eger wiha be ez dev ji biryara xwe berdidim".

"Na ez dexîlê te me, Xwedê wiha hez kirîye" -hawar ji Muştaq Baba diçe.

---

(62) Cilda yekem, rûpel: 395.

(63) Ji ber ku gotina "Muştaq" bi du manan de bikaranîye.

Sultan razî dibe, Guneş li Muştaq Baba mehr dike. Piştî vê ku Muştaq Baba vedigere Bedlîsê, hemû kesên li wan deran bi çavekê rikoyî li Muştaq Baba dinêrin, ji ber ku Sultan gelek zevî û erdên wê navçê jî jê re dibexşîne.

Gelek ser de naçe cardin Muştaq Baba biryar dide da ku biçe Stenbol. Dijminên wî dizanîn ku vê carê ji ba Sultan dê bi text ve vegere, biryarê kuştina wî didin. Ji bo vî karî jî çend Kurdekî ji eşîra Ferîq Behrî Paşa kirî dikin û ew mirovên kirîgirtî gav bi gav pê dikevin. Muştaq Baba li Bayezîdê li qonaxê serokê bajêr radikeve. Dema roj diçe ava Muştaq Baba dev ji nimêjê berdide û berê xwe dide hevalê xwe Şêx Arif û jê re dibêje:

"Tu dizanî dê niha çi biqewim e? Ew dê min bikujin, nebe tu dengê xwe bikî, roja min temam bûye. Xwedê wiha hez dike, ez dexîlê te me, dema ew bên jorê û pirsa min bikin, nebêje li vir nîne, hekene dê te jî bikujin Şêx Arif".

Muştaq Baba, dema axaftina xwe temam dike, axînek dikêşe, çend beyt dinivîse û dike binê bermalê. Wextê Kurd tên jorê, Muştaq Baba pênc deqîqe musaede ji wan distîne, destmêj digre, nimêj dike û vêca bê tirs berê xwe dide wan û ji wan re dibêje:

"Ez amade me, fermo min bikujin".

Gora Muştaq Baba niha li Bayezîdê ye, li hemberê qonaxa serokê bajêr e. Her çendîn kêla gora wî ya mezin rast dikin ew cardin xwar dibe, wisa dixuyê ew secde dibe.

Li gor Elî Paşayê kurê Muştaq Baba ku ewî bi xwe ji me re got, ev bûyera han di nîvê sedsala 13'ê koçî, yanî salên 50-60'ên sedsala 19'an a zayînî qewimîye. Elî Paşa gelek methê dîwana bapîrê xwe dikir û digot: belkê tenê Hafiz (mebest Hafizê Şîrazî ye -Elîşêr) ji wî şaîrtir be"(64).

"**Pambuk Baba:** Carek mirovek li Aksarayê li ber gora Pambuk Baba re derbaz dibe, ji ber xwe ve dibêje:

Gelo di nav Kurdan de jî kesên ji xeybê bizanin hene?

Dema Pambuk Baba van gotinan seh dike, lingê xwe bin axê

---

(64) V.A.Gordlevskî, Karên Helbijartî, cilda yekem, rûpel: 400-401.

Vê çîroka han li Erzirumê nivîsîye.

re derdixe, wî gavî ew mirov pê dihese ka şaşîtîyek çiqas mezin kirîye"[65].

Cilda duyem a Berhemên Helbijartî yê Vladîmîr Aleksandrevîç Gordlevskî, li ser berhemên derbarên ziman û edebîya-ta Tirk hatine amade kirin[66]. Ji ber vê yekê, tenê çar car navê Kurdan û çend carek jî navê bajarên wan tê de derbaz bûne(Amed-Dîyarbekir carek û Cizîr jî carek). Di wî berhemê ku ji bo gotinên bi qîmet û yên pêşîyên Osmanîyan[67] amade kirîye, V.A.Gordlevskî, car caran navê wan gelan jî tîne ku bi urf û adetên xwe ve nav Osmanîyan de cî girtine. Di wan nimunên Gordlevskî de derdikevin ku Osmanîyan bi yek çavê li cîranên xwe nenêrîne , carên wisa hene di pendên di nav xelkê belavbûyî de bi rikoyî li wan rabûne. Wek tê gotin serbilindî û ji xwerazîbûna Kurdan ji her tiştî zêdetir wek gelekî çîyayî dîqqeta wan kêşaye. Yek di wan pendan de wiha têt gotin:

"Wek Kurdê xwedîyê neh bizinan ewan jî dan", ji wî kesî re têt gotin ku destvekirî û merd e, ew wek wî Kurdî ye ku destê wî diçe wan neh bizinên wî jî bide. Gordlevskî dibêje: carên wisa hene di cîyê navên Kurdan de "Dayî Cezayîr" bikartînin [68], yanî dibêjin wek dayî[69], xwedîyê neh bizinan, ewan jî hemû dan.

Eynî bi vî awayî govend û şahîyên Kurdan dîqeta Osmanîyan kêşa ye, pendek heye wiha dibêje:

---

(65) Cilda yekem, rûpel: 457.

(66) Binêre: nota 4'an.

(67) Mebesta wî Tirk in.

(68) V.A.Gordlevskî,, Karên Helbijartî, cilda duyem, rûpel: 272.

(69) Dayê, di cîyê gotina Tirkî dayî de hatîye, ku di mana xalo û mamo de ye. Di wextê Osmanîyan de dayi naznavê fermanrewayên Cezayîrê bû.

(70) V.A.Gordlevskî, cilda duyem, rûpel: 272.

"Qereçî dibêje Kurd lê dixe"[70].

Lê wek Gordlevskî dibêje, car caran derbarê Kurdan de çîrokên wiha jî ber guhan dikevin:

"Kurd bi mijûlbûna savar kelandinê ve acizbûn, dawîyê di cîyê kevir bijartin û paqijkirina genimên ku bikelînin de, biryar didin bi yekcarî biçînin... dema ku savar ber na de diçin li ba qazî gazinên xwe jê re dikin, ew jî..."[71].

Di cildên din karê zanistî yên V.A.Gordlevskî de, cardin gelek car navê Kurdan derbaz bûye, ez hêvîdar im ku di dîwarojan de em bikaribin bi vê beşê re di berhemekî serbixwe de belav bikin.

---

(71) Cilda duyem, rûpel: 290.

MİJARA PÊNCAN

# Lİ SER KARAKTERA SERÎHİLDANA MEZİN A SALA 1925'AN

Serîhildana mezin a sala 1925'an a Kurdistana Tirkîyê(*) yek ji wan xelekên bi xwînî yên herî mezin ên zincîra xebata rizgarîxwazî-netewî ya Kurd e. Lê netewê me heta îro tiştekî yekcar kêm û heta derecek tiştên sethî di derbarê rûpelên gelek hêja yên vê serîhildana mezin de dizane ku ji bo nîşandana karaktera vê serîhildanê ya rasteqînî û dîyarkirina wan dersên dîrokî yên netewê me yê xebatker, pêwistî bi lêkolînekê kûr û fireh heye. Qet nebe ji bo roja îroyîn ji me re alîkarî bikin û em şaşîtîyên xwe yên do îro ducar nekin.

Li derveyê Kurdistanê jî heta îro bi awakî gelek kurt û heta raddeyek bi aşkera ev serîhildana han şaş hatîye lêkolîn. Beşekê gelek mezin ji dîroknivîsên bîyanîyan û bi rojhilatnasên mezin ên Sovyetê ve (ên wek Prof. ê bi nav û deng A. F. Mîller) vê serîhildana han tevgerek kevneperest a destkirê İngilîzan danîne. Li gor wan, du armancên vê serîhildanê yên bingehîn hebûne; ya yekem, berfirehkirina manawra saha

(*) Ev maqale di hejmara duyem a kovara Rojî Kurdistan de hatîye belavkirin (Bexdad, Tîrmeh, 1971, rûpel; 46-56)

sîyaseta sexte ya Îngilîzan ali ser bajarê Musilê ku li dijî Tirkan dimeşandin û ya diduyan jî, goya kevneperestên hindur û yên derve dixwestin di riya vê serîhildanê re, pêşî li guherandinên nû yên Kemalîstên[1] şoreşger li Tirkîyê bigrin.

Yek ji wan sebebên herî mezin ên ku rû û cîyê rasteqînî yê karaktera serîhildana sala 1925'an di dîroknivîsên bîyanîyan de bi carekî ser û bin kirîye, ew alozî û têkilhevîyên bêhejmar ên karbidestên şoven ên Tirkîyê bûn ku ji bo cîbicî kirina hinek armancên xwe avêtin holê. Bi taybetî durustkirina wan xeber û belgeyên derew ên ku di dawîyê de bûn serokanîyên lêkolîna dîroka serîhildanê. Nivîskarê vê gotarê, di giftogûyekî xwe ya taybetî ya li gel rojhilatnasê mezin yê Sovyetî, Anatolî Fîlîpovîç Mîller de -ku wek me got di wê bawerîyê de ye serîhildana sala 1925'an tevgerekî kevneperest e[2]- ewî (A. F. Mîller) rast û rewan wiha got: "Ew materîyal û belgên di destê min de nin, riya wî qasî nadin ez bikarim bi awakî din li vê serîhildanê binêrim, lê kengî belgên dîrokî yên bi bawer û saxlem bikevin destê min, wê çaxê helbet ez jî di bin wan ronîkirinan de dikarim bîr û rayekî nû bînim û îtîrafê pê bikim ku ez şaş bûm." Ez di vê bawerîyê de me ku piranîya dîroknivîsên bîyanîyan jî her li ser vê rayê ne.

Eva han, bêguman, wezîfekê yekcar mezin dixe ser milê dîroknivîs û heta hemû rewşenbîrên Kurdan, bi taybetî ewên ku di nêzîk ve agahdarîya wan li ser bûyerên vê serîhildanê hene, hewil bidin karekî wisa bikin ku ew rastîyên dîrokî yên girîng ên ku peywendîyên wan bi serîhildanê ve heye wenda nebin û kom bikin, bi awakî kûr û zanistî ya ji dûrê hissîyatê,

---

[1] Ew tevgera mezin a netewa Tirk a ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekem di bin serokatîya Mistefa Kemal de ji bo rizgarkirina welat berpa bû, di warê sîyasî de jê re "Tevgera Kemalî" û ji beşdarên wê re jî "Kemalî" tê gotin.

[2] Binêre: A.F.Mîller, Kurtedîroka Tirkîyê, bi zimanê Rusî, Moskova, rûpel; 192-193.

A.F.Mîller, Li Ser Dîroka Tirkîyê Ya Nû, bi zimanê Rusî, Moskova-Lenîngrad, 1948, rûpel; 152-153.

bûyerê pê bikolin.

Nivîskarê vê gotarê di daxilê quweta xwe de salên xwe yên xwendin û xebatên xwe yên li derveyê welat de, qîmetekê gelek mezin da bi vê bûyerê, di teza xwe ya doxtorayê de cîyekî taybetî jê re amade kir ku ez dikarim bêjim bê netîce nema. Cara yekem piştî lêkolîna vê tezê ya destpêka sala 1963'an bû ku Enstîtuya Rojhilatnasî ya Akademîya Zanistî ya Sovyetê biryar da ku pêwist e ew şarezatîyên xwe *"di bin ronahîya wan rastîyên ku di tezê de nin, carek din bîr û rayên xwe yên di derbarê serîhildana sala 1925'an a Kurdistana Tirkîyê de bin çav re derbaz bikin"*[3]. Ji derveyê van, yek ji Kurdnasên herî mezin ê Sovyetê û rojhilatnasê otorîte V.Vîlçewskî, bîr û raya xwe di derbarê vê tezê de nivîsand ku bi aşkera paş de gavavêtinên xwe ji şaşîtîyên xwe yên kevin ên ser bûyerê nivîsandibû, da xuyakirin, rastîyên wan netîcên ku di tezê de derbarê serîhildana 1925'an de hatine, qebul kir. Piştî vê, qasek şûn de, Dezga Rojhilatnasî ya Akademîya Zanistî ya

---

(3) Sûreta wê biryara ku li ser navê Serokatîya Enstîtuya Rojhilatnasîya Akademîya Zanyarîya Sovyetê, alîkarvanê serokê wê dezgê R.T.Exramovîç û Prof.B.M. Dautsîg imza kirine, li ba min heye. Piştî vê biryarê, dema cara diduyan lêkolîna vê têza han bi xwe de roja 15'ê Gulana sala 1963'an beşa "Problemên Navnetewî" biryarek din ya resmî derxist, ku di rûpela diduyan a vê biryarê de di derbarê Serîhildana sala 1925'an de wiha dibêje: "Bêguman, yek ji rûyê herî girîng ê têza Kemal Mezher eva han e ku li ser bingeha belgên bi qîmet şaşîtîya wan bîr û bawerîyên teng derxistîye. Di derbarê vê serîhildanê de, di nav me de belav bû ku goya hemû tevgerên Kurdî karekterên wan ên girêdanî hene û Îngilîzan ji bo armancên xwe yên Rojhilata Nêzîk berpa kirine. Nivîskarê vê tezê, îspat kirîye ku ev serîhildanên Kurd, li dijî bindestîya mêtingehkarî (li Îraqê) û sîyaseta şovenî ya dewleta burjuwazîya nîvçe derebegî ya Tirkîyê, Îran û Îraqê, bersîva civakî ya gelê Kurdistanê bûne. Ew dîtina ku di derbarê karaktera Serîhildana Şêx Seîd a sala 1925'an di nav me de belav bû, ku me digot ev serîhildan bi destê Îngilîzan e; wextê muqayesekirina li gel wan belgên ku nivîskarê di wê teza xwe de anîne, bi hindikayî pêwistê rastkirineke kûr e".

Azerbeycan û Ermenîstana Sovyetê, ji ber amadekirina behseke taybetî di derbarê vê serîhildanê de, ji bo wê kitêba mezin a ku di destê wan de ye, li ser dîroka gelemperî ya Kurd, bo belav bikin, ji nivîskarê vê gotarê nivîsek xwestin. Vêca di vir de bi kurtî ez ê beşekê wê behsê pêşkêş bikim. Hêvîya min ewe rojek bê ez bikarim hemû bi ser hev de belav bikim. Nivîskarê vê gotarê xwe gelek bextîyar dizane eger karîbe bi vî karî beşekê gelek kêm ji wî deynê mezin ê ku dayîka niştîman xistîye ser milê her kurdekî, dabe.

* * *

Ne tenê ji bo dîyar kirina karaktera serîhildana sala 1925' an, ji bo hemû tevgerên azadî-netewî yên Kurdistana Tirkîyê, pêwîst e çavek li ser rewşa jîyana sîyasî, aborî û civakî ya vê beşa Kurdistanê ya salên berê Şerê Cîhanê yê Yekem bê gerandin, da ku mirov bikaribe bi awakî durust û rewan hêzên ku têkelê van serîhildanan bûne û tesîra wan a li ser van serîhildanan derêxe holê.

Wextê ku Şerê Yekem xelas bû û dawîya İmparatorîya Osmanî hat, tevgereke sîyasî û kulturî ya mezin di seranserê Kurdistana Bakûr de belav bû. Ew rêxistinên sîyasî yên ji ber sebebên şer xebatên xwe dabûn sekinandin carek din ketin nav qada xebatê. Ji derveyê van çend rêxistinên sîyasî, yên nû jî hatin damezirandin û çend rojname û kovarên Kurdî hatin weşandin. Hemû ev rêxistin û çapemenîyên han bi imkan û karînên xwe ve ketin hewildanê ku bikaribin îstîfade ji rewşa sîyasî ya cîhanê, bi taybetî ya Rojhilata Navîn werbigrin, da ku bikarin karekî wisa bikin, netewê Kurd jî bigihîje mafên xwe yên netewî. Her ji bo vê mebestê jî van rêxistinên han peywendî bi dewletên îtîlaf (dewletên sondxwarî) re girêdan. Van bûyer û çalakîyên han tirsê xist dilê Tirkan ku Kurdistana Bakûr jî wenda bikin, ji ber vê yekê carek din dest avêtin colandina hestê ayînî(!), ew çekên berê ku hatibûn bikar anîn. Lêbelê gava ku zanîn ev car netewê Kurd bi nêrîna daxwaza serxwebûnî rabûye, naçar bûn bi lez ji bo lêkolîna rewşa sîyasî ya Kurdistanê komîtekê taybetî bi beşdarîya çend wezîr û hinek jî ji Bedirxanîyan pêkhatî damezrînin. Di netîcê de

komîte gihîşt wê bawerîyê ku ger Tirkîye dixwaze Kurdistan jê cuda nebe, pêwist e di nav çarçova dewleta Tirkîyê de mafê Kurdan ê otonomîyê nas bike. Ji bo vê mebestê biryarekê taybetî derxist[4], lê di pratîkê de ji bo cîbicîkirina vê qet tu tiştek nekir. Ji ber ku gelek di ser de neçû dijî Hukumeta Sultan û dagirkerên bîyanîyan şoreşa rizgarî ya Kemalîstan destpê kir. Eva han jî rewşeke sîyasî ya nû anî holê ku bi carekî seranserê welat girt û li ser jîyana sîyasî û hemû dîwarojên netewa Kurd tesîrekê gelek mezin kir.

Şoreşa Kemalîstan beşekê mezin ji netewê Kurd coland ku bi awakî dilsozane çû ji bo palpiştîya azadkirina welatê hevbeş (muşterek) ji destê dagirkerên biyanî[5]. Kurd, bi hestekê niştimanî ya gelek bilind û bi têgehîştinekê sîyasî ya rast rabû pîyan. Lê di eynî wextî de beşek biçûk ji derebegên Kurdan, palpişta xwe bi İngilîzan ve girêdan û xwestin pêşîya berfirehbûnên vê şoreşê bixitimînin. Ev rewşa han heta derecek burjuvazîya netewî ya Tirk silikand. Li gel vê jî di nav berfirehbûnên girîng ên pêvajoya şoreşê de derket holê ku Kurd, ji bo şaxavêtinên naveroka guherînên şoreşgerî û ber bi pêş de birina wan, di dîroka Tirkîyê de bûn unsurên pêşverû yên mezin. Eva han, bû sebebê Mistefa Kemal û hevalên wî ku gelek bi hêsanî di Kurdistanê de bi cî bin, gelek caran biçin nav Kurdan û heta sala 1919'an, hinek civînên xwe yên sîyasî yên girîng di nav wan de bidar bixin. Eva han tenê bi serê xwe belga wê ya

---

(4) Binêre: Dr. Blech Şîrkuh, El-Qezîye'l-Kurdîyye, Mazîyî'l-Kurd we Haziruhum, Qahîre, 1930, rûpel; 65-67.

(5) Hejmarek nivîskarên bîyanî behsa vê yeka han kirine ku bê alîkarîya netewa Kurd, Mustefa Kemal li hemberê dijminên Tirkîyê nedikarî biser bikeve.

Di vî warî de dîplomatê Amerîkî W.Eagleton wiha dinivîse: "Ji ber ku Atatürk (Tirkan ji ber xoşewîstîya Mustefa Kemal navê wî kirin "Atatürk", yanî babê Tirk-Nivîskar) di navbera salên 1920-1923'an de, di riya xebata yekîtîya Tirkîyê de, nedikarî guh nede piştgirîya hêzên Kurdan." W.Eagleton, The Kurdısh Republic of 1946, London, 1963, rûpel; 12.

vekirî bû ku hêzên demokratîk ên Kurdan di wê bawerîyê de bûn, bi serkevtina Kemalîstan, problema netewî ya Kurdan dê li ser riyeke rast çareser bûya. Ji vê jî hin pêştir, hewl û xebata Kemalîstan ji bo nêzikayî ber bi Kurdan de û dayîna waad û sozan, bawerîyek wiha hîn zêdetir qewî dikir. Bi taybetî ji bo ku wan dizanî eva han dibe sebebê bahanek ji bo "sitendina" Kurdistana Başûr ku di destpêkê de li gel İngilîzan ketibûn nav probleman. Her ji ber vê yekê jî, gelek caran wan, sozên ku didan Kurdan bi rîya belavokên taybetî ve dişandin navçên Kurdistana Başûr. Yek ji wan belavokan de ku li Ararat û Colemêrgê belav kirine û çend nusxên wê gehîştine Rewandizê jî wiha dibêje:

*"Hevwelatîno! Hukûmeta Komara Tirkîyê bi temamî qerardar e ku hemû pêwistîyên şaristanîyetê di welatê xoşewîstê me yê Kurdistana Tirkîyê de belav bike. Rê û dirbên we dê bên qîr kirin. Gund û bajarên we dê bêdibistan û mamoste nemînin, di jîyanekî gelek xweş de xêzanên we dê şad û bextîyar bin, asayîş û qanun dê bibin sebebê pêşveçûn û berfirehbûnên xêr û xêratên welatê we. Jîyan, mal û şerefa hevwelatîyên me di bin parêzgerîya rasteqînî û dilsozî ya qanunên komarê de nin..." (6)*.

Ji derveyê vê, di germîya destpêka şoreşa burjuvazî ya Tirk de, hejmarekê gelek zêde ji wan serokên ku bi Mistefa Kemal re vê şoreşa han berpa kirin, herwekî di bîranîn û namên komkirî yên wan de jî dertê, Kurd bûn. Wek mîsal, Komîta Serokatîya Kongra Erzirumê (23'ê Tîrmeh-6'ê Tebaxa 1919) -ku yek ji nuqtên herî girîng ên destpêka vê şoreşê têt hesêb kirin(7)- ji heşt kesan pêkhatibû, sisê ji wan Kurd bûn. Ew her sê

---

(6) Binêre: A.M. Hamilton, Road through Kurdistan, London, 1937, rûpel; 295-296.

(7) Di wextê vê kongrê de Mustefa Kemal slogana "xebata millet di dijî dagirkeran, di riya serxwebûnîya welat" de bilind kirîye.

kes ev in: Şêx Fewzî[8], serokê terîqeta Neqşîbendîyan ji navça Erzîncanê; Sedullah Begê xelkê Sêrtê ku heta sala 1918'an endamê Parlamentoya Osmanîyan bû û serokê eşîreta Motkî[9] Hacî Musa Begê Mîrzazade[10]. Mistefa Kemal li gel wan û gelek Kurdên din ên bi nav û deng peywendîyên gelek nêzîk danî û gelek namên taybetî ji wan re şand[11].

Di "Meclisa Netewî ya Mezin" a Tirkîyê de ku Kemalîstan di sala 1920'an de li bajarê Enqerê pêk anîn, 72 nûnerên Kurdan beşdar bûn[12]. Hemû endamên vê meclisê gelek bi germî pêşwazîya axaftina nûnerê bajarê Erzirumê Hiseyîn Ewnî kirin ku di civîneke de wiha digot:

*"Li ser vê kursîyê mafê axaftina du netewan heye: Kurd û Tirk"*. Axaftinên wek vê, çend carek ji alîyê nûnerên Tirkan ên wextê Kongra Stenbolê di derbarê lêkolîn û problema Musilê de hatine kirin[13].

Lê belê, Kemalîstan wek nûnerên çîna burjuwaya netewî ya desthilatdar, hîn cîyê pêyên xwe li ser desthilatê qayîm ki-

---

[8] Bi navê Hacî Şêx Fewzî Efendî bi nav û deng bû, di sala 1868'an ji dayîka xwe bû, li Erzîncan û Dêrsimê xwedansoz bû û giranîya wî li ser civakê hebû, dijî Taşnaqan rolek girîng lîst.

[9] Ev eşîra han li wilayeta Bedlîsê di navçekê çîyayî ya nêzîkê serokanîya rûbara Dîclê niştecî ye, ji wan re "Mut yan jî Motkan" tê gotin. Di dema Osmanîyan de Eşîra Motkî qet serî li ber hukumetê netewandiye û hemû wextê jîyanek nîv-serxwebûyî domandiye.

[10] Binêre: Mustefa Kemal -Rîya Nû Ya Tirkîyê û "Name û Beyanên Komkirî yên Mustefa Kemal", çapa Rusi, cilda yekem, Moskova, 1929, rûpel; 65.

[11] Eynî serokanî, rûpel; 65, 81, 152, 228, 234, 236, 284, 312.

[12] A.R.Ghassemlou, Kurdistan and the Kurds, Prague, rûpel; 46.

[13] Bi dirêjî di derbarê ji bo xwe nêzîkkirina ber bi Kurdan de hewlê Kemalîstan di destpêka tevgera xwe de, binêre: Blech Şîrkuh, serokanîya ku navê wê derbaz bû, rûpel; 74-75 û her wiha A. Safrastian, Kurds and Kurdistan, London 1948, rûpel; 81-82.

rin nekirin, rûyê rasteqînî yê sîyaseta xwe ya netewî xistin holê ku eva han beşekê girîng ê sîyaseta giştî ya wan bû di dijî jîyana demokratîk û çînên bindest de(14). Netîca vê sîyaseta han bû ku di milek de ketin tefandina gîyana karker û gundîyên Tirkîyê û di milek din de jî berê xwe dan netewên din, bi taybetî dijî Kurdan ku piştî Tirkan mezintirîn netewe bûn. Eva han milê tarî û kevneperest ê sîyaseta burjuwazîya netewî ya Tirk û bi tevayî eksê wê sîyasetê bû ku di destpêka bîstan de di xebata gelek qehremanî ya dijî emperyalîstên dagirker de hatibû ajotin. Piştî vê, di navbera çend salan de dijî hêzên kevneperest ên nav xwe, ji bo cîbicîkirina van armancên xwe yên durû, pêwistîya Mustafa Kemal bi wê hebû ku hemû desthilatê di destê çîna burjuwazîya netewî de kom bike û di vê riyê re jî dîktatorîya xwe damezrîne. Ji ber vê yekê di Tebaxa sala 1923'an de, partîyek taybetî durust kir û navê wê danî "Millet". Di helbijartina wê salê de ji 286 endamên parlamentoyê, 265'ên wan ji vê partîyê da helbijartin(15). Eva han hîn zêdetir desthilat û îmkan da destê Mustefa Kemal ê nûnerê çîna burjuwazîya Tirk ku bikare sîyaseta xwe ya durû hîn zû biser bixe. Demek piştî vê helbijartinê, Mustefa Kemal hin gavên pêş avêtin ku ji tevan girîngtir biryara rakirina

---

(14) Bêguman, yek ji wan şaşîtîyên mezin ên ku li ser piranîya dîroknivîsên pêşkevtîxwaz ên derve tesîrê kirîye, ku di bîr û bawerîyên xwe yên di derbarê Serîhildana Sala 1925'an de ber bi şaşîtîyê de biçin eva han e ku bi yek çav û yek qalibê seyra sîyaseta Kemalîstan a li hemberê çîn û tebeqên bindest ên Tirkîyê û jîyana giştî a demokratîk ya di welat de kirine û ferqek nexistine navbera van û sîyaseta wan a netewî ya di dijî Kurdan de, lê ev herdu polîtîkayên bi hev ve girêdayî di hîç wext û cîyek de cîhêkirina wan ji yekûdu nikare feyde bide ji bo derxistina rasteqînîyê bi holê.

(15) Binêre: A.D.Novîçev, Tirkîye, bi zimanê Rusî, Moskova 1965, rûpel; 167.

(16) Rejîma xelîfetîyê, bi salan bû ku bibû mezintirîn asteng di pêşîya pêşketina Tirkîyê de.

xelîfetîyê bû(16). Dawîya meha Çiriya Yekem a sala 1923'an rejima komarî (cumhurîyet) hat damezirandin, piştî vê di destpêka Adara sala din de xelîfe bi xêzanên wî ve ji welat hat derxistin û di meha Nîsanê de jî makeqanunek (qanuna esasî) nû ji bo welat danîn.

Rûyên tarî yên vê sîyasetê her bi zû, ne tenê dijî netewa Kurd, heta evê deyne cîyek, di pêşîya wê de di çend karekî sîyasî û civakî yên giring de xwe nîşan da. Burjuwazîya Tirk, berê ku li Kurdan xe li çîna karker xist. Herçend ku vê çîna han û serokên wê di yekem roja xebata Mustefa Kemal a dijî dagirkeran de, gelek bi dilsozane piştgirîya wan kirin jî. Yekemîn gava Kemalîstan di vî warî de ew bû ku bi zû ji "İttîhad" (mebest Îttîhat-Terakkî ye-Elîşêr) û "Pan-İslamî"yên kevin ji bo çîna karker partîyek taybetî dan durustkirin û heta navê wê jî danîn "Partîya Komunîst". Wek aşkera armanca ji vî ev bû ku bi vê rîyê hevsarê hemû proletaryayê Tirkîyê bikin destê çîna burjuwazî û wan ji rêxistina wan dûrxin. Kemalîst ewqas bi lez bûn ku bi vê jî neman. Di Kanuna Duyem a sala 1921'an de, cendirmên bajarê Trabzonê 16 serokên çîna karker ên bi nav û deng kuştin ku yek ji wan Mustefa Subhî bû û bi salan dilsozane û bê tirs di riya azadîya Tirkîyê û bextiyarîya hemû netewa xwe de xebat kiribûn. Ev bûyerên han û bi dehan belgên dîrokî yên din van rasteqînîyan ji me re aşkera dikin ku sîyaseta netewî ya burjuwazîya Tirk tiştekê tîk û xwerî ya bi serê xwe nebû, ji ber ku perçekê girîng ji sîyaseta giştî ya kevneperestiyê bû. Dîyarkirin û derxistina holê ya rûyê rasteqînî yê vê sîyasetê, ji bo destnîşankirina çarçova rasteqînî ya karaktera serîhildana sala 1925'an, xwedî qîmetekê taybetî ye.

Bîr û bawerîya Kemalîstan a teng di wê de derket ku ne her tenê nekarîn yek ji wan erkên girîng ên şoreşa burjuwa-demokrat cîbicî bikin ku ew jî nehiştina bindestîya netewatî ye, heta eksê vê, bi tevayî rîyek dijê vê dan pêşîya xwe. Nîşanên

---

(17) Berê ku Kemalîst bi tevayî desthilatê bigrin dest, naveroka sîyaseta şovenî ya burjuwazîya Tirk, di wextê îmzakirina Peymana Sewr de derket, bi taybetî wan bendên ku peywendîya wan bi mesela

vê riya nelibar her zû derket(17). Nemaze wextê danîna makeqanûna nû ya Tirkîyê ya sala 1924'an.

Di makeqanuna nû de tenê wan bendên makeqanûna salên 1876 û 1909'an hiştin ku ew bend bi tevayî li gel berjewenda (menfeeta) çîna burjuwazî-netewî diguncan. Bi taybetî ew ên peywendîya wan bi bêparkirina mafên rewa yên sîyasî yên çîn û netewên bindest re hebûn (wek bêparkirina mafên dengdanê ji bo ew kesên ku nikarin bi Tirkî bixwînin û binivîsin û di seranserê welat de danîna zimanê Tirkî wek zimanê resmî yê tîk û tenê ). Ev sîyaseta han berê serîhildana sala 1925'an di gelek kirinên din de xwe nîşan da û gelek bi zû gihîşt dereca sîyaseteke şovenî ku armanca wê, wek nivîska-rê İngilîz F.Rynd dibêje, eva han bû: "Tirkîyê bike dewleteke yeknetewî"(18). Ji bo cîbicîkirina vê jî aşkera ye pêwîst bû kuhemû netewên din ên di vî welatî de, di nav netewa mezin de asîmîle bikin (bihelînin).

Hêdî hêdî rêçên dizî yên vê sîyasetê derketin meydanê, heta di wan belavokên ku Kemalîstan di Kurdistanê de belav dikirin de jî, wek me dît, bi aşkera armanca wan qezenckirina Kurdan bû, her di wan deman de jî pencên êrîşê birin li ser wan Kurdên ku bi tu awayî bawerîya wan bi danîna dan û sitendinê bi Tirkîyê re tune bû. Dawîya wê belavoka ku me di pêş de behs kir, bi vî awayî hatîye:

*"Ew ên ku dijî qanûna komara me serîhildin, gelek bi tundî û bê merhemet dê bên ceza kirin, hemû hewlekî serîhildanê bê ku jê re firseta hîç cure serkevtinek bidest bixe bê dan, dê bên perçiqandin"*(19).

Wek Mamoste Şeweys di nivîsandinên xwe de daye xuyakirin her di wan deman de, Kemalîstan nehiştin ku Kurdên

---

Kurd ve hebû, tirseka mezin a bêhesab xistibû dilê wan. Ji ber ku, cîbicî kirina van bendan dihat mana tecrîdbûna bazirganên burjuwazîyên Tirk ji bazarên Kurdistana Bakûr.

(18) F.F. Rynd, "Turkish racial theories", Jounal of the Royal Central Asian Society, Vol. XXl, July 1934, Part II.

(19) Binêre: A.M. Hamilton, OP.Cit, p.296.

Tirkîyê nûnerên xwe bînin "Kongra Netewên Rojhilat" a ku di sala 1920'an de li Bakû çêbû, beşdarî bikin. Kemalîstan xwestin ew bi xwe li ser navê Kurdan heyetek teşkîl bikin û bînin vê kongrê[20]. Ji ber ku, wisa dîyar e tirsa wan ew bûye: welatparêzên Kurd mesela gelê xwe di riya vê kongra cîhanî re wisa bînin pêş ku li gel sîyaseta wan negunce. Her di wê salî de Kemalîstan biryara dardakirina Kamuran Alî Bedirxan dan ku sed salek bû malbata wî bê rawestandin di riya rizgarîya Kurdistanê de xebat dikir. Qasek şûn de, Zîya Gökalp ku yek feylesofê neteweperest ê herî mezin ê Tirkîyê têt hesêb kirin[21], di rojnamekê de ku li bajarê Dîyarbekrê derdiket, derbarê Dîyarbekir, daniştiwanên wê û heta daniştwanên hemû bajarên Kurdistana Bakûr, goya ku Tirk in, çend gotar belav kir[22]. Ev cure nivîsandinên han, bi taybetî hestê rewşenbîrên xwîngerm û pêta agirê hîsa netewî ya birîndar a wan geş dikir.

Di milek din de sîyaseta şovenî ya Kemalîstan hemû rêxistin û rojnamên Kurdan naçar kirin ku yan bi tevayî dest ji kar berdin yan jî bikevin saha xebata binerd, piştê van kirinan jî karbidestên Tirkîyê bi xwe bi awakî resmî ew qedexe kirin. Di

---

(20) Binêre: Rojî Nwê, hejmar l, sal; 2, Adara 1961'an, rûpel; 21.

(21) Ziya Gökalp (1876-1924), xelkê Dîyarbekrê bû, bi nijada xwe Kurd e, lê ji hemû Tûranîyan Tûranîtir bûye. Ji ber vê yekê lê nexweş hatîye ku jê re Kurd bêjin. Hinek kesên ku dijê wî ne dibêjin ew ne Tirk e, lê ji hemû kesî zêdetir di rîya Tirkayetîyê de çûye. Ewî di dijî wan kesan de bi navê "ji bo wî mirovî ku ji min re dibêje Tirk nîne" helbestek nivîsandîye û wiha dibêje:

Ez Tirk bim an ne
Hevrêyê Tirk im.
Hun jî Tirk bin an ne
Dijminê Tirk in.

(22) Binêre: Turkich Nationalism and Western Civlization selected essays of Zia Kokalp, translated and edited by Niyazi Berkes, London 1959, pp. 43-45, 140-141.

sala 1924'an şûn de karbidestên Tirk ên li Kurdistanê bi aşkera dest bi faalîyetê kirin û ji xelkê xwestin ku di cîyê kar û bar û axaftinên xwe yên rojane de zimanê Tirkî bikar bînin, di eynî salê de hejmarek ji serokên Kurdan ji welat dûr xistin(23).

Ev û wek van bi dehan bûyerên din bi carekî hestê netewî ya hemû çîn û tebeqên netewê Kurd xist nav bizavekî û eva han jî tesîrekê gelek mezin li ser jîyana sîyasî ya Kurdistana Tirkîyê kir. Di vir de gelek pêwîst û girîng e em vê rastîya han bêxin li ber çavan ku ev beşa han a Kurdistanê, landika durustbûn û geşkirina bîr û bawerîya netewî û melbenda destpêkî ya peydabûna tevgera azadî-netewî ya hemû gelê Kurd e(24). Ji ber vê yekê ye ku sîyaseta şovenî ya çîna karbidestên Tirkî-yê gelek bi zû gîyana xelkê coland û piranîya wan di pêvajoya xebata gelek salên dirêj ên bab û bapîrên xwe de zêdetir xwedî tecrube bûn. Eva han rastîyek dîrokî ya herî mezin e ku tesîrekê gelek zêde li ser berpabûn û karaktera serîhildana sala 1925'an kirîye. Lêbelê gelek mixabin piranîya dîroknivîsan vê yekê piştguh kirine.

Li gel vê jî, sîyaseta şovenî ya Kemalîstan a li hemberê Kurdan bala hinek dîroknivîsên bîyanî yên dûrbîn berê berpabûna serîhildana sala 1925'an, kêşa ye û gotine; ku ev sîyaseta han di netîcê de dê Kurdan ji bo serîhildanek mecbûr bike.

Di vî warî de cî û qîmetekê gelek girîng ê bîr û bawerîya dîroknivîsê İngilîz ê bi nav û deng Prof.Arnold Toynbee heye. Toynbee, du sal berê serîhildanê çûye Tirkîyê û gelek bi nêz de peyvendî li gel karbidestên mezin û mirovên sîyasî yên naskirî yên vî welatî re danîye. Piştî vegera xwe, di gotarek xwe

---

(23) Binêre: L.Rambout, Les Kurdes et le droit, Paris, 1947, p.26.

(24) Piranîya tevgerên gelê Kurd di sedsala 19'an de di vê beşa Kurdistanê de berpa bûn. Yekem car di sala 1880'an de, her di vê beşa Kurdistanê de slogana serxwebûna Kurdistanek mezin, di wextê serîhildana Şêx Ubeydullah de hatîye avêtin. Cardin Kurdên welatparêz ên vê beşa han a Kurdistanê bûn ku yekem rajname bi zimanê Kurdî derxistin û di dîroka Kurdistanê ya giştî de yekemîn rêxistina sîyasî damezrandin.

de behs kirîye ku çawan li wir "hewil didin Kurdan asîmîle bikin" û gihîştîye wê netîcê ku ev sîyaseta han rojek ji rojan "ji alîyê Kurdan de dê bibe sebebê serêşî û nexweşîyê ji bo Enqerê, bi rada wê serêşî û nexweşîyê ku ji alîyê Arnawudan de di wextê xwe de ji bo İmparatorîya Osmanî çêbû[25]. Ez wisa dizanim ku Mistefa Kemal û hevalên wî dê zêdetir feyde bibînin eger her di destpêkî de pêşîya bûyerek wiha bigrin û ji bo vê yekê mafê hevwelatî yê wekhevîyê bidin Kurdan, lê ewan bi zanîn be yan na, sîyaseta asîmîlasyonê ji bo xwe bijartine"[26].

Tenê hestê netewî û sîyaseta şovenî ya Kemalîstan pal nedan Kurdan ku serî hildin, ji ber ku gelek sebebên din jî di holê de bûn ku piranîya wan jî her netîca vê sîyaseta han bû. Berê hemû tiştî pêwist e ku em çavek di rewşa jîyana aborî ya nû ya Kurdistana Tirkîyê ya piştî serkevtina şoreşa burjuwazî ya ku di welat de çêbû, bigerînin, da ku em bikaribin wan sebebên aborî yên girîng ku di vê beşa Kurdistanê de rewşa teqîna sîyasî bi carekê gîhande dereca kemalbûnê dest nîşanbikin.

Aşkera ye ku li Tirkîyê li gel serkevtina şoreşa burjuwazî, sîyaseteke aborî ya nû hat holê. Kemalîstan, ji bo mebesta lawazkirina çîna derebeg û cure berhemên derebegî, çi di warê zîraet (kişt û kal) û çi jî di warê pîşesazî (sanayî) û bazirganî de, ji bo pêşdebirina peywendîyên berhemên sermayedarî, çend gavên pêş avêtin. Lêbelê, berê her tiştî armanca wan

---

(25) Di salên bîstî û sî yên sedsala 15'an de, Tirkên Osmanî hemû welatê Arnawudan (Albanya) îşxal kirin. Her wî wextî gelê Arnawud bi germî ket xebata dijî van dagirkerên bîyanî û bi dehan serîhildanên bi xwînî berpa kir. Ji ber vê yekê, gelek caran têt gotin, Arnawudan ji hemû milan zêdetir serêşîyê ji Osmanîyan re derxistine. Wek mîsal, serîhildana Arnawudan a sala 1911-an, heta derecek bûye sebebek gelek mezin ji bo jarbûna rejîma Tirkên Ciwan (Jön Türk).

(26) Professor Arnold J. Toynbee, "Angora and the British Empire in the East", The Contemporary Review, London, June 1923, pp.386-387.

hemû gavavêtinan, bi hêzkirina sîyasî û aborî ya çîna burjuwaya xwe bû. Ji ber vê yekê, di netîcê de, ne tenê barê jîyana çîna bindest ber bi başbûnê de neçû, di gelek milan de ber bi xirabûnê de çû.

Kemalîstan, nedixwestin di binî de li derebegîyê bixin û bi vê yekê cotkaran rizgar bikin. Ji ber vê, berê hewil û bizava xwe dabûn wê ku awayê berhemanîna derebegî gavek pêş de bibin û şiklê sermayedarîyê bidinê. Wek têt zanîn eva han jî di hemû cî û wextan de dibe sebebê hîn zêdetir perçiqandina cotkar û heta hemû gundîyan. Her di netîca vê sîyasetê bû ku heta demek piştî serkevtina şoreşa burjuwa, hinek serane û bacên derebegî her wek xwe hiştin, heta Kemalîstan gelek caran jî destê alîkarîyê ji bo kesên xwedî ax ên ku peywendîyên wan pê re hebûn, dirêj kirin. Mesela krêdî dan wan û ji der ve traktor û wasitên berhemê yên nû ji bo wan anîn. Bi taybetî li ser hesaba cotkarên Ermenî û Yunanîyan, mal û axên van cure xwedî milkan pêş de diçû. Hejmara cotkarên bê ax jî, nemaze di navçên wek Kurdistanê de ber bi zêdebûne de bû. Heta İsmet İnönü yê serokwezîrê sala 1936'an, bi xwe naçar bû eva han qebul bike ku "hejmarekê bêhesab cotkarên bê ax hene"(27). Bîst û çar sal piştî vê, rojnama "Yenî Sabah" a Tirkî wiha nivîsandîye: "Gotinên Şêx ji bo cotkaran wek qanûn in, heta mafê wan nîne bê rizayê wî qet bi tu awakî alîkarîyek bidin karbidestên mîrî"(28). Evên han hemû vê rastîyê dikin ber çav ku bi vî awayî sîyaseta zîraetê ya burjuwazîya Tirk, sîyasetekê rast û serkevtî nebû. Ji ber vê yekê, bû sebebê berfirehbûna dijîtîya çînîtî û civakî di gundan de(29).

(27) Binêre: Dîroka Hemû Cîhanê, bi zimanê Rusî, cild 9, Moskova 1962, rûpel; 441.

(28) Ji Kovara El-Teriq, Beyrut, 8'ê Tîrmeha sala 1961, rûpel; 93'an hatîye sitendin.

(29) Piranîya dîroknivîsên pêşverû, îşaretê vê xala han a giring kirine (wek mîsal binêre; P.P. Mayesief û M.A. Hasretyan, Tirkîye, bi zimanê Rusî, Moskova, 1965, rûpel; 65).

Aşkera ye ku bi vê rîyê nedikarî karek wisa bike, da ku zîraet di Tirkîya Kemalîstan de gavên mezin ên ber bi pêş de bavêje. Wek mîsal, di sala 1929'an de, cihên ew milk û axên ku ji bo zîraet dihatin bikaranîn, gihîşt sewîya salên berî Şerê Cîhanê yê Yekem, lê ew berhemên ku jê dihatin hilanîn li dor û berê ji sedî 80'yî (%80) berhemên berê şerî derbaz nedibû. Hejmara heywanan jî her di wî salî de gelek bi zehmetî xwe digîhand ji sedî 85'î hejmara berê şerê[30]. Di netîca van de giranî gelek pêş de diçû. Ez di wê qeneetê de me ku ev hejmarên han gelek bi aşkera dereca wan giranîyan dixin li ber çav: Di sala 1913'an de, hoqeyek goşt 5 quruş bû, hoqeyek nan quruşek û rûnê zeytûnê 3 quruş , lê di sala 1928'an de, bihayê hoqeyek goşt gihîşt 150 quruş, nan 18 û rûnê zeytûnê 70 quruşan. Bi vî awayî dewra Kemalîstan bihayên pêwistîyên bingehîn li gor berê şerê ji 18 û heta 40 caran zêde bûn[31]. Gruba ku feydê ji vê giranîyê girt tenê burjuwazîya bazirganî ya Tirk bû ku hejmarek dîroknivîs, vana hêzê pêşeng a şoreşa Kemalîstan dihesibînin, lêbelê ji hejar û bindestan re tenê tiştek hebû: **Birçîtî!**

Heta piştî hatina Kemalîstan, ew pêşketinên ku di warê berhemên pîşesazîyê (sanayî) de çêbûn, di welat de nebûn sebebê başbûna rewşa jîyana aborî . Eqsê vê, bihêzbûna desthilata sîyasî û aborî ya burjuwazî, bûn sebebê zêde mêjandin û perçiqandina çîna karker. Roja karkerekî şareza (kalîfîye) li bajarê Stenbolê digihîşt 120-200 quruşan û yê karkerek normal

---

(30) Binêre: A.Noviçev, serokanîya ku berê navê wê derbaz bû, rûpel; 170.

(31) Di derbarê van hejmaran de binêre; The Times, London, July 8, 1929, ewî dîqqet dikişe ev e ku heta karbidestên Tirkîyê her çend hewil didan jê kêm bikin, lê bi xwe jî bi awakî resmî îtîrafê bi vê giranîyê kirine. Serokanîyên resmî yên wan rojan wiha dibêjin; bihayê eşyan ên sala 1929'an, ji 13 heta 15 caran bi nisbet sala 1914'an zêdetir bûn (binêre: R.P. Korniyevko, Tevgera Karkeran Li Tirkîyê, 1918-1963, bi zimanê Rusî, Moskova, 1965, rûpel; 57).

(32) Binêre: R.P.Korniyevko, serokanîya ku navê wê derbaz bû, rûpel; 57.

jî li dor û berê 40 heta 100 quruşan bû[32]. Her çendîn rojên kar gelek caran digihîştin 16 seetan. Mîqdara wan rojaneyên han wek ku serokanîyên resmî jî gotine, di rasteqînîya xwe de sedî 17 ji rojaneyên karkerên sala 1913'an kêmtir bûn[33].

Rojaneyek wiha kêm tenê têra jîyana ziktêrîyê nedikir, wek mîsal, di serokanîyek bawerîpêkirî de dibêje ku karkerên madenên komirê yên Zonguldaxê, ji nanê tisî û genimên şamî pê ve qet tiştek din nedixwarin[34].

Li gel hatina Kemalîstan, mil bi milê tadaya aborî, tadaya sîyasî jî li ser çîna karker zêde bû. Hîn serneketibûn ku bi tevayî dijmin ji welat derînin, bi awakî hov ketin gîyana çîna karker û rêxistinên wê (tenê di payîza sala 1922'an de, zêdetir ji 300 serokên vê çîna karker şandin bendîxanan)[35]. Kemalîstan, ber bi girtina rêxistinên karkeran re, eynî wextî rêxistinên bi xwe ve girêdayî dadimezrandin da ku bi vî awayî nehêlin tevgera karkeran berfireh be û bikeve qalibek yekgirtî.

Hemû çîn û tebeqên bindest ên Tirkîyê bê ferqîtîya netewî, bi carek ji destê vê sîyaseta nalebar a karbidestên burjuwazîya Tirkîyê de kerixîbûn. Eva han jî her bi zû berê serîhildana sala 1925'an, xwe wek zincîra tevgerek grevan de xist pêş. Wek mîsal, gundîyên hinek navçên rojavayê Tirkîyê sala 1923'an de, serîhildanek mezin dijî hukumet û derebegîyê berpa kirin û gelek karbidest û cendirme kuştin. Lê gelek bi tundî û bêmerhemetî vê serîhildanê tefandin û di meha Çirîya Yekem a eynê salê de qanunekê "dijê çetegirî"[36] yê derxistin ku

---

(33) Binêre; A.Noviçev, serokanîya ku navê wê derbaz bû, rûpel; 173.

(34) "Yekîtîya Meslekên Navnetewî", bi zimanê Rusî, cild: 3, Moskova-Leningrad 1926, rûpel; 42-43.

(35) Binêre; R.P.Korniyenko, serokanîya ku navê wê derbaz bû, rûpel; 42-43.

(36) Kemalîstan ne tenê serîhildanên Kurdan bi "çetegirî" bi nav kirine, ji ber ku çi tevgera dijî xwe bihesibandina, bi wî navî bi nav dikirin.

armanca wê ya bingehîn ji bo berxwedaneke hemû cure tevgerên gundîyan terxan kiribû[(37)]. Di wî wextî de nerazîbûn û sevîya tevgera karkeran gihîştibû qonaxek pêş. Tenê di havîna sala 1923'an de, pirtir ji 12 hezar karkerên madenên komirê ên Zonguldaxê, sê caran grev kirin[(38)]. Gelek grevên din ên bi vî awayî, li Stenbolê û bajarên mezin ên Tirkîyê çêbûn. Pêwist e em diqetê bikişînin li ser vê xala han jî ku nûnerên hemû netewên din ên Tirkîyê beşdarîya van cure tevgeran kirin.

Bi vî awayî em dibînin ku piştî hatina Kemalîstan nerazîyeke giştî di hemû Tirkîyê de hebû, aşkera ye ku gelê Kurd ne ji derveyê vê bû. Lêbelê, çend sebebên taybetî di holê de bûn û evan tesîrek wisa kiribûn ku ev nerazîbûnên han di Kurdistanê de zêdetir neticên tund û tuj bidin. Carek berê hemû tiştî, sîyaseta aborî ya Kemalîstan di Kurdistanê de, li ser hemû tiştan re rîyek şovenî ya tund dabû li ber xwe. Wek mîsal, Kemalîstan navçên Tirkan de heta derecek gelek zêde, desthilata sîyasî ji xwedîyê axên mezin sitendin. Em dibînin di Kurdistanê de hewil didin ji derveyê vê, li berjewendîya wan a aborî jî bixin. Bi taybetî yên wan axa û serokeşîrên ku berê têkelê rêzên tevgera azadî-netewî bibûn. Pêwist e em eva han jî bêjin, ku mebesta vê lêdanê azadkirin û bi vê curê rakêşana gundîyên Kurdan ber bi xwe ve nebû, ji ber ku eva han beşek ji sîyaseta şovenî ya Kemalîstan bû. Wek mîsal, beşek ji baştirîn milk û axa Kurdistanê ji xwedîyên wan zeftkirin û dan destê wan Tirkên ku ji Yunanîstanê anîn[(39)]. Tenê di sala 1931'an de, biryar dan ku 100 hezar Tirkên Bulgarîstan û Yugoslavyayê bînin, li hinek navçên Kurdistanê bicî bikin. Goya armanc ji vê *"ji bo bihêzkirina niştecîyên xwe yên Tirk"*[(40)] bû.

(37) P.P.Mayasiev, Di Wê Serdemê de Peywendîyên Ziraetê Li Tirkîyê, bi zimanê Rusî, Moskova, 1960, rûpel; 171-172.

(38) Binêre: A.Korniyevko, serokanîya ku navê wê derbaz bû, rûpel; 59.

(39) Binêre: Problemên Ziraetê, bi zimanê Rusî, cild; 1-2, Moskova, 1936, rûpel; 127.

(40) Binêre: The Times, August 27, 1931.

Aşkera ye ku ev sîyaseta han ne tenê bû sebebê nerazîbûna gundîyên Kurd, bi wan re bû sebebê nerehetîya kesên serdestên wan jî.

Sebebek din a taybetî di holê de bû ku tesîrê kiribû li ser beşekê gelek zêde yê danîştiwanên Kurdistanê, bi taybetî eşîrên nîvçe koçer û bazirgan. Di sedsala 19'an de, seretaya durustbûna bazarek yekgirtî di hemû Kurdistanê de destpê kiribû, ev vî karî han a girîng, di netîca vebûna bazara Kurdistanê ber bi bazara sermayedarî ya cîhanê û destpê kirina rizgarbûn ji çarçova awayê berhemanîna girtî (tebîî), roj bi roj ber bi firehbûnê de bû. Parvekirina Kurdistanê di navbera Tirkîyê û Îranê de, di wê serdemê de hîn di pêşîya van pêşveçûnan de nebibû astengek . Di wan salan de di navbera Kurdistana Bakûr û Başûr de dan û sitendina bazirganî, noqta rûbara Xaburê ya ku bi Dîclê ve dihat girêdan û karwanên herdu milan de diçûn û dihatin, van herdu milên Kurdistanê bi hev ve girê didan, ji derveyê van ew heft rîyên ku di wê dolê de 20 km. bera wan bû, evên han heta derecek ber bi pêşdeçûnê de bûn. Heta dema nerehetîya navbera Îngilîz û Tirkan a li ser Kurdistana Başûr, Tirk gelek hêrs bûn ku peywendîya bazirganî di navbera vê beşê Kurdistanê û Kurdistana Bakûr de gelek xurt e û wek belge jî behsa wan heft rê û dolên li ba Xaburê kirin(41). Ji derveyê vê, ev peywendîya aborî bû ku di nezdê wê komîsyona taybetî ya "Komela Gelan" ji bo lêkolîna wê problemê şandibû û di rapora xwe de dawa kiribû ku eger "Wilayeta Musilê" ji Îraqê re bê dan, pêwist e riya xelkê bide da ku bi serbestî li gel Tirkîyê û Surîyê bazirganîya xwe bikin û ev mafê han jî ji bazirganên Kurdistana Tirkîyê re bê dan ku riya Wilayeta Musilê ji bo dan û sitendinên bazirganî bikar bînin(42).

---

(41) Binêre: League of Nations-Question of the frontier between Turkey and Iraq. Report submitted to the Council by the Commission instituted by the Council Resolution of the September 30 th, 1924, p. 29.

(42) Ibid, p. 90.

Lêbelê, rewşa nû ya dawîya xelasîya Şerê Cîhanê yê Yekem û bi dereca yekem bi destê İngilîzan dagirkirina Kurdistana Başûr û cihêbûna wê ji Kurdistana Bakûr, li gel serkevtina çîna burjuwazî li Tirkîyê û İranê, vê mana han dibexşîne ku êdî Kurdistan bi awakî polîtîk hat çend perçe kirin ku ji bo vê mebesta han gelek xebat hat kirin da ku bi vî awayî perçekirî be. Eva han jî, bêguman, li ser jîyana aborî ya Kurdistanê tesîrekê yekcarî mezin kir û bi taybetî li ser pêşdaçûna prosesa bazareke yekgirtî ya ku li ber çêbûnê bû.

Tirkan dixwestin bi carek dest deynin li ser hemû Kurdistanê, lê gava zanîn ku nikarin Kurdistana Başûr bixin bin bandorîya xwe, di sala 1924'an de destavêtin ku bi wasita eskerî hemû rê û buwarên sinorên li gel Surîyê û bi taybetî li gel İraqê bibirin[43]. Bi vî awayî bi rakirina rîya bazirganîya navbera van herdu beşên Kurdistanê, zehmetkirina peywendîya navbera wan, ne tenê bazirganên herdu milan, di netîcê de herdu bazaran jî gelek zerar dîtin. Heta nûnerên İraqê, di yekem civîna komîta duqolî ya çavdêrîya sinorê navbera Tirkîyê û İraqê de ku di dawîya sala 1926'an li Zaxoyê hat çêkirin, bi taybetî dîqeta heyeta Tirkan li ser vê problema aborî kêşan (44).

Bi zorî ji hev cihêkirina Kurdistana Bakûr û Başûr , li ser jîyana aborî ya eşîrên nîvçe koçer jî tesîrek mezin kir. Karbidestên Tirkîyê, bi carek de hatin-çûna wan eşîran a havîn û zivistanan li cîwarên ku ketibûn ser axên van herdu beşên Kurdistanê, qedexe kirin. Di netîca vê de, bi hezaran serî mî û bizinên van eşîran têk çûn. Wek mîsal, tenê havîna sala 1927'an, dor û bera şeş hezar kes ji Eşîra Ertûşî û Sindî, di netîca wan

(43) Binêre; A.Safrastian, Kurds and Kurdistan, pp . 87-88.

(44) Binêre: Report by Britannic Majestys Government to the Conucil of the League of Nations on the administration of İraq for the year 1926", London, 1927, p.21.

qutkirina ji cîwarên wan, zerarek gelek mezin dîtin[45]. Nêzîkê du sal berê wan jî, dor û bera 1200 xêzanên (aîlên) Eşîra Mîran naçar bûn ku bi yekcarî Kurdistana Tirkîyê bicî bihêlin li Kurdistana Başûr, li qeraxên rûbara Dîclê bicîbin[46]. Aşkera ye di netîca van kirinan de, nîvçe koçerên Kurdistanê jî bi tevayî dijî karbidestên nû yên Tirkîyê dildax û tijî bûn.

Ev nîvçe koçerên han li gel hemû gundîyên din ên Kurdistanê, herwiha karker û feqîrên nav bajaran, hemû çîn û tebeqên bindest ên Tirkîyê, fîxan dikirin ji destê van bac û seranên nû yên ku bi yekcarî ew xistibûn nav tengasî û zehmetîyan. Heta ew sermîyanên ku di destê zeneetkar û bazirganên navîn de kom bibû, têr nedikir da ku bikaribin li gel rêbaza sermayedarîya nû ya Tirkîyê xwe pêş bixin. Tesîra van bac û seranan ji tevan zêdetir li ser gundîyan çêbû, ji ber ku di dema Osmanîyan de piranîya wan gelek caran bi salan dikarîn xwe ji van baran biveşêrin. Wek mîsal, di sala 1913'an de, malbatek derebeg a navça Bedlîsê, bîst salan zêdetir ser de derbaz bû ku pulek bac û seranên dewletê nedabû[47]. Lêbelê, di dema desthilata merkezî ya burjuwazî de, aşkera ye ku imkana tiştên wiha bi carek hat birîn. Kovara "Rojhilata Nêzîk û Hindistan" ya Îngilîzî, çend meh piştî serîhildana sala 1925'an, di derbarê vê meselê de wiha dinivîse: "*Wezareta Darayî (Malîye) qet tu riyek nehiştîye ku danişţiwanên Tirkîyê bi wê wasitê bikarin xwe ji dana bac û seranan rizgar bikin*"[48]. Li ber vê re her ku diçû ew bac û serane ber bi zêdebûnê de bûn. Wek mîsal, tenê di navbera salek de (1928-1929) hatinên dew-

---

[45] Binêre: League of Nations. Report by Britannic Majestys Government to the Council of the League of Nations of the administration of İraq for the year 1927, London, 1928, p.26.

[46] Binêre: Report.... for the year 1926, p.16.

[47] Binêre: A.Safrastian, Kurds and Kurdistan, pp.72-73.

[48] Binêre: The Near East and India, Vol. XXVIII, November 19, 1925, p. 612.

letê yên ji bac û seranan ji sedî 6 zêdetir bû[49]. Di sala 1938-1939'an de, baca raste rast (mibaşir) gihîşt dereceke wisa ku pênc carê sala 1930-1931'an bû[50].

Heta barên serane û bacan jî li gor navçên din, li Kurdistanê zêdetir bû, hemû tiştan em deynin milek, tenê ew beşê gelek zêde yê ordîya dewletê ku vir ser pişta xelkê dijîya em bidin ber çav, wî çaxî netîca wê rewşê ji me re hîn ronîtir dibe. Ebdulezîz Yamulkî di vî warî de nivîsandîye, wiha dibêje: *"Ordîya Tirk, li ser milê gundîyên Kurdistanê belakî mezin bû, gundîyên Kurdistanê naçar bûn zexîrê ji bo wan kom bikin, bi pişta xwe bigihînin qişle û qereqolan. Li wir jî ewan li gora dilê xwe bihayê pê didan û her ewqas ji wan re dihîştin ku bikarin zivistana xwe bi nan û berû, bi zikê birçî bibin serî"*[51]. Vê sîyaseta han, bi carekê xelkê ji taqet xistibû. Beşek ji rêxistinên sîyasî yên Kurdistanê bi awakî vekirî bi vê yekê hesîya bûn, wek "Komîta Erzirumê", ya ku di wextê serîhildana sala 1925'an belavokek taybetî belav kirîye û tê de hukmê rakirina bac û seranan daye[52].

Piştî serkevtina şoreşa burjuvazî li Tirkîyê, bi gelemperî rewşa jîyana aborî û civakî ya Kurdistana Bakur ev bû, her bi van pêlên fireh ên hîle û astengan ve mirov bi rehetî dikare sebebê bingehîn û rewşa hêzên sîyasî yên hemû tevgerên azadî-netewî yên Kurdistana Tirkîyê ya dawîya Şerê Cîhanê yê Yekem, sebebê serîhildana mezin a sala 1925'an bide dîyar kirin.

---

(49) Binêre: The Near East and India, Vol. XXXIV, August 9, 1929, p.178.

(50) Dîroka Hemû Cîhan, bi zimanê Rusî, Cild-9, rûpel; 445.

(51) Ebdulezîz Yamulkî, Kürdistan ve Kürt İhtilalleri, cild:1, Tehran, 1946, rûpel; 78.

(52) Binêre: A.Ghassemlou, Kurdistan and the Kurds, p. 50.

Wek me bi aşkera dît ev sebebên han, di nav civakek de, bi piranî di rewşên serkevtina şoreşên burjuwazî-netewî de durust bûn, ev sebebên han jî ne tenê di Kurdistanê de, belko di wê serdemê de li hemû cî û demek de bes bûn ji bo wê netewê bigihîne dereca teqînê. Gelek aşkera ye di rewşên wiha de, herçiqas sebebên derve jî di holê de bin, lê di zanyarîya dîrokê de ji derveyî rolek biçûk pê ve ji van re qîmetek nehatîye dan, qet tu wextê rast nîne û mirov nikare wek ku gelek dîroknivîsan kirine, vê yekê hêzê colînerê bingehîn a serîhildana sala 1925'an nîşan bike.

# MİJARA ŞEŞAN

# KOMELA GELAN (CEMİYETÎ 'EKWAM) Û KURD

## Çend gotin li ser sîyasetê(*)

Her çendîn beşekê zêde vê gotara min ji bo behsa damezrandina Komela Gelan û karakterê vê dezgê hatîye amade kirin, lê ev yeka han dikare alîkarîya me bike ku em baştir bikarin helwêstê komelê li hemberê gelê Kurd fam bikin. Vêca di serî de em bi çend gotinên di derbarê sîyasetê û guherînên wê de destpê bikin.

İnsan çawan ber bi hiş de hatîye û ketîye mulahezekirina hînbûna sîyasetê, yan wek dibêjin karîye bifikire[1]. Ew fêl û fetlên ku ji bo jîyana rojane û parîyek nan bikar dianî, di jîyana wî de yekemîn roja bikaranîna sîyaseta sade bû.

Wek her bûyerek din ên jîyanê, sîyaset jî wiha peyda bû, bê sekinandin ber bi guherandin û pêşdeçûnê de bûye û dibe. De-

---

(*) Di hejmara 17'an û rûpelên 2-29'ê "Karwan" de hatîye belav kirin.

(1) Ji bo amadekirina vê gotarê min feydek mezin ji wan muhazeran wergirtîye ku min bi alîkarîya gelek serokanîyên cihê ji bo sinifa çaran a Beşê Dîrokê ya Fakulta Edebîyatê ya Unîvetsîta Bexdadê amade kirine.

mek sîyaset bûye pîşe, huner û zanistî. Dema ku civak û dewlet peyda bûn, sîyaset bû erkê yekem ê li ser milê piranîya dezge û karbidestan û her ji ber vê jî gotina "polîtîka" ya Grekîya kevin ku mana kar û barên civakê yan ên dewletê dide, bi mana "sîyaset" têkelê zimanê Awrupîyan bû[2].

Piştî peydabûna dewletê, dîn jî di pêşdebirina sîyasetê de rolekê mezin lîst. Dîn, bê sîyaset nedikarî belav û berfireh be. Di destpêka sedsala 4'an de dînê Îsayî û dewlet têkelê hev bûn, piştî demek kurt papazên wisa peyda bûn ku di warê sîyasetê de dikarîn bibin mamostê dehan mîr û paşayên dema xwe.

Pêxemberê me jî, silavên Xwedê lê bin, her di roja yekem a derketina Îslamîyetê de tund tund sîyaset û dîn bi hev ve girê da. Namên wî yên bi nav û deng ên ku ji bo paşayên Rum, Fars û Hebeşan hatine nivîsîn, nimûnên pêşîn ên peywendîya dîplomasîya cîhana nû ya Musilmanan in.

Wek me got, destpêka sîyasetê bi yekcarî sade bû. Li gel peydabûna desthilat û damezirandina dam û dezgên mîrî, sîyaset ber bi alozîyê de çû.

Berjewendîyên jîyana rojane û pêşdaçûyîna têkelbûna gelên cîran û yên nêzîkî hev, di rojên kevin de bûn sebebê peydabûna peywendîyên navbera dezgên mîrî yên cîhana pêşkevtî yên wî çaxî. Di destpêkê de û heta demek dûr û dirêj, peywendîyên wan rojane û bê aloz bûn. Çi dema ku pêwîst bûya, heyetê welatek ji bo girêdana peymanek an birina dîyarîyek an gîhandina emanetek an ji bo xwazgînîya şehzadeyek berê xwe didan welatekî din û piştî cîbicîkirina karên xwe, cardin ber bi welatên xwe ve vedigerîyan. Her çendîn erkê ser milê heyetên wiha, hêsan û bê ser û bin bûn jî lê cîbicîkirina wan demek dixwest, carên wisa hebûn ku meh li ser de derbaz dibûn û heta xwe digihandin salan. Çûn û vegerîna wefdê bi nav û deng ê Harun Reşîd li ba Şarlmanê Mezin, nêzîkî salek ajot.

---

[2] Gotina "polîtîka" ya Grekî ji "polîs" tê, ku me'na wê dewlet e. Dîyar e gotina "polîs" jî her ji wê hatîye.

Erkê heyeta ku navê wî derbaz bû, ji gîhandina namek û seetekê xelîfeyê Musilmanan ji bo qralê gawuran pêk dihat. Piştî vê, dor û berê çarsed salan, dema ku Marko Polo yê bi nav û deng li gel bab û mamê xwe, li ser daxwaza fermanrewayên Venedîkê ya İtalîya çû xizmeta Xanê Çîn û Maçînê, tam piştî 24 salan vêca vegerîyan welatê xwe. Ew di sala 1271'an de çûn di sala 1295'an de jî vegerîyan[3]. Marko Polo, nêzîkî sê sal û şeş mehan riya navbera Venedîka Awrupa û Pekîna[4] Asya temam kir û heta axa me jî beşek bû ji wan navçe û welatên ku ew bi peyatî jê derbaz bûn.

Li gel peydabûna rejîmên sermayedarî û durustbûna hejmarek dewletên mezin ên desthilatdar, qonaxek hesûdî ya nû di jîyana sîyasî ya gelan de destpê kir. Yek ji wan dewletên Awrupayê yên mezin ji sinorên xwe razî nebûn. Her yekî ji wan çavên xwe berdabûn saman û axên gelên din û di nav xwe de jî destên xwe kiribûn pêsîra hevûdu. Her ev yeka han têt zanîn ku pêta agirê şerê bilind dibû û bi hezaran û deh hezaran dibûn qurban. Ew şerên Awrupayê yên wextê Napolyon Bonapart, yanî destpêka sedsala 19'an, gihîştin sevîya tirsên wisa ku dîrokê heta wê demê nimûnên wisa nedîbûn. Zerarên mezin ên wan şeran û acizbûna bêsinor a gelên Awrupayê, pal dan ber fermanrewayên xwe ku ew welat zêdetir bikevin ser rêbaza çareserkirina aşîtîyane ya problemên nav wan dewletan. Ji ber vê yekê sîyasetkaran bi pewîstî zanîn ku dezgekê bilind ji bo çavdêrîkirina peywendîya navbera dewletên mezin damezrînin. Ew gihîştibûn wê bîr û bawerîyê ku qet nebe ew meselên ku dixwazin bi çek, xwîn û şer hel bikin, bi kêmasî hinek ji wan di riya axaftin û dan û stendinê de bên çareser kirin. Ji bo vê mebestê, piştê ketina Napolyon, Kongra Vîyanayê biryarê damezrandina cure meclisek dabû ku li gor vê car û caran nûnerên hejmarek dewletên mezin ji bo muzakerên ser behsên girîng ên cîhanê dicivîyan.

---

[3] Marko Polo, sala 1254'an ji dayîk bû û sala 1324'an koça dawîyê kir.

[4] Bi zimanê Çînî me'na "Pekîn" "paytextê Bukûr" e.

Piştî Kongra Vîyanayê û bi taybetî piştî salên 70'yên sedsala 19'an, welatên sermayedarî yên pêşkevtî gihîştin qonaxa emperyalîzmê, sîyaset û peywendîya navbera wan dewletan ket nav rewşek nû yê yekcar mezin û aloz, hindî ku diçû astengên wan zêdetir û barên wan girantir dibû. Encamê kar gihîşt wê derecê ku fermanrewayên wan wek hêvîya dawîyê, ji bo çareserkirina piranîya problemê welatên xwe yên bingehîn dest avêtin çek. Bi vî awayî destpêka meha Tebaxa sala 1914'an, şerek berpa bû ku dîrok heta wî çaxî di nimunên xwe de tiştek wisa nedîbû. Ev şerê han şerek wisa bû ku hemû girtin nav xwe û bi heqî jî navê wî danîn "Şerê Cîhanê yê Yekem".

Zerarên Şerê Cîhanê yê Yekem, gelek mezin bûn. Tenê yên ku di bin cil-bergên eskerî de, di şer de hatin kuştin, nêzîkî 10 mîlyon kesan bûn. Ew ên ku di meydanên şer de birîndar bûn nêzîkî 20 mîlyonan bûn ku sê mîlyon û nîvê wan heta mirinê seqet man. Ji sedî 50'yê xortan, 4 000 gund, 23 000 fabrîka, bingehên hesin û rejîyê, 550 000 xanî û tenê 58 000 kîlometro rê û banên Fransayê(5) bûn xwarina agirê Şerê Cîhanê yê Yekem ku bi kêmasî 360 mîlyon dolarê zêr hat xerc kirin. Ev pere, ji pereyên ku yên di hemû şerên berê vî şerî de hatibûn bikaranîn, zêdetir bûn.

Ev rasteqînîyên han divê hindurê herkesî bihejînin û di saha sîyasetê de gelek serenc û nirxandinên nû bînin holê. Belê damezrandina Komela Gelan yek ji encamên wî yên serekî bû.

## DAMEZRANDÎNA KOMELA GELAN

Bi temambûna Şerê Cîhanê yê Yekem re, hejmarek karbidestên dewletên mezin ji bo cîhanê piştî şer ketin damezirandina rêxistin û dezgeyekê bilind a navbera dewletan . Ji bo vê armancê Fransizan komîtekê taybetî di bin serokatîya Wezîrê Kar de damezrandin. Fermanrewayên Dewletên Yekgirtî yên

(5) Temenê Şerê Cîhanê yê Yekem 4 sal 3 meh û 9 roj bû, şer di nav axa Frenseyê di zêde nedomand.

Amerîkayê ji hemûyan zêdetir qîmetê dan vê meselê. Ew ku şer bû xêr û bereket li ser de rijîya, ji berê salên şerê gelek zêdetir dewlemend û xurttir bûn, ji ber vê dixwestin cîhana sîyaseta piştî şer, rêxistinên wek vê jî têkin bin destê xwe.

Li gel temambûna şer, damezrandina Komela Gelan (League of Nations) bû sloganekê rêxistinî, ji ber vê Kongra Aşîtî ya Parîsê ya ku roja 18'yê Kanuna Duyem a sala 1919'an hat çêkirin, bi taybetî qîmetê pê da û roja 25'ê Kanuna Duyem a eynê salê cîbicîkirina wê siparte komîtekê bilind a bin serokatîya W.Wilson ê serokkomarê Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê.

Dîyar e her yek ji dewletên serkevtî dixwestin programa Komela Gelan bi curek be ku di hemû milan de li gel armanc, plan û berjewendîyên wan de bigunce. Fransizî rikoyî bûn li ser wê ku komel bibe çiqlên çavên Almanên cîranê wan ku bi çavê babkujîyê li wan dinêrîn. Wan daxwaza damezrandina hêzekê serbixwe ji bo komelê dikirin, çimkî dizanîn ku eskerên siwarî û piyade yên wê çaxê yên Frensa mezintirîn hêza çekdar a cîhanê ye, lê ev hêza han bi navê gişt dewletên mezin ên serkevtî dê bikeve bin destê wan.

Programa Îngilîzan rê nedida damezrandina rêxistinek fireh, wan dixwest meclisek taybetî ji bo nûnerên welatên mezin damezrînin ku divîya karê ser milê wê ji parastina rewşa nû ya cîhanê pêk bê. Îngilîzan, her çi xwestibûn ji ber sebebê şerê ketibû destê wan û ji ber vê jî ji "beşa xwe" razî bûn. Dijî wê bûn ku kesek destê xwe têke nav kar û barê welatên bindes-tên wan ku wê çaxê pîvana wan cîyên bin destê wan digihîşt 35 milyon kîlometre çargoşe (km2) û hejmara nifusa wan jî digihîşt 450 milyon kesan.

Li ser behsa damezrandin û programa Komela Gelan, Amerîkî bi curek din hatin pêş. Washington dixwest rêxistinekê cîhanî ya fireh bê damezrandin û hemû dewlet bibin endamên wê, da weko bibe cîyê lêkolîna rewşa welatan, heta dijê wê jî bûn ku Almanya bi zû nebe yek ji endamê wê, ji ber ku dixwest bi wê riyê re serkêşîya Îngiltere û bi taybetî ya Fransa kêm bike. Ji vê jî zêdetir, nûnerên Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê di wan rojan de heta derecek "alîgirê"

dîyarkiri-na mafê çarenivîsa gelan bûn, dixwestin Komela Gelan wî mafî bike sloganeke xwe ya sereke. Her wiha li gel bazirganîya serbest û vekirî re bû, di vî warî de slogana "derîyê vekirî"[6] hildabû. Mebest ji "derîyê vekirî" ji bo hemûyan bêferq rêdana damezrandina peywendîyên aborî yên azad bû. Bi van sloganan fermanrewayên Washingtonê bi tundî derîyên girtî dixistin.

Ev xwestin û daxwazên Amerîkîyan ku heta derecek, gelek li gel başî û berjewendîya netewên biçûk ên cîhanê de diguncan, bê sebeb nebû. Evên han hemû kirinên sîyasetekê mezin û dûrbîn bûn ku xizmeta armancên Dewletên Yekgirtî yên Amerîka yên serekî û bingehîn dikirin. Samanên netewî yên wî welatî ji ber şer ji hesabê derket, bazara navbera cîhana Rojava, bi serê xwe êdî bersîva berhemên sanayî, hasilatên ziraî û perên wan ên kombûyî nedida. Ev mîsala han tenê bes e ku em bê ger bêjin, li gel temambûna Şerê Cîhanê yê Yekem, ji sedî 40'ê hemû zêrê cîhanê ket bankên Dewletên Yekgirtî ya Amerî-kayê ku qerzên (deynên) wî welatî yên li ser Îngîltere, Fransa û hejmarek welatên sermayedar ên din, gihîştibû 14 mîlyar dolaran. Berê ku şer destpê bike, salê 200 mîlyon dolar qerz dida van welatan. Çi heye ku ev welatên han ên yekcar dewlemend ji hasilatên ziraî yên welatên bindestê xwe mehrum bûn. Pîvana wan melbend û navçên ku ketibûn bindestê wî, hinek ji çarîk mîlyon kîlometre çargoşe zêdetir bû. Li beranberê wî, Frensizan nêzîkî 12 mîlyon kîlometre çargoşên axa gelan li gor daxwaza xwe talan kiribûn. Wî çaxî pîvana welatên bindestê Îngîltere ji 35 mîlyon kîlometre çargoşe derbaz dibû û hejmara nifusa van welatan, wek me got, digihîşt 450 mîlyon kesan. Yanî ew axên ku destê Frense de, nêzîkî 45 qat yên Îngîltere jî nêzîkî 135-140 qatê axên bindestên Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê bû. Ji ber vê yekê, dibû Washington he-

(6) Vê gotina han, "derîyên vekirî" yan "el-bab'ul-meftûh", cara yekem karbidestên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di sala 1899'an de bikar anîn. Wê demê ku dixwestin bi vê bahanê xwe bigihînin bazara fireh a çînê ya ku di destê dewletên mezin ên din de bû.

wil bide her çawan dibe bira bibe, derzek bike dîwara vê kela han a asê ya hevpeymanê xwe yê do. Li gor programa Amerîkîyan Komela Gelan dikarî di vî karî de rolek bilîze.

Lê ne mîzana hêzên çek û ne jî mîzana imkanên aborî yên wê çaxê rê neda yek ji wan programan ku bi tevayî bi ser kevin, ev yeka han jî bi serê xwe bû yekemîn sebebê lawazîya komelê ji dayîkbûnê.

Komîta taybetî ya W. Wilson, karên xwe temam kir û programa xwe ya ji 26 xalan pêkhatî ji bo Komela Gelan danî. Ev 26 xalên han, bûn beşa yekem a wan peymanên ku di Kongra Aşîtî ya Parîsê hatin îmza kirin. Peymana Versailles a di navbera Almanya û hevpeymanan de hat imza kirin, ji tevan girîngtir bû.

## ENDAMETÎ Û DAM Û DEZGÊN KOMELA GELAN

Bi vî awayî di sala 1919'an di Kongra Aşîtî ya Parîsê de Komela Gelan hat damezrandin û paytextê Swisre (Îsvîçre) Cenevre, bû bingeh, İngilîzî û Frensiz jî bûn berpirsîyarê wê ya giftugo û weşanên belgan. Du cur endamên komelê hebûn; damezrêner û helbijartî. Ew dewletên hevpeyman ên ku li Parîsê programa Komela Gelan îmza kirin û her wiha ew dewletên ku di salên Şerê Cîhanê yê Yekem de bê alî bûn, bê tu mercek (şertek), di navbera du mehan de wan jî eynî programê îmza kirin, bûn damezrênerên komelê. Hejmara endamên damezrênerên komelê ji 44 dewletan pêk dihatin, ji wan 31 dewletên hevpeyman û 13'yê din jî dewletên bê alî yên wek Swisre, Swêd, Norveç, Danîmarka, İspanya, İran û Arjantîn bûn.

Hejmarek dewletên din jî di pê hev de ji bo endametîya komelê hatin helbijartin, wek Almanya di sala 1926'an, İraq di sala 1932'yan, Yekîtîya Sovyet di sala 1934'an, Misir di sala 1937'an de hatin helbijartin. Heta vêketina agirê Şerê Cîhanê yê Duyem, hejmara endamên Komela Gelan gihîşt 58 dewletan.

Organên komelê ya herî bilind Komîta Giştî bû ku hemû dewletên beşdar ên komelê endamê wê bûn, divîya bi kêmasî salê carek di meha Îlonê de bicive.

Her çendîn dewletek dikarî hejmara nûnerên xwe bike sê kes, lê her mafê wan ê yek dengê hebû. Li ser daxwaza piranîya endaman di wextê pêwistîyê de, diviya Komîta Giştî bicive. Hemû biryarên girîng ên organên komelê dawîyê de diketin bin destê Komîta Giştî ku biryara wergirtina endamên nû û helbijartina sekreterê giştî yê komelê jî mafên wê yên serekî bû.

Her çendîn li gor rêzê encumen organê duyem a Komela Gelen bû, lê kar û barên wê ji ya tevan gelek bi qîmetir bû. Di rastîya xwe de encumen hêza aktîf a komelê bû.

Di destpekî de biryar wisa bû ku encumen ji neh endaman pêk bê, 5'ên wan daîmî û 4'ên wan jî demî (meweqqet) bin. Endamên daîmî nûnerên dewletên mezin ên hevpeyman ên serkevtî bûn, yanî İngîltere, Dewletên Yekgirtî yên Amerîka, Frensa, İtalya û Japonya. Çar endamên din, bi dor dihatin helbijartin.

Lê ev bûyera han wek hatî danîn neçû serî û çend guhertin tê de çêbûn. Ji ber gelek sebeban ku em ê dawîyê de bi kurtî behs bikin, Dewletên Yekgirtî yên Amerîka nebû endamê Komela Gelan, ji ber vê yekê cîyê wê di encumen û Komîta Giştî de vala ma. Çend salek berê Şerê Cîhanê yê Duyem hejmara endamên Encumena komelê bû 15 ku 9'ên wan demî û 6'ên wan jî daîmî bûn. Evên dawîyê ji Frensa, İngîltere, Yekîtîya Sovyet, Almanya û Japonya pêkdihatin(7). Diviya encumen bi kêmasî salê carek bicivîya. Demê din, li ser daxwaza piranîya endaman, çend car pêwîst bûya diviya ewqas biciviya.

Sekreterê Giştî û alîkarê organê sekreter, kar û barên rojane yên Komela Gelan cîbicî dikirin. Sekreterê Giştî ji alîyê encumen de dihat helbijartin û diviya ku dengê hemû endaman bigirta. Piştî vê diviya di Komîta Giştî de hemû yan piranîya endaman deng bidinê.

---

(7) Herçiqas, wek em ê di dawîyê de jî behs bikin, Japonya û Almanya li pê hev de, sala 1933'yan û İtalya jî piştî wan, sala 1937'an ji Komela Gelan kişîyan, lê ciyê wan ji ber hêvîya ku ji hespê Şeytanê peya bin û cardin vegerin nav komelê, vala ma.

Ji derveyê van tiştên ku me behs kirin, bi rêvebirina hejmarek komîte û organên din ên demî û cîbicîkirina beşek ji wezîfên komelê jî ketibûn ser milên Komela Gelan ku em ê di dawîyê de behs bikin.

## ARMANCA KOMELA GELAN

Li gor destûr û programê, diviya armanca yekem a Komela Gelan parastina aşîtîyê be, da ku cîhan tuşê facîakî metirsî ya wek Şerê Cîhanê yê Yekem nebe. Yek ji madên serekî ya programa komelê wiha digot: pêwîst e hewil ber bi her kar û fermanek re bê dan ku bê zanîn ev "aşîtîya gelan bi curekî aktîfî dijê şer û êrîşên şer diparêze".

Madek din a eynî programê, sebebê damezrandina Komela Gelan digihand ji bo pêwîstîya pêşdebirina alîkarîya navbera gelan û temînkirina bê tirsî û asayîşa wan". Pêwîstîya kêmkirina hêzên çekdar ên dewletan, madek din a programa Komela Gelan bû.

Li gor programa komelê dibû bi sebebê tehkîmê ve, yan di rîya encumen ve problema navbera dewletan bê çareser kirin. Ger encumen negihiştîya encamekê qayîlker, wî çaxî heqê endaman hebû her yek li gor nêrîna xwe beşdarîya wê meselê bikin. Her wiha programa komelê, abluka aborî û karanîna vê hêzê kiribû cezayê gunehkaran. Heta diviya encumen biryara dereca beşdarîya hêzê endamên komelê ji bo cîbicîkirina erk û van biryaran bide. Lê di sala 1931'an, li gor biryarekê taybetî, ji bo li hember rawestandina êrîşkeran, cezayê aborî kir "çekê serekî" ya komelê.

Beşek bi qîmet ji naveroka programa Komela Gelan, bi awakî wisa hatibû durust kirin ku firset û alîkarîyê dida destê hêzê dewletên mezin. Wek mîsal, ew madda ku behsa kêmkirina hêzê çekên cîhanê kirîye, bi awakî wisa pûç bû ku dibêje hemû dewlet, ji bo parastina hecma netewa xwe û cîbicî kirina erkên ser milên xwe, pêwîst e ewqas mafê wan dewletan bi hêzên çekdar hebe.

Durustkirina bi vî awayî programa komelê û çend rastîyek din, bûne sebebê piranîya kil û kêmasîyên vê dezga han a cîhanî ya girîng.

## KİL U KÊMASİYEN KOMELA GELAN

Wek me dît, di wextê Kongra Aşîtî ya Parîsê de, hemû alîyên desthilatdar, di keft û leftê de bûn ku Komela Gelan bikin bin destê xwe. Dema ku ev karê han ji bo Dewletên Yekgirtî yên Amerîka neçû serî, Washingron biryar da ku nebe endam [8]. Li ser vê biryarê yekem valatî ket bingeha Komela Gelan. Ji ber ku wê çaxê, Dewletên Yekgirtî yên Amerîka, mezintirîn hêza aborî û yek ji wan hêzên sîyasî yên aktîf ên cîhanê bû.

Di destpêkê de ji Almanya û welatên din ên mexlûb re rê nehate dan ku bibin endamê komelê. Her wiha Yekîtîya Sovyet jî ji wî mafî bêpar kirin. Hîn ji vî jî zêdetir, gelek caran Encumen û Komîta Giştî, bi taybetî û bi awakî gelek germ diketin behsa têkbirina nav Sovyetê. Di kêm behsên din de piranîya endamanên komelê bi vî awayî hevdeng bûn.

Welatê biçûk û yên bindest, gelek zehmet dibûn endamê Komela Gelan. Bi alîkarîya Frensa nebûya endametîya Hebeşîstanê qebûl nedikirin. Îraq piştî 10-12 û Misir piştî nêzîkî 17 salên xebata aktîf girtin[9]. Ev kil û kêmasî û şaşîtîyên Komela Gelan, netîca wê yekê bûn ku Frensa û İngilistan bibûn axayê mezin ên vê dezga han a cîhanî. Aşkera ye ewan jî li gor berjewenda xwe çawan bixwestina bi wî awayî problem derdixistin. Ji derveyê vê, armancek wan a din jî hebû ku dixwestin ji bo parastina rejima sermayedarî ya dijî tevgera şoreşgeran û Sovyetê Almanya bikin mertalek bi hêz. Ji ber vê yekê jî bê ku kes hêvî bike, roja yekê Îlona sala 1926'an rê dan ku Almanya

(8) Wê demê "Partîya Komarî" desthilatê girt dest û eva han jî bû sebekê din ji bo ku Dewletên Yekgirtî yên Amerîka nebe endamê Komela Gelan. Ev komela han bi rêveberîya W.Wilson ê serokê kevn ê komarê hatibû danîn. Wilson, nûnerê "Partîya Demokrasî" bû ku li gel "Partîya Komarî" re du bereyên sîyasî yên serekî yên Dewletên Yekgirtî yên Amerîka bûn.

(9) Ji bo dirêjahîya vê behsê binêre: Tarîxu'l Wezaretu'l-Îraqîyye ya Edurrezaq el-Hesenî. Her wiha Dr. Yunan Lebîb Rizq, El-Diblomasîyyetu'l Wefdîyye we 'Esbetu'l Umem-El-Sîyasetu'l Duwelîyye (kovar), Qahîre, hejmar: 34, sal: 1976, rûpel: 118-137.

him bibe endamê Komela Gelan, him jî cardin wek dewletek mezin bibe yek ji wan endamên daîmî yên Encumenê.

Bi rastî jî dewletên mezin ji bo Komela Gelan pir xem nedixwarin. Hemû bi başî têgehîştibûn ku komel nikare bibe dezgehek cîhanî ya aktîf. Roja 27'ê Adara sala 1933'yan , Tokyo bi awakî bêperwa xwe ji komelê kişand. Sebebê vê yeka han, tenê ji bo wê gilîya nerm a di netîca êrîşa eskerên Japon li ser Bakûrê Çîn bû ku ji alîyê komelê de lê hatibû kirin. Sal li ser de derbaz nebû, piştî ku Hîtler û Nazîyan desthilat wergirtin, Almanya jî roja 14'yê meha Çirya Yekem a eynê salê (1933) xwe ji Komela Gelan kişand. Problema derketina wan jî li ser wê yekê bû ku Encumenê biryara hilanîna wan beşên "Peymana Versaille" ku peyvendîya wan bi kar û barên eskerî yên Almanya ve hebû, neda. Ji vê jî zêdetir, sîyaset û armanca Hîtler di her halukarê de ji bo Almanya, dezgahekê wek Komela Gelan de li hev nedihat.

Piştî xwekişandina Almanya û Japonya, alozbûna rewşa sîyasî ya cîhanê bi sebebê Nazîyên Almanya, faşîstên İtalya û mîlîtarîstên Japonya , încar Sovyet hat bîra Londra û Parîs û bi pêşnîyara Fransa roja 15'yê Îlona sala 1934'an, 30 endamên Komela Gelan bi hev re daxwaz ji Sovyetê kirin ku bibe endam. Piştî sê rojan Moskova razîbûna xwe gîhand wan û bi vî awayî Sovyet bû yek ji wan endamên Encumenê ya daîmî. Lê di destpêka Şerê Cîhanê yê Duyem de, piştî vêketina şerê navbera Fînlandîya û Sovyet (1939-1940), cardin ev welatê han ji Komela Gelan hat dûrxistin.

Bi vî awayî em dibînin ku ew tovê ku li Parîsê ji bo Komela Gelan hat avêtin, ew ax û erda ku tê de perwerde bû ewqas musaît nebû ku berek baş jê bihata hêvî kirin. Ev rastîya han, bi alîkarîya xurt a dewletên mezin jî, bû sebebê sernekevtina komelê wek dezgahekê cîhanî. Li vir de ev yeka han tenê bes e ku em bêjin: hemû bi ser hev 21 sal li ser qewimandina Şerê Cîhanê yê Yekem de derbaz nebû, vêca dema ku cîhana xwedî rêxistinek wek Komela Gelan, çirîskên agirê şerekî hîn ji wî belavtir qewimî. Ji ber vê, da em bi kurtî carek bên ser behsa wan milên hêja yên jîyana gelan û cîhanê ku komelê nekarî rolek wisa tê de bilîze, ji ber ku heryek ji wan bûyeran bi curek rê

ji bo şerê nû yê cîhanê xweş kirin, ew şerê ku hewce bû Komela Gelan bi tu awayî rê ji bo destpê kirina wî nedaya.

## EW KARÊN KU KOMELA GELAN ÇARESER NEKİRİN

Ji destpêka sala 1920'an û heta pêçana dam û dezgên Komela Gelan di Nîsan sala 1946'an, yanî demek çarîk sedsal temenê Komela Gelan de, 66 meselên navbera dewletan ketin bindestê Komela Gelan. Lê, gelek mixabin nekarî çareyek girîng û hêja ji wan meselan re bibîne. Ev çend mîsalên jêrê çendek ji wan ên serekî ne.

**Yekem: Şerê Japonya û Çîn**

Dema dawîya sedsala 19'an Japonya ser xwe ve hat, jîyana aborî û imkanên xwe yên eskerî hinek ber bi pêş de bir, wek dewletek mezin hat naskirin û ji wê rojê şun de jî Tokyo çavê xwe berda ax û serwetên Çîn û Maçîna cîranê xwe.

Şerê Cîhanê yê yekem, hinek din Japonya dewlement kir. Wek belge li vir tenê em du nimûnan dixin li ber çav. Sala 1914'an heta sala 1919'an, qîmeta berhemên kel û pelên pîşesazîya Japonya, ji 13 mîlyar yenan[10] gihîşt 65 mîlyaran. Pênc car, yanî, sedî 500 zêdetir bû. Di bin çar sal Şerê Cîhanê yê Yekem de, yanî ji sala 1914'an heta sala 1918'yan, hecma bazirganiya Japonya li gel derve du car û nîv zêdetir bû û zîv û zêrekî bê hejmar di bankayên Tokyo de berhev bû. Ev yeka han bi derecek wisa bû ku êdî piranîya dewletên mezin ên Awrupayê ketin ji Japon pere deynkirinê[11].

Bi vî awayî Japonya, bi çavekê hesudî li Çîna dewlemend a paşkevtî dinêrîya. Ji ber ku fermanrewayên vî welatî dilxweş

---

[10] "Yen", perê Japonya ye. Qîmeta wî ber bi guherînê de ye. 300 yen, dolarek e. Yen, îro perê cîhanê yê herî bi hêz e. Li gor Banka Merkezî, dînarek nêzîkî 750 yen e.

[11] Piştî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Japonya duyem dewleta cîhanê bû ku feydeyek mezin ji wê rewşê wergirt ku Şerê Cîhanê yê Yekem anî holê.

bûn ku emperyalîst nabin asteng li ser riya wan. Hêzên çekdarên wan roja 18'yê Îlona sala 1932'yan ketin êrîşbirina ser Bakûrê Rojhilata Çînê. Di destpêkî de Çîn pişta xwe bi dewletên mezin girê da û xwest di rîya Komela Gelan re pêşîya vê destdirêjîya Japon bigre. Lê, komelê tiştek jê re nekir, biryarê wê yên di vî warî de bê lez û piştguh avêtin bû û her bi wî awayî jî man. Japon bêyî ku guhê xwe bidê, sala din navçên îşxalkirî de hukumetekê serbixwe damezrand.

**Duyem: Erîşa İtalya Li Ser Hebeşîstanê**

Dema ku faşîstan di dawîya meha Çirya Yekem a sala 1922'yan de, îqtidara Îtalyayê girtin destê xwe, dixwestin goya rojên borî yên Romayîyên desthilatdar zindî bikin û împaratorîyekê fireh û xurt damezrînin. Ji bo vê armancê, di her çar aliyan de slogana "Îtalya mezin" bilind kirin. Faşistan, ji bo ku Derya Spî ya Navîn, Derya Sor û beşekê mezin ê Afrîkayê têkin bin destê xwe, har bûn. Heta di xerîteyên xwe de, ne kêm û ne zêde, navê Derya Spî ya Naverast kirin "Derya Me".

Ji bo cîbicîkirina van armancên xwe yên fireh di Afrîka de, Îtalya faşîst berê hemû cîyek berê xwe da Hebeşîstanê û di destpêka sala 1935'an de bi navê serxwebûnîya Afrîka, destpê kir hêzên xwe anîn li ser sinorê vî welatî. Heta meha Tebaxa wê salê, Mussolînî ji bo şerê Hebeşîstanê 250 000 eskerên Îtalya û 750 000 eskerên welatên bindestê xwe wan navçan de civandin.

Ji sala 1923 pê ve Hebeşîstan yek ji endamên Komela Gelan bû. Wek me pêş de got, endametîya Hebeşîstanê li ser piştgirîya Frensayê ji alîyê wê dezgê de hat qebûlkirin.

Çi heye ku li gel van tevan de jî, heta roja Îlona sala 1935'an komele newêrîye giliya Hebeşîstanê bigre dest ku di roja 3'yê Kanuna Duyem a eynê salê dijî Îtalya pêşkêş kiribû. Yanî piştî heşt meh û rojek komele hay li vê yeka han bû.

Rast e, Komela Gelan li ser mesela Hebeşîstanê dereng biryarê abloqekirina aborî ya li ser Îtalya faşist da. Lê, bi alîkarîya Frensa û İngilistanê, neft û benzîn di vê lîsta han a kel û pelan de cî negirtin. Wî çaxî jî bi taybetî ji bo zivirîna

çerxa şerê faşistan, ji petrol û benzînê pê ve pêwîstîya Îtalyayê bi tiştek tune bû. Ji ber vê, biryara Komela Gelan a derbarê destdirêjîya İtalya faşist li ser Hebeşîstanê, qet feydek neda. Faşîstan xwe lê negirtin û heta bi awakî gelek hov welatê Hebeşîstanê yê fireh îşxal kirin. Di vî şerî de hejmara tenê yên ku ji ber bikaranîna gazên jehr hatin kuştin, digihîşt 275 000 kesan! Çi heye ku gelek di ser de neçû, di navek re, ser daxwaza Londra û Parîsê, Komela Gelan biryarê vê nîv abluqa aborî jî li dijî Îtalya rakir.

**Sêyem: Destêkirina Nazî û Faşîstan**
**Di Nav Kar û Barên Hindurî Ên Îspanya de**

Di rîya serxwebûnîya rasteqînî û mafê demokratîk de, di Nîsana sala 1931'an de gelê Îspanya şoreşekê mezin destpê kir ku nêzîkî heşt salan domand. Şoreşgeran, di destpêkê de destkevtinên mezin dest xistin û karîn komarekê serbixwe û demokratîk damezrînin. Vî karî han tirs xist dilê kevneperestên hindûr û yên derveyê welat. Gelek di ser de neçû, dijminan planekê ji bo xistina komara sava ya Îspanya saz kirin. Di Tîrmeha sala 1936'an de, agirê şerê birakujîyê li vî welatî hat vêxistin. Her çiqas berê vê, 27 dewletên Awrupayê biryarê dabûn ku kes dest têneke nav kar û barê hindûrî yê Îspanyayê, lê nazîyên Almanya û faşîstên Îtalya wek tev karên xwe yên din, xwe bi vê girênedan û di Tîrmeha eynê salê de ji bo serîhildana kevneperestên İspanya ketin birina çek û danîna hevpeymanên cur bi cur(12). Faşîst û Nazî bi vê yekê tenê neman, ji ber ku, ji bo armanca derêxistina reh û rêçên hêzên pêşkevtîxwaz ên Îspanya, dest avêtin bîlfîîl hêzên xwe yên çekdar jî birin. Hejmara wan çekdarên Almanya û Îtalya ku anîn Îspanyayê, gihîşt nêzîkî 300 000 kesan. Wisa lê hat ku di navbera 32 mehan de qet tu çek nema ku li dijî şoreşgerên Îspanya bikar ne anîn.

---

(12) Heta tank û firoke jî şandin (nota 11'an di orîjalê kitêbê de du car hatibû nivîsandin. Ji ber vê me nota 11'an a diwîyê kir 12 û notek jî zêdebû -Elîşêr).

Li gor naveroka programê, diviya Komela Gelan yekem dezge be ku li ser Îspanyayê dengê xwe bilind bike. Lê ji bo Almanya û İtalya biryara abloqakirina aborîyê jî neda ku ew li ber çavên tevan ketibûn veçirandina gîyana civakên xelkê İspanyayê. Dema ku di meha Çirya Duyem a sala 1936'an Komara Îspanya gilîya xwe pêşkêşê Komela Gelan kir, Frensa û İngilistan -bibe guhar bikeve guhê wan- karek wisa kirin, ku ne Encumen û ne Komîta Giştî nekarîn behsa İspanya bikin. Tenê komîtekê serbixwe damezrandin, ewê jî tenê biryarên dewletên Awrupayê dubare kirin ku guya nabe kes dest bike nav kar û barên hindurî yên Îspanyayê. Di rastîya xwe de ev biryara han tenê ji bo şoreşgeran çû serî, ji ber ku cepha wan ji peydakirina çekan bêpar ma. Ev yeka han demek wisa jî bû ku faşîstan li gor dilê xwe hesp dibezandin.

**Çarem: Destdirêjîyên Almanya Hîtlerî**

Ev cure rewşên Komela Gelan yek ji wan sebeban bû ku mil da ber Hîtler û Mussolînî da ku zêdetir ber bi pêş de gav bavêjin. Gelek li ser de neçû, nazîyan birek gavên tirsê avêtin ku evên han tev bi awakî aşkera li dijî çarçova programa Komela Gelan û naveroka biryar û peymanên Kongra Aşîtî ya Parîsê bûn. Almanya nazî bi curekê ku qet berê nehatibû dîtin ket çêkirina çek û tifaqên şerê û pêşdebirina hêzên cur bi cur. Tenê di navbera sê salên pêşîn desthilata Nazîyan de mesrefê Almanya ji bo kar û barên eskerîyê, ji mîlyarek mark gihîşt deh mîlyaran. Yanî deh caran zêdetir bû. Hejmara yekemîn sedî 2'yê û hejmara duyem jî sedê 17'yê hebûnên neteweyî yên Alman pêkdihat. Her di wan navan re hejmara cure çekê eskerên Almanya, ji dehan gihîşt 30 curan û di dawîyê de ev hejmarên han gelek zêdetir jî bûn. Di wextê xwe de li gor "Peymana Versaille" , diviya ku hejmara eskerên Almanya bi tu awayî ji 100 000'an zêdetir nebûya.

Dema ku kar gihîşt vê derecê, êdî Hîtler ji wê yekê silikatîyê nekir, cardin destpê kir hêzên xwe yên çekdar anîn navçên Ren a ser sinorê Frensa ku li gor Versaille hatibû bêçekkirin. Roja 7'ê Adara sala 1936'an, Hîtler ferman da ku

eskerên Reichstag a sêyem[13] bikevin nav axa Ren. Hêjayê gotinê ye ku wê çaxê hîn eskerên Fransa ji yên Almanya xurttir bû, her wiha di riya qanunî de jî mafê wê hebû ku pêşî li van pêşdeçûnên Almanya bigre. Dawîyê de ev yeka han jî derket ku Hîtler ferman dabû serekên eskerên xwe, gotibû ger Frensa bikeve bizavek nerizabûnê, ew yekser bê şer eskerên xwe paş de bikişînin. Lê ne Frensa û ne jî Îngîlterê ji derveyî ku bêjin "ev pêşdeçûyîna han a Hîtler ne li gor "Peymana Versaille ye" pê de, tiştek nekirin. Ji ber ku vê yeka han wek karekî tirsê ya ji bo destdirêjahiya aşîtiya cîhanê hesêb nekirin.

Rewşên dewletên mezin, berê hemûyan Frensa û Îngilistan, wisa kirin ku Hîtler hîn zêdetir ji xwe razî be. Tev li ser hev, salek ser de derbaz nebû, Adolf[14] Hîtler, di eynê meha sala bê de, yanî Adara sala 1937'an, welatê Avusturya îlhaq kir (helluşî-daqurtand)[15] û kir ser Reîcha sêyem. Tiştê ecêb ev yeka han bû; Londra, Parîs û hevpeymanên wan, îşxalkirina Avusturya meselek wisa nezanîn da ku bigrin dest û bikin bin destê Komela Gelan.

---

(13) Reich, ji gotina Almanî "Reichstag" hatîye girtin ku ji du gotinên hevedudanî pêkhatî ye: "Reich", yanî dewlet an împeratorî, li gel "tag" yanî kombûn an encumen e. Wek termînolojîyek sîyasî ji sedsala 12'an ve hatîye bikaranîn. Zêdetir tê mana parlamentoyê. Reichê Yekem û Duyem, du qonexên navbera sedsala 12'an û dawîya Şerê Cîhanê yê Yekem digrin. Reichê Sêyem, di sala 1919'an destpê dike û bi temambûna Şerê Cîhanê yê Duyem re diqede. Herçiqas Reichstag di bin sîyaseta Hîtler de, wek piranîya dezgên demokrasîyê yên din ên Almanya, ketîye sewîya nebûnê, lê çi heye ku li gel vê jî gelek dîroknivîsên dema Almanya Nazîyan bi "Reichê Sêyem" bi nav kirine. Navê kitêba bi nav û deng a Wilyam Chirer a di derbarê Almanya Nazî bi vê awayê ye: "Dîroka Almanya Hîtlerî, Damezrandina Reichê sêyem û Ketina Wê".

(14) Adolf navê wî û Hitler jî naznavê wî ye. Di eslê xwe de navê wî Adolf Schicklgruber e.

(15) Di dîrokê de ji vî karî re "enşilyus" dibêjin ku gotinek Almanî ye û tê mana xistina ser. Hellûşîn (daqurtandin, dabelandin-Elîşêr) Kurdî rastirîn gotine ji bo vî karî.

Cardin salek ser de derbaz nebû, yanê eynê meha sala din, yanî Adara 1939'an, Hîtler ferman da eskerên xwe da ku Çekoslovakyaya serbixwe jî îşgal bikin û bikin ser Reîch a Sêyem. Hêjayê gotinê ye ku Îlona sala 1938'an, Komîta Giştî ya komelê di civînê de bû, wê çaxê jî Almanya eskerên xwe li ser sinorê Çekoslovakya amade kiribû, vêca li ser vê jî vê beh-sa han nenanîn holê. Hewce ye ev yeka han jî bê gotin ku Çekoslovakya yek ji dostê herî nêzîk ên Frensayê bû.

**Pêncem: Ji Alîyê Îtalya Faşîst de Îşxalkirina Arnawudistan (Albanya)**

Wek Hîtlerê hemfikrê xwe taqeta Benîto Mussolînî nedi-gihîşt. Eger ji wî kêmtir nedikir. Xwedê jê re nehêle, lê ewî jî kêm nekir. Wek me di serpêhatîyên hedîsên Hebeşîstanê de dît, destdirêjahîyên Hîtler, Mussolînî zêdetir şidand. Ji bo ku Arnawudistan serbixwe heleqek qels a Awrupayê bû ku demek bû wî çav berdabûyê.

Faşîstên Îtalya, tenê bi vê neman, ji ber ku di salên bîstan ve Arnawudistan kiribûn welatekî nîv bindest û di wê demê ve xeyala îşxalkirina wî kiribûn serê xwe. Di vê bûyerê de faşîstan ne qîmetê bi rayagiştî û ne jî Komela Gelan dan. Li ser destûra Japonya û Almanya, Îtalya jî di sala 1937'an de, xwe ji Komela Gelan kêşa. Gelek di ser de neçû eskerên faşîst, bêperwa li ber çavên hemûyan, di Nîsana sala 1939'an de, Ar-nawudistan îşxalkirin. Mussolînî da xuyakirin ku ev welatê han hemû her tim beşek ji dîroka Îtalya bû!

Bêdengîya Komela Gelan û yên dewletên mezin li hemberê van destdirêjîyan, curek pêşkêşkirin bû ji bo Japonya, Italya û ji hemûyan jî zêdetir ji bo Almanya Nazî. Li ba wan, wisa bû ku bi vî awayî Hîtler ji Rojava dûr bixin û mil bidin çûna wî ya ber bi Rojhilat ve[16]. Lêbelê gelek di ser de neçû, zeman îspat kir ku ew heta çi derecê ber bi şaşîtîyê de çûn. Bi van cur rewşan, Hîtler bêhed ji xwe razî bû, wisa dizanî ku kes nîne bikare mil bide milê wî.. Her bi vî awayî jî riya ji bo hilkiri-

---

(16) Mebest, Rojhilat û Rojavayê Avrupayê ye.

na agirê Şerê Cîhanê yê Duyem xweş bû, ew şerê ku wek me got; divîya Komela Gelan rîya destpê kirina wî nedaya.

Ger wiha be -ku wiha jî bû- Komela Gelan dezgehekê cîhanî ya sernekevtî bû. Lêbelê li gel vê de jî, tenê bi serê xwe damezrandina vê dezgê gavek bû ji bo rojên pêş ên jîyana giştî ya însanan. Ji derveyê vê, Komela Gelan her bi çi awayî be, karî hejmarek problemên nav dewletan çareser bike, bi taybetî di salên 20'an de, yanî destpêka jiyana xwe de.

## EW KARÊN KU KOMELA GELAN ÇARESER KİRİN

Ew meselên ku Kongra Aşîtî ya Parîsê firset nedît temam bike, sipartin Komela Gelan. Piranîya beşek ji wan meselên berhev bibûn, rîya çareserîkirina wan hatibûn dîyar kirin, ji ber vê yekê komelê heta derecek ewan bi zû û rehet çareser kir. Beşekê din jî ku peywendîya dewletên emperyalîst pê ve nebû, ji ber vê jî gelek zû hel bûn.

Di nîvê pêşîn a salên bîstan de Komela Gelan mesela sînorê navbera Arnawudistan-Yugoslavya, Yunanîstan-Bulgarîstan, Lîtvanya-Polonya û Iraq-Tirkîyê û her wiha çarenivîsa Salîzya Bakûr, netîca çarenivîsa navça Sarî Almanyayê di riya dengdanê ve çareser kir. Grava (cezîreya) Korfo jî ku Îtalîya zeftkiribû, da destê Yunanîstanê. Bi eynî destûrê daxwaza Swêd a ku dixwest Grava Alandê ya nav Derya Baltikê ji Fînlandîya bigre.

Hejmarek dezgên serbixwe yên Komela Gelan kêm an zêde xizmet kirin. Yek ji wan dezgan "Rêxistina Cîhana Kar" bû (17). Li gor programa vê rêxistinê, diviya ku ev rêxistina han ji bo bilindkirina sewîya jîyana karkeran, nehiştina bêkarîyê, tesbîtkirina sewîyek maqûl ji bo kirê, parastina karê zarok û jinan û qebulkirina damezrandina sendîkên serbixwe yên karkeran hewil bide û kar bike.

"Rêxistina Cîhana Kar", tiştek wisa zêde ji bo karkeran nekir, bi taybetî ji bo karkerên welatên paşdemayî. Carên wisa

(17) Yanî "Munezzemetu'l 'Emelu'l-Dewlîyye".

hebûn ku di dezge yan civînên giştî yên vê rêxistinê de, ji sê kesên ji wan welatên endamên Komela Gelan ve heyet pêk dihat. Dibûya yek ji wan nûnerê karkeran, yek nûnerê sermayedaran û kesê din jî nûnerê hukumeta wî welatî bûya.

Ji bo ronîkirina vê meselê, tenê em dikarin vê mîsala han a 'ecêb bidin ku gelek caran kesên wek Cafer Eskerî, civînên rêxistina kar ên ji bo helkirina hinek meselên karkeran çêdikir, dibûn "nûnerê" karkerên wan welatan(18). Li gel van tevan jî, em dikarin bêjin tenê damezrandina "Rêxistina Cîhana Kar" destkevtinek hêja bû, ji ber ku sewîya pêşdeçûyîna tevgera karkerên cîhanê nîşan dida, ew tevgera ku qet alîgirên wê tunebûn heta li hemberê van kil û kêmasîyan çav bên girtin.

"Rêxistina Tenduristî ya Cihanê", "Mehkema Edalet ya Nav Dewletan" a Laheyê û "Komîta Kêmayetîyan"(19) dezgên din ên Komela Gelan bûn ku her wiha navê tevan li ser e.

## NETÎCA KOMELA GELAN

Roj bi roj Komela Gelan ber bi sistbûnê de diçû. Berê Şerê Cîhanê yê Duyem destpê bike, komele bêdeng bû û tenê sîya wê mabû. Wisa lê hatibû ku kesekî êdî guhê xwe nedidayê. Her çiqas Komela Gelan wek qanunî heta roja 18'ê Nîsana sala 1946'an ma jî û piştê dawîya meha Tîrmeha sala 1939'an şûn de, bi tu awayî dezgên wê necivîyan . Vê roja han, endamên komelê ji bo cara dawîyê li Cenevrê civîyan, dam û dezgên wê dan hev û erkên wê sipartin Koma Milletan ku ji wir şun de êdî wek dezgehekê cîhanî cîyê Komela Gelan girt.

---

(18) Ji bo dirêjahîya vê behsê binêre: Dr.Kemal Mezher Ehmed, El-Tebeqetu'l-'Amîletu'l-Îraqîyye, el-Tekewwun we Bîdayatu'l-Teherruk, Beyrut, 1981.

(19) "Munezzemetu'l Sihhe'l-Alemîyye", "Mehkemetu'l 'Edlu'l-Duwelîyye" û "Licnetu'l 'Eqellîyye".

# KURD Û KOMELA GELAN

Gelek car navê Kurd û Kurdistanê ketîye bin destê Komela Gelan û dezgên wê. Bedirxanîyan, Şêxên Berdeqareman, Hepsexan(20) û hejmarek din ji welatparêzan, çendîn car rapor û namên taybetî pêşkêşê vê dezga cîhanî kirine. Roja îmzakirina peymana sala 1930'yan a li ser Îraqê ya ji alîyê Îngilîzên dagirker de, piştî qewimandina herî mezin û ya dil şewitandî ya roja 6'ê reşê Îlonê, welatparêzên Kurd birek telgraf û namên protestoyê şandin Cenevrê. Li ser meselên wek van, gelek caran Bedirxanîyan jî zû bi zû dengê Kurdan digîhandin rêvebirên Komela Gelan. Lê ji hemû wextan zêdetir dema civînên ser mesela Musilê, navê Kurdan ket ber destê endamên Komela Gelan û dezgên wê.

Berê Şerê Cîhanê yê Yekem bi hemû wan navçan ve ji Kurdistana Başur re "Wilayeta Musilê" dihat gotin ku beşek ji Împeretorîya Osmanî ya fireh bû. Nîvê sala 1917'yan, eskerên Brîtanya ji be daxwaza dagîrkirina vê melbendê çend milan de ber bi Bakurê Bexdayê ve ketin rê(21). Dema ku di Çirya Duyem a sala 1918'yan de "Agirbesa Mondrosê"(22) dawî bi şerê navbera dewletên hevpeymanan û Împeretorîya Osmanî anî, hîn eskerên Îngilîz 12 mîl ji Musilê dûr bûn. Dawîya şer û ser serkevtina Kemalîstan, Tirkiyê vê yeka han ji bo "doz kirina" Wîlayeta Musilê kir bahane. Bi vî awayî meselek navneteweyî peyda bû ku bi navê Mesela Musilê ket nav belge û rûpelên dîrokê(23).

---

(20) Mebest, Xwedê jê razî be, Hepsexanê Neqîb e.

(21) Li gel destpêkirina Şerê Cîhanê yê Yekem eskerê Îngilîzan ji Başûr ve ket îşxalkirina axa Îraqê, heta roja 11'yê Adara sala 1917'an gihîşt Bexdadê û piştî vê vêca ber bi Kurdistanê ve ket rê.

(22) Agirbes, yanî "Hedne".

(23) Ji bo dirêjahîya vê behsê binêre: Dr.Fadil Huseyn, Muşkiletu'l Mûsil, Dirasetu Fî'l-Dîplomasîyye'l-Îraqîyye -el-Îngilîzîyye -el-Tur-kîyye we fî'l-Re'yî'l-'Am, el-teb'etu'-ûla, Bexdad, 1955, rûpel: 336. Ev kitêba han teza doktora wî ye, sala 1952'yan pêşkêşê

Mesela Musilê, bû yek ji wan behsên serekî û ket nav rojeva Kongra Lozanê ku li dor û berê dawîya Çirya Duyem a sala 1922'yan, ji bo daxwaza îmzakirina peymanek nû ya di şûna Peymana Sewrê, di navbera Kemalîstên Tirkîyê û dewletên hevpeyman de çêbû. Li vir de Lord Curzon ê nûnerê Brîtanya û Îsmet Înonû (İsmet İnönü) yê nûnerê Tirkîyê, bi du qolî ketin nav behsa çarenivîsa Wilayeta Musilê û heryek ji wan ber xwe ve hewil dan ku Kurdan bikin jokerê birina lîstika xwe. Dema vê yeka han feyde neda û negihîştin netîceyek, Lord Curzon(24) ku wî wextî Wezîrê Derve ya Brîtanya bû, roja 25'ê Kanuna Duyem a sala 1923'yan, nameyek taybetî ji Sekreterê Giştî yê Komela Gelan re şand û jê daxwaz kir da ku mesela Musilê têke nav lîsta karê Encumenê. Piştî vê, Înonû naçar bû heta dereceyek hinek paş de gav bavêje. Ji ber vê, herdu alî bi hev re qerar dan ku vê mesela han di navbera neh mehan de bi xwe helbikin. Ger herdu alî di navbera vî wextî de nikaribin bigihîjin netîceyek, wê çaxê vê meselê bidin destê Komela Gelan.

Her çiqas nunerê herdu milan çendîn civîn û muzakere di vî warî de kirin jî, bê ku Tirkîye û Brîtanya Mezin bigihîjin netîceyek, roja 5'ê Hezîrana sala 1924'an, ev neh meh temam bûn. Dema ku kar gihîşt vê nuqtê, roja 6'ê Tebaxa sala 1924'an Londra ji Sekreterê Giştî yê Komela Gelan daxwaz kir da ku bê paş de avêtin Mesela Musilê bêxe ber destê Encumen. 11'yê meha Tebaxa eynê salê, yanî tenê piştî pênc rojan, di bin rêvebirîya karên komelê de Mesela Musilê kirin nav lîsta karê Encumen û endamên komelê, di vî warî de Tirkîyê agahdar kirin.

---

Unîversîta İndiyana ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê kir. Çend sal şun de çapa wê ya duyem jî hat weşandin. Ji bo lêkolîna çend milên girîng ên dîroka hevdemî ya gelê Kurd, serokanîyek hêja ye.

(24) Lord Nathaniel Curzon (1859-1925) yek ji wan mirovên sîyasî yên bi nav û deng ên İngîltere ye, ji dawîya sedsala 19'an heta destpêka sala 1924'an Wezîrê Derve bû, bi vî awayî rola wî di "Mesela Mûsilê" û çarenivîsa Kurdan de mezin bû.

Di civîna roja 30'yê Îlona sala 1924'an de, Komela Gelan biryar da ku Mesela Musilê bispêre komîtekê taybetî ya ji sê kesan pêkhatî û mehek şun de jî navê wan bi vî awayî dîyar kir:

**Yekem: Karbidestê wezareta derve ya Swêd, Einer af Wirsen ku li Romanya konsolos bû.**

**Duyem: Sîyasetvan û zanayê coxrafya, Paul Teleki, navek re serokwezîrtîya Macarîstanê kirîye.**

**Sêyem: Zabitê (subay) teqawîd ê Belçîkî, A.Paulis.**

Yê yekem, yanî Wirsen, bû serokê komîtê, hejmarek sekreter û alîkarên şareza jê re hatin dayîn.

Diviya ku komîta Komela Gelan gişt wan belgên ku peywendîya wan bi milên cûda cûda yên jîyana netewî, civakî û aborî ya bi mesela Musilê ve heye, bikole. Her wiha hewce bû endamên wê biçin navçên cûda yên "Wilayeta Musilê" û di nêz ve peywendî li gel nûnerên grubên cur bi cur ên li wir rûdinin deynin, pişt re kurtîya netîca kar û pêşnîyarên xwe di raporek serbixwe de pêşkêşî komelê bikin.

Ji bo cîbicîkirina vî karî, endamên komîtê serî li Londra, Bexdad, Stenbol û Enqerê(25) dan û piştî vê, dawîya meha Kanuna Duyem a sala 1925'an çûn navçên "Wilayeta Musilê". Roja 27'ê wê mehê gihîştin bajarê Musilê bi xwe. Piştî çend rojan endamên komîtê û alîkarên wan cûda cûda çûn bajêr û qesebên din ên navçê, li Hewlêr, Kerkûk û Silêmanîyê bi taybetî man û bi gelek kesan re peywendî danîn. Meha Nîsanê vegerîyan Cenevrê û li vir dest bi nivîsandina rapora xwe kirin. Roja 6'ê Tîrmeha sala 1925'an dawî pê anîn û pêşkêşî endamên Komela Gelan û hejmarek rojnamevanan kirin.

Hêjayî gotinê ye ku nênerên Tirkîyê û Brîtanya jî bi endamên komîtê re hatin. Tirkan, aşkera ye ji bo armancên xwe û berê her tiştî jî ji bo xwe nêzîkkirina Kurdan, Fetah Begê xizmê Şêx Mehmud li gel xwe anîn.

---

(25) Roja 16'yê Kanuna Duyem a sala 1925'an endamên komîtê gihîştin Bexdadê û piştî deh rojan,ji vir çûn Musilê û vêca ketin gerîna navçên Kurdistanê.

Munaqeşe, biryar û mercên Komela Gelan ji bo dîyarkirina çarenivîsa "Wilayeta Musilê" heta dereceyek aşkera ye û têt zanîn. Em dixwazin di vê gotarê de taybetî li ser vê rapora han a ku wê komîtê amade û pêşkêşî komelê kirîye bisekinin û bal bikişînin ser ku navê wê wiha ye:

**"Komela Gelan.**

**Mesela Sînorê Navbera Tirkîyê û Îraqê.**

**Ev rapor ji alîyê wê komîta ku li gor biryara roja 30'yê Îlona sala 1924'an a ji alîyê Encumen de hatîye damezrandin, pêşkêşî Encumen bûye"**(26).

Rapora komîta lêkolîna li ser Mesela Musilê, ji zanyarîyên gi-rîng yên di warê sîyasî, aborî, civakî û coxrafî pêkhatine ku beşek ji wan ji serokanîyên bi bawer wergirtine û beşa din jî, endamên komîtê bi xwe berhev kirine. Zanyarîyên vê beşa dawîyê, endamên komîtê yan bi çavên xwe dîtine û nivîsîne yan jî di riya hejmarek mamostên şareza yên unîversîtên bi nav û deng ên cîhanê ve zanîne. Ji ber vê, ev rapor di yekem roja belavkirina xwe de bûye serokanîyek rojane ya lêkolîna gelek milên jîyana Kurdan ya nû û hevdemî. Kurdnasan gelek car di berhemên xwe de ji zanyarîyên vê raporê îstîfade kirine.

Çi kesê ku bixwaze behsa jîyana derebegî, koçerî, eşayîrî, peywendîyên aborî û 'urf û adetên civaka navçên fireh ên Kurdistanê bike, pêwîst e serî li naveroka rapora komîta lêkolîna mesela Musilê bide ku birek nêrînên sîyasî yên hessas tê de ne... Hêjayî gotinê ye ku nivîskarên raporê çend caran behsa peywendîya biratîya navbera Kurd û Îsayîyan kirine û vê yeka han qebul kirine ku di vî warî de tu gelek din ê Musilman nîne ku bikaribe bibe wek Kurdan(27).

Cardin gelek car navê Kurdan û Kurdistanê di wê rapora taybetî ya hêja de heye ku Îngilîzan di navbera salên 1920 û

---

(26) Eva han jî navê wê yê Îngilîzî ye :

(League of Nations. Question of the Frontier between Turkey and Iraq. Report submitted to the Council by the Commission instituted by the Council resolution of September 30, 1924), Geneva, 1925.

(27) Ibid, PP. 46-47

1932'yan de, çend car bi awayê çapî derbarê kar û barên îdarekirina Îraqê de pêşkêşî Komela Gelan kirine. Ev raporên han jî îro bûne serokanîyên rojane yên lêkolîna dîroka hevdemî ya hemû Îraqê û gelek zanyarîyên bi feyde û girîng derbarê alîyên cûda yên jîyana Kurdan tê de hene.

Qismên serekî yên heryek ji wan raporan, ji bo Kurdan amade kirine. Wek mîsal di rapora yekem de ku di derbarê rêvebirina kar û barên Îraqê yê navbera meha Çirya Yekem a sala 1920'an û meha Adarê ya sala 1922'an de ye(28), behsa kuştina Mister Bil û Kapiten Skoti tê kirin. Ev herdu kes di meha Kanuna Yekem a sala 1919'an de ji alîyê şoreşgerên Kurdên navça çîyayî ya Hewlêrê ve hatibûn girtin. Her wiha behsa kuştina Kapiten Salmon jî tê de ye ku zabitê sîyasî yê Kifrî bû û di destpêkî de ji alîyê Kurdan ve hat esîr kirin, pişt re jî hat kuştin(29).

Eynê rapor bi kurtî behsa Kongra Qahîrê û sîyaseta Îngilîzan a hemberê Kurdan, beşdarnebûna xelkê Silêmanîyê li "helbijartina" Feyselê Yekem, kirîye. Ya yekem, yanî di Kongra Qahîrê, meha Gulanê ya sala 1921'an de di bin çavdêrîya W. Churcill de civîya ku ew wê çaxê Wezîrê Kolonîyan bû. Endamên "Kongra Qahîrê" di derbarê Îraqê de çar behsên serekî lêkolîne:

**Yekem: kêmkirina vêrgîya Brîtanya Mezin li Îraqê.**

**Duyem: behsa wan kesên ku xwe ji bo textê paşatîya Îraqê amade kirine.**

**Sêyem: Mesela Kurd.**

**Çarem; Rewşa eskerên Îraqê yê rojên pêş (dahatû).**

Her çiqas Kongra Qahîrê qîmetek zêde da mesela Kurd jî lê guhertinek bi wî awayî di sîyaseta Îngilîzan a hemberê wan nehat holê.

Rûpelên 68 û 69'an ên vê rapora sala 1920-1922'yan, ji bo tefandina serîhildana Eşîreta Surçî ya dijî Îngilîzên dagirker

---

(28) Report on Iraq administration, October 1920 - March 1922), London, 1923.

(29) Rojên "Şoreşa Bîstan"de Kapîten Salmon (Captain Salmon) ji alîyê mirovên Birahîm Xanê Delo ve hat kuştin.

amade kirine. Ev serîhildana han dor û berê dawîya sala 1921'an destpê kir, Îngilzan heta destpêka sala hatî nikarîn bi tevayî wê serîhildanê bitefînin. Li gor zanyarîyên vê raporê, hejmara şoreşgerên Surçî digihîştin 600 kesan ku wek dibêje, nêzîkî 200 eskerên Tirkan bi topên xwe ve alîkarîya wan dikirin. Ew hêza eskerî yên Îngilîzan berdan canê şoreşgerên Kurd, ji hezar eskerên lîwa pêk hatibû ku ji derveyê du zabitan pê ve yek ji wan Îngilîz nebûn. Wisa dixuyê şerê navbera herdu alîyan du roj ajotîye, Tirkan tenê roja yekem beşdarî kirin û ji wir şun de şoreşgeran terk kirin. Li gor vê raporê piştî vê, Surçîyan, baş berxwedan, lê naçar bûn xwe paş ve bikişin. Wekî hatîye nivîsandin zerarê wan 20 kuştî, 70 birîndar, kavilkirina hejmarek gund û girtina du-sê kerî mî û bizin bûne.

Dawîya vê rapora sala 1920-1922'yan de rastîyek dîrokî ya biqîmet hatîye weşandin. Dibêje, Îlona sala 1921'an de, hejmarek sereskerên şareza yên Îngilîzan gihîştin Îraqê û destavêtin beşek piranîya hêzên xwe yên girêdayê lîwaya navçên Firatê birin Kurdistanê. Lêbelê, "gelek mixabin heta dema nivîsîna vê raporê nikarîne qet yek eskerek lîwayê li Dîwanîye, Semawe û Nasirîye bileqînin", ji ber ku, wek dibêje, hemû melbendên Firatê bi esker nedihatin kontrol kirin. Ev gotinên han dereca belavbûna tevgera rizgarîxwazî ya Kurd a dijî Îngilîzan û qîmeta xebata bi hev re ya di nav sinorê yek welatî de bi aşkera ronî dikin. Rast e heta roja nivîsandina wê raporê, dagirkeran karîbûn Şoreşa Bîstan li Başûr û herêma navîna welat de bitefînin, lê, ew sê bajarên ku navê wan derbaz bûn hîn ji çeng û perrên xwe neketibûn, ji ber vê Îngilîzan nekarîn hemû kûçikên xwe yên har berdin gîyana welatparêzên Kurdan.

Di eynî raporê de navê Şêx Mehmud, Simaîl Axayê Şikakî (Simko), Mehmud Xanê Dizlî, Ebdurrehman Axayê Serokeşîra Şirnaxî ya Kurdistana Tirkîyê û hejmarek navdarên din ên Kurd derbaz dibin(30). Wek mîsal derbarê Şôx Mehmud û Mehmud Xanê Dizlî yê mezinê Hewramanan wiha dibêje:

---

(30) (Report on Îraq administration, October 1920 - March 1922), PP. 103.

"Li navça Silêmanîyê propagandayek gelek zêde li dijî Brîtanya kirîye.. Sala 1919'an Mehmud Xanê serokê gundê Dizlê, beşdarîya Tevgera Şêx Mehmud kir û sala 1920'an hukumeta Îranê wî esîr girt û dan destê karbidestên Brîtanya (li Îraqê-K.M.). Piştî vê, demek li Hindîstanê girtî ma, Îlona sala 1921'Yan îzna wî dan ku vegere Silêmanîyê, lê bi wê şertê ku soz bide neçe milê Îranê. Lê. Mehmud Xan sozê xwe bicî nenanî, vegerîya Dizlê û ji wir namek ji Mustefa Kemal re şand, ji bo ji navçên Silêmanîyê derêxistina Îngilîzan daxwaza çekan jê kir. Di Kanuna Yekem de hejmarek serokên mezin ên Hewraman ku bêguman peywendîya wan li gel wî hebû, hatin Deşta Helebçê û ketin berhevkirina bacê. Nîvê meha Kanuna Duyem (sala 1922-K.M.) hêzekê Lîwayê ket nav kemîna wan û hejmarek ji wan hatin girtin ku yek ji wan zabitê Brîtanya Kapitan Fîtzgîbbon(31) ê fermandê wê hêzê bû. Piştî vê, Brîtanya bi hêzên xwe yên piyade û bi firokan (teyaran) ve êrîş kirin ser Helebçê. Netîca vê êrîşê gelek serkevtî bû. Mehmud Xan bi naçarî vegerîya gundê Dizlê, lê mirovên wî li ser êrîşa Deşta Helebçê neşikestin. Erîşên firokan ên meha Adarê Mehmud Xan mecbur kir da ku peywendî bi karbidestên Îngilîzan ve deyne.

Kesên ku beşdarê Şoreşa 1919'an a Şêx Mehmud bûn ev kes bûn: Şêx Qadirê birayê wî, Xerbîyê Şêx Arifê xizmê wî û Şêx Ehmedê mirovê wî (ev di meha Gulanê de hat berdan). Ê yekem û duyem niha li Bexdayê ne, herçî Şêx Ehmed e rê dan ku yekser vegere Silêmanîyê. Şêx Mehmud û Şêx Herbîyê kurê Şêx Maruf, di meha Kanuna Duyem de ji Hindîstanê anîn û niha wek multecîyên sîyasî li Kuweytê ne û hêviya vegerînê ne ji bo Silêmanîyê"(32).

Di cîyek din ê eynî raporê de, derbarê xwendevarîya wê çaxê ya Kurdistanê de vê rastîya han daye dest; dibêje di Îlona sala 1921'an de sinifek navendî (orteoqul) li Silêmanîyê vekirin, lê, ji bo ku tenê sê xwendevaran serî lêxistibûn, pêşnîyar

---

(31) Captaîn Fitzgibbon

(32) (Report on Iraq administration, October 1920 - March 1922), PP. 116-117.

kirin da ku biguherînin bajarê Kerkukê(33). Wek em ê di dawîyê de jî behs bikin, xwendina Kurdî, di bin sîya Îngilîzan de, ji çaverîya ku jê dihat kirin jî kêmtir pêşkevt.

Di raporên piştî vê de ku Îngilîzan derbarê kar û barên Îraqê yên navbera Nîsana 1922'yan û Adara sala 1923'yan dane Komela Gelan(34), em bi dirêjî behsa rewşa Kurdan hemberê "helbijartina" Feyselê Yekem, alozîyên navça Helebçê û Hewraman, kuştina M.Mott (35), rewşên cûda yên serokên Caf û Pêşder derbarê Şêx Mehmud de, aktîvîtên Kemalîstan di nav Kurdên Îraqê de, serîhildana Kerîm Begê Fettah Begê Hemewendî, kuştina Kapiten Bond(36) û Kapiten Makkant(37) ji alîyê şoreşgerên Hemewendê ve û gelek behsên hêja yên wek van dixwînin(38).

Eynê rapor bi dirêjî behsa wê kirîye ku çawan di bin serîhildana şoreşgeran û nerazîbûna xelkê de, Îngilîz naçar bûn roja 5'ê Îlona sala 1922'yan bajarê Silêmanîyê û hemû wan navçe û melbendên ku ketine Bakurê Hewlêr-Kerkuk-Kifrî berdin . Îngilîzan wê rojê 67 karbidestên xwe ji Silêmanîyê bi firokan birin Kerkukê, rêvebirina kar û barên bajêr sipartin wê encumena ya ku demek berî nûnerên danîştiwanên bajêr helbijartibûn(39).

Cardin eynî rapor bi firehî behsa çend alîyên girîng li ser vegerîna Şêx ji Hindîstanê dike. Di vir de rapor bi sernivîsa "Wergirtina Desthilatê ji Alîyê Şêx Mehmud de û Planên Wî li Gel Tirkan", behsa peywendîya nihênî ya Şêx Mehmud di

---

(33) Ibid.

(34) (Report on Îraq administration, April 1922 - March 1923), London 1924.

(35) Lieutenant M.Mott.

(36) Captain Bond

(37) Captain Makkant

(38) ((Report on Iraq administration, April 1922 - March 1923)), PP. 33-34.

(39) Ibid, P.35.

riya Özdemir Paşa ve(40) li gel Kemalîstan kirîye. Di vî warî de vê rastîyê dibêje; Kemalîst li gel Şêx dilpak nebûn, ji ber ku dixwestin wî bikin jokerê cîbicîkirina armancên xwe(41). Vê raporê gelek zanyarîyên hêja di derbarê vê behsê û çalakîyên berfireh ên Kemalîstan di nav Kurdên Îraqê de parasti ne.

Di çend cîyan de, rapora sala 1922-23'yan, bi aşkera behsa wan kirinan kirîye ku firokên şerî yên Brîtanya di rikoya Şêx Mehmud û Kemalîstan de, çi li daniştiwanê bêguneh ên Kurdistanê dikirin. Ez bawer nakim di wan deman de li tu qunceki din ên welatê berfireh ên bindestê Îngilîzan de, bi rada Kurdistanê çekên cur bi cur, bi taybetî firoke, hatibin bikaranîn. Londra van karên han wek bûyerek tebî'î di raporên xwe yên taybetî de dixist ber destê dezga Komela Gelan û endamên wê.

Eynî bi vî awayî xebata gelê Kurd, bi taybetî Tevgera Şêx Mehmud, gelek rûpelên raporên piştî van tejî kirine ku ji bo behsa kar û barên Îraqê ji Nîsana sala 1923'yan û heta Kanuna Yekem a sala 1924'an amade kirine(42). Di wan raporan de çend car behsa ji alîyên firokên Brîtanya Mezin ve bombebara-

---

(40) Özdemir Paşa zabitekî (efser, subay) mezin ê Tirkan û alîgirê Mustefa Kemal bû. Özdemir naznavê wî bû, navê wî bi xwe Elî Şefîq û xelkê Misrê bû. Hezîrana sala 1922'yan şun de Kemalîstan li gel hêzekê esker ve şandin Rewandizê. Özdemir, bi hezar û yek gotinên şêrîn ên derew ve karî bû di nêz de peywendî li gel gelek serokê Kurdan re deyne. Çalakîyên Özdemîr û alîkarîya wî li gel serokên Kurdan û bi taybetî li gel Şêx Mehmud, bi tevayî Îngilîzan bêzar kiribû. Özdemir, qasek şûn de naçar ma paş de bikişe. Eger di wê rewşa alozî de Kemalîstan bi dilek pak alîkarîya Kurdan bikirana, wê bikaribûna cîyê piyê Îngilîzan bi tevayî bişemitînin. (Özdemir Paşa yê bi navê Özdemir Bey jî ku dihat nasîn yarbayê mîlîsan bû. Li ser navê Kemalîstan bi Şêx Mehmut re dizî li hev kiribû. Di Nîsana sala 1923'yan de dema ku li hemberê Îngilîzan mexlûb bû pena bir ber Îranê-Werger)

(41) ((Report on Îraq administration, April 1922 - March 1923)), P. 39.

(42) ((Report by His Britannic Majesty's Government on the administration of Îraq for the Period April 1922 - December, 1924)), London, 1925.

na Silêmanîyê, Helebçê û cîyên din ên Kurdistanê , kirine. Li gor rapora wan bi xwe, bombebarana roja 25'ê Gulana sala 1924'an xelkên Silêmanîyê naçar kirin ku bajêr terk bikin, wek dibêje; dema ku Îngilîzan îşxal kirin, ji 20 000 nifusê tenê 700 kes tê de mabûn. Piştî du mehan vêca nîvê xelkê bajêr dest avêtin vegera ser mal û avahîyên xwe, lê heta meha Çirya Duyem hejmara wan negihîşt wek berî(43).

Ji derveyê behsa rewşa Kurdan li Iraqê, rapora sala 1926'an (44) bi taybetî behsa Simko jî kirîye. Di vî warî de wiha dibêje:

Simkoyê Simaîl Axa : Dor û berê dawîya meha Çirya Yekem Simkoyê Simaîl Axa yê serokê Eşîra Şikakan ku bi navê Simko têt naskirin, dijî Hukumeta Îranê şoreşekê berpa kir, lê di wî şerê ku nêzîkî Dîlman de qewimî bû de zora wî çû û bi naçarî bi sed mirovên xwe ve pena anî ber Iraqê û piştî vê bi riya Tirkîyê ve, nêzîkî Nêhrîyê, ji sinor derbaz bû û hat navça Rewandizê ya ser Hewlêrê.

Îran dawa li Iraqê kir ku Simko bi dilî bidê, lê Iraqê mil neda ber vê daxwazê, ji ber ku qanuna penaberîtî ya Iraqê musa'eda paşvedana penaberan nedikir. Li gel vê jî Hukumeta Iraqê ji bo axaftina li gel Simko û bi şertên ku Iran wî 'ef bike, rê dan Îranê da ku zabitekî xwe bişînin nav axa Iraqê(45).

Ji bo mesela Kurd û gelek behsên din ên wî çaxî yên Iraqê, rapora sala 1927'an(46) di giringîya xwe de qet ji yên din kêmtir nîne.Vê carê behsa muzakera Îngilîzan li gel Şêx Mehmud hatîye pêş. Ji bo cîbicîkirina vê mebestê, Şêx Mehmud, Seyîd

---

(43) Ibid, PP. 32-33.

(44) ((Report by His Brittanic Majesty's Government to the Council of The League of Nations on the administration of Iraq for the year 1926)), London, 1927.

(45) Ibid, P. 27

(46) ((Report by His Brittanic Majesty's Government to the Council of the League of Nations on the administration of Iraq for the year 1927)), London, 1928.

Ehmedê Berzencî kirîye nûnerê xwe û şandîye Bexdadê. Nivîsarên vê raporê, Seyîd Ehmedê Berzencî bi "ajaweçîyê (problem,têkelhevker) Kurdistana Başur"(47) nav kirine. Aşkera ye, dibe welatparêz û hemû mirovên dilsozên welatên xwe, li ba hemû zordar û dagîrkeran ve her ajaweçî, serîhilder û mirovê xerab be!. Her bi vî awayî rapora han Sabir û Ebdullayê kurê Kerîmê Fettah Begê Hemewendî jî bi eynî navî nav kirîye. Ew jî wan rojan de, li ser rêça bab û bapîrên (kalên) xwe, bi mêranî dijî dagirkeran rabibûn, ji ber ku wê demê, wek rapor bi xwe dibêje; tenê ew di saha xebat de mabûn û Îngilîz qul û qul bi firoke, bi hêzên xwe yên siwarî û bi eskerên xwe yên lîwayê ve duv wan ketibûn.

Rapora sala 1927'an bi kurtî çend milekê rewşa jîyana wan Kurdan xistîye ber destê Komela Gelan ku di netîca serîhildana mezin a Şêx Seîd de pena anîbûn ber Îraqê û wek dibêje; navça Musilê ji ber lehîya van penaberan bi carek têkel bû. Li gor gotina raporê, heta sala 1927'an tenê 450 kes ji wan penaberan di nav axa Îraqê de mane. Yên din tev vegeriyane ser gundên xwe. Ji wan 450 kesan jî, nezîkî 150 kes li navça Zaxo, 250 ji wan li navça Dihokê û nêzîkî 100 kesan jî li nav Musilê û der û dorên wî de niştecî bûn(48).

Di rapora sala 1931'an de(49), hejmarek eşîrên navça Behdînan dibin gawur û berazxwer(!) û li ser vê, firokên Brîtanya Mezin gelek bi "dilsozî" tên pêş, dikevin gîyana wan. Dawîyê de em rûpelek li ser behsa girtina Mamoste Tewfîq Wehbî ya

---

(47) Ibid, P. 24

Eslê vê gotinê wiha ye:

(The stormy Petrel of Southern Kurdistan)

"Petrel" tenê bi serê xwe melikê piçûk ê behra gelek dûr e, lê, ku bi gotina "storm" re bê bikar anîn, tê menayek din û ji wan kesên gelek zîrek û xweşik re tê gotin.

(48) ((Report... on the administration of lraq for the year 1927)), PP. 24-25.

(49) ((Report by His Majesty's Government in te United Kingdom of Great Britain and Northern İreland to the Council of the League of Nations on the administration of İraq for the year 1931)).

ji nîvê Nîsanê heta 30'yê Gulana sala 1931'an dixwînin(50). Her wiha çi ev rapor û çi jî rapora sala 1930'an(51), çend carek behsa 6'ê Îlona reş, ta berpabûna Serîhildana Şêx Mehmud, heta esîrgitin û şandina wî li Nasirîye dikin. Dema ku rapora sala 1931'an têt ser behsa Şerê Avbarik ku roja 5'ê Nîsana sala 1931'an de qewimî, dibêje Kurd "bi azayetî ceng kirin, her çiqas êrîşa firoke û piyadan berdewam bûn jî, heta tarîtî ser wan de hat wan ber xwe dan û vêca paş de kişîyan". Nivîsarên raporê, bê hîle û mezinkirin behsa wan nivîsîne ku çawan firokên Îngilîzan navbera du heftîyên borî de ketin pê Şêx û bê rawestandin dest li ser hilnedan, heta roja 20'ê Nîsanê mecbur kirin biçe milê din. Şêx li wir gundê Pîranê kir bingeha xwe ya nû(52).

**Piştî çend rûpelek din, rapora sala 1931'an behsa wê dike ku çawan Îngilîzan li ser daxwaza Riza Şah hêzên xwe yên taybetî birin ser Mehmud Xanê Dizlî û dest li ser hilnedan heta roja 31'ê Gulana wê salê û esîr girtin, şandin Bexdayê(53).**

Rapora piştî van ku ji bo navbera Kanuna Duyem û Çirya Yekem a sala 1932'yan amade kirine(54), wek ên din bêperwa gelek behsa "camêrîya" firokên şerê yên Brîtanya Mezin a dijî şoreşgerên Kurd ji Komela Gelan re kirîye(!!). Ev "çîroka" han a xweş(!!) ev car bûye gula serdestê behsê û şeş rûpelên yekemîn ên raporê jê re "amade kirine". Cardin rapor gelek bêperwa behs dike ku çawan êrîşên firokên Îngilîz ên li ser Kurdan ji bo xatirê çavê hêşîn ê pîlotek û alîkarvanê wî ku

(50) Ibid, PP. 15-16

(51) ((Report by His Mejesty's Government in the United Kingdom of Great Britain and Northern Ireland to the Council of the League of Nations on the administration of Iraq for the year 1930)).

(52) ((Report..... for the year 1931)), PP, 16-17

(53) Ibid, P. 31.

(54) ((Report by His Majesty's Government in the United Kingdom of Great Britain and Northern Ireland to the Council of the League of Nations on the administration of Iraq for the period January to October 1932)).

"çetên" Kurdan wan esîr girtibûn, behs dike. Lê nivîsarên vê raporê bi awakî rast vê yeka han jî rapor kirine ku çawan van "çetan" bi mirovayetî ji wan esîran re hurmet kirin û piştî demek azad kirin(55).

Yek ji wan raporên Îgilîzan ên di salên 20'an heta destpêka salên sîyan ku di derbarê Iraqê de pêşkêşî Komela Gelan kirine, ji behsa Kurdan bêpar nîne. Rapora dawîyê ku berê xelasîya sala 1932'yan li ser girtina Iraqê ji bo endametîya Komela Gelan hatîye pêşkêş kirin, ji kurtkirina hemû raporên din pêk tê, ji ber vê qîmeta wê gelek taybetî ye(56). Em dixwazin ji vê raporê tenê yek nimûne bînin ku Xwedê ji wan re nehêle, bê hîle û derew behsa rewşa xwendin û xwendevarîya Kurdan a heta destpêka 30'yan dike, yanî heta dema ku Iraq bûye endamê Komela Gelan. Di wê navê re ku goya Brîtanya Mezin, Iraqê bi navê Komela Gelan îdare dikir, jîyana rewşenbîrî ya Kurdan gelek hêdî bi ser hev de dihat. Her çawan be gavên li navçên din dihatin avêtin ji gavên vir dihatin avêtin xirabtir bû. Gelek mixabin carên wisa hebû ku ew gavavêtinên ber bi paş de bûn ne ber bi pêş de. Wek nimûne, berê ku Şerê Cîhanê yê Yekem destpê bike, hejmara xwendevarên dibistanên navîn li bajarê Silêmanîyê digihîşt nêzîkî 165 kesan, çi heye ku berî ku Iraq bibe endamê Komela Gelan û piştî 14 salên zehmetîyên di bin qeyyûmîya Brîtanya pêşkevtî de, ev hejmara han ket, bû10 kes. Ji vê jî xirabtir; cardin berê ku Iraq bibe endamê Komela Gelan, di bin sîya Brîtanya Mezin de hejmara hemû kesan ku dibistanên Kurdî de dixwendin, li gor hejmartina Îngilîzan bi xwe, tenê ji 1545 kesan pêkhatibû. Çi heye ku beramberê van de, 6 300 kesan dibistanên Îsayîyan de

(55) Ibid, P. 3.

(56) (Special Report by His Majesty's Government in the United Kingdom of Great Britain and Northern Ireland to the Council of the League of Nations on the progress of Iraq during period 1920 - 1931), London, 1931.

û 8400 kesan jî dibistanên Cuhîyan de dixwendin!!(57). Yanî ew ciwanên Îraqê yên ku hejmara wan nedigihîşt ji sedî 3-4'ê Kurdan, ji pênc qat zêdetir mafê wan ê xwendinê hebû!!

Bi vî awayî çi belge di derbarê Kurdan de çûye ber destê Komela Gelan, bi durustî wêna rewşa nalebar a sîyasî, civakî û aborî ya Kurdan ji bo endaman kêşa ye, behsa wan zulm- sitem û bêmafîya Kurdan ji wan re kirin ku sebebê hebûna Îngilîzan ve, nîra ser milê wan dibû didu. Rast e, car û caran dezgên Komela Gelan hinek rê dan Kurdan û heta wan nameyên ku welatparêzên Kurdan ji wan re şandine jî bê bersîv nehiştin (58), lê, bêguman, rewşa komelê berambere Kurdan qet tu rojê negihîştîye nîva wê sevîyê ku li gor naveroka programa xwe diviya bikira. Ev yeka han jî cardin rûyê rasteqînî yê Komela Gelan a wek jokerê destê dewletên mezin nîşan dide.

Madem wiha bû, wê demê mafê welatparêzên Kurdan hebû bi çavekî şik û rikoyî li Komela Gelan binêrin. Bêsebeb nebû Selam di şi'reke xwe ya sala 1933'yan de ku yekem car di kovara "Hawar" a li Şamê dihat weşandin de, belav bûye(59), navê Komela Gelan danîye "kotekî destî Mîster Henderson" ê Wezîrê Derve yê Brîtanya Mezin(60).

---

(57) PP. 232-234, ((Special Report...)), her wiha binêre; Ebdurezaq el-Hilalî, Tarîxu'l Te'lîm Fî'l-Îraq Fî'l-'Ehedî'l-Osmanî 1638-1917, Bexdad, 1959, rûpel: 181, M.Emîn Zekî, Tarixu'l Sulemanîyye we Înhaîha, terceme: Muhemmed Cemîl Bendî Rojbeyanî, Bexdad, 1951, rûpel: 205-210, El-'Alemu'l-'Erebî" (rojname) , Bexdad, 20 Kanûna Dawî 1931.

(58) Binêre: ((Report... on the administration of Îraq for the year 1931)) PP. 18-19.

(59) Binêre: Hawar, sala duyem, hejmar: 22, 1 Tîrmeha 1933, rûpel: 7. Ev perça han yekem helbesta Selam e di Dîwana wî de (binêre: "Dîwanî Selam", Bexda, 1958, rûpel: 1-4). Di dîwanê de çend cîyekê helbestê nehatine çapkirin, lê, Hawar deqa wê wek eslê wê belav kirîye.

(60) Mebest A.Henderson (1863-1935) ê Wezîrê Derve ya Îngîltere ye. Ew ji sala 1911'an heta sala 1934'an Sekreterê "Partîya Karker" bû. Sala 1929'yan bû Wezîrê Derve, sala 1931'an dev jê berda, yanî dema Selam şi'ra xwe gotîye ew hîn wezîr bûye.

Selam, di eynî şi'rê de derbarê Komela Gelan de bi êş û nalîn wiha gotîye :

**'"Esbetu'l-Umem, komelî gewre**
**Be pêç û pena be fêl w dewre(61)**
**Be coş û kul bûy bo Kurdî hejar**
**Etgut em qewme ekem ristgar**
**Eger rast ekey helî sûrrêne**
**Bes bo siyaset helman perrêne**
**Terîq nabî to to çît pê eken**
**(Kutekî destî Mîster Hendirsin)**

Selam, piştî vê plan û lîstikên Komela Gelan ruswa dike û cardin berê xwe didê û dibêje:

**Le 'edaletekey eme deebe**
**Yaxu her şêwe w ûsulî xerb e**
**Komelî dro, cêgey mekr û fen**
**(Kutekî destî Mîster Hendirsin)**
**Xo to wesî bûy eqwam bûn hetîw**
**Demî Kurdit kird be teley teqîw**

Selam hîn jî pêş de diçe û Komela Gelan dike cîyê bingeha "fitne û hîlan" û kargeha "fesadî û ezîyetê", ji ber ku:

**Le Silêmanî Cadey Ber Sera**
**Be xwênavî Kurd awrişên kira(62)**

Piştî dawîpêanîna behsê, bi vî awayê dilşewitî berê xwe dide Komela Gelan û gelek ji dil jê dipirse:

**Çon 'aciz nabî lem xwên riştine**
**Le lay to helbet hiquq kuştin e(63)**
**Natirsî mêjû le'netit biken**
**(Kutekî destî Mîster Hendirsin)**

Hêjayî gotinê ye, ev şi'ra Selam gelek zû dîqeta rewşenbîrên Kurd û yên bîyanîyan kêşaye ku her yek ji bo armancek qîmetê

---

(61) Evên han çend beytên helbijartî ji helbestên Selam in, ne hemû ne.

(62) Selam, vê şi'ra han ji bo yekemîn bîranîna şeşê Îlona reş nivîsîye, yanî Îlona sala 1931'an.

(63) Digot; 'Li ba te elbet mafdan kuştin e".

bi mesela Kurd didan. Ev şi'r wergerandine Frensî û Garabêtê Ermenî nusxek ji wê anîye Cenevrê ji Komela Gelan re. Dema ku Minorskî di sala 1934'an de hatîye Silêmanîyê, wî jî nimûnek bi xwe re birîye. Her wiha bi taybetî ji ber ku di helbestê de êrîşek zêde li ser 'Ecem û Îranê heye, konsolosê Îranê yê li Silêmanîyê sûretek ji wê anîye Wezareta Derve li Tehranê(64).

Komela Gelan di zimanê Kurdî de cuda cuda hatîye binav kirin. Nivîskarên Soran jê re gotine "'Esbetu'l Umem" yan jî "Komelî Eqwam", nivîskarên "Hawar"ê û "Ronahî"yê gotine, "Civata milletan"(65).

Bedirxanîyan li du kovar û nivîsên xwe yên din de gelek caran "civat" di şûna komel, komele û yekîtîyê de bikar anîne (66). Di wextê xwe de "Akademîya Zanyarî ya Kurd", kelîma "civat"ê di şuna "neqebe" de jî pêşnîyar kir(67). Li gor bawerîya min ev pêşnîyara han di cî de ye, ji ber ku Xanî "civîn" ji bo "kombûn û girsên xelkê bikar anîye", Cîgerxwîn û Qanadê Kurdo jî eynê gotinê bikar anîne.

Ez emîn im gerînek kur û fireh di nav paşdemayîyên weşan û belgên Komela Gelan de, dê bikaribe hin rûyên din ên bi qîmet ên dîroka me ronî bike.

(64) Vê beşê han di dîwana xwe de çap nekirîye.

(65) Şi'ra Selam di Hawarê de bi sernavê "Ji bo Civata Milletan" û di dîwana wî de bi sernavê "Bo Komelî Eqwam" hatîye belav kirin.

(66) Wek mîsal binêre: Hawar, sala: 1, hejmar: 2, 1 Hezîrana 1932, rûpel: 1, Sal: 1, hejmar: 14, 31 Kanuna Yekem 1932, rûpel: 1.

(67) Binêre: Kovarî Korrî Zanyarî Kurd, cilda yekem, beşê yekem, 1973, rûpel: 521.

# MIJARA HEFTAN

# ÇEND BELGE JI DÎROKA KURDISTANÊ

Wextê xwe de di hejmarek "Kovarî Korrî Zanyarî Kurd" de, van kurtegotarên han ên xwarê min bi navê xwe belav kirin(1). Ji ber hêjatîya mijara wan ji bo rewşenbîrîya Kurd, ez di vir de bi destlêdanek kêm cardin belav dikim.

## Yekem
## WEQÎFNAMA EBDURREHMAN PAŞAYÊ BABAN

Ebdurrehman Paşayê kurê Mihemmed Paşayê kurê Xalid Paşa, yek ji wan fermanrewayê bi nav û deng ê Mîrnişîna Baban e, sala 1204'ê koçî (1789/1790'ê zayînî) desthilatê kir destê xwe û di navbera çarîk sedsalek de, ne tenê li Kurdistanê, belko li Iraq, Iran û Tirkîyê, di jîyana sîyasî de rolek mezin lîst. Her wiha yek ji wan serokê Kurdan e ku hestê netewî tê de tê dîtin.

Li gor gotina Rîch, dema ku Silêmanê Biçûk ê Paşayê Bex-

(1) Kovarî Korrî Zanyarî Kurd, cilda yekem, beşê yekem, 1973, rûpel; 381-418.

dayê li dijî dewletê serîhilda, Sultan daxwaz ji Ebdurrehman Paşa kir ku cîyê wî bigre, lê, Paşayê Baban qebûl nekir ji Kurdistan û bingeha Mîrnişîna bab û bapîrên xwe dûr bikeve.

Deqa gotina C.J.Rîch di vî warî de wiha ye :

*"Dema Küçük Silêman Paşayê Bexdayê dijê Derîyê Bilind (2) serîhilda, Reîs Efendî ku ji Stenbol ji bo tefandina vê serîhildanê hatibû, serokatîya Hukumeta Bexdayê ji Ebdurrehman Paşa re pêşnîyar kir. Lê, Pîrê Mezin gelek bi şêrane wê şerefê red kir û wiha got : 'Rast e, ez bi vî karî dibim wezîr, lê dilopek ava befra çîyayên min hemû rêzên İmparatorîyê tîne. Ji derveyê vê, çûna min li Bexda dibe sebebê zêdebûna serwet û samanên min, lê, ev karê min dibe sebebê têkçûna hemû binemala Bebe"(3).*

Yek ji wan belgên din ên hestê zanistî û netewî yê Ebdurrehman Paşayê Baban ev bûye ku heta roja dawîya jîyana xwe(4) bi çavekî rêz û xoşewîstî li zanayên Kurdistanê nêrîye. Di vir de em ê belgek dîrokê yê ku nayê zanîn bixin li ber çav.

Yek ji wan destnivîsê sipehî ya ku ji bo Kitêbxana Ebdurrehman Paşa nivîsandîye, "Sehîhê Buxarî" ye. Ev destnivîsa han dawîya meha Remezana sala 1211'ê koçî (Nîsana 1797'ê zayînî)(5) ji alîyê Mihemmedê kurê Şêx Yusifê kurê Şêx Mewlanayê kurê Şêx Omer ve ku nevîyê (torinê) Weysî Qerenî ye, bi xetekê xweşik nivîsandîye û du cîyên wê de muhra Ebdurrehman Paşa li ser e. Paşayê Baban vê destnivîsa han li ser binemala Celê ya Koyê û piştê wan jî li ser zanayên "Kurdis-

---

(2) Derîyê Bilind, rasterast di mana "el-Bab el-'Alî" de ye, ku heta dawîya Şerê Cîhanê yê Yekem ji Dewleta Osmanî re dihat gotin.

(3) C.J. Rich, Narrative of a Residence in Koordistan, and on the site of Ancient Nineveh, with Journal of a voyage down the Tigris to Bagdad, and an account of a visit to Shirauz and Persepolis, Vol, 1, London, 1836, pp, 96-97.

(4) Ebdurrehman Paşayê Baban, sala 1228'ê koçî (1813'yê zayînî) koça dawîyê kir.

(5) Mixabin roja temambûna nivîsandina destnivîsê dîyar nekirîye.

tan, ji Musilê heta Bexda û Sine" weqif kirîye(6). Li ser muhra Ebdurrehman Paşa ev hatîye kolandin :

*"We ofewwêvo emrî îlallah 'ebduhû Ebdurrehman"(7).*

## Duyem
## DU NAMÊN HACÎ KAK EHMEDÊ ŞÊX Û RASTKIRINEK

Hacî Kak Ehmedê kurê Şêx Marufê ji gundê Nodê û kurê Şêx Mistefayê kurê Şêx Ehmed, yek ji wan mirovên zana yên payebilind ê Kurdistanê yê sedsala 19'an e. Hacî Kak Ehmed, sala 1207'ê koçî (1793'ê zayînî) li bajarê Silêmanîyê ji dayîk bû û sala 1305'ê koçî (1887'ê zayînî) her li wir koça dawîyê kir. Vêca niha em dixwazin şaşîtîyek biçûk a di derbarê temenê Hacî Kak Ehmedê Şêx de rast bikin.

Li gor van salên jorîn, Hacî Kak Ehmedê Şêx 94 salîya xwe de wefat kirîye. Lê çi heye ku Mamoste Emîn Zekî û Şêx Mihemmedî Xal nivîsandine ku dema wî zanayê me koça dawîyê kirîye temenê wî 98 sal bûye(8).

Ev şaşîtîya han ji vê yeka han tê ku dîroknivîsê me yê mezin Mamoste Emîn Zekî temenê Hacî Kak Ehmedê Şêx li gor salnama salên zayînî hesêb kirîye bê wê ku ferqê deh rojên salan bigre berçav. Mamoste Şêx Mihemmedî Xal jî her çendîn sala ji dayîkbûn û wefata Hacî Kak Ehmed wergerandîye ser salên zayînî û bi awakî rast sala dayîkbûnê 1793 û wefatê jî 1887

---

(6) Deqa wê ya Erebî bi vî awayî ye: "...Summe 'elel 'ulemaî'l-lezîne kanû fî nahîyetî Kurdistan mîn e'l-Mûsil îla Bexdad we Senendej..."

(7) Binêre: wênên weqifnamên Ebdurrehmah Paşayê Baban, rûpel: 383 û 385, hejmara yekem a Kovarî Korrî zanyarî Kurd.

(8) Binêre: M.Emîn Zekî, Meşahîru'l Kurd we Kurdistan, el-cuz'i sanî, Qahîre, 1947, rûpel: 119.

M.Emîn Zekî, Tarîxu'l Silêmanîyye we Enhaîha, Bexdad, 1951, rûpel: 224.

Mihemmed el-Xal, el-Şeyx Me'ruf El-Nodehî El-Berzencî, Bexdad, 1961, rûpel: 199.

tespît kirîye, lê li gel vê jî temenê wî 98 sal nivîsandîye.

Tesîreke hêja yê Hacî Kak Ehmedê Şêx di zanistîya ayînî de heye û gelek nivîsên vî warî bi zimanê Farisî di pê xwe de hiştîne. Eynî wextê, Hacî Kak Ehmed, di nêzîk de peywendî li gel zanayên Kurdistanê danîye. Yek ji van zanayên mezin Hacî Mele Ebdullayê Celîzadeyê Koye ye. Wisa dîyar e bi berdewamî name di navbera van herdu mirovên mezin de çûye hatîye. Binemala Celîzade ji van naman du lib parastine ku di wextê xwe de Hacî Kak Ehmedê Şêx ji mele Ebdullah re şandîye.

Gelek mixabin li ser tu cîyek van herdu naman roj û sala şandina wan nenivîsandine(9). Lê, wisa dîyar e ku yek ji wan sala 1300'ê koçî (1882'ê zayînî) ji Silêmanîyê şandine Koye. Ya diduyan jî ji naverok û lawazîya xetan derdikeve ku demek kurt berê koça dawî ya Hacî Kak Ehmedê Şêx hatîye nivîsandin(10). Di destpêka vê de Hacî Kak Ehmed wiha nivîsandîye:

*"Ya hebîbî, we ya qerîbî we ya muhibbî, îbteleytu bîma xerece mîn taqetî we bîma la sebre lî fîhî we etemenna mewtî me'e husne xatimî fe'izurnî. Eczeytekum bîl tedrîs la sîyema kulle 'îbade lîsanîyye cuz'îyye kullîyye, we kulle 'îbade fi'lîyye..."*

## Sêyem
## ÇEND RASTÎ DÎ DERBARÊ ŞAIRÊ BI NAV Û DENG ŞÊX RIZAYÊ TALEBANÎ DE

Şairê mezin û hêja yê dawîya sedsala 19'an heta destpêka sedsala 20'an a Kurdistanê, Şêx Rizayê Talebanî, di edeba gelê Kurd de xwedî cîyek bilind û aşkera ye. Lê çi heye ku li gel vê jî heta niha di dîyarkirina sala ji dayîkbûn û wefata wî de ferqîtî heye. Mamoste Emîn Zekî behsa sala ji

(9) Binêre: wênên wan herdu namên rûpela 388 û rûpelek din a bê hejmar a hejmara yekem Kovarî Korrî Zanyarî Kurd.

(10) Mamoste Mes'ud Mihemmed jî di vî bawerîyê de ye.

dayîkbûna wî nekirîye(11). Herçî Mamoste Elaeddîn Seccadî ye sala 1835'an(12) û Dr.Maruf Xeznedar jî sala 1832'an sala ji dayîkbûna wî nivîsandine(13).

Kurdnasê derve jî van salên han bi tevayî dîyar nekirine. Wek mîsal Edmonds nivîsa xwe ya yekemîn a derbarê Şêx Riza de du salan ji bo ji dayîkbûna wî nivîsandîye; 1841 yan 1843(14). Lê, çi heye ku piştî demek, navbera van herdu salan bijartîye û sala 1842'an kirîye sala ji dayîkbûna wî(15).

Dr. Kemal Fuat rasterast 1253'ê koçî sala ji dayîkbûna Şêx Rizayê Talebanî nivîsandîye(16). Lê wisa dixuyê ku roj û meh jê re nedîtîye ku heta bikare bi temamî vê sala han li gor salnama zayînî dîyar bike, ji ber ku sala 1253'ê koçî ber sala 1837/1838'ê zayînî dikeve. Dr. Kemal Fuat ji van herduyan yekê bijartîye, wisa dixuyê bi vî awayî xwestîye hinek temenê vî şairî me yê mezin dirêj bike. Ez bûma jî min her wiha dikir.

Mamoste Mela Ebdulkerîmê Muderris, 1253'ê koçî wek sala ji dayîkbûna Şêx Riza Talebanî danîye. Wî, ji bo dîtina vê salê serî li Şêxê Telebanîyan daye(17).

Şêxê mezin Talebanî, li gundê Qirx ê nêzîkî Çemçemalê(18) ji

---

(11) Binêre: M.Emîn Zekî, Meşahîru'l Kurd we Kurdistan, cuz'i ewwel, Bexdad,1945, rûpel: 224-225.

(12) Elaeddîn Seccadî, Mêjûyî Edebî Kurdî Bexdad, 1952, rûpel: 341, çapa duyem, Bexdad, 1971, rûpel: 374.

(13) Dr.Maruf Xeznedar, Kurtey Mêjûyî Edebî Kurdîy Nwê, bi zimanê Rusî, Mosko 1968, rûpel: 81.

(14) C.J. Edmonds, "A Kurdish Lampoonist Shaikh Riza Talabani", Journal of the Royal Central Asian Society, London, Vol XXII, January 1935, p. 116.

(15) C.J. Edmonds, Kurds, Turks and Arabs, London, 1957, p. 57.

(16) Kamal Fuad, Kurdische Handschriften, 1970, p. 101.

(17) Biryar wisa bû ku Mamoste Mela Ebdulkerîm vê rastîya han di Yadî Merdan de çap bike.

(18) Qerx û Taleban du gund in û dikevin navça Çemçemalê ya navbera Kerkuk û Silêmanîyê.

dayîk bû. Temenê wî yê zaroktîyê li Kerkukê derbaz bû. Li Kerkuk, Koye û Silêmanîyê xwendîye; erebî, farisî û tirkî baş zanîye û şiir nivîsandîye. Çûye Stenbol û beşê dawî yê jîyana xwe li Bexdad derbaz kirîye.

Gelek mixabin di weşana sala wefatkirina Şêx Riza de cardin şaşîtî hatîye kirin. Mamoste Elaeddîn Seccadî, 1909'an wek sala wefata wî nivîsandîye(19). Dr.Kemal Fuad jî eynê salê nivîsandîye(20).

Gorra Şêx Riza, tijî nûr û gulav be, li Goristana Şêx Ebdulqadirê Geylanî ya li Bexdayê de ye(21). Li ser kêla mezin a gorra Şêx Riza wiha hatîye nivîsandin:

*"Qed fewefîyye el-fadilu'l-merhûm fî leyletî'l-cum'e'l-mubarek mîn Muherremî'l-Heram, sene: 1328".*

Yanî di vê belga han a girîng de, heta meh, heftê û şeva koça dawî ya Şêx jî heye. Lê, Mamoste Emîn Zekî vê roja han yekê Muherremê nivîsandîye(22). Ji ber ku yekê Muherremê, roja pêncşembê tê hesêb kirin û li ser kêla gorra wî jî nivîsandîye ku Şêx şeva Înê wefat kirîye, ez di wê bawerîyê de me ku yekê Muherrem a Mamoste Emîn Zekî durust be. Bi vî awayî roja wefata Şêx Riza Telebanî wiha dibe:

Yekê Muherrema sala 1328'ê koçî ku dike êvara pêncşemba ser îna 13'ê Kanuna Duyem a sala 1910'an.

Li ser kêla gorra Şêx Riza bi Farisî ev çend rêzên han hatine kolandin:

*Ya Resulellah çe başed çon segê Eshabêkehf*
*Daxilê Cennet şevem der zumreyê eshabê to*
*U reved der Cennet û men segê eshabê to*
*U segê Eshabêkehf û men segê eshabê to*

---

(19) Elaeddîn Seccadî, serokanîya ku navê wê derbaz bû, çapa yekem, rûpel; 341-343, çapa duyem, rûpel; 374-376.

(20) Kamal Fuad, Op., p.101.

(21) Mihemmedî kurê şêx Reza, ku ew jî şair bûye û naznavê wî "Xalis" bûye, li teniştê babê xwe û di Goristana Şêx Ebdulqadirê Geylanî de hatîye veşartin.

(22) M. Emîn Zekî, Meşahîru'l Kurd we Kurdistan, cuz'i ewwel, rûpel: 225.

Şêx Rizayê dinyadîtî û jîyanperest, bi peywendî û runiştina bi zana û şairan re gelek hez dikir û peywendîya wî bi gelekan re hebû. Yek ji heval û dostên wî yê herî nêzîk Mele Ebdullahê Celîzade bûye ku bi hev re li Koye li ba Hacî Mele Eshedê babê Hacî Mele Ebdulla xwendine û piştî vê jî di riya naman re peywendîya wan bi hev re dom kirîye. Yek ji namên Şêx Riza ku heta niha jî maye(23), ji nivîsînek dostane pêkhatîye. Şêx Riza vê nama han di sala 1313'yê koçî (1895/ 1896'ê zayînî) de nivîsandîye(24) Şêx bi vî awayî bi rêzên şiîrên xwe yên farisî ve dest bi namê kirîye:

*'Eyb der zatê to ey kanê huner me'dum est(25)*
*Meger în'eyb ke lehmê 'ulema mesmum est*
*Şi'rê men ez hewe sû der heme kêşwer sarî*
*'Ilmê to der heme ca ber heme kest me'lûm est*
*Mîreved şi'rê men 'ilmê cihangîrê şuma*
*Herdo bîfaîdê ta cayê êqamet Rûm est*
*Name binvîs be her terz diletmîxwahed*
*Hemî sêhr est eger nesr o eger menzum est*

Roja 6'ê Kanuna Yekem a sala 1984'an, kak Çalak Talebanî vê mesela han ji min re got:

*"Wênekêşekê Bexdayê, deng û behsê Şêx sehkirîye, her ji dûr ve bûye heyranê eqil û zîrekîya wî. Daxwaz ji nevîyê wî dike çi kes ê ku ji Talebanîyan bikare teswîra ser û çavên wî bike, ku dema tê Bexdayê bîne li ba wî. Qasek şun de wî hunermendî wênekê cenabê Şêx durust kir ku çawan çavê dapîra min lê ket, ecêbmayî ma û yekser pirsî: 'ev wêna mamê (apê) te Riza li ku bû', eynî ew bi xwe ye!".*

---

(23) Binêre: wêna wê nama ku di rûpela 392'an a hejmara yekem a Kovarî Korrî Zanyarî Kurd de ye.

(24) Mixabin di namê de tenê sala şandinê hatîye nivîsandin.

(25) Şêwa nivîsîna Şêx Riza wek wê hatîye parastin.

## Çarem
## CARDIN ROJNAMA "KURDISTAN"

Çendîn car di derbarê rojnama Kurdistan de bê nivîsandin hîn kêm e, ji ber ku ev rojnama han destpêkeke dîrokî ya girîng û pirr şanazî ye di seranserî jîyana rewşenbîrîya gelê Kurd de(26).

Wek aşkera ye rewşenbîrên Kurd li dor û berê dawîya sedsala 19'an ve bi germî têkelê nav xebata netewî ya gelên xwe bûn û her di wan rojan şûn de jî bi qîmeta rojnamegerîyê gihîştin. Bi taybetî ewên ku li Stenbol jîyabûn yan xwendibûn, bi çavên xwe dîtibûn ka rojnamegerîya Tirk û yên gelên din di nav dewleta Osmanî de çi rolek di jîyana civakê de dilîst(27). Vê yeka han nêzîkî dawîya sedsala borî pal da ber xwendevanên dûrbîn ên Kurdistanê(28) da ku xwe ji bo weşandina rojname û kovarên bi zimanê xwe yê zikmakî amade bikin.

Cîbicî kirina vê wezîfa han a pêwîst ne li nav axa Kurdistanê bi xwe û ne li Stenbola paytext, ji ber sebebên rejîma xwînavî ya Sultan Ebdulhemîdê Duyem (1876-1909) karekî rehet

---

(26) Di wê kitêba min de, ku bi navê "Têgeyîştinî Rastî û Şwênî le Rojnamenûsî Kurdî" sala 1978'an de, hat belavkirin, min îstîfade ji beşekê vê behsa han kir.

(27) Yekemîn rojname di dîroka Tirkan de sala 1825'an bi zimanê frensî li Izmîrê hatîye çapkirin. Yekemîn rojnama bi zimanê tirkî jî bi navê Takvim-i Vakayi sala di 1832'an de hatîye çapkirin, ku organa Derîyê Bilind bû.

Salên 70'yên sedsala 19'an rojnamegerîya Osmanî bi carek berbipêş de çû û hejmarên hemû rojname û kovarên vî welatî gihîştin 47 liban, ku 13 ji wan bi tirkî û yên din jî erebî û yunanî yan bi zimanên din bûn.

Çend lib rojnamên tirkî yên wek Tercüman-ı Ahval û "Tasvir-i Efkar û hinekên din di nav xwendevarên Kurdan de jî belav dibûn.

(28) Bi taybetî rewşenbîrên ser binemala Bedirxanîyan ku hejmara wan zêde, dereca xwendina wan bilind, imkanên wan ên aborî û hebûnên wan baş bûn.

nebû, bi taybetî di wan rojan de di her quncek Kurdistanê de herroj serîhildanek berpa dibû. Ji ber vê rewşenbîrên Kurd naçar bûn hewil bidin li derveyê welat rojnamekê Kurdî çapbikin û ji wir jî bi dizî bigihînin Kurdistanê. Di wê serdemê de ji bo derxistina rojnamekê wiha baştirîn cî jî Misir bû. Ji ber ku ev welatê han ser dema Mihemmed Elîyê Mezin (1805-1849) ji çengê desthilata Sultanên Osmanîyan rizgar bibû. Ji derveyê vê Ingilîzan ber bi xelasîya sedsala 19'an bi temamî cîyê pêyên xwe li Misrê qahîm kiribûn, hez jî dikirin ku nahezên dewleta Osmanî li wir bicivin. Nabe em eva han jî ji bîr bikin ku rojnamegerîya Misrê ya wî çaxî deng dabû, hejmarek çapxanên mezin wî çaxî li Qahîrê kar dikirin, nahezkerên Derîyê Bilind ê Osmanî û textê tawîsê Qacarî li wir çapemenîyên xwe derdixistin.

Hemû ev sebebên han pal dan ber Bedirxanîyan ji bo daxwaza weşandina rojnamekê kurdî berê xwe bidin Misrê. Bi vî awayî roja Pêncşemba 30'ê Zulqe'de ya sala 1315'ê koçî, /9'ê Nîsana sala 1314'ê Rumî ku dikin 22'yê Nîsana sala 1898'ê zayînî, li bajarê Qahîrê yekemîn hejmara yekem rojname di dîroka gelê Kurd de li çapxana El-Hîlal bi navê Kurdistan ji alîyê Mîqded Midhet Bedirxan ve hat derxistin.

Hêjayî gotinê ye ku li gor wan cedwelên bawerîpêkirî yên li ber destan, bi taybetî cedwela Akademîya Orbelî(29), roja 30'yê Zulqe'de ya sala 1315'ê koçî dike roja înê, ne pêncşembê, wek eva han li du cîyan de li ser hejmara 1'ê ya Kurdistan hatiye çapkirin. Li gor eynî cedwelê, roja 30'yê Zulqe'de ya sala 1315'ê koçî dike 22'yê Nîsana sala 1898'ê zayînî. Ji ber vê jî em awakî rast ji guherandina Orbelî dilxweş in(30). Bi taybetî ji ber ku şaşîtî di wê de bû ku Prof. Tsîbulskî di wan lîstên girtibûn de, ne behsa sala 1315 û ne sala 1316'an tê de nebûn (31), em naçar bûn bikevin gerîna wê ka gelo 22'yê Nîsana sala

---

(29) Sala 1961'an li Moskova çap kirîye.

(30) Binêre: rûpela 269'ê cedwela wî.

(31) Binêre: kovara Gelên Asya û Afrîka, bi zimanê Rusî, Moskova, hejmar: 3, sal: 1962, rûpel: 245.

1898'ê zayînî dike roja pêncşembê yan roja înê. Piştê lêkolînek fireh derket ku ev roja han roja pêncşembê ye. Ger wiha be, dibe ku şaşî dîyarkirina destpêk û dawîya mehên wê salê yên hicrî bi xwe de kiribe ku ew jî mimkun e. Ji ber ku wek tê zanîn, dîyarkirina destpêk û dawîya salên hicrî li ser esasê dîtina hîvê ye û gelek caran şaşîtî tê de tê kirin. Ew roja 22'yê Nîsana sala 1898'an li Misrê, 30'yê Zulqe'de hatîye nivîsandin, wisa dixuyê ku di rastîya xwe de 29 bûye. Eynê şaşîtî di hejmarên 3 û 5'ê "Kurdistanê" de jî hatîye kirin, divê ji wan 28'ê Zulhecca Yekem 27 û 27'ê Muherrema Duyem jî 26 be.

Rojnama hêja û yekemîn, Kurdistan, demek çend sal bi muhacirî jîyaye û her rojek li bajarek hatîye çapkirin, hejmarek li Cenevre ya paytextê Swîsr (İsvîçre), hinek li Londrayê û beşek din jî li bajarê Folkston ku dikeve Başûrê Brîtanya, hatine çapkirin. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem Kurdistan bûye navê kovarek nû ya ku li Stenbol dihat çapkirin(32).

Beşek ji hejmarên rojnama Kurdistan, di kitêbxanên mezin ên derve de hatine parastin. Hejmara yekem di Kitêbxana Liqa Unîversîta Rojhilatnasî ya Sovyetê ya li Lenîngradê de heye, hejmara yekem û heta 31'an -ji derveyî hejmarên 10,12, 17, 18 û 19'an- di Kitêbxana Marburg ya Almanya Rojava de hatine parastin(33). 18 hejmarên ku sala 1899'an hatî çapkirin di Kitêbxana Niştimanî (Milli Kütüphane-Elîşêr) ya Enqerê de ne (34).

Sala 1972'an li Şamê bi rîya Rewşen Bedirxan ve hejmara 5'an a Kurdistan û rûpelên 3 û 4'ên hejmara 3'an ketin destê

---

(32) Tenê di hêla nav de nebe qet peyvendîyek wê bi rojnama yekemîn a Kurdî Kurdistan re tune. Li vir Mamoste Emîn Zekî û M. Elî Ewnî ber bi şaşîyê de çûne. ( Binêre: M. Emîn Zekî, Xulasetu Tarîxu'l Kurdî we Kurdistan, Qahîre, 1936, rûpel: 370).

(33) Kurdistan yekemîn rojnama Kurdî 1898-1902 ye ku berhevkiriye û jê re pêşgotin nivîsandiye: Kemal Fuad, Bexdad, 1972.

Kovara Rûnakî, Bexdad, hejmar: 180, 23'ê Gulana 1969'an, rûpel: 4.

(34) Binêre: Eski Harfli Türkçe Süreli Yayınlar Toplu Katalogu,

min û min wan li gel wêna hejmara yekem pêşkêşî Kitêbxana Korrî Zanyarî Kurd kir.

Di bin navê hejmara yekem a Kurdistan de ev rêza han a Tirkî hatîye nivîsandin:

**"Kürtleri iqaz ve tahsil-i sanayiye teşvîk içun şimdilik, onbeş günde bir neşrolunur Kürtçe gezetedir".** Lê, di bin navê hejmara 5'an de bi kurdî wiha nivîsandîye:

**"Panzde roja de carkî têt nivîsandin cerîdeya Kurdî ye"**(35).

Ji bo dîroka rojnamegerîya kurdî hêjayî gotinê ye ku li ser milê rastê hejmara yekem a rojnama kurdî ya yekemîn, ev biryara han a gelek hêja û bi mana hatîye weşandin:

*"Her car du hezar cerîdeya bê pere ez ê rêkim Kurdistanê de biden xelkê*(36) *"*

Piranîya herî zêde hejmarên Kurdistan ji bo behsa girîngî û hêjabûna xwendin û xwendevarî ye, hemû rêzên wê bi awakî dilsozî ji bo ku gelê Kurd jî wek gelên din dest bavêje xwendinê, hatine amade kirin. Di vî warî de ji bo bilindkirina hestê xelkê gelek hedîsên pêxemberê Musilmanan ên derbarê pêwistîya fêrbûn û xwendinê de nivîsandîye. Ji derveyê vê, çend nimunên din ên bi alîkarîya zanistîyê serkewtina Japon ser Çînê û ya Misrê jî ser Sudanê daye.

Hejmara 5'an a Kurdistan ku li Kitêbxana Akademîyê de hatîye parastin, pêncşemba 27'ê Muherrema(37) sala 1316'ê koçî (18'ê Hezîrana sala 1898'ê zayînî) çap bûye. Bi vî awayî Mîqded Midhed Bedirxan navbera du salan de pênc hejmarên Kurdistan li Qahîrê weşandîye.

Hejmara 5'an a rojnama Kurdistan li ser kaxezek rengê kesk çap bûye. Dirêjahîya vê hejmarê li gel wan perên hejmara si-

---

(35) Wergirtinên ji rojnama Kurdistan bê destlêdana rênivîsa wan hatine weşandin.

(36) Di hejmara 4'an a Kurdistan de, hinek guhertin di vê rista han de hatîye kirin û wiha bûye: "Her car du hezar cerîdeya ez ê rêkim Kurdistanê de belaş biden xelkê".

(37) Wek me di pêş de got, mimkun e ev 27'ê Muherremê, di rastîya xwe de 26 be.

sîyan ku destê me de ne, 33,8 û panîya wê jî 26 cm. e. Sergotara hejmara sêyem bi Tirkî û bi vê navî namek ji Sultan Ebdulhemîd re şandîye : *"Şevketlu 'Azîmetlu Sultan Abdulhamid Han-i Sani Hazretlerine"* yanî *"Ji Sultan Ebdulhemîd Xanê Duyem ê Mezin û Payebilind re"*. Dawîya namê ku vê namê seranserê rûpela yekem û ya diduyan jî girtîye, bi îmza Mîqded Midhed bi vî awayî qedîya ye: *"Bedirxan Paşazade Miqdad Midhed Kullarî"*. Mîqded Midhed Beg di namê de ku duyem name ye bi rîya Kurdistan re ji Sultan re dişîne, bi awakî xurt û vekirî armanca rojnama Kurdistan xistîye ber çav û daxwaz ji Sultan kirîye ku riya belavbûna wê bide. Ji ber vê yekê di rûpela sêyem a eynê hejmarê de pêşnîyarî ji bo zana, mîr û axayên Kurdan kirîye ku bi telgrafan daxwaz ji Sultan Ebdulhemîd bikin da ku rê bide Kurdistan bila bi aşkera bê nav axa welat. Ev yeka han jî bêguman çarçova xebata rewşenbîrên Kurdên wî çaxî û awayê rêbaza xebata wan nîşan dide.

Hêjayê gotinê ye ku li ser hejmara yekem û heta hejmara sêyem a Kurdistan wiha hatîye nivîsandin: **"Li Misrê Metbe'a el-Hîlal de teb' bîye"**, çi heye di dawîya hejmara 4'an û 5'an de wiha nivîsandîye **"Li Misrê Metbe'a(*) Cerîdeya Kurdistanê tebi'i bîye"**. Di piştа hejmara 6'an de nivîsandîye: **"Metbe'a(**) Cem'îyeta Tifaq û Qencîya Musilmana teb' bîye"** û dawîya hejmara 20'an de jî nivîsandîye **"Li Misrê Metbe'a Cerîdeya Kurdistanê teb' bîye".**(***) Di dawîya hejmara 22'an de bi Tirkî nivîsandîye **"Hindîye Matbaasinde tebi'i olunmuştur"** û di dawîya hejmara 28'an û heta 31'an , bi Tirkî nivîsandîye **"İntikam Matbaasinda teb' olunmuştur".** Bêguman ev hemû çapxane û cîguherînên han jî nîşanên din a jîyana muhacirî ya rojnama Kurdî, Kurdistan û barê gelek gi-

(*) (**) Ev gotinên han di orîjînalên rojnamê bi xwe de hene, lê kitêbê de nînin. Mimkun e şaşîtîya çapê be-Malmîsanij.

(***) Di dawîya hejmara Kurdistan a 20'an de ev îbara han hatîye nivîsandin: "Misir'da tab' olunmuştur" / "Li Misrê teb' bîye". Yanî qismê "Metbe'a Cerîdeya Kurdistanê" ne orîjînalê rojnamê a Tirkî û ne jî Kurdîyê de nîne-Malmîsanij.

ran a ser milê rewşenbîrên wî qonaxî ya Kurdan e.

Aşkera ye derketina yekem rojnamê, di dîroka gelê Kurd de pêvajoyek mezin û destpêkek bi qîmet e. Nirxek weşandina Kurdistan a sîyasî û zanistî hebû. Em qet dûr neçin, ger ev rojnama han nebûya, mimkun bû heta îro jî me sala wefata şairê mezin ê Kurd, Hacî Qadirê Koye nezanîya. Di saya Kurdistan de ev yeka han hat zanîn ku piranîya nivîskarên me di dîyar kirina sala koça dawî ya Hacî Qadirê koye de ber bi şaşîtîyê de bûn. Mamoste Ebdurrehman Seîd, sala 1312'ê koçî nivîsandîye ku ev sal 1894/1895'ê zayînî dike(38). Mamoste Elaeddîn Seccadî, Gîw Mukrîyanî û Mehemedî Mele Kerîm, sala 1892'an nivîsandine(39). Dr.Maruf Xeznedar û Dr.İshan Fûad jî wek Edmonds sala 1894'an wefata Hacî nivîsandibûn (40). Mamoste Refîq Hilmî, di kitêba xwe ya "Şiir û Edebîyat" de tenê behsa ji dayîkbûna Hacî kirîye(41). Mamoste Emîn Zekî jî sala 1314'ê koçî ku dike 1896/1897'ê zayînî, nivîsandîye(42). Herekol Ezîzan ku naznavê Celadet Bedirxan e, sala 1312'ê koçî nivîsandîye (1894/1895'ê zayînî)(43).

---

(38) Komele Ş'rî Hacî Qadirî Koyî, çap û belavker: Ebdurrehman Seîd, Bexdad, 1925, rûpel: 6.

(39) Binêre: Elaeddîn Seccadî, serokanîya ku navê wê derbaz bû, rûpel: 309-312, çapa duyem, rûpel: 341-343.

Dîwanî Hacî Qadirî Koyî, Hewlêr, 1969, rûpel: 5.

Mehmedê Mela Kerîm , Hacî Qadirî Koyî Şairî Qonaxekî Nwê Le Jiyanî Netewey Kurd, Bexdad, Bê, rûpel: 9.

(40) Binêre: Dr.Maruf Xeznedar, serokanîya ku navê wê derbaz bû, rûpel: 40.

Dr.İhsan Fûad, Hunermendîy Hacî Qadirî Koyî û Şwênî Le Wêjeyî Kurdî da, kurtey namey doktora wî, bi zimanê Rusî, Moskova, 1966, rûpel; 9.

C.J.Edmonds, Kurds, Turks and Arabs, p.58.

(41) Refîq Hîlmî, Şi'r û Edebîyatî Kurdî, Bexdad, 1941, rûpel: 99-118.

(42) M. Emîn Zekî, Serokanîya ku navê wê derbaz bû, cilda duyem, rûpel: 110.

(43) Binêre: Hawar, Şam, sal: 9, hejmar: 33, 1941, rûpel:113.

Piştî van hemû cihêbûnan, kovara **Rûnakî** sala 1969'an di gotarekê de bê ku navê nivîskarê wê hatibe nivîsandin, bi alîkarîya rojnama Kurdistan sala koça dawî ya Hacî Qadirê Koye bi durustî nivîsandîye(44). Wisa dixuyê ev gotara han a Dr.Kemal Fuad e.

"Kurdistan", di rûpela sêyem a hejmara sêyem de yekemîn sal derbazîya koça dawî yê Hacî Qadirê Koye bi vî awayî nivîsandîye:

*"Alimek ji Sora hê sala dî wefat kir rehmeta Xwedê lê be gunehên wî bixefirîne navê wî Hacî Ebdulqadir bî. Ev mirov saxîya xwe de gelek xebitî derheqa 'elimandina ilim û me'rîfetê re gelek beyt û eş'arên Kurmancî dinivîsî ,rê dikir welatê xwe Sora. 'Ezmanê wî 'ezmanê Sora ye loma Kurd hemî vî ezmanî nizanin. Pişta kitêba Mem û Zînê de bi xetê xetdestê xwe hin beyt nivîsîne teberruken min ew ebyat li vê cerîdeyê de binivîsin, bi diqqet bê xwendin mana wan xûş têt fehm kirin"*(45).

Piştî van gotinan, Kurdistan wan beytên ku Hacî Qadir bi destxetê xwe yê pîroz di pişta rûpela dîwana Mem û Zîna Xanî de nivîsandîye çapkirîye, ji van beyta pêşîn wiha ye:

**Zemane resmî caranî nemawe**
**Çiraxî nazim û munşî kujawe**

Beyta dawîn de jî wiha dibêje:

**Le Kurdan xeyrî Hacî û Şêxî Xanî**
**Esasî nezmî Kurdîy danenawe.**

Wisa dixuyê hejmarên Kurdistan pir zû gihîştine destê gelek kesan û bi hemû awayî hestê xelkê bilind kirîye. Di vê hejmarê de namek bi navê "N.H." ji Şamê, Mîqded Midhed Bedirxan re şandine û tê de bi vê dilsozîya han behsa hêjabûna Kurdistan û xwedîyê wê kirîye:

---

(44) Rûnakî, îna 23'ê Gulana 1969, rûpel: 41.

(45) Deqa nivîsa Kurdistan bê destlêdan hatîye nivîsandin.

*"...Rehmet li babê te bit Xwedê dewleta te mezin biket ew edl û kirina babê te kir niho jî dibit sebeba rehmetê ew ceríde te ser qencîya Kurda derêxistî ev jî nêzîk wê ye zimanê qencî hewqas dibit..."*

Piştî vê namê helbesta Kurdek ji Şamê yê bi navê Şêx A.Fetah(*) belav kirîye ev yeka han jî aşkera nîşan dide ku rojnama Kurdistan çi dengek di nav Kurdan de daye. Di hejmarên din de jî gelek ji van nimûnan berçav dikevin.

Qet gumanek di wê de nîne ku rojnama Kurdistan, ronahîyek şewqdar a nû bû, di asoya (ufqa) jîyana rewşenbîrîya Kurd de hilket. Hejmarekê zêde ji dîroknivîs û nivîskarên me û yên bîyanîyan, van rastîyên han weşandine. Dr.Şakîr Xesbak û Dr. Blech Şîrkuh, rojnama Kurdistan, destpêka guherîna jîyana Kurd hesibandine(46). Dîyar e her evan sebeban tirsê xist dilê karbidestên Tirkîyê û wisa lê kirin ku her di destpêkî de belavbûna Kurdistan di nav welatê Osmanî de qedexe bikin. Ev rastîya han di naveroka rojnamê bi xwe de bi ronî dîyar e. "Derîyê Bilind", bi vê tenê jî nema, di wê nama Mîqded Midhed Bedirxan de ku ji bo Sultan Ebdulhemîdê Duyem şandîye û wek sergotar di hejmara 5'an a Kurdistan de belav bûye, aşkera têt dîtin ku çawa mirovên Sultan ketine bahaneya girtin û şerfirotina xwedîyê Kurdistanê, vê yeka han derecek wisa pêşde birine ku êdî daxwaz ji karbidestên Misrê kirine wî welatparêzî Kurd wek "gunehkarek" bişînin Stenbolê. Wisa dixuyê ku ev êrîş û tehdîtên han ên çetên Sultan, Mîqded Midhed Bedirxan naçar kir ku piştî hejmara 5'an, êdî dev ji weşandina Kurdistan berde. Piştî vê Bedirxanî naçar bûn cîyê rojnamê biguherînin bajarê Cenevrê û li wir jî

---

(*) Di orîjînalê rojnamê de di bin vê şiîra navê wê derbaz dibe de navê Lawê Şêx E.Fetah heye. "Lawê Şêx E.Fetah, naznavek e ku Emîn Alî Bedirxan bikaranîye. Emîn Alî Bedirxan birayê mezin ê weşankerê rojnama Kurdistan Mîqded Mîdhed Bedirxan e û eynî wextî babê Celadet û Kamran Bedirxan e-Malmîsanij"

(46) Binêre: Dr.Şakir Xesbak, El-Kurd we Meseletu'l Kurdîyye, Dr.Blec Şêrko, El-Qezîyyetu'l Kurdîyye Mazîyu'l-Kurd we Haziruhum, Qahîre, 1930, rûpel: 51.

Ebdurrehman Bedirxanê birayê Mîqded Mithed(47) çapkirina wê girt ser milê xwe.

Bi vî awayî di riya rojnama Kurdistan re mirov dikare gelek alîyên bi qîmet ên edebîyat û dîroka nû ya gelê kurd ronî bike. Rojnama Kurdistan, rûpelek gelek hêja û serwetek giranbiha ya gelê Kurd e.

## Pêncem
## MUHR Û ORGANA "KOMELA KURDISTAN"

Di destpêka sedsala 20'an de û bi taybetî piştî serkevtina şoreşa sala 1908'an a Tirkên Ciwan ku text û taca Sultan Ebdulhemîdê zordar ji bin hat kişandin, rewşenbîrên Kurd li Stenbol û Dîyarbekrê ketin damezrandina komel û rêxistinên serbixwe; wek **Komela Kurdistan** (Kürdîstan Cemîyetî), **Kürt Te'amîmî Maarîf ve Neşrîyat Cem'îyetî, Komela Bilindbûna Kurdistan** (Kürt Tealî Cemîyetî) û h.w.d. Di wan wextan de, her wiha jinên Kurd jî ber bi hişyarîya xwe ve çûn û grubek jinên pêşeng **Komela Bilindbûna Jinên Kurd** (Kürt Kadınları Teali Cemiyeti) damezrandin(48). Roleke gelek mezin a van komelan di tevgera netewî û di jîyana rewşenbîrî ya gelê Kurd de hebû.

Li Kurdistana Iraqê, heta dawîya Şerê Cîhanê yê Yekem tu komel û rêxistin nehatibûn avakirin. Aşkera bû ku wî çaxî gelê Kurd ket nav xebatek asê û dûr-dirêj li dijî Ingilîzê dagirker. Di warê vê xebatê de grubek ji rewşenbîrên vê perçê han a Kurdistanê, bi giringî û qîmeta komel û rêxistinan a ji bo ku di jîyana gel de cîyê xwe bigrin, gîhiştin. Bi vî awayî di salên 20'an de, di vê perçê de jî dest hat avêtin ji bo damezrandina çend komele û rêxistinan. Mamoste Refîq Hilmî di vî warî de wiha dibêje:

---

(47) Mîqded Mithed navekî hevedudanî yê wek Ismaîl Heqqî, Mistefa Kemal û gelek ên wek van e, wan deman de li welatê Osmanî de belav bûye.

(48) Kurd Kadınları Cemiyeti (Komela Jinên Kurd).

*"Ji alîyê welatparêzên Kurd de...her roj komelek dihat damezrandin".*(49) Komelên sîyasî yên Kurdistana Îraqê di wê qonaxê de feydeke mezin ji serpêhatîyên komel û rêxistinên sîyasî yên Kurdistana Tirkîyê wergirtin. Ji ber ku bi taybetî beşek ji damezrêner û endamên wan ên aktîf berî xelasbûna Şerê Cîhanê yê Yekem li Stenbolê xwendibûn û kar kiribûn.

Yek ji van komelên ku di destpêka salên 20'an de li Kurdistana Îraqê hatin damezrandin, **Komela Kurdistan** (Cem'îyetî Kurdistan) bû. Ev komela han yekem rêxistina aşkera bû di dîroka Kurdistana Îraqê de ku karbidestên Îngilîzan ji ber gelek sebeban naçar man rîya xebatê bidinê.

Komela Kurdistan, li bajarê Silêmanîyê, roja îna 21'ê Tîrmeha sala 1922'an di civînek mezin a di Mizgefta Seyîd Hesenê Muftî de, di bin serokatîya Mistefa Paşa Yamulkî de hat damezrandin. Di riya dengdana nihênî de, Refîq Hîlmî, Ehmed Begê Towfîq Beg, Salih Qeftan, Faîq Begê Marûf Beg, Hacî Axayê Fethullah, Îzzet Begê Osman Paşa, Ethem Efendî, Ehmed Behcet, Şêx Mihemmedê Gulanî, Şêx Elîyê Serkar, Elîyê Bapîraxa, Ebdullah Efendîyê Mihemmed Efendî û Şukrî Heleke ji bo birêvebirin û organên komelê hatin helbijartin(50).

Muhra Komela kurdistanê ya taybetî hebû û li ser wê wiha hatibû kolandin: **Cem'îyetî Kurdistan.** Li ser navê wê jî wêna rojê hebû(51). Ev muhra han ji alîyê, Xwedê jê razî be, Ebdulezîzê kurê Mistefa Paşa ve hatîye parastin.

Her di wê wextê de Komela kurdistan, biryar da organeke hefteyî bi navê **Bangî Kurdistan**(52) derxe ku yekemîn hejmara wê roja çarşemba 8'ê Zulhecceya 1340'ê koçî (2'ê Tebaxa

---

(49) Binêre; Refîq Hîlmî, Yaddaşt (Bîranîn), cilda du, beşê yekem, Bexdad, 1956, rûpel: 28.

(50) Binêre: Bangî Kurdistan, Silêmanî, hejmar: 1, 2'yê Tebaxa 1922'an, rûpel: 1-2.

(51) Binêre: wêna ser muhra Komela Kurdistan ku di rûpelê 404'ê hejmara Kovarî Korrî Zanyarî Kurd de ye.

(52) Bangî Kurdistan.

sala 1922'yê zayînî) li Silêmanîyê hatîye çapkirin. Li ser hejmara pêşîn a Bangî Kurdistan wiha hatîye nivîsandin: Sahîbî îmtîyaz û mudîrî mes'ul: (Xwedî û Midurê Berpirsîyar) Mistefa Paşa

Nivîskarên Kurdî û Farisî: Elî Kemal û M. Nurî

Nivîskarên Tirkî Refîq Hilmî".

Di bin navê rojnamê de jî eva han hatîye nivîsandin:

*"Zemanê gurz û rim rabûrd (rabwird) û êsta palewan 'ilm e Silahê dest e sen'et, barîqeî tîx û sinan 'ilm e."*

*" Ilmî, îctimaî, edebî, xezeteyekî hurr û serbest ê millî ye, heftê carêk derdiçî"*(53).

Ji derveyî yên ku bi armancên taybetî hatine derêxistin û rolek kevneperestî lîstine, hemû rûpelên dîroka rojnamenivîsî ya Kurdî cîyê şanazîyê ne, herçiqas gelek rojname yan kovarên kurdî zor bi dest dikevin jî. Wek belge, li vir bi bê destlêdan mîsalek biçûk ji Bangî kurdistan em ê bidin. Li ser rûpela 3'an a vê rojnamê eva han hatîye nivîsandin:

*"Mesrefî çapkirdin wesaîreyî ewwel nusxeyî em xezeteye le terefî e'zayanî daîmîy Cem'îyetî Kurdistanewe te'mîn kira û em ewwel nusxeyey teberrueken we meccanen tewzî' we teqdîmî biraderanî weten dekrê".*

Di eynî hejmarê de bi navê sahîbî îmtîyaz (xwedî îtîyaz) Mîrlîva Mistefa, eva han hatîye belav kirin ku ji ber qîmeta wê bi bê destlêdan em pêşkêşî xwendewanan dikin:

*"Es-selamû aleykûm ey Kurdan, ey qewmî qedîmî Pehlewî, gwê bigrin le Bangî Kurdistan, em bange bo xeberdarîy hemû Kurdan e, bo huşyarîyî şêran e, bo bîstînî bawk û daykan e, gwê bigrin em bange çîy tê da ye, em haware bo çî ye, qisey pirr û pûçî kolanan, diro helbestinî rêjgawan besîye, temaşay 'alem biken le sin'et û me'rîfet da le ême paşkevtûtir kê heye? Kalayekman nîye bo setrî ewretman kafî bê, derz w dazûyekman man nîye ke destkirdî welatman bê, nîşaney ezemet û xanedanîş ke êste 'îbaret e le şekir û ça ewaneyş hî Kurdistan nîn, le cêgeyanî dûr dêtin. Parçekaxezêk ke bo*

(53) Ev nivîs wek eslê xwe hatiye nivisîn.

*nuştey çewr û şêrîn bê, ewîş le Frengîstanewe dêt(54), le seda çwarman tê da nîye ke kaxezêk bo kes û karî w sirrêkî mehremane bo aîley xoy binûsê. Mişkî w mîzerman le Êran û Frengîstan û gurûnî gul hoqqeyman le Hindûstan û ebay gewrey nazdaranman le Erebîstan û kifinî mirduwanman le Ewrûpa w melûtkey mindalanman le Emerîka we bo dêt".*

Hejmarên Bangî Kurdistan bi piranî ji xeber, gotin û gotarên girîng pêk dihatin. Bêguman belgên bi qîmet in ji bo ronîkirina gelek alîyên dîroka nû û hevdemî ya netewa Kurd(55).

Bangî Kurdistan li Silêmanîyê derçûye û 14 hejmar jê hatîye weşandin û di tevan de, li ser rûpelê dawîya rojnamê hatîye nivîsandin ku li Çapxana Hukumetê li Silêmanîyê hatîye çapkirin.

Roja weşandina hejmara 14'an a Bangî Kurdistan 8'ê Hezîrana sala 1923'ê ye, pîvana hemû hejmaran 22,1x34 cm. bûye, hejmara 14'an ne tê de (ku ew 4 rûpel bûye), hemû hejmarên din 6 rûpel bûne.

Hêjayî gotinê ye, Mistefa Paşayê Yamulkî di destpêka sala 1926'an de, her bi navê Bangî Kurdistan 3 hejmarên din weşandine ku li ser wan nivîsandîye 14-1, 14-2 û 14-3. Di van de Mistefa Şewqî nivîskar û Kerîmê Rustem jî kargerînê wê bûye.

---

(54) Frengîstan, yanî welatê Ferenkan. ji navê wê eşîra Avrupî ya kevin ve hatîye ku bi Latînî Franci û bi Frensî Francs jê re dibêjin. Ev eşîra han ji keven ve xwedî desthilat û dewlet bûye. Di dema Rojhilatîyan de bûye Ferenci û gelek car di cîyê Avrupayê de hatîye bikar anîn û wek gotin di nav çîn û tebeqên jor ên civakê de belav bû û heta van dawîyan jî dihat bikaranîn. Wisa dixuyê di riya zimanê Tirkî ve têkelî nav Kurdîya me bûye.

(55) Kek Cemal Xeznedar karekî gelek baş kir ku wêneyê hejmarên van rojnaman belav kir, bi vî awayî bûye serokanîyekî li ber destên me û yên bîyanîyan (binêre: Bangî Kurdistan berhevkirin û li ser nivîsandin: Cemal Xeznedar, Bexdad, 1974).

## Şeşem
## YEKEM KOVARA ZAROKAN BI KURDÎ

Temenê hemû salên Komara Mahabad ku di roja 22'yê Kanuna Duyem a sala 1946'an de damezra û Kanuna Yekem a eynî salê hilweşîya, bûye dema geşkirina rojnamenivîsî ya kurdî. Di wê dema kurt de, li gor Kurdistanê hejmarekê gelek zêde rojname û kovar bi zimanê Kurdî hatin derxistin. Wek Kurdistan, Helale, Hawar, Hawarî Niştiman, Hawarî Kurd û h.w.d. Di wan rojan de di dîroka gelê Kurd de yekemîn kovara zarokan bi navê **"Girrûgalî Mindalanî Kurd"** hatîye weşandin.

"Girrûgalî Mindalanî Kurd", di **"Çapxana Kurdistan"** a Mahabadê de dihat çapkirin û di bin navê kovarê de wiha hatîye nivîsandin: "Bîrî Kargeranî Çapxaneyî Kurdistan e." Li dor û berê dawîya bihara sala 1946'an hejmara yekemîn derketîye. Hejmara duyem roja 1'ê Cozerdana sala 1325'an ( 21'ê Gulana sala 1946'an), hejmara sêyem roja 1'ê Pûşperê 1325'an (21'ê Hezîrana sala 1946'an de) derketine. Wisa dîyar e ku her ev her sê hejmarên han hatine weşandin(56).

Pîvana hejmara duyem û sêyem a "Girrûgalî Mindalanî Kurd" 22,5x15 cm. e, Qadirî Muderrisî berpirsîyarê wê bûye. Di van herdu hejmaran de çend dersên ziman, coxrafya û behsên din tê de belav kirine. Li ser rûpela yekemîn a "Girrûgalî Mindalanî Kurd" wêna Selaheddînê Eyyubî hatîye weşandin.

---

(56) Hejmara 2 û 3'an a "Girûgalî Mindalanî Kurd" li ba min heye, ç kesê ku bixwaze dikare jê îstîfade bike. Her wiha suretên wan di Kitêbxana Akademîyê (Korrî Zanyarî Kurd) de hene.

# MIJARA HEŞTAN

## YEKEMÎN ÇAPXANA KURDÎ YA BAJARÊ SILÊMANIYÊ

Rojnamegerîya kurdî eynika raste rast ya rûpelên serpêhatîyên dîroka gelê me ye(*). Bê xewîtî, hewil û keftûlefta bêrawestan a eskerên bênav ên wê saha girîng a jîyana rewşenbîrên me, hêjayî nirxandinek bilind û lêkolîneke fireh e. Gelek mixabin kesek ji me di wextê xwe de neket pê berhevkirina serpêhatîyên wan nemirên binax ên ku bingehê dîroka rojnamegerîya kurdî danîn. Ji ber vê piraniya wan destanên me yên nihênî ji kîsê me çûn û evên han li gel ên wek Pîremêrd, Huseyn Huznî Mukrîyanî, Salih Qeftan û gelek lawên wek van bi wefa yên xelkê me re, çûn bin erdê. Eva han jî wek gelek tiştên me yên din dibû wiha be!!.

Di sohbetek de, Mamoste Ehmed Xwaca hat ser behsa dewra 60 sal berê niha. Em ketin behsa yekemîn çapxana Kurd ku Îngilîzan li Silêmanîyê damezrandin. Hinek rastîyên bi qîmet ên ku nayên zanîn ketin destê min ku hêjayî weşanê ne.

Piştî tefandina qonaxa yekemîn a Serîhildana Şêx Mehmud

---

(*) Ev nivîs di "Rewşenbîrî Nwê", hejmara 77, Çirya Yekem 1979, rûpel: 31-34'an de hatîye belav kirin.

(dawîya bihara sala 1919'an), Îngilîz ji bo ku zêdetir çavên xelkê bitirsînin û bi zîrekîya xwe dilê xelkê hîn zêdetir ber bi xwe ve bikişînin, Major Soane kirin hakimê sîyasî yê herêma Silêmanîyê. Major Soane, ji bo bicîanîna vê wezîfê ji hemû wan Îngilîzên wê serdemê zêdetir musaîd bû. Kurdîyek baş dizanî, baş şarezayê kon û valatîyên vê beşê han ê Kurdistanê bû. Wek hemû dagîrkerên din jehr û şekir têkel dikir. Gelek caran pena dibir ber sîtem û zordarîyê, carên wisa jî hebûn destê alîkarîyê ji bo grubek dirêj dikir û hinek caran jî kesan dikirrî. Lê wek Avrupîyek pêşkevtî difikirîya û bi xwe jî kurdnasekî mezin bû. Ji ber vê damezrandina çapxanek kurdî pêwîst zanî. Di wê serdemê de jî Îngilîzan ji bo meşandina karên resmî û ji bo ku propagandên xwe baştir bibin serî, hejmarek çapxanên kevin anîbûn Îraqê. Li ser daxwaza Major Soane yek ji wan çapxanan birin bajarê Silêmanîyê û yeka din jî birin bajarê Kerkûkê.

Major Soane bi xwe karê çapxana Silêmanîyê îdare dikir û rê û ciyek baş jê re amade kir. Xanîyê Faris Efendî yê li hemberê mala Heme Axayê Ebdurrehman Axa, jê re girt û kir bingeh. Mezintirîn astenga wî ew bû ku çawan û li ku dê bikare kesên herfan radixe peyda bike. Di wê serdemê de karkerên xwendevar kêm bûn. Her çi hal bû, Major Soane karî sê xortên xwendevar razî bike da ku karê çapxanê bigrin ser milên xwe (Şêx Mecîdê Şêx Arif, Edîb Ezîz û Mihemmed Zuhdî). Van her sê pêşengên rojnamegerî û çapxanegeriya kurdî ya Îraqê, herfan radixistin, nivîs rast dikirin û vêca bi makînê dest bi çapê dikirin. Her çend ev karê han gelek giran nebû lê rehet jî nebû.

Yekemîn karê çapxana Silêmanîyê, amadekirina kaxez û çapa taybetî ji bo bi rêvebirina kar û barên resmî bû. Lê, mezintirîn karên ku kirin weşandina yekemîn rojnama kurdî li Kurdistana Îraqê bû. Piştê keftûlefteкê zêde, Major Soane, roja 29'ê Nîsana sala 1920'an yekemîn hejmara rojnama **Pêşkewtin** xist pîyasê. Pêşkewtin (32x20 cm.) heftê carek, di destpêkê de çar û pişt re jî şeş rûpel û dor û berê du salan bi awakî rêk û pêk derket. Major Soane bi xwe serkarîya wê dikir û car û caran nivîsan jî tê de dida belav kirin, eva han nimûnê yek ji wan

nivîsan e:

*"Ji bo agahdarîya tevan:*

*Mecîd kurê Elîyê Hemewendî, 27 salî ye, mêr e, simbêlboqê û simbêl dirêj e, rûyê wî top e û porrê wî sor e; mirovek kuştîye û revîyaye, kî xeber bide ka ew Mecîd ku de çûye yan bigre bigihîhe hukumetê 300 rûpî dê jê re bê dayîn.*

*Hakimê Sîyasî Major Soane"*(1).

Pêşkewtin, li gor wext û cîyê xwe rojnameke dewlemend û pêşketî bû. Grubek rewşenbîrên bi nav û deng ên wek Cemal Îrfan, Şêx Nurîyê Şêx Salih, Cemîl Saîb û Zekî Saîb berhemên xwe tê de belav dikirin û bi vî awayî cîyek Pêşkewtin a aşkera di dîroka rojnamegerîya Kurdi de heye û îro hejmarên wê yek ji wan serokanîyên eslî yên lêkolîna gelek alîyên jîyana gelê me ne.

Li gel vê jî naveroka hejmarên Pêşkewtinê, ji şaşîtîyên mezin û nîşanên paşdemayînê bêpar nînin. Di vir de em vê nimûna han a balkêş dixin ber çav ku wê rojnamê derbarê rêça (regeza) Kurdan de belav kirîye. Di hejmareka Pêşkewtinê de, wiha hatîye nivîsîn:

*"Dema ku deng û behsê*(2) *pêxemberîya Muhemmed Mustefa (S.E.W.) gihîşt hemû milek, xilxile xist dinyayê û wisa lê hat ku xaqan û sultanan heleqa bendîtîya wî mezinî kirin guhê xwe. Oxuz (Oğuz) Xan ku di wî wextî de mezintirîn sultanê Turkistanê bû, bi navê Bexdûz mirovekî maqûl ji Kurdan, bi ser û rûçikên wî yê neşirîn ve şand cem pêxember(S.E.W.). Dema ku çavên Pêxember (S.E.W.) lê dikeve, ji ser û rûçikên wî dilê wî diheje. Eşîr û qebîla wî dipirse, Bexdûz dibêje "ez Kurd im". Ew hezret jî jê re dibêje; ew Xwedayî tebareken te'ala vê tayîfa han muwefeqê îttîfaqê neke, ger îttîfaqa wan hebe alem dê ji destê wan bêzar be. Êdî ji wê rojê şun de, ji derveyî pênc tayîfe, dewlet û saltanatên mezin ji bo wan rêneketîye.."*(3).

(1) Pêşkewtin. Silêmanî, 3 Adar 1921.

(2) Tenê ji alî rênivîsê hatîye guhertin.

(3) Pêşkewtin, 14 Çirya Yekem 1920.

Major Soane, ne di riya rojnama Pêşkewtin û ne jî di riya tu karek din nikarî gelê Kurd bide sekinandin. Welatparêzên Kurdistanê serî ber Îngilîzan netewandin û nerazîbûnên xwe heta ji destê wan hat zêde kirin û wisa kirin ku dagîrker neçar bin rê bidin Şêxê Pîşewa (Şêx Mehmûdî Berzencî -Elîşêr) ji derve, ji dûrketina der û dorên xwe, vegere nav axa welat(4). Di yek belgeyê xwe yê taybetî de, Îngilîzan rasterast vê yeka han qebûl kirine ku di wê serdemê de *"hemû hestê neteweyî yê xelkê Kurdistanê ji bo vegerîna Şêx Mehmud hatibû amade kirin"*(5). Îngilîz neçar bûn serî li ber daxwazên gel bitewînin, plana ji holêrakirina Şêx ji serê xwe derêxin(6) û bi wê hêvîya ku "ders" ji wan derd û ezîyetên derbederîya çend salan wergire, rê bidin ku ew vegere welat(7). Lê, Şêx wek welatparêzekî esîl, her kirinên xwe yên berê dikir, ji ber vê ku dema vegerîya ye ji carên berê hîn zêdetir nerazîbûna xwe pêş de birîye ku pê bîyanîyan ji axa welat bibre. Çend belgên din ên Îngilîzan behs dikin ku çawa berê Şêx gihîjtiye Silêmanîyê, her di rê de peywendîyên nihênî li gel hêzên welat re girê daye û xwes-tîye feyde ji dijîtîyên Kemalîstên Tirkîyê bi

---

(4) Piştî tefandina qonaxa yekem a serîhildanê, Şêx Mehmud birîndar bû û esîr hat girtin, piştî biryardana xeniqandina wî ji welat dûr xistin.

(5) Binêre; (Iraq. Report on Iraq administration April 1922 - March 1923), London, 1924, P.33.

(6) Di Şerê Derbendî Bazîyan de (17'yê Hezîrana sala 1919'an) Şêx Mehmud birîndar bû, Îngilîzan wî li Berdeqareman esîr girtin. Fermanberê sîyasî yê giştî yê wî çaxî ya Iraqê Arnold Wilson, ji bo ku "asayîş di Kurdistanê de çêbe" ji holêrakirina Şêx pêwîst dizanî.

Binêre: A.T.Wilson, Mesopotamia 1917-1920. A clash of loyalities. A personal and historical record, London, 1930, P.139.

(The letters of Gertrude Bell), London, eleventh printing, April 1930, P. 433. (Di orîjînalê de reqema nota heftan nehatîye danîn, ji ber vê me jî wek orîjînal hîşt -Elîşêr)

Îngilîzan re werbigre ku wan rojan de ew di Rojhilata Navîn de mezintirîn nehizkerên Îngilîzan bûn[8].

Roja 30'yê Îlona sala 1922'yan Şêx gihîşt Silêmanîyê. Gelek ser de neçû zorê da Îngilîzan û wan neçar kir ku dev ji navça Silêmanîyê ku cardin banga azadîyê tê de hat bilind kirin, berdin. Dema ku Îngilîzan Silêmanîyê terk kirin, nikarîn çapxanê li gel xwe bibin. Ji ber ku bi awakî gelek zû şoreşgerên Kurdan dest danîn ser. Vê çapxana han rolek mezin di jîyana sîyasî û rewşenbîrî ya wan rojên nazik ên Kurdan de lîst. Ji tevan jî girîngtir ew herdu rojname bûn ku wek organên weşanî yên rejima Şêxê nemir bi navê **Bangî Kurdistan** û **Rojî Kurdistan** hatin belav kirin û her gelek zû bûn rûpelên vekirî yên rojnamegeriya Kurdî.

Çalakîyên rewşenbîrên Kurd di wan rojan de rik û daxwaza Îngilîzan hîn zêde kir, Îngilîzan xwest ku rojek zûtirîn rejima sava ya Şêx Mehmud bi zindî çal bikin. Top, teyare, pere û hemû kirinên nizm têkel bûn û Şêx naçar kir berbeyana 24'ê Adara sala 1923'yan carek din şer bicî de bihêle û li gel alîgirên xwe cîyê xwe biguherîne navça çîyayî ya dor û berê Sûrdaşê. Vê carê şoreşgerên Kurdan ji bo xebata nav gel ji carên din zêdetir cî dan qîmeta çap û çapemenîyê . Ji ber vê yekê di wan rojên teng de bi hewl û keftûleftê gelek mêrane çapxana xwe li gel xwe birin û Şikefta Casene de bicî kirin û despê kirin rojnama **Bangî Heq** pê çapkirin û ji li vir jî digîhandin gelek herêmên Kurdistanê.

Aşkera ye ku Îngilîz bi vê yeka han qayîl nedibûn ku bingehê şoreşê bin destê wan de derkeve û bi wê jî gîyana wan pê veçirin. Ji ber vê dor û berê dawîya Gulana sala 1923'yan hêzên xwe kirin navça çîyayî ya Sûrdaşê û şoreşgerên Kurdan naçar kirin ku berê xwe bidin Pêncwîn û Pîran. Wisa dixuyê vê carê nekarîne çapxanê li gel xwe bibin û bi vî awayî ketîye

(8) Binêre: (Speciel raport by His Majesty's Government in the United Kingdom of Great Britain and Northern Ireland to the Council of the League of Nations on the progress of Iraq for the period 1920-1931), London, 1931, P. 255.

( Report on Iraq Administration April 1922 Marth 1923), P. 36.

destê Îngilîzan[9]. Wan çapxanê ji Şikefta Casere birin Silêmanîyê û cardin danîn cîyê wê yê berê.

Van gavan jî alîkarîya Îngilîzan nekir, her roj di milek de cinên şoreşa Kurd xwe nîşanê wan didan û heta wan naçar kirin ku cardin dev ji Silêmanîyê berdin. Roja 17'yê Hezîrana sala 1923'yan hêzên çekdar ên Îngilîzan bajêr bi cî hiştin. Hejmarek sernizmên welat û rûreşên dîrokê jî ku ziravên wan ji tola gel diqetîya li gel wan bajêr terk kirin[10]. Şoreşgerên Kurdan, bi navê Şêx, di bin serokatîya Kerîmî Fetah Begî Hemewend de kar û barên bajêr girtin dest û heta bi xwe roja 11'yê Tîrmehê bi serbilindî vegerîya.

Cardin Îngilîzan firsetê nedîtin çapxanê bi xwe re bibin, lê wek carên berê di cî de nehîştin, ji bo ku riya xebatê ber bibirin, mîla wê jê derxistin û li gel xwe birin. Şêx ferman da her çawan be hewce ye çapxanê bixin kar. Weste (Hoste) Salihî Silêmanî Cejnî ku çaxmaxsazekî zîrek bû, di navbera du rojan de mîlek din jê re durust kir, bi vî awayî çapxane ket kar. Piştî vê bûyerê bi destê xwe namek ji bo Şêx Mehmud çap dikin û wek mizgînî jê re dibin. Ew jî ji ber xweşîya vî karî, di cîyê 60 rûpî heqê dest de 200 rûpî dide Westa Salihî Cejnî. Piştî vê ji bo cîbicîkirina derêxistina rojnameyek, komîteyek taybetî pêk tînin. Endamên komîtê Ehmed Xwaca, Macîd Mistefa, Adilî Şêx Selam, Seyîd Ehmedî Berzencî û Sebrîy Kake Reş, li mala Îzzet Beg dicivin û piştî munaqeşê van çend navên han ji bo rojnamê pêşnîyar dikin. Kurdistan, Umîdî İstîqlal, Goyje, Weten, Serkewtin, Yekyetî û çend navên din. Van navên han bi cihê cihê ser kaxizan dinivîsin, dipêçin û diçin ber derî, li wir rastî Qadir Axayê xelkê Pişderê tên, Qadir Axa sê car bi ser hev de navê "Umîdî Îstîqlal" dikişîne û bi vî awayî ew dibe navê rojnamê.

---

(9) C.J.Edmonds, Kurds, Turks and Arabs. Politics travel and research in North Eastern Iraq, London, 1957, P. 332.

(10) Di nav wan kesên ku bajêr bi cî hiştin de însanên pak jî hebûn, lê ew bi gotinên Îngilîzan xapabûn.

Îlona sala 1923'an, rojnama Umîdî Îstîqlal bûye rûpelek şewqdar a weşana rojnamegerîya Kurdî. Mihemed Zuhdî[11] tenê bi serê xwe vê rojnama han çap dikir. Tîpên her hejmarek çend rojan radixist û rojekê jî çap dikir.. Piştî derketina hejmara yekemîn, Şêx, wî bi 150 rûpîyan xelat kir û maaşê wî jî ji 45 rûpîyan kir 100 rûpî.

Ji hejmara yekemîn a "Umîdî Îstîqlal" hezar lib hatine çapkırın û di demek kêm de hemû belav bûne, çend libên wê jî di rîya Kifrî re şandine Bexdayê. Kesên wisa hebûn ku ji bihayê wê du-sê qat zêdetir heq didan. Piştî vê hejmarê grubek nivîskar kaxiz û murekeb kirrîn. Eynê wextê çapxane ket çapkirina sê cur pereyên taybetî yên ji sê rengan pêkhatî. Yek 'ane, heşt 'ane û yek rûpî. Şêx Letîfê Se'etçî nava wan pûlên kevin qul (kun) dikir û bi vî awayî qerax ji wan re durust dikir.

Dengdana Umîdî Îstîqlal gelek tesîr li ser Şêx Mehmud kir û wî biryar da ku çapxanek hîn mezintir ji Almanya bide anîn. Lê, plan û zordestîyên Îngilîzên dagirker rê nedan bi awakî berfireh grubek rewşenbîrên Kurd bikevin holê. Gelek di ser de neçû, cardin firokan cî li xelkê Silêmanîyê û der û dorên wî teng kirin û dawîya Gulana sala 1924'an Şêx û alîgirên wî, bi hezaran pîr-kal, jin û zarokan ve neçar bûn carek din bajêr bi cî bihêlin. Piştî dor û berê mehek, dema ku Îngilîzan Silêmanîyê îşxal kirin ji 20 000 kesî tenê nêzîkî 700 kes tê de mabûn, yên din hemû derketibûn (13).

Bi vî awayî weşandina Umîdî Îstîqlal jî rawesta. Vê carê firset neket destê şoreşgerên Kurdan ku çapxanê bi xwe re bibin. Mehek di ser de derbaz nebû, dezga nû ya resmî (ya Kurdan) ket belavkirina rojnama Jîyanewe ku hejmara wê ya yekemîn di roja 18'yê Tebaxa sala 1924'an ket pîyasê.

---

(11) Piştê ku Silêmanî ji alîyê Îngilîzan de hat îşxal kirin, Mihemed Zuhdî yekser çû Tirkîyê. (Di metnê orîjînal a kitêbê de nota 12'an tune, ya 13'an heye, lê ev herdu notên han jî di qismên notan de nehatine nivîsandin -Elîşêr).

## MIJARA NEHAN

## CIYÊ GELÊ KURD DI ŞOREŞA BÎSTAN DE

Cîyekî gelek aşkera yê Şoreşa Sala 1920'an, di dîroka hevdemî ya Iraqê de heye(*). Tenê alîyek wê ya girîng nebe, behsa serpêhatîyên vê şoreşê dûr û dirêj ji alîyê dîroknivîsên me û yên bîyanîyan de hatîye kirin. Ya ku li ser nehatîye sekinandin, di vê şoreşê de rola gelê Kurd e ku tiştek wisa di derbarê wê de nehatîye nivîsindan û heta îro jî pêwistî bi lêkolîn û nivîsandinê ye[1]. Heta beşek ji dîroknivîsên derve di wê bawerîyê de nin ku goya qet rolek Kurdan di vê şoreşê de nebûye[2]

(*) "Birayetî", Bexdad, hejmar: 4, cilda duyem, destpêka Îlona sala 1970, rûpel: 22-26'an de hatîye belavkirin.

(1) Ev gotara min çend sal berê di kitêbek min de hat çapkirin ku min wê kitêbê bi zimanê Erebî derbarê cîyê Kurdan di Şoreşa Bîstan de bi vê navê weşandîye: "Dewru'l Şe'bu'l Kurdî Fî Sewretî'l 'Eşrîn el-Iraqîyye, Bexdad, 1978.

(2) Rojhilatnasê Sovyet Prof. N.Awhanisyan, di wê gotara xwe ku di kitêba "Welat û Gelên Rojhilata Nêzîk û Navîn" de bi navê "Xebata Hêzên Demokrasî yên Iraqê di Pênava ji Holê Rakirina Întîdabî Brîtanya de" bilav kirîye, dibêje: goya Kurd beşdarê Şoreşa Bîstan nebûn.

Ev yeka han jî heye, kesên wek P.W.Areland û S.H. Longrigg, qîmetek wisa bi rola Kurdan nedane. Ji ber vê, ronîkirin û derxistina rola Kurdan di Şoreşa Bîstan de xwedî qîmetek taybetî ya dîrokî ye. Qet nebe ji ber ku ev şoreşa han yekemîn tevgera rizgarîxwazî ya bi muşterek a herdu gelên mezin ên Iraqê, Ereb û Kurd e.

Aşkera ye ku mirov nikare di tenê gotarek de bi dirêjahî û pêwistî rola gelê Kurd di Şoreşa Bîstan de dîyar bike. Ji ber vê em ê di vir de hewil bidin tenê çend alîyên wê yên bi qîmet ên wê dewrê bixin ber çav.

Berê hemû tiştek pêwîst e ev rastîya han bê derxistin ku rola Kurdên Iraqê di çêkirina rîya berpabûna Şoreşa Bîstan de mezin bûye. Demek gelek berê teqîna vê şoreşê, di gelek navçên Kurdistanê de xebateke mezin a çekdarî li dijî Îngilîzên dagîrker destpê kiribû. Hemû bi ser hev şeş meh ser hatina Îngilîzan de derbaz nebû, gundîyên Goyan bi çek dijî wan serî hildan. Wan navan re li çend navçên Behdînan çend zabitên Îngilîzan hatin girtin û hêzên dijmin mecbur man ku bi paş de vegerin. Dawîya bihara sala 1919'an jî çirîskên agirê xebatê hemû navçên navbera Kerkûk û Silêmanîyê girtin û çend car zora Îngilîzan birin. Tenê di wî şerê nêzîkî Tasloce yê roja 23'yê Gulana sala 1919'an de, şoreşgerên Kurd, li gor serokanîyên Brîtanya bi xwe, karîn hejmarek eskerên Îngilîzan bikujin, çar wasitên zirh û 19 otomobîlên Ford bişkînin(3).

Deng û behsên vê serîhildana Kurdistanê tesîrek gelek zêde li ser navçên Iraqê yên din kir û ket ser devê kesên sîyasî yên Bexdad, Kerbela, Necef û bajarên din. Ev yeka han di milek de bû sebebek din ê aşkerakirina rûyê rasteqînî yê dagirkerên nû û di milek din de jî nîşan da ku kolonyalîs kelayek ji polayê ya asê nîne ku kes pê nekaribe, ji ber ku îrada gel dikare bi çek û îttîfaq ve, bingeha vê jî tar û mar bike. Ev jî, bêguman, çavê xelkê zêdetir vekir, tirsa ku li ser wan bû şikest û bi vî awayî rê ji bo Şoreşa Bîstan xweştir kir. Rojhilatnasê bi nav û deng ê

(3) Binêre: A.T.Wîlson, Mesopotaîa 1917-1920. A clash of loyalities. A. personal and historical, London, 1930, P.137.

Sovyetî L.N.Katlov, di kitêba xwe ya li ser Şoreşa Bîstan [4], beşek ji bo vê behsê amade kirîye, ji ber ku li gor wî, serîhildanên Kurdistanê rêçêkerên hêja yên van şoreşan in.

Nimûneyên vê jî hejmarek Kurdên naskirî yên endamên wan komele û rêxistinan bûn ku destê wan di amadekirin û hilkirina agirê şoreşê de zêde bû, wek "Heres el-Istîqlal" ku kesên wek Celal Baban endamên wê yên berçav bûn.

Li gor raya van, dema şoreş destpê kir Kurd destgirêdayî neman. Di wan rojan de çend melbend û navçên Kurdistanê çalakane hatin pêş û niştecîyên wan jî li dijî Îngilîzên dagirker serîhil-dan. Her di destpêkê de beşek ji serokên şoreşê pêwist zanîn ku ji derveyê eşîrên Ereban eşîrên Kurdan jî bikişînin nav kurahîya xebatê[5]. Ew Kurdên ku li Bexdayê dijîyan beşdarîya hemû wan xwenîşandan û civînên niştecîyên vî bajarî dikirin.

Di destpêka meha Tebaxê şûn de Kurdistan bû ciyê tevlihevîyê û vê yeka han jî barê ser milê Îngilîzên dagirker girantir kir. Loma naçar bûn beşek ji hêzên xwe yên Firata Navîn ber bi wir de bînin.

Li Kurdistanê agirê şoreşê berê hemû ciyan li navça Kurdên Baqube hilket. Roja 14'yê Adara sala 1920'an Kurdan karî Qizrabat azad bikin.Vê yeka han niştecîyên Xaneqînê jî şidand. Pêşmergên vê navçê êrîşeke serkevtî birin ser kompanya petrola Brîtanya-Iran a navça Neftxanê. Di milek din de jî karîn xeta trênê ya navbera Xaneqîn-Bexdad,Bexdad-Kingreban-Kerkûk têk bibin û bi vî awayî peywendîya navbera hêzên Îngilîz ên Kurdistanê û yên naverast û xwarê Iraqê bidin qutkirin û derbê li wan hêzan jî bixin ku Îngilîzan ser Iranê

(4) L.N.Katlov, Serîhildana Rizgarîxwazî-Netewî ya sala 1920'an li Iraqê, bi zimanê Rusî, Moskova 1958, rûpel: 98-99, 104-105. Ev kitêba han teza doktora L.N. Katlov e. Dr.Ebdulwehîd Kerem wergerandîye Erebî û li Bexdad û Beyrudê çend caran çap kirîye, lêbelê gelek mixabin, wergerandina wê de gelek şaşîtîyê mezin hene, ku vê yeka han tesîrekî mezin kirîye ser naveroka vê kitêba biqîmet.

(5) Binêre: Adil Xenîme, El Hereketu'l Wetenîyye Fî'l-Iraq, Qahîre, 1960, rûpel: 9.

re dianîn ser şoreşgeran.

Van qewimandinên han Îngilîz bi temamî şerpeze kirin û naçar man ku dest bavêjin hêzek xwe ya çekdar a di bin serokatîya zabitekî xwe yê şareza B. Edward de bînin navça Xaniqînê. Roja 16'yê Tebaxê, dor û bera 200 pêşmergên Kurd êrîşê vê hêza han kirin û di netîca şerek du seet û nîvan de rîya pêş de çûyînê li wan girtin. Wisa lê hat ku êdî Îngilîz neçar bûn ku hêzek xwe ya din bînin alîkarîya vê hêzê(6). Ev yeka han, bû sebebê têkçûna mîzana hêzan û firset da dijmin ku roja 19'yê Tebaxê, çend gundên navça Xaniqînê bigrin û rojên pêş jî têkevin nav bajarê Xaniqînê bi xwe. Dagirkeran li vir bacekî gelek giran xisti ser milên xelkê bajêr ku bi gunehê piştgirîkirina şoreşê dihatin "gunehkar" kirin.

Dagîrkirina Xaniqînê nikarî belavbûna agirê şoreşê li navçên din ên Kurdistanê rawestîne. Danîştiwanên Mendelî Kurd û Ereb bi hev re mil dan ber şoreşê û kar û barên bajêr di bin serokatîya Musa Efendî de girtin destê xwe.

Di milek din de jî eşîra Delo û beşek ji Cafan, di bin serokatîya Brahîm Xan(*) û Weysî Beg de, roja 24'ê Tebaxê, piştî şerek kurt bajarê Kifrî azad kirin û hemû wan hêzên dijmin ku li wir bûn esîr girtin, Kapîten Salmon bi xwe re birin û dest danîn ser alaya Brîtanya ya li wêderê(7).

Deng û behsên serîhildana Kifrî gelek zû di welat de belav bû, bi taybetî piştî vê bûyerê Îngilîzan li Bexdadê belavokekê serbixwe di derbarê vê de belav kirin. Tirsê Îngilîzan girt ku agirê şoreşê navçên din ên Kurdistanê bigre, ji ber vê zû hêzek xwe yê mezin di bin serokatîya zabitê sîyasî yê Kerkûkê Longrigg de şandin Kifrî. Beşek ji eşîra Zengene û Talebanîyan

(6) Binêre: A.L.Haldane, The Insurrection Mesopotamia, Edinburgh, 1922, PP. 158-161.

(*) Kitêbek Mistefa Nerîman a li ser Brayîm Xanî Delo û serîhildana wî ya bi navê "Şorişî Îbrahîm Xanî Delo : 1920" bi Kurdî hat weşandin. Kitêb 214 rûpel e û di sala 1985'an de li Bexdadê hatîye çapkirin -Elîşêr.

(7) Ji bo dirêjîya vê behsê binêre: Mukerremu el-Talabanî, Ibrahîm Xan Sair Min Kurdistan, Bexdad, 1971.

danîn li ba vê hêzê.

Di destpêkî de Longrigg hewil da ku bi riya muzakerê re serokatîya serîhildana Kifrî razî bike da ku xwe bidin dest. Lê vê yekê feyde nekir, ji ber ku şoreşgerên navçê li ser serîhildanê bi qerar bûn. Di wî navî re ku êrîşa Îngilîzan destpê kir, şoreşger naçar man ku xwe bikişînin navçên asê yên dor û bera bajêr. Dema ku li wir sehkirin ku kurekî serokê Kurdan hatîye kuştin, di cîyê wî de Kapîten Salmon kuştin ku heta wî çaxî bi rêz li ba xwe hiştibûn. Kuştina Salmon, Longrigg bi tevayî şidand û ewî jî di bersîv de cezayê dana 10 000 rûpî û 500 tiving xist ser danişţiwanên Kifrî[8].

Serîhildana nav cergê Kifrî, eşîrên wan navçan şidandin, Beyatîyan Tuzxurmatu azad kir. Di nav bajêrê Kerkûkê de grubek sîyasîyên nihênî dest bi çalakîyan kirin. Hejmarek ji welatparêzan hewil dan ku bi alîkarîya Şêx Qadirê Sîyamensorî rê li hêzên Longringg bigrin û nehêlin biçe Kifrî. Lê, Longringg bi vê yeka han hesîya, cîyê ku êrîşê bibe ser Kifrî bir ser gundê Şêx Qadir, piştî şerek çend se'etan, bi alîkarîya firokan vî gundê han kavil kir û bi vî awayî rola şoreşgeran wê navçê de pûç kir.

Herçî ku navça Silêmanîyê bû ji ber çend sebebên têkel, nikarî di rojên Şoreşa Bîstan de rolek wisa girîng bilîze. Ji ber ku bi taybetî hemû li ser hev di navbera çend mehan de Îngilîzan karîn cî li welatparêzan teng bikin û serokên tevgera rizgarîxwaz jê dûr bixin. Di saya vê de Major Soane yê serokê bajêr jî karî grubek serokeşîrên navçê bikrre û heta hinek axayên Pişder hêzên xwe yên taybetî jê re şandin. Wî xwest di riya wan re çavê xelkê nevçê bitirsîne[9]. Lê di ser van tevan de jî, wan rojan çend serîhildanên biçûk ên navçeyî teqîyan, wek li Sengaw, di nav mirovên Mehmud Xanê Dizilî de.

Rewşa Hewlêr û ya der û dorên wê gelek ji vê jî aloztir bû. Hîn li navçên Firata Navîn şer destpê nekiribû, navek re danişţiwanên Hewlêrê çend caran civîyan û piştgirîya daxwazên

(8) Ebdulrezaq El-Hesenî, El-Sewretu'l Iraqîyye'l-Kubra, Seyda-Beyrut, 1952, rûpel: 170A-170B.

(9) Binêre: L.N.Katlov, serokanîya ku navê wê derbaz bû, rûpel:

şoreşê kirin. Xelkê derveyê bajêr jî rewşa sîyasî ya aloz a wan rojan firset dîtin û ewan jî dest çalakîyan kirin. Roja 21'ê Tebaxa sala 1920'an, nêzîkî Rewandizê grubek çekdarên Kurd êrîş birin ser Kapîten Hay û çend car jî êrîşê alîkarekî wî kirin ku bi tesadufî ji mirinê xelas bû.

Rewşa sîyasî ya Hewlêrê ewqas aloz bû ku cîgirê hakimê sîyasî yê giştî yê wê demê yê Îraqê A.T.Wilson neçar kir ku roja 8'ê Îlonê ew bi xwe bi firokek taybetî biçe wir. Wilson, li Hewlêr di gel zabit û karbidestên Îngilîz, grubek serokeşîrên Kurd û hinek mirovên giregir ên bajêr civîya, ji wan re behsa "serkevtina mezin" a Îngilîzan li navça Firata Navîn kir û şiv li guhê wan xist ku goya "rewşa Silêmanîyê sakîn" e[10].

Lê ne hatina A.Wilson ne jî tehdît û lîstikên wan, nikarî çavên xelkê Hewlêr û yên dor û berê wî bitirsîne. Piştî vegera wî li Bexdad, navbera demek gelek kurt de Îngilîz bi wê yekê hesîyan ku welatparêzên Hewlêrê ji bo derêxistina wan ji Hewlêrê û danîna hukumetek serbixwe xwe amade kirine. Ji ber vê naçar bûn bi du milan de, yek ji Kerkûk a din jî ji Musil ve du hêzên xwe yên nû bînin ser Hewlêrê. Hejmarek axayên Dizeyan jî hatin hawara wan û bi vî awayî karîn Hewlêr îşxal bikin[11]. Lê vê yeka han tesîrek wisa mezin li ser rewşa alozî ya navçên Hewlêrê nekir. Surçîyan, van rojan ji xwe re firset zanîn û roja 1'ê Îlonê Batasyan azad kirin, piştî vê berê xwe dan Rewandizê û hêzekê lîwa ya Îngilîzan kirin bin abluqeyê. Surçîyan di şerek giran de li Rewandizê 18 eskerên lîwayê kuştin[12].

Piştî vê bûyerê vê hêza han nikarî xwe li Rewandiz ragire û bi neçarî vegerîya Hewlêr. Di dawîyê de Rewandiz û Koye jî ketin nav têkelîyê û roja 8'ê Îlonê zabitê sîyasî yê bajêr çû wir.

Rewşa herêmên Behdînan gelek ji van baştir nebûn. Bûyerên Kurdistanê bi xwe û kuştina Kapîten Lichmen ji alîyê şoreşgerên eşîra Zewbe'î ya navça Rumadîyê, bi tevayî hestên

---

(10) A.T.Wilson, Op. Cit., P.288.
(11) A.L.Haldane, Op. Cit., PP.246-247.
(12) Ibid, P.246.

(hîssên) xelkê Behdînan dijî dagirkeran şidand. Li gor belgek nihênî ya Frensizan, di zorkerîyê de mîsalên Lîchmen tunebûne[13]. Tev li ser hev salek berê wê dema ku zabitê sîyasî yê Musilê bû, xwest nêzîkî hezar malbatên Behdînî derbeder bike, xelkê din bîne di cîyê wan de bi cî bike û axa bab û bapîrên wan ji wan zeft bike. Ji ber vê, daxek wî li ser dilê xelkê navçê hebû. Hewla kuştina yekî wek wî xelkê şidand. Eqreyê wê demê serî hilda. Kurdên Êzîdî jî her di destpêkê de piştgirîya şoreşê kirin, wek mîsal alîkarîya wê hêzê kirin ku êrîşê birin ser Tele'fer. Lê dudilîya Komela Ehdî İraqî ku kar û barên şoreşê li navça Musilê îdare dikir û terkexemîya serokê wê yê naskirî Cefer Eskerî, bû sebebê sarbûna şoreşgerên vê navçê, ji ber vê nikarîn rolek wisa zêde bilîzin.

Heta dor û berê dawîya havîna sala 1920'an, hêzên Îngilîzan karîn agirê şoreşê di piranîya navçên Başûrê İraqê de bitefînin. Dîyar e vê yekê tesîrê li ser Kurdistanê jî kir û tirs xist nav serokeşîran. Xoşnawî û Gerdî li gel Îngilîzan ketin muzakerê û qerar dan ku li dijî wan nesekinin û çi zerarên wan di wan navçan de çêbûye Îngilîz bidin wan. Surçîyan û grubek din serokeşîrên Kerkûkê û Silêmanîyê jî ketin peydakirina nêzîkîyê bi Îngilîzan re[14].

Belê, herçiqas gelê Kurd dikaribû feydek ji wê rewşa aloz werbigre ku Şoreşa Bîstan anî holê û bi xwîna lawên xwe rûpelekê gelek hêja ji bo xwe weşîne, lê bêguman, dikarî rolek hîn ji vê jî zêdetir bilîze. Dîyar e ev yeka han mimkun nebû, ji ber ku netîca gelek sebeban bi hev ve girêdayî bû. Piştî destpê kirina Şoreşa Bîstan, di navek re dikir ku Îngilîz dest ji hêzên welatparêzên Kurdistanê bikişînin. Kêmterkexemîya (îhmalkarî) serokatîya şoreşê rolekê gelek xirab lîst, "Mektebu'l Sewre" ku îdarekirina şoreşê ketibû ser milê wê, nikarî heta tik û tenê liqek jî di Kurdistanê de damezrîne. Serokên şoreşê

(13) Binêre: Direction Politique et Commercial, (Weşanên Wezareta derve ya Frensa), Mesopotamia, E-314, Armee, No: 348, 24.VIII, 1920.

(14) L.N. Katlov, Serokanîya ku navê wê derbaz bû, rûpel: 167.

mesela Kurd fam nedikirin, ji ber vê ne di tu gotarek de, ne di belavokek de, ne li ser rûpelên yek-du ji wan rojnamên ku ji alîyê şoreşgeran de dihatin weşandin, ên wek "El-Firat" û "El-İstîqlal" û ne jî dûr an nêzîk xwe nêzîkî sînorê vê meselê nekirin, herçiqas li gor çarçova ku danîbûn Kurdistana Başûr jî di nav vê hukumetê de bû, lê qet rîyek ji bo sîyaseta netewî ya vê hukumeta serbixwe ku dixwestin damezrînin, dîyar nekiribûn. Dema ku em li hinek bûyeran dinêrin, em kêmterkexemî û kêmasîyên serokatîya şoreşê baştir fam dikin. Grubek welatparêzên wek Refîq Hilmî û Fayiqî Tapo, di germîya şoreşê de hewil didin ku di riya şoreşgerekî Kurd ê Bexdayê, Mistefa Beg re, peywendî bi serokatîya şoreşê re deynin(15).

Di milek din de Îngilîzan di her çar alîyan de ji bo agirê nakokîya netewî û ayînî çirîsk geş kirin. Di vê riya nelibar de karîn beşek ji xelkê sade yê Kurdistanê ber bi şaşîyê de bibin û wan bikin dijî şoreşgerên Kurd ên ku goya li gor gotina wan "ketibûn bin tesîra Erebên Şîî".

Ev hewl û planên Îngilîzan bêber neman. Konsolosê Brîtanya yê Kirmanşahê, karî beşek ji eşîra Sencawî bixapîne û bi çek bişîne ser şoreşgerên Xaniqînê û Kifrî(16).

Beşek jî ji eşîra Kelhurê hatin alîkarîya Îngilîzan û ji wan re bûn notirvanê parastina kanîya neftê nêzîkî Xaniqînê(17). Di milek din de jî Îngilîzan karîn çend grubek ber bi şaşîyê de bibin û bikin dijî şoreşgerên Kurdistanê. Nîvê Îlona sala 1920'an, li Sero û Musilê şerekî giran di navbera wan û şoreşgerên Kurdan de qewimî. Li gor serokanîyên Îngilîzan, di wî şerî de nêzîkî 60 kes ji Kurdan hatin kuştin û 140 kes jî di ava Zê ya Mezin de xeniqîn(18).

---

(15) Binêre; Refîq Hilmî, Yaddaşt, cilda yekem, beşê yekem, 1956, rûpel: 76-77.

(16) Binêre: P.W. Ireland, Iraq. A study in political development, London, 1937, P.270, A.L. Haldane, Op.cit., PP.158-160.

(17) L.N.Katlov, kitêba ku navê wê derbaz bû, rûpel: 156.

(18) A.L.Haldane, Op. Cit., P.247.

Belê, her çend Şoreşa Bîstan ser neket, lê gelek dersên mezin da gelê Îraqê yê Ereb û Kurd. Yek ji wan dersan; derxistina hêjabûna xebata bi hev re bû, ev xebata han diviya ku bibe kevirê hîma hemû tevgerê rizgarîxwazî yê gelê Îraqê.

# MIJARA DEHAN

# SEBEB, NETÎCE Û QÎMETA ŞOREŞA BÎSTAN

## 1- SEBEBÊ ŞOREŞA BÎSTAN

Kesek bêteref nîne guman ji mezinbûna Şoreşa Bîstan bike(*). Dîyar e her bûyerek yan tevgerek serbixwe ya ku pişta xwe bide bi dehan hezar gundî, pale, karker, rewşenbîr û "feqîr û jaran", di riya mafê bi heq yên gel de bikevin nav saha xebatê û çek di destên wan de, êrîşê bibin ser mezintirîn hêzê emperyalîst ê cîhanê, divê bûyerek azadîxwaz û tevgerek pêşkevtîxwaz be. Ev yeka han heta mîzana meselê guherand û netîca vê bûyera mezin a sala 1920'an gelek navçe û melbendên Îraqê girt û seranserî wî şidand, li hemû Rojhilata Navîn, Nêzîk û Awrupayê jî deng da.

Piranîya belgên dîrokê vê yeka han qebûl kirine ku bûyerek wiha mezin bi serê xwe durust nabe, divê gelek sebebên serekî û biçûk têkelê nav hev bin da ku bûyerek wiha bînin holê û wisa tesîrê bi hezaran kes bike ku amade bin gîyana xwe bi

---

(*) Di kovara "Karwan" hejmara 10'an, sala 1983, rûpel; 21-31'an de hatîye weşandin.

dil bibexşînin, wek li ba herkesî aşkera ye, bi dil û can bexşîna gîyanê di riya welat de mezintirîn dereca xebatê ye. Belê, vêca ger wiha be, berê hemû behsên din carek ka em çav li wan sebebên bingehîn ên ku agirê Şoreşa Bîstan berpa kirin bigerînin.

Berê destpêka sedsala 20'an, hestê (hîssên) netewî û daxwaza serxwebûnî di nav seranserê gelên bindestên Osmanîyan de bi tevayî serê xwe hilda, ger hestê ayînî û rêza "xelîfetîya Musilmanan" nebûna, her wî çaxî cihêbûna bi heq dibû slogana serekî ya xebata rojane ya Kurd û Ereban û qet dûr nebû ku vî karî han ew İmparatorîya Osmanî ya ku ji çeng û perrên xwe ketibû têk bibira.

Li gel temambûna Şerê Cîhanê yê Yekem û ketina rejima Osmanî, hêvîya gelên Rojhilata Navîn ji bo cîbicîkirina mafê çarenivîsê tam pêş ket, bi taybetî piştî wê ku di salên şer de karbidestên welatên mezin her caran soz didan, vî mafê han çarmedorên xwe de belav dikirin û digotin ger şer temam be dê hemû gelên navçê serxwebûnîya xwe werbigrin(1).

İraqî yek ji wan gelan bûn ku çendîn sal bû xeyala serxwebûnîyê kiribûn mêjîyê xwe. Li ba wan wisa bû ku li gel temambûna Şerê Cîhanê yê Yekem, Îngilîz kel-pelên xwe didin gul û wan gulên nazik ên azadî û serfirazîyê dikin ber pêsîra wan. Kesek têgihiştî tunebû ku ew gotina General Modî dibîra wî de nebe ku roja 11'yê meha Adara sala 1917'an li gel dagirkirina bajarê Bexdayê got. Wî got "em azadker in ne dagirker". Lê, çi heye ku eynî wextî Îngilîz ketin reh û rîş avêtin û damezrandina dam û dezgên xwe. Dema ku şer jî xelas bû êdî kesî carek din xwe li nêzîkî behsa serxwebûnîyê nekir. Ji vê jî xirabtir ev bû ku grubek karbidestên mezin ên Îngilistanê aşkera dixwestin İraq bi Hindîstanê ve girêbidin da ku bibe beşekê wî. Yên wisa jî hebûn ku dixwestin taca paşatîya Bex-

---

(1) Piranîya naveroka vê gotara xwe min ji wê kitêba xwe girtîye ku di sala 1978'an bi Erebî di derbarê cîyê Kurdan di Şoreşa Bîstan de hatîye belav kirin. Ji ber vê ez pêwistî nabînim hemû perawêzan ducarî bikim (Binêre: "Dewru'l-Şe'ebu'l-Kurdî Fî Sewretu'l 'Eşrîn el-İraqîyye", Bexdad, 1978).

dayê deynin serê mirovek Îngilîz ê wek Sir Persi Syks.

Piştguhkirina axaftinên xwe yên berê yên Îngilîzan ên derbarê serxwebûnîya Îraqê, bû sebebê teqîna hestê nerizayîyê di hindurî piranîya sinif û tebeqên civakê de. Gelek belgên taybetî yên şoreşê hene ku vê rastîyê îspat dikin. Navê yek ji wan herdu rojnamên şoreşgerên ku Necefê azad kirin diweşandin navê wê "El-Îstîqlal" yanî serxwebûn bû. Vê rojnama han di bin navê hemû hejmarên xwe de vê slogana han dinivîsand:

*"Jîyan Bê Serxwebûnî Ne Mumkun e!".*

Di hejmara 5'an de "Îstîqlal" wiha nivîsandîye:

*"Serxwebûnî û Azadî...şertên serkevtin û bingeha pêşkevtina welat in"(2).*

"**El-Firat**" ku yekemîn rojnama şoreşê bû, çend caran rasterast vê yeka pan qebul kirîye ku mebesta serekî ya şoreşgeran cîbicîkirina mafê çarenivîs û bidestxistina serxwebûnê ye. Di sergotara hejmara 2'yan a Firatê de wiha hatîye nivîsandin:

*"Îraqî baş bi wê tê gihîştin ku daxwazên qanûnî û xwenîşandanên aşîtî ne feyde didin, ne jî bi wan maf tên sitendin. Bi taybetî ji ber ku Îngilîzan dest danîne ser hemû wasiteyên peywendîyên welat dengê nerizayîyên bi heq ya wan nagihîje qet tu dezgehekê sîyasî ya derve, "(3).*

Ji ber vê yekê diviya ku di riya lula tivingê re daxwaza bi heq ya serxwebûnîya gel û welat cîbicî bûna.

Rast e hemû wek hev behsa serxwebûnîyê nedigihîştin, ji ber ku bi hezaran kes hebûn ku ev bîr û bawerîyên han bi awakî rasterast nedigîhşt wan. Bi taybetî gundî ku bi sebebê pelçiqandina derebegî û şêlandina bi sedan sal ên Osmanîyan ve, wek kevirê bin axê li wan hatibû. Lê, ew grubên ku ji tevan baştir bi qîmeta serxwebûnîyê digihîştin, mebesta wan ew bû ku li gor imkanên xwe van daxwazan ji bo sinif û tebeqên cur bi cur ên civakê ronî bikin. Di yek nivîsek liqa serokatîya şoreşê de ku heta îro jî maye, rêberên tevgera rizgarîxwaz a wê rojê

---

(2) El-Îstîqlal, Necef, hejmar: 5, 25 Muherrem 1339 (Çirya Yekem 1920).

(3) El-Firat, Necef, hejmar: 2, 28 Zîlqe'de 1338, (14 Tebax 1920).

ya İraqê, daxwaz ji serokeşîrên ser bi cebha netewî kirine ku slogana serxwebûnîyê ji bo der û dorên xwe bidin famkirin. Divê di hemû xebatên xwe de hawar bikin û bêjin; *"me serxwebûnî divê!"*.

Qanuna jîyanê tesîrek wisa kirîye ku gelek car nebûna serxwebûnî û tehdaya aborî bi hev re birijin nav yek rêçê. Vê rastîya han xwe aşkera di Şoreşa Bîstan de îspat kirîye. Di riya nan de feqîrên İraqê bi vê tê gihîştin, cihêtîyek mezin di navbera dagîrkerên îro û yên do de nîne. Belko çend sebebên bi tesîr jî di sahê de bûn da ku wisa li wan bike rojê hezar rehmet li kefenê dizan bînin.

Çi heyf ku gelek ji dîroknivîsên me wek sebebek aktîf a bûyerên dîrokê qîmetek mezin nedane milên aborî, ji ber ku ji alîyê wan kesan ve însan kevirên damê yên bê hest û gîyan e. Rast e, hişê gundîyên kêmfam ji yê gundîyên nefam baştir ber sebebên birçîtî û riya çareserkirina wê diçe. Lê ev jî rast e ku birçîtî nava herdukan wek hev dihejîne û birçî ji têrê zêdetir amadeyê xebat û fedakarîyê ye. Birçîtî perçek ji bûyera jîyanê ye ku tu car ji bîr naçe. Di civakên paşdemayî de dibin nîşan û dîrok. Me seh kirîye dibêjin *"filan kes sala giranîyê ji dayîk bû"*, yan *"jin anî"*, yan *"koça dawîyê kir"*. Demek berê niha dema ku rojnamegerek daxwaz ji jineka pîr a ji bajarê Kufê dike ku behsa serpêhatîyên xwe yên berê jê re bike, berê hemû tiştê wê behsa serpêhatîyek xwe jê re gotîye ku çawan carek ser dema fermanrewatîya Mîthet Paşa de bacgirên mîrî hatine gundê wan, piştî wê ser daxwaza birayê xwe dewarên xwe veşartine û mirovên xwe li dijî wan dane rawestandin û piştî lê-xistinek xweş wan ji gund derxistine(4).

Ji ber gelek sebeban bi hatina Îngilîzan re barê jîyana piranîya sinif û tebeqên gel, ber bi xirabîyê de çû, li ba tevan wisa bû ku ber bi nemana desthilata Osmanîyan birçîtî ji holê radibe. Beşek ji wan sebeban derveyê taqeta desthilat û daxwaza Îngilîzan bûn. Serpêhatî û netîcên Şerê Cîhanê yê Yekem

(4) Binêre: Kovara "Elifba", Bexda, hejmar: 479, 23 Çirya Duyem 1977, rûpel: 24-25.

barê aborî yê ser milê tevan ji berê girantin kir. Wê demê Îngilîz bi xwe rastê gelek problemên aborî yên giran hatibûn. Bi sebebê şer ve nêzîkî ji sisiyan yekê serweta xwe ya netewî winda kiribûn. Ji ber vê di welatên bindestên xwe de ji carên din bê merhemettir bûn. Dixwestin beşê piranîya zerarên xwe ji xelkên van cîyan derêxin, yan qet nebe beşek ji erkê hêzên xwe yên dagirker bixin ser milê wan, ji ber ku bacdarên Îngilîzan bi xwe li Wersaille ketibûn nav tirsek mezin, ji ber vê kesek ji karbidestên wan cur'et nedikir bibin sebebê tehrîkkerîya vêrgîyên nû.

Bi vî awayî li gel temambûna Şerê Cîhanê yê Yekem tehdayî û zordarîya aborî ya dagirkeran domand. Çi belgên Îngilîzan û çi jî belgên şoreşê tijî nimûnên îspata van rastîyan in. Li gor belgên Îngilîzan, ew bacên ku Îraqîyan di salên 1919-1920'an dan Îngilîzan, du qasî wê bacê bûn ku sala 1911-1912'an de didan Osmanîyan. Berê destpêkirina agirê Şoreşa Bîstan, ew bacên ku Îraqîyan dida dagirkerê welatê xwe, deh qatê wan bacan bûn ku Hindûyên Pencapî didan wan. Rojnama Dail Mil a Londrayê di hejmara xwe ya 12'yê Tîrmeha sala 1920'an de, yanî di germîya şoreşê de, di warê mesela bacan de wiha nivîsandîye:

*"Li gor butça sala 1919-1920'an, ew bacên ku ji Îraqê hatîye sitendin 5 500 000 pawe ye, yanî para herkesî du pawe ketîye, nimunên vê yeka han heta niha tu welatên rojhilatê de nîne. Li Brîtanya Mezin ku gelek dewlemend bû, di wextê Şerê Cîhanê yê Yekem de serê kesek 3,5 pawe bac diket".*

Di vî warî de ger em hinek xwe nêzîkî navçên Kurdistanê ya Îraqê bikin, em rastê gelek nimunên ecêb tên. Li wir melbendên wisa hebûn ew baca didan, ji %16 ji wê zêdetir bûn ku li gor qanunê diviya ji melbendên qismên navîn berhev bikin.

Qet tiştek ku bikaribe wek wê wezîfa zorî ya ku bi sebebê Îngilîzan ve ket ser milê titûnvanên Kurdistanê, di vî warî de behsa me ronî bike, tune. Îngilîzan, qîmetek gelek zêde dan titûna Kurdistanê. Ji bo vê mebestê grubek şareza ji derve anîn. Yek ji wan pisporê Amerîkî yê bi navê Chetraws bû. Netîca vê qîmetpêdanê, berê her tiştî xwe di wan bacên zordarî de xist pêş ku ket ser milê titunvanên Kurdistanê. Li gor vê, diviya

heryekî ji wan panzdeh qat hindî wê bacê bidin ku bab û bapîrên wan di dewra Osmanîyan de didan.

Eynî bi vî awayî Îngilîzan qîmetek dan hemû berhemên zîraetê, daristan, pez-dewar û hebûnên din ên welat. Heta yek ji mirovê Dezga Parastinî ya Belgên Kevin, tenê ji bo behsa berhemên din ên navça Hewlêrê amade kirin(5). Bêguman kes di wê bawerîyê de nîne ku ev cure qîmetpêdan nîşana pêşketinê ye, mebesta serekî ya wî çaxî ya Îngilîzan bac û bacgirî bû.

Hejmarek ji karbidestên navçên Kurdistanê ji xwe re lîstên bacê yên taybetî danîbûn. Lîsta Major Soane yê bi nav û deng ku ji bo Silêmanîyê û dor û berê wê danîbû, wek di îlaweya rojnama Pêşkewtin de hatîye belav kirin, ji 23 xalan pêkhatibû (6). Li gor vê lîstê, cotkarekî ku zevîyên mîrî bikar dianî, diviya %40 berhemên xwe bibe qişlê. Xwedî rez û bostanan pêwîst bû ku salê rûpîyek(7) ji bo darên xwe yên pênc salî û rûpî û nîv jî ji bo darên ku heft salî yan ji heft salî zêdetir bûn, bidin. Ev pere bi hindikî pênc qatê wan peran bûn ku xwedîyê darxurmeyek li başûr dida û bi kêmasî danzdeh qatê wan peran bû ku xwedîyê darxurmeyek a di dewra fermanrewatîya Osmanîyan didan.

Bi vî awayî lîsta M.Soane riya xelasîyê ji bo kesek nehiştibû. Her bi vî awayî jî M.Soane karî erkê îdarî û eskerî yê seranserê navça Silêmanîyê bixe ser milê niştecîyên wêderê. Sala ku Şoreşa Bîstan qewimî, M.Soane, nêzîkî 3 200 000 rûpî ji bacan berhev kir, bi van peran jî navçê îdare kir û xelkê bêdeng kir. Ji vî perê nêzîkî 2 milyonan ji bo karên eskerî û çêkirina rê, xanî û piran xerc kir û yê mayî jî kir xercê xwe û mirovên xwe(8).

---

(5) Binêre: El-Merkezu'l Wetenî Lî'l-Wesaîq, Bexda, reqemu'l-mlf: 1000. Sub Agriculture -Arbil Division, 1920.

(6) Pêşkewtin, Silêmanî, 17 Hezîran 1920.

(7) Li gel dagirkirina Îraqê, Îngilîzan rûpîya Hindîstanê di cîyê lîre û quruşê Osmanîyan xistin bazarê.

(8) Pêşkewtin, 23 Kanuna Yekem 1920.

Îngilîzan gelek caran bi destûra Osmanîyan bi hezaran gundî di karên rojane de didan xebitandin û bi wan; rê, xanî, pir û bendên avê didan çêkirin. Bi xwe jî vê yeka han qebul dikirin ku çawan car û caran bi zora çek kar bi wan gundîyan dane kirin. Dûrxistina gundîyan ji karên wan bi vî awayî, hem bû sebebê perîşanî û têkçûna gundî û hem jî yên axan. Li ser van tevan de jî gelek caran berê keda wan a ji karên giran ber valatîyê de diçû û dibû sebebê malwêranîya wan bi xwe. Yek ji wan raporên ku ji Parlamentoya Brîtanya re hatibû şandin, behs dike ku çawan Îngilîzan ji bo bilindkirina ava nav rûbarê Dîclê çend co û bendên avê durust kirine da ku bikarin gemîyên xwe li ser bikarbînin. Ev kar jî bû sebebê çikîna ava li ser saheyên gelek fireh ên zevîyên çeltîkan ên eşîrên niştecî 'Emare û Suqu'l Şuyûx.

Barê giran ê bacên nû yên Îngilîzan li ser gund û gundîyan tenê nema, bi zû van bacên xwe ser nefesa xelkên bajêran jî siwar kirin. Kar gihîşt wê nuqtê ku hakimê sîyasî yê Necefê bacê "mirinê" jî dani. Divîya mirovên (pismamên, eqrebeyên) mirî, ji bo definkirina mirîyên xwe jî "baca xwe "(!) bidana. Sala 1918'yan hatinên vê baca ecêb gihîşt 48 000 rûpîyan û biryar wisa bû ku di navbera salek de bigihîje 1 200 000 rûpîyan.

Dema fermanrewatîya Osmanîyan de bacdaran bi hezar rê û fêlan dikarîn xwe ji beşek mezin ên bacan xelas bikin. Navçe û melbendên wisa hebûn ku destê dewletê nedigihîştê. Sidîq El-Demlûcî dema ku behsa dîroka Behdînan dike wiha dibêje: Berê Şerê Cîhanê yê Yekem, hejmara jendirmên gelek navçan ji sê çarîkan derbaz nedibûn, ew jî tev wek kûçikan li wan dihat. Carên wisa hebûn ku ji du-sê mehan carek ucret (maaş) wernedigirtin. Ger destê alîkarîya xelkê nebûna ji birçîna dimirin(9). Vêca çi kesê ku bixwaze bi hêsanî dikare dereca desthilat û bêserûberîya bê sînor a wê dewrê bigihe. Ew yek di bin sîya desthilata bi hêz a Îngilîzan de zehmet bû mirov bikare xwe bilivîne. Çunkî dagirkerên nû xwedîyê zabit, karbi-

(9) Sidîq el-Demlûcî, Emaretu Behdînan el-Kurdîyye ew Emareu'l-'Imadîyye, Mûsil, 1952, rûpel: 81, 149-150.

destê dilsoz, şareza û lêhatî bûn. Mîtralyoz, top û firoke bikar dianîn. Kovara Londra ya bi nav û deng "Rojhilata Navîn û Nêzîk" vekirî dibêje heta ku firokan jî li dijî bacdaran bikar dianîn(10). Li gelek navçan ji bo berhevkirina bac û seranan bi awayê ku quruşek li ser kesî nemîne, Îngilîzan daxwaza alîkarîya hesabzanên Cihûyan dikirin. Kesên kal û pîr ên ji bajarê Semmawe, heta niha jî navê Sason Efendî bibîr tînin ku dibêjin; bênderan bi denk debijard. Ji bo îbret, carê wisa hebûn ku evserên sîyasî, kesên ku xwe ji dana bacan vedişartin, rezîl dikirin; bi cil û bergên sor ve ser-çavên wan tenî dikirin û di nav bajêr de digerandin.

Bêguman, ev hemû ezîyet û tehdaya dagirkerê nû, li ser xelkê Îraqê nedibû ku belavî seranserî axa welat nebe. Hejmarek belgên şoreşê li ser van behsan disekinin. Rojnama el-Firat di hejmarek xwe de berê xwe daye Arnold Wilson ê cîgirê hakimê sîyasî yê giştî û jê re wiha gotîye:

*"Li seranserê hemû navçan, heta wê parîya nav niklên teyran jî jê zept kirîye û mêjîyê nav hestîyên wan jî jê derxistîye û baca li ser milê gundîyan çendîn qat zêde kirîye... a eva han e edaleta we"(11).*

Têkelbûna bazara Îraqê bi ya sermayedarîya cîhanê re, demek bû nerehetîyê ji zene'etkarên welat re anîbû. Piştî vê di netîca Şerê Cîhanê yê Yekem de Îngilîzan desthilata xwe di seranserê Îraqê de damezrandin û hinek din derî ji bo berhemê karên xwe vekirin. Her ji ber vê jî hinek din alozî ji zeneetkaran re çêbû. Bi dehan kes ji colayanî (berik, xaluçe, cacim çêkerin -Elîşêr.) Bexda û cîyên din ji holê rakirin. Li ba me jî vê bûyera han tesîra xwe kir. Colegerîya bajarên me yên mezin ber bi nemanê çûn. Sala 1902'yan Mark Syks, di dema gera xwe ya bi nav û deng de, li bajarê Silêmanîyê 150 dikanên çeksazîyê hejmartîye(12). Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem di hemû bajar û

---

(10) (The Near East and India), November 23, 1922, PP. 149-150.

(11) El-Firat, hejmar: 5, 2 Muherrem 1339.

(12) Binêre: C.J.Edmonds, Kurds, Turks and Arabs. Politics travel and research in North'êastern Îraq, London, 1957, P .80.

karwanserayên bajêr de du-sê ji wan mabûn û hatina wan jî têra beşê jîyana xwedîyê wan a ziktêrîyê tenê nedikir û karê wan ê serekî jî ketibû ser fişeksazkirinê.

Şerê Cîhanê yê Yekem netîcên giran û yên kavilbûnê ji bo piranîya navçe û melbendên İraqê anîn. Herçiqas webalê vî karî di cîyê Îngilîzan de diket ser milê Osmanîyan, lê xelkê ewan nasdikir. Bi sebebê seferberlikê û nemana beşekê zêde pez, dewar û terşan, berhemên zîraeta İraqê ber bi temambûna şer re hat li ser çaran yekî berhemên berî. Ji ber vê bahayê dexil û nan car û nîv heta du car û nîv zêde bû. Çay sê hindî û şekir pênc hindî carên berê bihatir bûn. Wan navçên ku tê de berê şerê masî ne tiştek bûn, piştî şerê ji ber giranîya masîyan, hawar ji niştecîyên wan navçan rabû(13).

Bajarê Silêmanîyê(14) baştirîn nimûna van kavilkirinan e ku ji ber sebebê Şerê Cîhanê yê Yekem seranserê navçê rastî wan hatibû. Li gor belgên Îngilîzan heta şer temam bû, ji 29 mizgeftên bajêr tenê 10 heb (lib) mabûn. Her di wan salan de 3 tekye, 5 hemam, 5 aşê avê, 9 xan, 13 bostan, 16 çayxane, 4 karwanseray, 687 dikan û 1813 xanîyên Silêmanîyê bi tevayî kavil bûn. Beşek ji van reqemên kavilbûnan gelek ji van jî zêdetir in. Berê şerê li Silêmanîyê 29 mizgeft, 3 tekye, 31 çay-xane, 11 hemam, 24 aşê avê, 18 bostan, 6 karwanseray û 3205 xanî hebûn. Yanî ji ber sebebê şerê nêzîkî %21'ê aşan, %45'ê xanan, nêzîkî %46'ê hemaman, %52'ê çayxanan, %56'ê dikanan, %57'ê xanîyan, %66'ê mizgeftan, %67'ê karwanserayan, %73'ê bostanan û ji %100'ê tekyan bi carek kavil bûn. Ji ber vê,

---

(13) El-Merkezu'l Wetenî Lîhifzî'l-Wesaîq, el- mlf:125/514 (Fich Tax, 1915-1918).

(14) Ji ber du sebebên serekî me wisa pêwîst zanî ku piranîya belgeyên ku em pêşkêş bikin bila peywendîya wan bi navçên Kurdistanê ve hebe. Sebebê yekemîn; ji ber ku di derbarê navçên din ên İraqê de gelek zêde tişt û derbarê navçên alîyên me de jî gelek kêm tişthatine belav kirin. Sebebê duyem jî, ji ber wê ye ku em dixwazin bi riya rastîyên ku di vê gotarê de hatine nivîsîn sebebên geşkirina agirê tevgera rizgarîxwazî ya wê demê ya Kurdistanê bidin dîyar kirin.

ne tiştek ecêb e ku nivîskarên vê raporê pêşniyar dikin ku dev ji îmara bajêr berdin û li teniştê wî bajarek nû ava bikin(15).

Belgek din a wê demê behs dike ku çawan ji %80'yê xelkê Silêmanîyê bi sebebê şer ya nemane, yan muhacir bûne. Berhemê zîraetî yên wan bi qasî ji pêncan yekî berhemê berê ye, bihayê tenekek genim gihîştîye 1600 rûpî, ya tenekek birinc jî gihîştîye 2400 rûpîyan(16). Li gor nivîsandina rojnama "El-'Ereb" a ku Îngilîzan wî çaxî li Bexdayê derdixistin, qet di tu bajarek Iraqê ya din de bihatî negihîştîye vê derecê(17).

Gelek ji Îngilîzên Avrupî yên pêşkevtî ku hatine Iraqê, xwestine bê ku guhê xwe bidin 'urf û 'edet û esasên dînî, netewî û heta eşîretî yên navçê, wek xwe hereket kirine û ev yeka han jî bûye sebebên teqînên nerizayîyên bêhesab ên biheq di seranserê welat de. Wan dîroknivîsên ku behsa Şoreşa Bîstan kirine(18) di vî warî de gelek nimûne û belge di derbarê navçên Navîn û Başûrê Iraqê de anîne. Ji ber vê di vir de em ê çend nimûnan jî ji alîyê me bînin (Mebest Kurdistan e-Elîşêr). Îngilîzan, di bajarên Kurdistanê de aşkera rê dan gelek kesan ku ne tenê mey, heta esrar jî bifiroşin. Bajarên wisa hebûn ku ne tenê tîyatro tê de danîn, heta 'umumxane (kerxane) jî tê de vekirin. Tîyatroya Hewlêrê şerê mezin bi xwe re tîne(19). "Lawê Çîya"(20) Enwer Mayî wiha dibêje ku hatina Îngilîzan

---

(15) El-Merkezu'l Wetenî Lîhifzî'l-Wesaîq, el-mlf:20/01 (Sulaimaniyah Municipality, 1920).

(16) El-Merkezu'l Wetenî Lîhifzî'l-Wesaîq, el-mlf: (67/17 (Sulaimaniyah, Scarcity).

(17) El-'Ereb, Bexdad, 3 Tebax 1919.

(18) Bi taybetî mamoste Hesenî, Werdî û Feyaz (Binêre: Ebdurrezaq Hesenî, El-Sewretu'l Iraqîyye'l-Kubra, el- teb'e salîse el-muwessî'e, Beyrut, Seyda, 1972. El-Dr. Elî el-Werdî Lemhad Îctîma'îyye Mîn Tarîxî'l Iraq el-Hedîs, el-cuz'u-l xamis, el-qismu'l-ewwel, Bexdad, 1977, el-qismu'l-sanî, Bexdad, 1978. El-Dr. 'Ebdullh el-Feyyaz, El-Sew-retu'l Iraqîyye'l-Kubra, senetu 1920, el-teb'e sanîye, Bexdad, 1974.

(19) Binêre: Seda el-'Ehrar (rojname), Mûsil, 20 Sibat 1953.

li ser exlaqê beşek Behdînîyan tesîrê kir (21).

Ew Îngilîzên ku li welatê xwe nimûnên exlaqê nerm in, gelek caran gava ku dibin karbidestê welatên bindestê xwe bi pozbilindî û dilhişkî li gel xelkên wan cîyan hereket dikin. Piranîya wan nivîskarên ku behsa Şoreşa Bîstan kirine, çend nimûne di vî warî de anîne. Yek ji wan di bîranên xwe de behsa vê yeka han dike; ku çawan şêxekî Baqube rastê belayê hakimê sîyasî yê bajêr tê. Rojek seyê (kûçikê) hakim xwe nêzîkî wî dike û ew jî ji bo ku se lê nekeve hinek xwe jê dûr dixe. Hakim li kaleşêx vedigere û bi hêrs jê re dibêje *"ya şêx, seyê min ji te gelek paqijtir e"(22)*. Dîyar e ev gotin ger rast be jî, rewayê gotinê nîne.

Efserên Îngilîzan bi eynî awayî tiştên wek van li gel xelkê navçên Kurdewarî de jî dikirin. Çi dema Major Soane bihata nav bazar, diviya ku hemû ji ber wî rabin û serpîyan bisekinin. Rast e ewî wek Grinhaws ê efserê Necefê qamçî bikar nedianî, lê, bi xwe jî vê yeka han dixwest ku jê re dikirin. M.Soane, mirovên xwe berdabûn pêsîra xelkê bajêr, Ezîz Xan yek ji wan mirovê nexwendeyî req û dilhişk bû, ewî bi pîyên kutayî anîye Silêmanîyê(23).

Çirîskên agirê kirinên ne di cî yên efserên Îngilîzan pekîyan gelek kesên makûl ên Kurdistanê. Yek ji wan şêxên Berdeqaremanê nemir bû. Mehmud Cewdetê welatparêz ê bi nav û deng ji ber Soane neçar dibe cîyê xwe terk dike.

Belgên Liqa Musilê ya "Komela 'Ehd"(24) di vî warî de gelek rastîyên hêja parastine. Bi taybetî ewên ku hember şêxên Behdînan bêexlaqîyên efserên Îngilîzan nîşan didin. Roja

---

(21) Enwer el-Maî, El'êkrad fî Behdînan, Mûsil 1960, rûpel: 184-185.

(22) Binêre: Talib Muştaq, Ewraq Eyyamî, el-cuz'ul-ewwel, Beyrût, 1968, rûpel: 91.

(23) Binêre: Pêşkewtin, 6 Mayis 1920.

(24) Cem'îyyetu'l-Ehd", yek ji wan komelên sîyasî bû ku rewşenbîrên 'Ereban, damezrandin. Piştî şer cîyê îdara bilind a Ehd li Şamê bû. Liqa Mûsilê ya Ehd, yek ji wan liqên herî aktîf û dilsoz bû ku piranîya endamên wê heta dawîyê paqij man.

14'yê meha tebaxa sala 1919'an, Liqa Musilê ya Komela 'Ehd di derbarê ezîyetdana Neqşîbendîyan, nameyek dişîne baregeha bilind a komelê ya bajarê Şamê. Berpirsîyarên Liqa Musilê di nama xwe de wiha dibêjin:

*"Em bi temamî dilteng in ji ber van şêxan ... Ger hemû serok bi korî pê wan de neçin, yan wek dixwazin mil nedin ber hakîmîyeta wan, Îngilîz dixwezin awakî bêperwa serî li hemû serbilindan nizm bikin û ezîyetê bidin wan, . Eynê wextê çavên wan ba hilnagire kesek xwedî desthilat ê wek cenabê Şêx Bahaddîn Efendîyê Neqşîbendî bibînin ku nikarin bikin darêdestê xwe"*(25).

Hemû li ser hev du hefte li ser de derbaz nebûye Liqa Musilê ya Komela 'Ehd a nameyek taybetî ya din dişîne Şamê û vê hedîsa xwarê digihîne baregeha bilind a komelê:

*"Çend roj berê niha Îngilîzan li Hewlêrê, Seîd Axa kurê wî û grubek hevrêyên wî bi tohmeta kuştina çawuşekî Îngilîz û birîndarkirina du polîs û du cendirman girtin. Yek ji polîsan Îngilîz û yên din jî Iraqî ne. Her wiha qismek ji mirovên Seîd Axa jî birîndar bûn. Ev hedîsa han li ser wê yekê qewimî ku rojek berê vê di tîyatroyê de çawuşek li kurê Seîd Axa xistîye û gelek xeberên ne di cî de jê re gotine"*(26).

Zorî û tehdaya Îngilîzan bê cihêkirina sinif û tebeqan li ser herkesî ye. Liqa Musilê ya Komela 'Ehd di roja 8'ê Çirya Duyem a sala 1919'an di namek xwe de wiha nivîsandîye:

*"Qet tu zordarîyek nemaye ku dagirkeran hember xelkê bikar neynin. Kêmtirîn cezayê şaşîtîya her kesek dibe sebebê lêxistina wî bi dar û copan, gelek caran ew kes di xwînê de dikemilin û cîyê qamçîyên wan demek dûr û dirêj dibe nîşan û bi laşên wan ve dimîne. Wisa li xelkê hatîye; cezayê peran ku dibe mezintirîn qezenca dagirkeran, di cîyê lêxistinê de ji wan re ev karên nizm, wek nîmet e. Xwezî ew ên ku Îngilîz wan gunehkar dike tiştan tîne serê wan ev tenê bûna! Gelek kes kirine zindanan bê ku gunehek li ser wan îspat kiribin, yan jî*

(25) Seda el-Ehrar, 13 Sibat 1953.

(26) Seda el-Ehrar, 20 Sibat 1953.

*dadgehek biryarê girtina wan dabe. Wek mîsal, 18 Goyî(27) girtine, bê ku tu peywendîyek wan bi wê bûyerê ve hebe ku di nav çîyayên wan de qewimî. Ev Goyîyên han va demek e li Musilê bi hemalî dijîn. Ev Goyîyên han heta ku cîyê Kolonel Lîchmen neguhertin, Dilêm û Kapîten Bill di cîyê wî de neşandin, wî li ba xwe girtî hîştin"(28).*

Karbidestên wê demê yên Îngilîzan çend car vê yeka han qebul kirine ku cure grubek ji efserên wan bûne sebebê peydabûna nerehetîyên zêde di nav piranîya xelkên Îraqê de. X.Bill ê bi nav û deng(29) ku li gor piranîya hevrêyên xwe gelek qenc jî bûye, çend caran di nivîsandinên xwe de van rastîyan nîşan daye. Ji vê jî girîngtir raya General A.L.Haldane ye ku ew bi xwe qumandarê (fermandeyê) wan eskeran bû ku wezîfa tefandina Şoreşa Bîstan li ser milê wan bû. Haldane, kirinên ne di cî yên efserên Îngilîzan yek ji sebebên serekî yên Şoreşa Bîstan hesêb dike(30).

Eynî wextî ev rastîyên han di belgên şoreşê de jî tên xûyakirin. Rojnama El-Firat a dildax, wisa lêhatîye ku webalê hemû xirabîyên û zeptkirinên kun û quncikên dîrokê jî dikir ser milê Îngilzan. Wisa lê hatîye ku ji bo tarîtîya Qerna Navîn silavên hurmetê tîne , Fir'ewn, Cengîz Xan, Tîmurê Leng û Hûnên xwînrijên Awrupayê. Ji ber ku wek dibêje; *"Xwedê, tu bi xwe agahdar î, ew bi hestên xwe naziktir û dilên xwe ve baştir bûn ji Îngilîzên zordarên barbar"(31).*

---

(27) Mebest jê endamên Eşîra Goyan ên niştecîyên Bakurê Zaxo ne. Goyî, yekemîn eşîr bûn ku li Îraqê dijî Îngilîzan çek hildan.

(28)Sed el-Ehrar", 3 Nîsan 1953.

(29) Mebest jê Mis. Bill e ku li Îraqê karbidestekî mezin ê Îngilîzan bû. Car carnan bi navê "şajînî bê tac" (jina bê tac Elîşêr.) hatîye binavkirin.

(30) A.L.Haldane, The Insurrection Mesopotamia, Edinburgh, 1922, PP. 20-21.

(31) El-Firat, hejmar: 4, 13 Zulhecce 1338.

Çi Ereb û çi Kurd, li ba Iraqîyan wisa bû ku li gel nemana selteneta Osmanîyan û hatina Ingilîzan ve çirîskên şaristanîyetê û nî'metên xwendevarîyê dê bigihîje hemû quncên welat. Bêguman her çawan be ji ber gelek sebebên aşkera bindestîya Îngilîzan xelkê ji bindestîya Osmanîyan zêdetir nêzîkî jiyana şaristanîyetê dike. Lê, bi sebebê wî barê yekcar giran ê ku Şerê Cîhanê yê Yekem xist ser milê hemûyan, asteng ketin ser riya vê bûyera han. Îngilîzan bi zû tiştek wisa ji wan re nekirin, xelk jî bi lez bû. Ji ber gelek sebebên tevlîhevî, rewşa xwendewarîya welat di salên pêşîn ên piştî şerê paş de çûn. Hemû perên ku Îngilîzan di sala 1919-1920'an de ji bo kar û barên xwendinê tehsîs kirin, 70 000 lîreyê Osmanî bûn, yanî du qatî wî pereyê ku Osmanîyan sala 1911-1912'an de, tenê ji bo Wilayeta Bexdayê dan jî nebû. Ji ber vê, ne tiştek ecêb e ku hejmara hemû dibistanên Iraqê bû bi qasî hejmara sala 1914'an. Kar gihîşt wê derecê ku Îngilîzan li bajarekî wek Musilê hejmarek dibistanên seretayî (mekteba ewilîn), navîn (orte mekteb) û fêrgehekê (enstîtutî) amadekirina mamostan girtin(32).

Kar û barên xwendinê li navçên Kurddistanê hîn jî xirabtir bûn. M.Soane, ji bêtirî 3 000 000 rûpî ku qezencên navça Silêmanîyê bi xwe bûn, tenê 63 000 rûpî ji bo kar û barên xwendinê tehsîs kir. Yanî nêzîkî %2'yê qezenca navçê û bîst car ji wî perê kêmtir bû ku ji bo polîs û pasewanên xwe yên taybetî xerc kir(33).

Van cure kirinên han tesîrek wisa kir ku di destpêka hakîmîyeta Îngilîzan de xwendina kurdî, ber 'eksê wê ku wan çaverêdikirin, paş de ket. Piştî temambûna şerê, Îngilîzan tenê dibistanek destpêkî li Silêmanîyê vekirin. Demek berê şer di eynî bajarî de du dibistanên seretayî, yekê navîn û fêrgehek zabitiyê hebû ku hejmara xwendevanên wan bi ser hev 330 kes û hejmara mamostan jî 20 kes bûn. Di dawîya salên 20'an de

---

(32) El-'Ereb, 13 Tebax 1919, "Sed el-Ehrar", 3 Nîsan 1953.

(33) Li gor wan hejmaran hatîye hesab kirin, ku Major Soane ji xwe re di rojnama Pêşkewtin de belav kirîye (Binêre: Pêşkewtin, 23'yê Kanûna Yekem a sala 1920'an).

cardin li Silêmanîyê tenê 10 xwendevanên navendî hebûn, yanî 16 car ji hejmara sala 1914'an kêmtir bûn. Wê demê hejmara xwendevanan ên di dibistanên Kurdan de li seranserê Kurdistana Iraqê, 1545 kes bûn; di hemberê vê de 6 300 kes di dibistanên Îsayîyan de û 8 400 kes jî yên Cihûyan de dixwendin(34).

Rast e, ew ên ku hesabekî wiha ji bo vî milê jîyana rewşenbîrî ya wê demê dikirin kêm bûn, lê yên qîmetê pê didan, yanî rewşenbîr û entellektuel û aktîvîstên civakê bûn ku di destpêkî de bi hatina Îngilîzan dilgerm bûn.

Di nav sebebên berhevbûna nerizayî ya Ereb û Kurdên Iraqê de, ji derveyê sebebên ku heta niha me behs kirin, cîyê hestê ayînî yekcar mezin û dîyar e, bi derecek wisa ku li gor hinek dîroknivîsên Iraqê ev sebebê yekemîn ê vêketina agirê Şoreşa Bîstan e. Gelek kes bi çavê kafir û zindiqîyê li Îngilîzan dinêrîn, heta piştî ku wan xwarin dixwarin di pê wan de firaqên xwe tehfîl dikirin. Gelek ên wisa jî hebûn ku hîn meyla Sultan Reşad ê "Xelîfê Musilmanan" dikirin. Di vir de rola cure grubên Îngilîzan bi xwe jî kêm nebû. Heta Osmanî li Bexdad bûn, wan kincên piştevanîya Musilmanîyê li xwe kiribûn(35), lê dema ku şer temam bû û gihîştin armanca xwe, ketin xaçperestîya xwe ya carên din û xwe gelek nêzîkî Îsayî û Cihûyan kirin. Rast e Îsayî û Cihûyên wî çaxî yên Iraqê, ji ber gelek sebeban ji musilmanan xwendatir bûn, lê ev ne sebebek tik û tenê bû ku piranîya efserên Îngilîzan han dida da ku tenê pişt li wan girê bidin.

Li ser van tevan re, herçiqas mirov nikare wan biparêze, lê piranîya karbidestên Îngilîzan nedizanîn çawan têkilî bi şêx û melan re deynin. Destê hejmarek ji wan gihîşt rojên wan ên bên jî. Efserên wisa yên xwîngerm hebûn ku aşkera gawurçîtîyê

---

(34) Derbarê serokanîyên lêkolînên li ser van hejmaran, binêre: nota hejmara 63'yan a beşê yekem a kitêba Dewru'l Şe'bu'l Kurdî Fî Sewretî'l-'Eşrîn el-Iraqîyye" rûpel: 44-45.

(35) Di hejmarên El'êreb û Têgeyîştinî Rastî de nimûnên îspata van rastîyan pirr in.

dikirin. Wek Longrigg(36) ên wisa jî hebûn ku xwe mîratgirê " ala şaristanîyeta tenê (çerm) spî ya Avrupa dihesiband. Wan Selaheddînê me û Şêrdilê(37) xwe bibîr anîbûn.

Ji bo ku em bikaribin baştir vî milê han ê meselê ronî bikin, divê em serî li wan gotinên rojnama El-Firat ku di vî warî de nivîsandine, bidin. Di hejmara 4'an de El-Firat bi aşkera xwîn ji dilê xwe dibarîne dema ku dibêje:

*"Ji me re bêjin kîjan dewleta azad ji xeynî Îngîltere Mewlud li me qedexe kirîye, kîjan karbidestê îdarî yan sîyasî yan eskerî ji xeynî serokên Îngilîzan curet kirîye dest têke nav karê vê 'edeta cîgirtî? Ka bêjin mirovekî sîyasî yan îdarî yan eskerî heye ku ewqas hov be, hezbike henekan bi mafê azadî yê giştî bike? Lê gelo şermî nîne li gel van tevan de jî îddî'a şaristanîyetê bike?"(38).*

Ez bawer nakim nêrîn û fermanên mirovên dînî yên Başûr dengek a bi wî awayî di alîyê me de derketibe. Lê ez vê jî bawer nakim ku feqî û melayên Kurdistanê bi hatin û hakîmîyeta gawuran razî bibin. Car û caran rojnama Pêşkewtin jî êrîş û tehdayên karbidestên Îngilîzan û biryarên wan ên derbarê qedexekirina civîn û xwendina Mewludê di nav mizgeftên Bexdayê de belav dikir. Di hejmarek xwe de Pêşkewtin, piştî belavkirina êrîşên zêde yên bi van babetan ên Wilson li Bexdadê, zû bi zû ducarî dikir. Pêşkewtin, xeberê xeniqandina "çar mufsîd" jî çap kirîye(39).

---

(36) Longrigg yek ji wan efserên sîyasî yên Îngilîzan bû. Çend sal Kerkuk di destê wî de bû. Di nivîsên xwe de bi hêsanî meyl bi wan cure bîr û bawerîyên nijadperestî dikir, bi taybetî di wê kitêba xwe ya bi navê "Îraq ji Sala 1900'an Heta Sala 1950'an" de. (Binêre: S. H. Longrigg, Îraq 1900 to 1950, A. political, social and economic history, London, 1953).

(37) Mebest jê Richardê Yekem ê qralê Îngîlistanê ye (1189-1199) ku beşdarî êrîşa sêyem a xaçperestan bû û nêzîk ve peywendî bi Selaheddînê Eyyubî re danî.

(38) El-Firat, hejmar: 4, Zulhecce 1338, hêjayî gotinê ye ku nîvê vê hejmara han a rojnama El-Firat li ser vê behsê ye.

(39) Binêre: Pêşkewtin, 19 Tebaxa 1920.

Şoreşa Bîstan, ji wan cure bûyeran nebû ku bikare ji hindurê welat an ji derve bê birrîn(40). Ew kesên ku hewlê wiha bidin ne qîmeta Şoreşa Bîstan û ne jî qîmeta tu tevgerek azadîxwaz ên din berz yan nizm dikin, giranî û qîmeta raya kesên wisa tune ku mirov xwe bi bersîvdana wan re aciz bike. Hêjayî ew qas zehmetîyan jî nîne ku mirov xwe bi wan re biwestîne ku dixwazin bi bêjîngê tîrêjên rojê li ser me de qut bikin.

Li gor qanunek dîrokê, qet bûyerek nîne ku di hecmek yan qalibek teng de bimîne û ji der û dora xwe bê qutkirin. Çi belgên şoreşê, çi belgên Îngilîzan û çi jî lêkolînên gelek dîroknivîsan demek e vê yeka han îspat kirine ku:

1) Serîhildana di nav cergê Kurdistanê, li gor qene'eta me, yek ji wan sebebên girîng e ku ji bo destpêkirina Şoreşa Bîstan rê vekir.

2) Şoreşa Bîstan, di nav gelek navçên Kurdistanê de deng daye û tesîr kirîye. Heta eşîrên wisa hebûn ku hîn hestê neteweyî serdarên wan nehejandibûn, lê ew serdar û bi mirovên xwe ve ji ber gelek sebeban ji Îngilîzan dildax bûn û ji tevlîhev a sala 1920'an firset dîtin ku jî ji ber xwe ve bikevin gîyana dagirkeran.

3) Tevgera netewî ya Ereban li Misrê, Şamê, Hîcazê û di dawîyê de tevgera rizgarîxwaz a Kemalîstan li Tirkîyê û serkevtina yekemîn şoreşa sosyalîzmê di cîhanê de, di hîşyarbûna rewşenbîrên Iraqê û ruswakirina dewletên emperyalîst de rolek mezin lîstin.

Ev nimûne û belgên ku me behs kirin, hinek in ji bênderek, lê li gor bawerîya min ji bo ronîkirina dîroka sebebên Şoreşa Bîstan bes in. Dîyar e bûyerên ku ji sebebên wisa derkevin, dê netîceyên wan jî mezin bin.

---

(40) Hin nivîskar dixwazin bi zorî Şoreşa Bîstan bixin nav qalibek teng (wek mîsal binêre: Settar Cebîr Nasir, Hewamîş 'Ela Kitabî 'Elî el-Werdî Lemhat Îctîma'îyye Mîn Tarîxî'l Iraq el-Hedîs, el-cuz'u'l-xamis, Bexdad, 1978, rûpel: 74-85. El-Rasidu'l Teqeddumî, Sewretu'l 'Eşrîn, El-Bu'udu'l Qewmî wel Ehdafu'l Wetenîyye, -"El-Iraq", 29 Huzeyran 1978.

## 2 - NETÎCA ŞOREŞA BÎSTAN

Wek belav e ne tenê ji roja 30'yê Hezîranê, yanî wê roja ku Şe'lan Ebu'l-çon ê serokeşîrê Zewalmî hat girtin û mirovên wî wî azad kirin, lê ji destpêka bihara sala 1920'an ve şoreşa gelê Îraqê li dijî Îngilîzê dagirker li Bexdad, Necef, Kerbela û cîyên din serî hilda. Di hemû alîyan de civîn û xwenîşandanan destpê kirin, serxwebûnî bû slogana (şî'ar) rojane ya xebata xelkê. Heta dor û berê dawîya meha Hezîranê serîhildana gel ji bajaran gihîşt gundan û merkezên eşîrên çekdar ên Firata Navîn. Ji wir şûn de qonaxek nû di awayê xebata girsên xelkên welat de destpê kir û çend meh domand. Li gor gelek serokanîyan hejmara wan ên ku di rîya rizgarîya welat de destavêtin çek, ji 130 000 kesan zêdetir bû.

Şereşgeran, karîn hejmarek bajêr û beşê herî zêde ya melbendên Firata Navîn azad bikin. Necef, bû bingeha serokatîya şoreşê. Heta destpêka Tebaxa sala 1920'an, çirîskên agirê gihîşt Baqube, Dêtawe, Şareban, Delê Ebbas û ji wir ve êdî ber bi alîyê me ve belav bû. Eşîra Delo ya navça Xaniqîn û Kifrî di bin serokatîya Kerîmî Xesrew Beg û Birahîm Xan, li ber dijmin baş dest hildan. Her wan rojan de hejmarek navçe û eşîrên din ên Kurdistanê wek Leylan, Zengene, Dawide û Surçî serîhildan. Hewlêr wisa têkel bû ku Arnold Wilson neçar ma Bexdad bi cî bihêle û bi firokeyek taybetî biçe wir(41).

Rast e, ji ber gelek sebeban Îngilîzan karîn bi zora çekên kuştinî yên nû Şoreşa Bîstan bitefînin, lê ev tefandina han liser wan gelek giran runişt. Hejmara serbaz û zabitên Îngilî-zan ku di şer de hatin kuştin yan bê ser û şûn man 1041, a birîndarên wan jî 1228 kes bû(42).

---

(41) Mihemmed Mehdî Besîr, Hesenî, Feyaz, Werdî, Katlov, Haldane û hejmarek nivîskarên din ên ciyî û bîyanî, bi direjî behsa serpêhatîyên şoreşê kirine. Min jî li gor îmkana xwe di kitêba xwe de bûyerên Kurdistanê ronî kirine.

(42) Serokanîyên Îngilîzan, 1041 kuştî û kesên windabûyî dikin du beş; 426 kuştî û 615 windabûyî.

Wê demê ku Londra ji bo quruşek dikarî bifirya, tefandina Şoreşa Bîstan nêzîkî 100 milyon pawan li ser wan mal bû(43) ku ji bo destpêka salên 20'an û rewşa aborî ya dawîya şer mesrefek gelek zêde bû. Lê, piştî tefandina şoreşê jî Îngilîzan ji tirsa carek din berpabûna wê, naçar bûn eskerek mezin di nav Îraqê de bihêlin ku xercê wê barek zêde giran bû. Tenê di yekemîn sala piştî tefandina şoreşê de xercê vî eskerî gihîşt nêzîkî 21 milyon pawe ya zêr(44).

Şoreşa Bîstan mezinîya xwe di vir de îspat kir ku dagirker naçar kirin da ku di sîyaseta xwe ya beramberê Îraqê de çend gav paş de bavêjin. Îngilîz baş bi wê têgihîştin ku nikarin serxwebûnîya gelê Îraqê bidin bin pêyên xwe. Her zû hawar li Asquith ê serokwezîrê berê yê Brîtanya rabû û di salona parlamentoyê de bi aşkera daxwaza kişandina eskerên welat ji Wîlayeta Musil û Bexdayê kir. Rojnama "Observer" a bi nav û deng roja 23'yê Tebaxa sala 1920'an derbarê eynî behsê de wiha nivîsandîye:

"Jibîrkirina wan wezîfên serekî yên ser milên me dexma qanunên me ne li ser gelek de ku me bê heq û sebeb bi wan daye zanîn, pêwistîya bi vî awayî danezanînek nîne, ji ber ku ev karê han tiştek pêkenînê ye".

Eynî rojê "Sunday Times" ku ev jî rojnameyek din a bi nav û deng a Londrayê bû, daxwaz ji karbidestan kir ku sîyaseta xwe ya sernekevtî ya Îraqê qebul bikin û dest ji pêsîra xelkên wî berdin.

## 3 - QÎMETA ŞOREŞA BÎSTAN

Ew ên ku heta niha me di derbarê sebeb û netîcên Şoreşa Bîstan de gotin, balkêşana yekemîn a qîmeta zêde ya wê bûye-ra mezin e, di tomarên dîrokê de. Çi tevgerek şoreşger a ku pişt

---

(43) P.W.Ireland, Iraq. A.Study in political development, London, 1937, P.273.

(44) Binêre: B.M.Dantisg, Do û Îro Iraq , bi zimanê Rusî, Moskova, 1960, rûpel: 24.

bide bi dehan hezar kesan û biçe nav kûrahîya xebatê û bi hezaran kes serê xwe jê re bikin qurban divê ku serpêhatîyek dîrokî ya bi qîmet be. Piranîya serokanîyan di wê bawerîyê de nin ku zerarê şoreşgeran digihîje nêzîkî 8 450 kuştî û birîndaran. Dibe ku lêkolînek fireh hejmarek zêdetir derîne.

Belge û nîşanên hêjabûna mezin a Şoreşa Bîstan, di vê yeka han de ne ku Şoreşa Bîstan yekemîn bûyera mezin a dîroka nû ya Îraqê ye ku Ereb, Kurd, kêmayetî('ekalîyet) yên musilmanên şîî, yên mezhebên sunnî û Îsayî di sengerek de civandîye. Îngilîz, roja ku pê xwe danîn nav axa Îraqê şûn de, ketin avêtina tovên dijîtî û nehizîya karên wisa. Li gel vê jî di sala 1920'an de vî tovê han berek wisa nedayê. Di eksê daxwaza efserên Îngilîzan û planên wan de, roja 14'yê Gulana wê salê, yekemîn civîna muşterek a azadîxwazên sunnî û şîîyên Bexdadê li Mizgefta Qublanîye ya nav Bazara Bezazan çêbû. Vê civîna han ava destpêkî ya hêja di dîroka Îraqê de rijand ku wê demê hemû dilsozên têgihiştî tînîtîya wê dikêşa. Êdî ewqas têt zanîn, xelkên hemû alîyan ên Bexdadê di civînên mezin de têkilî nav yek û du dibûn û hemûyan bi yek dengî daxwaza serxwebûn û azadîyê dikirin.

Ji vê jî zêdetir, di wan rojan de welatparêzên Bexdadê pêhesîyan ku karbidestên wir di rîya du-sê kesên kirîgirtî yên musilman re, planek çêdikin û dixwazin êrîş bibin ser şayîyek dînî ya Îsayîyan. Li ser vê, bi yekser hejmarek gelek zêde xelk dicivin û bi ala kesk a bi gulan ve xemilandî berê xwe didin dêra Kildanîyan û li wir têkelî nav birayên xwe yên mezin dibin û bi hev re dikevin zikr û tehlilî li ser Îsa û Muhemmed hawar ji bo serfirazîya gel û welat dikin.

Cardin hîn ji vê jî pêştir, yek ji wan raporên nihênî yên wê demê yên polîsê Bexdadê ye ku behsa vê yeka han kirîye ku çawan gotebêjê Şoreşê Mihemmed Mehdî Besîr(45) di wextê civîna şeva 16'yê Hezîranê ya li Mizgefta Seyîd Sultan Elî

---

(45) "Gotebêjê Şoriş" bûye naznavê Mihemmed Mehdî Besîr ê ku yek ji serokên xwîngerm ên şoreşa gelêrî ya Bexdadê bû. Mamoste Refîq Hilmî di "Yadaşt" de gelek qîmet pê daye.

de, ji xelkê re digot ku, *"ji Cihûyan re bêjin û wan dilxweş bikin ku kesek xwe nêzîkî dikanên wan nake!"*.

Şoreşa Bîstan di rîya serxwebûnê de yekem tevgera şoreşgerî û rizgarîxwazî ya hemû gelên Iraqê bû ku serokatî û dezga îdarî, eskerî û organ û çapemenîya xwe ya taybetî hebû. El-Firat û El-Istîqlal, di dîroka rojnamegerîya Iraqê de rûpelên yekcarî dîyar û şewqdar in (46).

Ji derveyê hemû van tiştên ku me behs kirin, dîroknivîsên pêşkevtîxwaz jî di vê bawerîyê de nin ku Şoreşa Bîstan bûye kevirê bingeha yekîtîya xebata muşterek a Kurd û Ereban a dijî dagirkeran û bi vî awayî ji bo vebûna deriyê sîyasî gelêrî ya herdu milan rê çêkirîye û baştir bi vê yeka han têgihîştîye ku dijminên wan yek in(47).

Herçiqas dijmin karî Şoreşa Bîstan di xwîn de bikemilîne, lê eynî wextî neçar jî bû ku di netîca dexta wan tirsan de, serî ber hejmarek daxwazên wê demê yên gelê Iraqê bitewîne. Guherîna Arnold Wilson ê ku Iraqî ji hemû karbidestên Îngilîz zêdetir ji wî dildax bûn û di germîya şoreşê de şandina Percy (Persî) Koksî li Bexdadê, cure paşdekişanek taktîkî bû, ku Îngilîzan berê berpabûna agirê Şoreşa Bîstan bibîr nedianîn. A wê dereng an zû yek ji kurên Huseyn ê Şerîfê Mekkê bibûya paşayê Iraqê, lê guman ji vê yeka han jî nayê kirin ku Îngilîzan ji ber sebebên Şoreşa Bîstan, bi lez tac û textê şahîyê pêşkêşî Feyselê Yekem kirin. Çunkî ew gihîştin wê bawerîyê ku diviya Iraq di riya *"paşayek û hezar şêxan ve"* bihata îdarekirin, ne di riya hejmarek zêde ya eskeran ku barek gelek giran dikir ser bacdarên Brîtanya.

---

(46) Ji bo dirêjahîya vê behsê binêre gotara ku bi navê "Mîn Tarîxî Sehafetî Sewretu'l 'Eşrîn", di rûpelên 35-70'yên kovara Drasat Fî'l-Tarîx we'l-Asar, Bexdad, el-'ededu'l-sanî, 1982 de hatîye belavkirin.

(47) Binêre: "Iraqa Hevdem", nivîsa grubek Rojhilatnasan, bi zimanê Rusî, Moskova, 1966, rûpel: 135.

(Iraq Review), Vol.1, No: 6, July 2, 1959, P.3.

Ji yekemîn roja destpêka Şoreşa Bîstan şun de, deng û behsên şoreşê li seranserî Îraqê, Rojhilata Navîn, di nav sîyasîyên Awrupayê û Amerîka Yekgirtî de deng daye. Wek me dît, xeberên şoreşê gelek zû ketine ber destên sîyasîyan û li ser rûpelên rojnamên Londrayê. Arşîvên taybetî yên Îngîltere, Frensa û Hindîstanê, tijî bi sedan belge û raporên nihênî yên gelek milên şoreşê ne, lê çi heyf ku heta niha jî kêm ji wan ketine destên dîroknivîsan.

Li gor bawerîya min cî û giranîya sala 1789'an ji bo dîroka nû ya Fransayê çi ye, cî û giranîya Şoreşa Bîstan jî ji bo dîroka hevdem a Îraqê ew e, ji wê kêmtir nîne. Ji ber vê ez bi dilek pak dibêjim ku yê me heta niha ji bo Şoreşa Bîstan kirîye, gelek ji qîmeta wê ya rastî kêmtir e.

MIJARA YANZDEHAN

# LI SER SERÎHİLDANA MEZIN A KANÛNA DUYEM A SALA 1948'AN Û CIYÊ GELÊ KURD DI WÊ SERÎHILDANÊ DE

Dîroka nû ya hevdemî ya Îraqê tijî ji rûpelên xebata xwînavî ya dijî dagirkerên bîyanî û kevneperestîya hindur e(*). Yek ji van rûpelên pîroz, serîhildana mezin a Kanûna Duyem a sala 1948'an e ku îro ji her wextî zêdetir, pêwîst e em ji dersên wê yên dîrokî ya mezin feyde werbigrin û bi awakî zanistî û fireh bikolin.

Ji bo ku em bikaribin bi awakî durust çarçova Serîhildana Kanûnê bidin dîyarkirin, pêwîst e em çavek li wan guherînên mezin ên di rojên Şerê Cîhanê yê Duyem û salên piştî wî de yên di wan awa û guherînên ku naveroka xebata rizgarîxwazî û jîyana civakî ya Îraqîyan de çêbû, bigerînin.

Demek gelek dirêj berê Şerê Cîhanê yê Yekem, derebegî wek

(*) Di kovara Birayetî, hejmar: 11, sal: 1, cilda duyem, nîva Sibata 1971, rûpel: 4-15'an de hatîye weşandin.

rejimek aborî û civakî ber bi têkçûnê de bû û di pêşîya pêşkevtina sebebên wasitên berhemdarîyê de bibû asteng. Ji ber sebebê kêmterkexemî (nemelazimî) û bîrtengîya nûnerên wê li alîyek, li alîyê din jî ji ber awayê peywendîya berhemdarîyê, vê rejimê karek wisa nekiribû ku di destê cotkar û xwedî axên biçûk de waridatek bimîne ku ji jîyana xwe ya rojane zêde bike û bikare vê zêde waridata han ji bo berfirehkirin û pêşxistina wasitên karê xwe texsîs bike. Li ser vê de jî Osmanîyan û piştî wan jî Îngilîzan, ji bo xwe, gelek milên vê rejimê ragirtin, cîyê pêyên xwe qahîm û desthilata xwe xurttir kirin. Vê yeka han demek bû dijîtîyek di navbera axa û gundîyan de çê kiribû.

Ji ber çend sebeban, di salên Şerê Cîhanê yê Yekem û piştî vî şerî de, pelçiqandina derebegî ji carên din zêdetir bû, ev jî bû sebebê kûrbûna dijîtîya nava xwedî ax û gundîyan. Ev yeka han bû sebeb ku gundî tenê dagirkerên bîyanî ji xwe re dijminê rasteqînî nebîne, belko eynî wextî kedxwerê hindur jî wek dijmin bibîne. Netîca sîyasî ya vê bûyerê jî ji bo rojên bên hindik nebû.

Lê ji vê jî mezintir ew guherînên mezin ên girîng bûn ku li bajaran eynî wextî rû dan û bûn sebebê wê yekê ku jîyana civakî û xebata netewî ya Îraqîyan bikeve nav çarçovek nû. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem û bi taybetî piştî xelasîya salên 20'an şûn de, sanayîya netewî ber pêş de çû. Gavên mezin ên pêşde çûna waridata sanayîya netewî, di salên Şerê Cîhanê yê Duyem de çêbû, wê demê ku ji ber sebebê şerê bazara Îraqê ji bazara sermayedarî qut bû, bû mercek li bar ji bo kesên xwedî perên mezin ên bajaran ku bi dilxweşî bixin saha berhemdarîya sanayîyê. Netîca vê yeka han jî giranîya burjuvazîya netewî, çi di jîyana aborî û çi jî di jîyana sîyasî ya welat de ji carên din zêdetir kir.

Di milek din de jî ev bûyera han bû sebebê zêdebûna hejmara çîna karker. Van çend sebebên taybetî tesîrek wisa kir ku giranîya vê çînê di çend alîyan de, heta ji giranîya çîna burjuvazî ya netewî jî zêdetir be. Wek mîsal, di salên Şerê Cîhanê yê Duyem de, tenê hejmara wan karkerên ku di bingehên eskerî yên Îngilîzan de kar dikirin, nêzîkî 70 000 kesan bûn, ev hejmara han %35'ê tev wan karkeran pêkdianî ku di hemû

karên sanayîyê de dixebitîn[1].

Lê ji vê jî girîngtir ew guherînên kûr bûn ku ji destpêka salên 30'yan ve, di naverok û awayê fikirîn û tevgera vê çîna mezin a civakê de destpê kiribûn. Di destpêka çêbûnê heta nîvê salên 30'yan ev beşê civakê, tenê ji "ber xwe ve çîn" (çînêk le xwoy da - class in it self), yanî tenê çîn bû. Di warê sîyasî û civakî de pêşengîya kar di destê çînên din ên welat de bû. Heta fermanrewayên wan çaxan jî dixwestin jê îstîfade bikin û bikarin bikin darên destê xwe. Bê sebeb nebû ku di dawîya salên 20'an de yekî wek Cafer Eskerî çend car di nezdê Komela Gelan de bûye "nûnerê" karkerên Iraqê. Ev yeka han di nîvê salên 30'yan de yekcarî guherî, ji vir şun de êdî hêdî hêdî karkerên Iraqê ketin nav qalibê "ji bo xwe çîn" (class for it self)[2].

Netîca van guherînên han di salên Şerê Cîhanê yê Duyem de bi awakî xweş derket û xwe di zincîrek grev (karberdan) û sloganan (şîar) de da pêş. Demek kêm piştî şerê jî greva mezin a Gawirbaxî ku di destpêka havîna sala 1946'an de qewimî, bi tevayî îspat kir ku çawan karkerên Iraqê bi yekcarî bûn çînek ji bo xwe.

Ev cure guherînên han herdem netîcên mezin bi xwe re anîne, bi taybetî nîsbet tevgerek rizgarîxwazî ya civakek be. Bi

(1) Binêre : (Kingdom of Iraq), by a committee of Officials, Baltimore, 1946, P. 108. Her wiha binêre: El-Şerare, el'ededû samin, Huzeyran 1944, rûpel: 2.

(2) "Ber xwe ve çîn" û "ji bo xwe çîn", du gotinên zanistî ne, ku heta niha di zimanê Kurdî û ez bawer im di zimanê Erebî de jî nehatine bikaranîn. Endamên hemû çînên karker di destpêka çêbûnê de û heta demek dirêj belav in, hîssa wezîfeyên civakî û sîyasî yên ser milê xwe nake. Dîqqeta xwe nakişîne li ser yekîtîyê di beranberê çîna sermayedar û rejimên sermayedarî de û tevger û serîhildanên wan ên çêdibin û heta gelek car pêşengîya kar û aktivîtên wê di destên çîn û tebeqên din de ne. Di vê qonaxê de çîna karker tenê "ber xwe ve çîn"ek pêkhatî ye. Lê piştî ku ev bûyerên han tev diguherin û karker hîss bi erkên civakî û sîyasî yên ser milên xwe di nav temamê civakê de dike, ew çax ev çîna han diguhere û dibe "çînek ji bo xwe", yanî êdî ne darê destê kesek e û ji wê rewşê xelas dibe û ji bo xwe şer dike.

nîsbet wan civakan e jî ku ji neteweyek zêdetir pêkhatine. Ev guherînên han ji wan re dibin maya (hêvîn) kêmbûna dijîtî û nakokîya neteweyî ya nav wan, bi taybetî ya nav çîna serdest.

Bi vî awayî gava ku Şerê Cîhanê yê Duyem temam bû, giranî û mîzana çînîtî di nav civaka İraqê de gihîştibû dereca şertên kemla guherînên sîyasî yên mezin. Ev rewşa ku bi xwe re xistina enîya faşîzmê ji bo seranserê cîhanê anî, jê re bû sebebekî alîkar ê girîng. Karbidest, neçar bûn heta dereceyek mil bidin ber daxwazên demokratîk ên gel. Roja 23'yê Sibata sala 1946'an Tewfîq Siwêdî, yekemîn wezareta piştî şerê damezrand ku du kes ji nûnerên burjuvazîya netewî tê de beşdar bûn. Ê yekem Se'd Salih e û bû wezîrê hindûr, yê duyem jî 'Ebdulwehab Mehmûd e ku ew jî bû wezîrê Malîyê.

Di wê programa ku Serokwezîr roja 5'ê Adarê pêşkêş kir de, dewletê gelek sozên sîyasî û aborî didan xelkê. Ji van a herî girîng guherîna peymana sala 1930'an a di navbera İraq û Brîtanya de bû ku diviya bi awakî li gel "rewşa nû ya cîhanê û programa Komela Netewên Yekgirtî re" li hev bê. Maddeyek din a programê, li ser belavkirina axa dewletê bi ser gundî û cotkarên welat de bû. Kabîna nû, piştî mehek li ser demazrandina xwe re, biryara ji holê rakirina îdara 'urfî da ku ev ji Hezîrana sala 1941'an ve hatibû danîn. Eynî wextî kontrola ser çapemenî û postê jî rakir.

Mezintirîn destkevtîyê wî çaxî biryara rêdana damezrandina pênc partîyên aşkera bû. Navê van partîyan ev in: El-Şe'b (Gel), El-Îttîhadu'l-Wetenî (Yekîtîya Niştimanî), El-Wetenu'l-Dimûqratî (Nîştimana Demokrasî), El-Ehrar (Ên Azadîxwaz), El-Îstîqlal (Serxwebûn). Roja 2'yê Nîsana sala 1946'an bi awakî resmî riya van partîyan hat dan û ji wir şûn de êdî di welat de jîyana sîyasî geş bû. Her yek ji van partîyan xwedî mafê organ û çapemenîyên xwe yên taybetî bûn û hemû jî li gor xwe ji daxwazên gel re xwedî derketin ku di wê demê de ji her tiştî zêdetir daxwaza jiholêrakirina Peymana Sala 1930'an bû. Daxwaza bêrawestan a civaka gel, hukmetê neçar kir ku komîteyek taybetî ji bo lêkolîna vê meselê deyne.

Yekser piştî temambûna Şerê Cîhanê yê Duyem, berê her

tiştî ev yeka han derket ku çawan xebata bêrawestandin a gel dikare rêçek nû di sîyaseta hindur û derve ya Iraqê de bîne holê. Îngilîzan, Iraq ji bo tiştek din kiribûn bingeh, ewan dixwestin ku di cîhana piştî şer de, Iraq bi yekcarî bikin bingeha qahîm a belavkirina desthilat û parastina menfe'eta aborîya xwe di seranserê Rojhilata Navîn û Nêzîk de. Ji ber vê çi ew bi xwe û çi jî kevneperestên hindûr bi guman û tirsê li asoya (ufqa) sîyasî ya nû ya Iraqê dinêrîn û bi rikoyî (îsrar) pêwîst didîtin ku bi zûtirîn wext derîyên qefesan bi ser de bigrin. Piştî birek wan zincîrên civînên serokên dewletên Ereban ên bihar û destpêka havîna sala 1946'an, karên han bûn wezîfeyên bi lez li ser milên kevneperestên Iraqê.

Rewşa sîyasî û aborî ya wê demê ya Iraqê, berê hemû tiştî peywendîya di navbera hêz û çînên netewî de, heta derecek zêde karê kevneperestên Iraqê hêsan kir. Carek her welatekî ku ji neteweyek zêdetir neteweyan pêkhatibe, pêwîst e welatparêzên dilsoz hewl bidin ku yekîtîya netewî bikin bingeha hemû guherînên sîyasî yên kûr. Lê dema ku Şerê Cîhanê yê Duyem temam bû bi sebebê sîyaseta dûrbîn a Îngilîzan, hîn yekîtîyek wisa di zemîna Iraqê de di holê de nebû. Bi ser van tevan de, hemû hêzên welatparêz ên wê demê bi kûrî giringîya yekîtîyek bi vî awayî tênegihîştibûn. Wek belge em vê yeka han tenê bêjin bes e; herçiqas karbidestên Iraqê yên wê demê bi awakî zanistî gelê Kurd ji mafên sîyasî yên bi heq bêpar kiribûn, lê çi heye ku yek ji wan partîyên ku me navê wan got, ne di program û ne di karên xwe yên rojane de qîmetek wisa nedidan mesela Kurd, bi rastî jî nedikarîn çarçova pêwîstîya vê meselê dîyar bikin. Partîya Azadîxwazan (El-Ehrar) ku welatparêzekî naskirî yê lîberal ê wê demê serokê wê bû, bi carek gelê Kurd avêtibû piştguhê xwe. Ji vê jî xirabtir eva han bû ku Partîya Serxwebûn (El-Îstîqlal) gelê Kurd di pêşîya cîbicî-kirina yekîtîya Ereban de[3] kiribû "asteng"ek. Ev cure da-xwaz û nêrînên kurtbîn, karek wisa kirin ku yek ji wan partîyên aşkera yên piştî şer, nekarîn di nav Kurdan de ji

(3) Binêre: Mihemmed Mehdî Kubbe, Muzekkeratî Fî Semîmî'l-Ehdas (1918-1958), Beyrût, 1965, rûpel: 199.

bo xwe bingehek damezrînin, vê yeka han jî li ser giranî û îmkanên sîyasî-yan tesîrek zêde kir.

Di milê din de peywendîya navbera hêz û çînên netewî ji vê baştir nebû. Bêparkirina beşek ji wan çînan ji mafên sîyasî, li gor burjuvazîya netewî kirinek bi heq û di cî de bû, loma di vî warî de yek gotin ji devê wan derneket. Ev yeka han li gel çend sebebên din tesîrek wisa kirin ku karbidest bikaribin gelek bi zû dest deynin li ser destkevtîyên destpêkî yên gel. Ji bo ku qet nebe xwe ji wezîrên welatparêz xelas bikin, roja 30'yê Gulana sala 1946'an, Tewfîq Siwêdî naçar kirin da ku ji hukumetê dev berde. Du roj şûn de damezrandina kabîna nû sipartin Erşed 'Umerî yê ku yek ji kesên sîyasî yên nehizkirî bû û dijminekî naskirî yê hêzên demokrasîyê bû. Damezrandina wezareta nû destpêka êrîşên mezin a kevneperestan bû li ser gel. Hemû li ser hev çar hefte ser re derbaz nebû, polîsan mitîngeke (xwenîşandaneke) Bexdadê gulebaran kirin[4], pênc kes hatin kuştin û gelek kes jî birîndar bûn. Du heftê piştî vê jî hedîsa bixwînî ya Gawirbaxî qewimî û ev jî bû sebebê kuştin û birîndarkirina gelek karkerên neftê ya Kerkukê.

Ev lêxistinên han karên qestî û plankirî bûn. Diviya ji bo zîldanên van guherînan çi kesê ku serê xwe hildana zindî bihata çalkirin û Îraq ji carê din tundtir bi çerxên daxwazên Londra ve bihata girêdan û bibûya bingeha serekî ya êrîşên ser hemû tevgerên rizgarîxwaz ên netewî yên gelên Rojhilata Navîn û Nêzîk. Cîbicî kirina van mebestan û li ser vê de jî lêxistina hêzên demokrasîxwaz pêwestê peymanek din bû ji bo tijîkirina wan valatî û kêmasîyên ku di Peymana Sala 1930'an de derketin, bi taybetî jî piştî destpêkirina serîhildana Gulana 1941'an. Cîbicîkirina vî erkî, wek jê hêvî dihat kirin, ket ser milê Nûrî Se'îd ê şareza ku roja 21'ê Teşrîna Duyem a sala 1946'an damezrandina wezaretek nû pê hat sipartin. Nûrî Se'îd jî ku zanayên wek wî di Rojhilata Navîn de kêm hebû, xwest hemû rewş û zemînê pêwist ji bo peymana nû

(4) Welatparêzên paytextê, roja 28'ê Hezîrana sala 1946'an vê xwenîşandana han rêxistin.

amade bike lê morkirina wê bixe ser milê sîyasîyek din. Ji ber ku ew baş tê gihîştibû ku îmzakirina peymana sala 1930'yan heta çi derecê wan kesên ku vê peymanê îmzakiribûn ber çavê xelkê xistibû. Ji derveyê vê, wergirtina Îraqê ji bo endametîya Komela Gelan li ber bû, lê di ev peymana han a nû ya ku Îngilîz û kevneperestan dixwestin de ji bilî qeyd û zincîrê pê ve tiştek din tune bû. Eynî wextî Nûrî Se'îd baş bi vê yeka han jî gihîştibû ku ferqîtîya raya giştî ya nîvê salên 40'an li gel raya giştî ya destpêka salên 30'yan gelek e û qet dûr nîne ku di netîcê de rîsên wî xav bibin, bibin hirî. Ji ber van sebeban, her ewqas çend gavên din dijî deskevtinên demokratîk ên gel avêt û dev ji kar berda û wisa kir ku damezrandina wezareta nû dan Salih Cebr.

Di Adara sala 1947'an de Salih Cebr wezareta nû damezrand û her di destpêkê de hemû îmkanên xwe seferber kirin da ku rojek zûtir ew peymana ku Londra dixwest bê morkirin. Ji roja 22'yê Teşrîna Duyem a sala 1947'an şûn de, di destpêkê de li konsolosxana Brîtanya ya Bexdadê, û dawîyê jî li Koşka Şahane "nunerên" Îraq û yên Brîtanyayê çend car bi nihênî civîyan. Mebesta van civînan ku heta roja 4'ê Kanûna Yekem dom kirin, dîyarkirina naverok û çarçova peymana nû û awayê morkirina wê bû. Roja 4'ê Kanûna Duyem a sala nû, yanî piştî mehek, li Bexdadê, navê endamên wê heyeta ku "ji bo îmzakirina peymananek nû ya di cîyê Peymana Sala 1930'yan de" dê biçûna Londrayê, hat belavkirin. Heyet di bin serokatîya Salih Cebr de, bi endametîya Nûrî Se'îd, Wezîrê Derve Fazil Cemal, Wezîrê Bergêrî (Difa'i) Şakir Wadî û çend kesên din pêk hat. Bi lez ev heyeta han ber bi Londra ve ket rê û roja 15'yê Kanûna Duyem a sala 1948'an li Korfeza (Bendera) Portsmouth ku dikeve Başûrê Brîtanya, li gel nûnerên Londra ew peymana ku terh kiribûn mor kirin û bi navê Peymana Portsmouth ket nav rûpelên dîroka hevdemî ya Îraqê.

Peymana Portsmouth bi nisbet Peymana Sala 1930'yan, paş de gavavêtinek bû, ji ber ku wan Îraq tundtir bi Brîtanya ve girêdan. Li gor peymana sala 1930'yan, tenê di wextê şer de mafê Îngilîzan hebû ku eskerên xwe bînin nav axa Îraqê lê li

gor Peymana Portsmouth Îngilîzan vê mafê han ji bo di wextê "peydabûna tirsa şer de jî" sitendin, yanî her çi dema ku Londra bixwesta bi her bahaneyek heqê wê hebû ku bi esker bikeve nav axa Îraqê. Li gor benda yekem a Portsmouth, seranserê axa Îraqê ji bo tam 20 salan bû bingeha Brîtanya. Bendên din ên Peymana Portsmouth miftên (kilîdên) gelek zêde yên milên jîyana sîyasî, aborî û kar û barên eskerî dabûn destê Îngilîzan(5).

Gavê îmzakirina Peymana Portsmouth hemû Îraqê bi carek hejand. Bi hezaran xwenîşander rijîyan ser kuçeyên bajarên mezin û nerizabûnên gel gelek bi zû gihîştin dereca sirîhildanek mezin û rêk û pêk ku pêşengîya serokatîya wê di destê hêzên netewî ên nihênî û aşkera de bû.

Gelê Kurd gelek bi germî têkilê nav vê serîhildanê bû. Welatparêzên Kurd ên Bexdadê her di destpêkê de mil bi milê xelkên paytext, rijîyan ser kuçeyên bajêr. Li Bexdadê, Partîya Demokrat a Kurdistan, Partîya Komunîst û Partîya Gel, komîtekê sê qolî ya taybetî damezrandin ku wezîfa serekî ya wê, rêxistina xebata gel û dîyarkirina sloganên girîng ên xebata vê qonaxê bû. Evên jêrîn ji wan sloganên wê komîtê ne:

*"Îptalkirina Peymana Portsmouth", "Xistina Hukumeta Salih Cebr", "Helbijartina azadane nûnerên gel", "Dayîna mafên demokratîk" û "Nehiştina buhatîyê".*

Ji derveyê van sloganan di wextê serîhildanê bi xwe de çend sloganên din hatine avêtin ku beşek ji wan peywendîya xwe bi mafê neteyî yê Kurdan ve heye. Longrîgg, bi awayê jehrrijandinê, vê serûbinîya şoreşgerî nirxandîye û wiha dibêje:

*"Ew peymana bi hêz a sala 1948'an di navbera neteweperestan û Kurdên komunîst ên ser Rusya hat îmza kirin... têkilhevîyên bê ser û bin ser kuçe û mektebên bajêrê Silêmanîyê de anî"*(6).

---

(5) Derbarê metna bendên Peymana Portsmouth binêre: Ebdulrezaq El-Hesenî, Tarîxu'l Wezaretu'l Îraqîyye, el-cuz'u'l-sabî, Seyda, 1968, rûpel: 233-239.

(6) S.H.Longrigg, Iraq 1900 to 1950, London, 1953, P.353.

Hêzên netewî ên din jî destgirêdayî nesekinîn. Hîn heyeta Salih Cebr neçûbû Londrayê, Partîya Wetenî-Dîmuqratî, Îstîqlal û Ehrar belavokek sêqolî belav kirin, tê de daxwaza jiholêrakirina peymana sala 1930'yan kirin û raya xwe gihandin Hukumeta Salih Cebr ku bi tu awayî mafê wî tune ku li ser navê Îraqê peymanek nû li gel Brîtanya îmza bike[7].

Dema ku Fazil Cemal ê Wezîrê Derve li Londra hewlê destpêkirina "muzakereke girîng" a di navbera Brîtanya û Îraqê de da xûya kirin teqînîyên mezin ên gelêrî yên Îraqê wê rojê destpê kir. Roja piştî wê ku dike 4'ê Kanûna Duyem a sala 1948'an[8], bajarê Bexdadê bi carek ser û bin bû. Her wê rojê jî li ser fermana serokwezîran, polîs ketin canê xwenîşanderên paytextê. Rojek şûn de karbidestên Fakulta Hiquqê li ser vê behanê fakultê girtin ku goya bîr û bawerîya tekilhevîyê di nav xwendevanên wê de belav e.

Ev bûyerên han ên Bexdadê Wezareta Salih Cebr ji îmza kirina peymanek nû dûr nexist. Roja 5'ê Kanûna Duyem endamên heyeta "Îraq"ê bi firokek taybetî çûn Londrayê. Vê yeka han hinek din welatparêzên Îraqê şidand. Her wê rojê cardin xwendevanên Bexdadê rijîyan nav kuçeyên bajêr û sinif û tebeqên din jî mil dan ber wan. Vê carê jî polîs êrîş anî ser wan û di netîcê de ji herdu milan jî hejmarek zêde kes birîndar bûn. Iê dezgên dewletê di belavokên xwe de ku li ser van bûyeran belav kirin, behsa birîndarîya 42 polîsan kirin. Zû derket ku wan dixwestin vê yeka han bikin behana pelçiqandin û tehdayên tund û tujtir. Ji ber vê, roja 7'ê Kanûna Duyem belavokek belav kirin ku bi tehdît û çavtirsandinek zêde ve digot:

*"Hukumet, dê bi awakî tund biçe ser wan kesan ku dixwazin hêminî û asayîşê têk bidin".*

Netîcên van kar û biryaran bi tevayî di eksê daxwazên karbidestan çêbûn. Li ser van biryaran hêminîya Bexdad a pay-

---

(7) Binêre: Sewtu'l Ehrar (cerîde), Bexdad, 1 û 2. Kanûnî Sanî 1948, Mihemmed Mehdî Kubbe, serokanîya ku navê wê derbaz bû, rûpel: 225-226.

(8) Fazil Cemal vê xebera han roja 3'yê Kanûna Duyem a sala 1948'an belav kirîye.

text deyne cîyek, eynî wextî bajarên din jî têkilê serîhildana gel bûn. Dema ku kar gihîşt vê derecê, goya ji bo lêkolîna daxwaza gel Cemal Baban ê cîgirê Salih Cebr neçar bû li gel hejmarek sîyasîyên naskirî civînek taybetî çêke. Her çi hal bû, hukumet neçar bû hinek xwe paş de bikişîne. Ev yeka han bû sebeb ku roja 8'ê Kanûna Duyem biryara vekirina Fakulta Hukukê û berdana girtîyan bi kefalet, bidin.

Lê van biryaran xelkê paş de neda, ji ber ku li ser van hemû têkilhevîyan de hîn hukumetê ji îmza kirina Peymana Portsmouth paş de gav neavêtibû. Ji ber vê ji roja 16'yê mehê şûn de cardin li hemû milan xwenîşandan çêbûn. Xwendevanên mektebên navendî û dezgên unîversîtê, biryara greva sê rojan dan. Sê roj şûn de sendîkên[9] karkeran jî daxwaz ji endamên xwe kirin da ku ew jî "di riya cîbicîkirina daxwazên tevgera netewî ya gel de agirê xebata xwe geştir bikin". Eynî wextî hêzên burjuwazî yên netewî jî hewl dan ku ji bo firehkirina xebata asê ya van rojên teng ên dîroka welatê xwe, bikevin xebatê di nav civaka xelkê de. Ji bo vê mebestê cardin heryek ji partîya Wetenî-Dîmukratî, Îstîqlal û Ehrar, bi serê xwe belavokên dirêj belav kirin ku beşê piranî yê belavokên hersêyan jî ji bo danexûyakirina naveroka Peymana Portsmouth û aşkerakirina mebestên wê yên nihênî bû[10].

Van bûyerên han bi carek welat ber geşbûnê de bir. Roja 19'yê Kanûna Duyem, bi deh hezaran xwenîşander bi sloganên xwe yên netewî ve ketin hewildana çareserîkirina nerizayîyên gel. Xwenîşanderên Bexdadê,, vê carê berê xwe dan hola parlamentoyê û bi yek dengî gotin: "Mirin ji bo Peymana Portsmouth", "Hilweşe wezareta Salih Cebr".

Rojek şûn de, yanî 20'ê Kanûna Duyem, cardin polîsê paytext destê xwe dirêjî xwenîşanderan kir, bû sebebê şehîdbûna çar

---

(9) Civat, yanî "neqebe". (Ji bo rê baş dana fehmkirinê me di şûna her duyan de jî sendîka bikaranî-Elîşêr.)

(10) Ji bo van belavokan binêre: Dr.Fadil Huseyn, Tarîxu'l Hizbu'l Wetenî'l-Dîmuqratî, Bexdad, 1963, rûpel: 222, Ebdulrezaq el-Huseyn, serokanîya ku navê wê derbaz bû, el-cuz'u'l-sabî, rûpel: 241-

kesan û birîndarbûna dehan kesên din. Roja din bi hezaran welatparêz ji bo beşdarbûna cenazên qurbanên roja borî, rijîyan ser kuçan û meydana Nexweşxana Mecîdîyê(11); carek din bûn hedefê guleresandinê û vê carê jî du kes şehîd bûn ku yek ji wan xwendevanê Fakulta Dermansazîyê bû, gelek ji wan jî birîndar bûn.

Van kirinên dawîn ên hukumetê wan grubên bêalî jî dişitandin ku heta wî çaxî ji ber sebebên cihê beşdarî xebata gel nebubûn. Berpirsîyar û grubek mamostên Fakulta Tibê gelek bi tundî nerizayîyên xwe dan xuyakirin û li gel nêzîkî 100 doktorên bajarê Bexdadê ve dest ji kar berdan(12).

Dema ku kar gihîşt vê qonaxa nazik, êdî 'Ebdulîlla neçar bû ku yekser bê sahê. Roja 21'ê Kanûna Duyem bi grubek mirovên sîyasî yên navdar re civîya ku nûnerên her sê partîyên sîyasî yên aşkera bûn(13) Wan bi aşkera daxwaza çûna Salih Cebr û sekinandina hemû cure peymanan jê kirin(14).

'Ebdulîlla dît ku karê wî ber bi jêr ve diçe, neçar bû ku nûnerên gel çi dixwazin, wisa bike. Di destpêkî de belavokek di radyoyê de da belavkirin û tê de soz da ku *"tu peymanek a mafê welat û daxwazên netewîyan negre berçav, neyê îmza kirin"*. Lê eynî wextî Salih Cebr ji Londrayê ve ket êrîş û tehdîdan û di belavokek taybetî de serîhildana gel kir ser milê wan kesên ku navê wan kir "komunîst û nazî"(!!) û da xuya kirin ku bi xwe bi awakî zû "ji bo wan kesên ku bi şaşîtî kar tevlîhev kirine", vedigere Bexdadê.

---

(11) Vê nexweşxana han di wextê xwe de Osmanîyan di "Babu'l Mu'ezzem" a Bexdadê de çêkirine û navê Sultan Ebdulmecîd lê kirine, heta salên 50'an jî her jê re Xestexana Mecîdî dihat gotin. Heta niha jî beşek ji avayîyên nexweşxana Mecîdî mane, kirine ser "Mendînetu'l-Teb".

(12) Binêre: (Revolution in Iraq), Baghdad, 1958, PP. 13-14.

(13) Karbidestan her bi zû Partîya Gel (Şe'eb) û Yekîtîya Niştiman (Ittîhadu'l Wetenî) girtin.

(14) Ji bo direjîya van behsan binêre: M. Khadduri, Independent Iraq (1932-1958), London, 1960, P. 268.

Ev belavoka han a serekwezîr hinek din xelkê aciz kir. Roja 23'yê Kanûna Duyem, cardin di hemû milan ve civakên gel rijîyan ser kuçeyên paytext û bajarên mezin ên din û vî carî ku rikoyî bûn ku heta ev sloganên serekî yên xwarê neyên cîbicî kirindev jê bernedin .

1) Çûna Wezareta Salih Cebr

2) Berdana girtîyên sîyasî

3) Helbijartinek azad

Rojên 24 û 25'ê Kanûna Duyem, di bin daxwazên van sloganan de çend xwenîşandanên gelek mezin li Bexdad û bajarên mezin ên din çêbûn. Rojek şûn de Salih Cebr gihîşt Bexdadê. Hatina serekwezîr û karên wî, bûn neft û ketin ser agirê serîhildana gel, ewî bi bawerîyek tam soz da 'Ebdulîlla ku di navbera 24 se'etan de "hêminî û asayîş dê bibe wek berê". Cemal Baban bi wê yekê gunehkar kir ku goya dema ku ew li derveyî welat bûye, wî " bi nermî li gel tevlîhevkeran beşdarî kirîye". Van tohmetên han wisa kir ku Cemal Baban yekser dev ji wezaretê berde. Wezîrê Kar û Barê Hindûr jî ji bo ku "şaşîtî"ya Cemal Baban tekrar neke, wê roja ku Salih Cebr gihîşt Bexdayê ferman da hemû polîsên Îraqê da ku bi tundî li xwenîşandanek nû bixin. Roja din, yanî 27'ê Kanûna Duyem bi hemû milan de polîs ketin canê welatparêzan. Wê rojê li Bexdadê 20 kes kuştin û gelek ji van zêdetir jî birîndar kirin. Xwenîşanderên Bexdadê wê rojê çapxana "Times Îraq" a ku di destê Înilîzan de û merkeza rewşenbîrî ya Brîtanya şewitandin. Li Kerkukê jî welatparêzan êrîş birin ser konsolosxana Brîtanya(15). Ji tirsa xwenîşanderên Kerkukê dezgên kompanya petrolê bi polîs hatin parastin. Xelkê bajarê Silêmanîyê ji yekemîn roja serîhildana Kanûnê ve bi carek rabibû. Li vir jî xwenîşanderan êrîş birin ser merkeza rewşenbîrî ya Brîtanya û şewitandin.

Van bûyerên han bi carek tirsê xist nav rêzên piranîya karbidestên welat. Bîhna şoreşê di hemû milî de bilind dibû. Eynê rojê yanî 27'ê Kanûna Duyem, Wezîrê Malîyê, Wezîrê Kar û Barên Civakî, Serokê "Encumena Nûneran" û 20 kesên

---

(15) S.H.Longrigg, Op. Cit., P.347.

din dev ji kar berdan. Lê Nûrî Se'îd, Salih Cebr û yên nêzî wan dixwestin bi çi awayî dibe bira bibe, serîhildana gel bitefînin. Li gel vê jî her eynê rojê Ebdulîlla neçar ma daxwaz ji serekwezaretan bike ku dest ji kar berdin û se'et heştê şevê, vê xebera han di riya radyoyê re da belavkirin.

Ev yeka han di rojên serîhildana Kanûnê de yekem serkevtina mezin a gel bû. Ev serkevtina han a hêja ne tenê di dîroka hevdemî ya Îraqê de, eynî wextî di dîroka hevdemî ya seranserê Rojhilata Navîn û Nêzîk de jî bûyerek hêja bû. Civakên gel di hemû alîyan ve, gelek bi germî alîkariya ketina wezareta Salih Cebr kirin.

Destkevtinên mezin ên van rojan, xelk û partîyên sîyasî sar nekirin, wan dev jê berdana Îraqê ji "Peymana Portsmouth" dixwestin û ji wê ditirsîyan ku dûrxistina Salih Cebr tenê paşdekêşanek tektîkî be. Ev yeka han, bû sebeb ku roja 28'ê Kanûna Duyem karîn karek wisa bikin ku nehêlin damezrandina kabîna nû ji Erşed 'Umerî re bê dan ku wek Salih Cebr sîyasîyek bê zirav bû. Ji ber vê Ebdulîlla û kesên rawêjker neçar bûn li ser yekî wisa bisekinin ku xelk di wan rojan de pê qaîl bin. Roja din damezirandina kabîna nû sipartin Mihemmed Sedr ku mirovekî dînî yê naskirî û yek ji wan serokê Şoreşa Bîstan bû. Ev yeka han bi serê xwe ji bo grubek karbidest problemek din bû. Bi taybetî ger em vê yeka han jî bigrin ber çav ku du nûnerên burjuwazîya netewî di wezareta Mihemmed Sedr de cî girtin, ê yekem Mihemmed Reza Şebyî û yê duyem jî Mihemmed Mehdî Kubbeyê serokê Partîya Îstîqlal bû. Lê li alîyê din nûnerên grubên kevneperest ên wek Cemîl Medfe'î û Erşed 'Umerî bûn endamên kabîna nû ku eynî wextî partîya Wetenî-Dîmuqratî jê dûrxistin. Herçî Partîya Ehrar bû bi xwe nexwest beşdar be.

Gelek li ser de derbaz nebû, zeman îspat kir ku ev problema han a kevneperestên Îraqê gavek deqîq û dûrbîn bû, lê ji bo gihîştina netîcê hîn pêwistî bi çend gavên din hebû. Serekwezîrê nû Mihemmed Sedr, di yekem belavoka xwe de, sozê cîbicîkirina "daxwazên gelê Îraq ê serbilind" da. Roja 1'ê Sibatê jî biryara damezrandina komîtek taybetî ya ji bo tesbîtkirina "gunehkarên xwînrijîna Kanûna Duyem" derxist. Vê ca-

rê du roj şûn de qerarê biryara betalkirina "Peymana Portsmouth" da.

Van biryarên han hêzên netewî ji xebatê dûr nexistin, wan dixwest ku hemû slogan û daxwazên gel bên bicîkirin. Hêjayî gotinê ye ku xebata gelê Kurdistanê jî di wan rojan de eynî bi vî awayî bi firehî û rêxistinî gihîşt Bexdadê. Xelkê bajarê Silêmanîyê, wek mîsal; di namek taybetî de van daxwazên xwarê kirin ber destê Wezareta Salih Cebr ku di naveroka xwe ya gelemperî de ji slogan û daxwazên serekî yên navçe û herêmên din pir cihê nebû:

1) Dayîna heqên demokrasî yên gel
2) Rêdan ji bo jîyana partîyên serbixwe
3) Rêdan ji bo damezrandina sendîkên karkeran
4) Azadkirina hemû girtîyên sîyasî yên İraqê
5) Ji holêrakirina Peymana sala 1930'yan.

Nêrînên namê bi vî awayî dawî lê hatibûn: "Xelkên bajarê me, dest ji xebata xwe bernadin heta ku ev dawxazên han neyên bicîkirin"(16). Ji bo bicîkirina eynê mebestê, Sibat û Nîsana sala 1948'an, çed heyetên taybetî ji Kurdistanê hatin Bexdadê. Roja 13'yê Sibatê, nûnerên Hewlêr û Koye bi hev re rijîyan ser kuçeyên Bexdadê û piştî zîyareta gora şehîdên 27'ê Kanûnê li gel xelkên paytextê beşdarî civîna cenazê welatparêzê Kurd Hiseyn 'Elî bûn ku berê wê di xwenîşandanek Bexdadê de hatibû birîndarkirin. Kovara Gelawêj di vî warî de wiha nivîsandîye:

*"Roja 13.2.1948'an, posta Koye û Hewlêr gihîştin cî, vê yekê jê re bêjin, mêranî nîşan dan, di kuçeyan de em çûn ser gora şêhîdan. Qevdek gul ji wan re dîyarî birin, ji wan re gotin wisa nezanin ku hun çûne! Hun neçûne, di quncikên dilên me de cîyê we heye. Bi vê jî nesekinîn, bi cenazê lawê gel (Kurd) Hiseyn 'Elî yê nûgihîştî re çûn bajarê pîroz Necef, ev bajarê han ku nevîyê (torinê) Pêxember li wir mêvan e û xelkên wî jî ehlê 'îlm û 'îrfan in"*(17).

(16) Binêre: Nûrî Ebdulrezaq Huseyn, Teyyaratû Sîyasîyye Fî'l-Hereketî'l Wetenîyye'l-İraqîyye, Qahîre, bila. rûpel: 65.

(17) Binêre: Gelawêj, Adar 1948, rûpel: 14.

Roja 26'ê Sibatê jî heyetek ku ji 500 kesan pêkhatîye ji Zaxo, Ranye û Silêmanîyê, hatin Bexdadê û li gel welatperwerên paytext re xwenîşandanek mezin çêkir û çûn ser gora şehîdan, li wir çend gotarên bi erebî û kurdî xwendin û çend caran jî bi germî behsa wê kirin ku divê xebata muşterek a Ereb û Kurdan bibe kevirê hîmê tevgera rizgarîxwazîya niştimanî, da ku gel bikaribe bi ser dijmin de serbikeve. Cardin kovara Gelawêj vê roja han a dîrokî di vê çarçova han de girtîye dest:

*"Roja 26.2.1948'an lawên gelê Silêmanîyê gihîştin cî*(18). *Ew tenê bi serê xwe 300 kes bûn. Bi lawên Ranye û Zaxo re bûn yek ku hejmara wan bi hev re gihîşt dorê 500 Kurdên camêr ên dilsozên dilbirîn, ew ji bo doza birayên xwe yên hemfikir diçin. Piştî ku li Deştî Melik Feysel rêz girtin, berê xwe dan Goristana*(19) *Babu'l Mu'ezzem, se'et didu û nîvê piştî nîvro di Şari'û Reşîd de rêketin...Di pêşî de flamên Îraqê, piştî wan hinek mirovên maqûl û rîspî bi cil-bergên kurdî ve, pişt van de rêzên ji çar-çar pêkhatî, di pişt flamên xwe de grubên Silêmanîyê, Ranye û Zaxo. Pişt wan de keçên Kurdan qevdek gul di destên wan de, pişt van de xortên bi cil-bergên kurdî û pankartên xwe, pişt van de jî cotek zarokên biçûk bi şal û şapikên xwe û cardin keçên bi qevdên gulan û rihanan ve, di dawîyê de jî Kurdên zarok...serî hat ser xortan û pankartên wan, ser van pankartan hemû cure tişt hatibûn nivîsandin, wek; pirsa şehîdan, navên heyetên Kurdan, jîyana Kurd û Ereban, biratîya Kurd û Ereban, daxwaza asayîşê di welat de. Ev meşa han bi awakî gelek baş hatibû rêk û pêk kirin. Di navbera bîst gavan de du Kurd, yek li milê rastê û yê din li milê çepê bi cil-bergên kurdî, bi rext û dabancên birno ve dimeşîyan. Evana hemû perdên şîn û xemîyê bi ser de kêşan, destê hemûyan li ser hev, bê deng û hîs ketin rê. Alema Bexdadê her ji Saha Melik Feysel û heta Goristana Babu'l Mue'ezzem bi jin û mêr vî milî û wî milî Şari'û Reşîd girtin û li wê menzereyê û meşa wan denêrîyan.*

---

(18) Di cîyên gelek pêwîst de nebe li rênivîsê destkarîyek nehatîye kirin. (Mebest orîjînalê kitêbê ya bi Lehça Soranî ye-Elîşêr)

(19) Di metna gotarê de; rûwew gorrî...(ber bi gorê-Elîşêr)

*Se'et çaran gihîştin goristanê û ketin hindûr..."*[20].

Gelawêj dema ku hatîye ser behsa axaftina Heme Ehmedî Taha ku li ser gora şehîdan xwendîye, bi van gotinên xwe yên gelek ma'nedar piştgirîya axaftina wî Kurdî kirîye:

Ey *"şehîdên riya azadîyê! menzereyên van kur û keçên han ku hun li ser gora xwe dibînin paşvemayên hovîtîya roja reş a 6'ê Îlonê ne ku ji bo azadîyê hatin meydanê û destên pîs yên bîyanîyan bi destên we yên dirêj ê merdane girêdan û bi we re wan nehizker dan xuyakirin! Ew armancên ku hun ji bo wan daketin meydanê, ew jî ji bo wan ketin zindanê! Niha em bi hev gihîştin ku dilê me li hemberê hev pak e, armanca me armancek pîroz e û dilê me dilek paqij e!!"*[21].

Roja 5'ê Gulana 1948'an dema ku heyeta Xaniqîn gihîşt Bexdadê ev tev bi hev re carek din meşîyan[22].

Xebata bêwestan a gel di seranserê welat de, Wezareta Mihemmed Sedr neçar kir ku beşek din ji daxwazên welatparêzan cîbicî bike. Piştî dudilîyek zêde, roja 22'yê Sibatê daxwaz ji encumena nûneran kir û biryara helbijartina nû derxistin, hejmarek zêde ji girtîyên sîyasî berdan û rê dan rojname û kovarên girtî ku carek din bên weşandin. Bi qasek şûn de qerarê paşdekişandina grubek eskerên Brîtanya da û van karê civakên xelkê "serkevtinek netewî" ya mezin da xuyakirin[23].

Gelê Kurd jî di netîca serkevtina serîhildana Kanûna Duyem de gihîşt çend mafên xwe yên serekî. Di dîroka Îraqê de yekemîn car îzna weşandina kovarek sîyasî ya bi zimanê Kurdî hat dan[24]. 21'ê Adara sala 1948'an, cara yekem Kurdan bi vî awayî fireh û aşkera li Bexda û bajarên Kurdistanê Newrozê pîroz kirin.

---

(20) Gelawêj, eynî hejmar, rûpel: 14-16.

(21) Eynî serokanî, rûpel: 17.

(22) Eynî serokanî, rûpel: 18-22.

(23) Ev gotin a Longrigg e, binêre: S.H.Longrigg. Op. Cit., P .347.

(24) Mebest kovara Nezar e, ku Xwedê jê razî be Mamoste 'Elaeddîn Seccadî sernivîskarê wê bû.

Lê gelek mixabin bihara nû ya gelê Îraqê gelek temen ('umr) kurt bû. Kevneperestên Îraqê karîn bi zû desên xwe bidin hev û bikevin êrîşê. Hîn meha Adarê xelas nebû ku Wezareta Mihemmed Sedr li gor destûra Wezareta Salih Cebr, rê neda ku Partîya Gel (Şe'eb) dest bi xebatê bike. Ev înhirafa Wezareta Sedr di wextê helbijartina nû de xwe zêdetir nîşan da. Li gelek bajar û navçan dezgên dewletê bi awakî aşkera destên xwe kirin nav karê helbijartinê û li çend cîyan welatparêz û polîs li ser vê yekê li hev ketin. Eynî wextî li çend cîyan karbidestan li karkerên xwe xistin. Polîs greva karkerên şî-mendifera Hewlêrê tefand. Ji vê jî xirabtir li karkerên Hedîse hat kirin, bi taybetî ji ber ku bûn sebebê zerargîhandina kompanya neftê Îraqê. Hinek serokanî vî zerarî han çend milyon dînar dinivîsin. Piştî vê, di rîya çend mafek seretayî de mecbur man ku grev bikin (25).

Kevneperest bi vê tenê qayîl nebûn, ewan dixwestin Îraq vegerînin rojên berê, cardin hêzên netewî bêdeng bikin, kar û barên welat bidin destê Nûrî Se'îd û der û dorên wî. Ji bo bicîkirina vê mebestê û jarkirina wezareta Sedr, hin endamên wezaretê xwe kişandin. Ji vê jî zêdetir, kevneperestên wî çaxî yên Îraqê feyde ji bûyerên Filistînê wergirtin. Bi vê behanê ji meha Gulanê şûn de bi sedan welatparêz kirin zîndanê. Hejmarek zêde ji xwendevanên Silêmanîyê di dema îmtîha-nan de berhev kirin(26) Piştî vê Mizahim Paçeçî ku dostekî nêzîkî Nûrî Se'îd bû, roja 26'ê Tîrmeha sala 1948'an wezareta nû damezrand û piştî vê jî êrîşa kevneperestan a li ser welatparêzan hinek din tûj û tundtir bû. Gelek ser de derbaz nebû, nîr û zincîra cara berê kirin stûyê civakên xelkê.

Gelek sebeban alîkarîya kevneperestan kirin da ku bikarin bi vî awayî zû li destkevtîyên xelkê yên serekî bixin. Berê hemû tiştek divê em vê rastîya han bixin ber çav ku beşek ji hêzên netewî, armanc û problemên mezin ên di navbera kevne-

(25) Wek mîsal binêre: kovara Rojhilata Îro, bi zimanê Rusî, Moskova, hejmar: 5, 1957, rûpel: 14.

(26) Dîtinek bi efserê zabitê) teqawît Mistefa Ebdullah re, roja 15'yê Sibata 1985.

perestan de bi awakî dûrbîn qîmet pê nedan û heta di dema ketinê de, heta derecek bi wan re zêde germ û nerm bûn. Wisa dixuyê ku "marên mamê Omer" di bîra wan de nebû. Serokê Partîya "Îstîqlal"ê Mihemmed Mehdî Kubbe qayîl nebû di Wezareta Mihemmed Sedr de beşdar be, ji ber ku tenê bi Wezareta Temwînê qayîl bû ku zêde rolek wê tune bû. Çi heye ku beramberê viya di germîya serkevtina gel de wezaretên herî girîng ên wek Kar û Barên Hindûr, Derve û Bergêrî dan destê hejmarek sîyasîyên kevneperest ku ji wan rojan êdî kerixî bûn. Eynî wextî beşek ji hêzên netewî yên burjuwazî di karên xwe yên rojane de bi curek wisa pê radibûn ku dijîtîyên wan bi sinif û grubên netewî yên din re gihîştibûn dereca teqînê[27].

Bêguman li gel tev kil û kêmasîyan jî, serîhildana bi qehremanî ya Kanûnê, bûyer û netîceên wê, rûpelek şewqdar a dîroka hevdem a Iraqê û Rojhilata Navîn û Nêzîk in. Wek dîroknivîsê Misrî Mihemmed 'Ewde nivîsandîye; ev serîhildana han mezintirîn derbe bû ji bo "sîyaseta derve ya Ernist Bevin [28] di seranserî Rojhilata Ereban de"[29]. Ji ber ku bi rastî bûye sebebê hilweşandina planek mezin ku Londra dixwest bi wê rîyê re welatên navçê ji carên din hîn xurttir bi xwe ve girê bide. Welatparêzên welatên Ereban bi awakî zû bi vê rastîya han gihîştin, ji ber vê bi germî piştgirîya xebata qehremane ya gelê Iraqê kirin. Rojên sirîhildanê kuçeyên Qahîrê, Şam û Beyrudê xwenîşandanên mezin dîtin[30].

Serîhildana Kanûnê bû destpêka guherînek mezin û pirr netîce di cur û awayê bîr û bawerîya sîyasî yên civaka xelkê Iraqê ya Kurd û Ereb bi hev re. Ev yeka han jî berê hemû tiş-

(27) Wek mîsal binêre: Sewtu'l Ehalî (cerîde), Bexdad, 19 Ilon 1948, Mihemmed Mehdî Kubbe, serokanîya ku navê wê derbaz bû, rûpel: 248-249.

(28) Wextê îmzakirina Peymana Portsmouth, Ernist Bevin, Wezîrê Derve yê Brîtanya Mezin bû.

(29) Mihemmed 'Ewde, Sewretu'l Iraqîyye, Qahîre, bila, rûpel: 62.

(30) Binêre: Xalid Bekdaş, Întîfadetu'l-Şe'ebu'l-Iraqî Lî senetî 1948 We Eserûha Fî Tetewwurî'l-Qezîyye'l-'Erebîyye, Metbe'etu'l Musenna, 1948, rûpel: 11.

tek, xwe bi awayê xebata wan a dijî dewletên emperyalîst de da xûyakirin, bi vî awayî ev xebata han ket nav çarçoveke giştî ya yekgirtî. Tu wextî bi qasî dema Kanûna Duyem a sala 1948'an bi vî awayî bi sedan hezar kes di seranserê Îraqê de û eynî wextî ji bo yek armancê serî hilnedabûn. Li gor hinek serokanîyan, hejmara beşdarên vê serîhildanê ji 300 000 kesî zêdetir bûn [31].

Yek ji netîceyên herî girîng û mezin ên serîhildana Kanûnê, ji vê pêkhatîye ku di destpêkê de bi kirinên xwe ve, qîmeta xebata muşterek a rêxistinî ya Ereb û Kurdan nîşan daye . Ev rastîyên han bûne kevirên hîmê serkevtin û destkevtîyên serîhildanê bi xwe. Gelek hêzên pêşkevtîxwaz ên Ereban, vê yeka han qebul kirine[32]. Yek ji wan netîcên girîng ên vê bûyera nû eva han e ku daxwazên gelê Kurd tenê di çarçova Kurdistanê de neman, ji ber ku heta dereceyek tesîrê li navçên din jî kirin. Di rojên serîhildanê bi xwe de, ji her çar alîyên Îraqê sloganên berdana girtîyên sîyasî yên Kurd hatin bilindkirin, heta vê yeka han dîqqeta dîroknivîsên derve jî kêşa ye[33]. Di Kurdistanê bi xwe de jî yekemîn car di rojên serîhildana Kanûnê de hestê biratîya navneteweyî xwe xist pêş[34]. Kurd, Tirkmen û Asurî, li Kerkuk, Xaniqînê û cîyên din xebatê ji bo yek armancê di mewzîyek de civandin.

Kêm tişt bi dereca vê bûyera nû ya jîyana sîyasî ya gelê Iraqê tirsê kir nav dilê emperyalîstan. Gelek ser serîhildana Kanûnê de derbaz nebû, "Intelligence service" ya Brîtanya[35]

---

(31) Binêre: (Sovermenay Iraq), Moscow, 1966, P. 158.

(32) Wek mîsal binêre: El'êxbar (cerîde), Beyrût, 9 Sibat 1964.

(33) Binêre: S.H.Longrigg, Op., P .346.

(34) Li Gawirbaxê ev cur yekîtîya han tenê di nav karkerên kompanya petrolê Îraqê de, di rojên grevên havîna sala 1946'an de hat domandin.

(35) "Intelligence service" dezga casusî ya Brîtanya ye ku destpêka damezrandina wê diçe digihîje dor û berê dawîya sedsala 15'an. Ji bo cîbicîkirina armancên xwe, dest davêje hemû hemû riyek wek plan zivirandinên kirrîn, xapandin, çandina tovên dijîtîyê, kuştin û birîn.

di yek belgeyek xwe ya nihênî de daxwaz ji mirovên xwe kir ku piranîya beşê xebata xwe ya İraqê ji bo geşkirina agirê dijîtîya netewî ya di navbera Ereb û Kurdan texsîs bikin(36). Eynî bi vî awayî bi wasita kesên bi kirîgirtîyên kompanya petrolê, ji bo cîbicîkirina van armancên xwe bi aktîfî dest bi xebatê kirin.

Yek ji nîşanên cihê û destkevtinek aşkera ya civakî ya serîhildana Kanûnê, ev yeka han bû; ku jinên bajêran, çi Kurd û çi Ereb, bi awakî fireh û rêk û pêk têkilê jîyana sîyasî bûn û mil bi milê mêran de ji bo xistina Peymana Portsmouth ketin meydana xebatê. Yek ji beşdarên vê serîhildanê bi taybetî behsa cîyê jinên Kurd di xwenîşandanên Bexdadê de kirîye(37).

Serîhidana Kanûnê nîşan da ku êdî çawan bajêr bûn merkezên serekî yên tevgera sîyasî û xebata rizgarîxwazî û çawan êdî gundan di pê xwe de dikişînin(38).

Ev yeka han nîşana cîgirtina xebata rizgarîxwazî, jinavçûna sinif û grubên derebegî û durustbûna yekbazarî ye. Di rojên serîhildana Kanûnê de nîşana berzbûn ên rola pêşengîya bajaran, di Kurdistanê de jî gelek bi ronî xwe nîşan da, bi taybetî di wê tevgerê de ku di nav gundîyên 'Erbete de(39) di İlona sala 1948'an de teqîya. Gelê Kurdistanê di tevgera 'Erbete de cara yekemîn bi awakî rêxistinî slogana xebata li dijî bindestîya derebegan hilda. Rakêşandina gund ji alîyê bajaran ve, di hêla sîyasî de di bûyera 'Erbete de bi vî awayî têt dîtin ku gundîyên navçê dema tevgera xwe de ji bilî daxwazên aborî yên taybetî, çend sloganên sîyasî jî hildane, wek ji holêrakirina Peymana sala 1930'yan, girênedana qet tu cur peymanek

(36) Binêre: El-Xed, mucelle,? Şubat 1964, rûpel: 12-13.

(37) Binêre: Nurî Ebdulrezaq Huseyn, serokanîya ku navê wê derbaz bû, rûpel: 62.

(38) Yanî "el-medînû tecirrû raeha'l-qerye" (bajêr gundan pê xwe de dikişin-Elîşêr.), eva han jî yek ji wan nuqtên girîng ên kemilîn û berpêşdeçûna xebata gel e.

(39) 'Erbet dikeve Deşta Şarezorê, yanî di navbera Helebçe û Silêmanîyê de.

nû bi welatên emperyalîst re, kişandina eskerên dawî yên bîya-nîyan ji ser axa welat, berdana girtîyên sîyasî û çend daxwazek bi vî awayî. Nêzîkî 500 cotkarên navça 'Erbete, van daxwazên han wek telgrafek ji karbidestên Bexdadê û rojnamên paytext re şandin[40].

Tevgera gundîyên 'Erbete du rastîyên din jî nîşan dan; yekem kûrbûna tesîreke jîndar di navbera bûyerên bajêr û gundan de; ya duyem jî, cîgirtina xebata muşterek a Ereb û Kurdan bi awakî hêsan û zû. Roja 17'yê Îlona 1948'an hejmarek zêde ji welatparêzên Bexdadê ji bo piştgirîya cotkarên 'Erbete, xwenîşandanek rêxistin û her sloganên wan avêtin[41]. Vê yeka han bi carek kevneperestên Îraqê teqand û bê cî grubek ji hêza burjuwazî ya netewî jî tirsand. Polîsan eynê demê berê xwe dan canê welatparêzên Bexdadê û gundîyên 'Erbete. Tenê li Bexdadê 88 kes birîndar kirin û 250 kes jî girtin[42].

Rabûna cotkarên 'Erbete û piştgirîya wan ji alîyê welatparêzên paytext ve, bûyerên serîhildana Kanûnê bi xwe û êrîşa kevneperestan, di dawîya bihara sala 1948'an de heta derecek girîngîya cepheyek netewî ya yekgirtî di gelek milên sîyasî ve ferz kiribû. Ji ber ku yek ji wan sebebên ku wezîfa ser milê kevneperestên Îraqê hêsan kir, ev yeka han bû ku hîn hemû hêzên netewî bi girîngîya cepheyek netewî tênegihîştibûn. Ji ber vê, qet ecêb nîne ku di rojên serîhildana Kanûnê de herçiqas hêzên netewî yên pêşkevtîxwaz, bi yekawayî slogan hilgirtibûn jî carên wisa hebûn ku mil bi milên hev nediçûn meydana xebatê. Xwedê qebûl neke, dijmin jî ji alîyê xwe de texsîr nekir, çend ji destê wî dihat ewqas agirê dijîtîyê geş dikir. Dema ku ket canê yên jê nehezker, bê ferqîtî hemû di yek girtîgehê de berhev kirin. Ev yeka han bû dersek mezin ji bo welatparêzên Îraqê û rollîstina çêkirina riya damezrandina cepha niştimanî ya yekgirtî ji bo rojên muşteqbel.

(40) Binêre: Sewtu'l Ehalî, 19 Îlon 1948.

(41) Eynî serokanî

(42) Binêre: Ebdulrezaq Huseyn, serokanîya ku navê wê derbaz bû, cilda duyem, rûpel: 14.

Emperyalîstan û kevneperestên hindûr jî kêm dersên ji kirinên serîhildana Kanûna Duyem a sala 1948'an wernegirtin. Serkevtina xelkê û betalkirina "Peymana Portsmouth" berê her tiştî vê rastîya han derxist ku di Îraqê de meşandina rêbaza sîyaseta kolonyalîzma klasîk êdî wek çekê berê nîne û mumkun e ji wan re zerarê wê ji qezencên wê zêdetir be. Ji ber vê, bi vî awayî êdî dest avêtin hîle û planên sîyaseta "kolonyalîzma nû"[(43)]. Carek din bi awakî sedî sed behsên wek girêdana peymanek dumilî ya "Peymana Portsmouth" ê neanîn holê êdî behs bû behsa "xebata muşterek a li dijî dijminê hemû-yan - komunizma cîhanî !!!". Vê yeka han heta nîvê salên 50'an ji bo îmzakirina "Peymana Bexda"[(44)] rê çêkir.

Di bin sîya rêbaza sîyasî ya nû de, kolonyalîst û kevneperestên hindûr bi awakî fireh û lêkolîn, bi hînîtî ketin nêçîra kesên ku di mewzîyên welatparêzîyê de bûn, hewil dan wan bigrin an qet nebe ber bi şaşîtîyê de bibin. Eynî wextî gelek ji berê zêdetir ketin geşkirina agirê dijîtî û nakokîya navbera hêzên netewî. Ji ber ku dixwestin dijminên xwe bi kar û problemên cûda cûda mijûl bikin. Serokê Partîya Îstîqlal, Mihemmed Mehdî Kubbe di bîranînên xwe de aşkera li ser vê meselê sekinîye û dibêje ku karbidestan hewil dan bi wasita grubek we-

---

43) Kolonyalîzma nû, yanî "Neo-colonialsm", ji kincê nû yên emperyalizma cîhanê pêkhatî ye. Dewletên emperyalîst di bin dexma bi hêzbûna tevgerên rizgarîxwazên gelan û çêbûna cepheyek sosyalîzmê ya fireh de, neçar bûn ji bo bicîkirina armancên xwe yên berê, dest bavêjin awayê karên din, ji ber ku ruswabûna awayê carên berê êdî feyde nedidayê. Naveroka kolonyalîzma nû ji "emperyalîzm bê welatê bindest" pêkhatîye. Yek ji rûyên herî girîng ên kolonyalîzma nû, xebat ji bo ber bi xwe ve rakêşana burjuwazîyên netewî ye, yan qet nebe danîna davikên mezin li ber wan e.

(44) Herçiqas di zimanê Kurdî de "peyman" di cîyê "mu'ahede" de tê bikaranîn jî di rastîya xwe de raste rast tê ma'na "helf". Rêkkettiname (rêkkevtinne-Elîşêr.) jî bi ma'na "îttifaqîye" ye. Hêjayî gotinê ye ku Awrûpî gotina "pact" ji bo "helf" bikar tînin.

latparêzan ber terkexemîyê ve bibin da ku di wê riyê re "bi tîrek du nîşanan bixin..."[45].

Lê, ew dersên ku emperyalîstan ji serîhildana mezin a Kanûnê wergirtin, wek dermanekî bi tesîr ê dema wisa bû ku derdê mirinê kiribû nav dilan. Gelê Îraqê taze carek din , piştî ta'ma servkevtina Kanûnê ta'am kir, êdî bi van nedihat sekinandin. Xerakirina "Peymana Portsmouth", bi carek gelê Iraqê xist ser wê bawerîyê ku dikare bi ser kevneperestîyê bikeve û welat ji destê bîyanîyan rizgar bike. Belgên dîrokî yên mezin ên vê rastîyê di wê de tên xuyakirin ku gelê Îraqê piştî Şoreşa Bîstan ji bo ku bikare tevgerek şoreşgerî ya din a wek vê berpa bike hewcedarê 28 salên dirêj bû. Piştî vê, çar sal bi ser re derbaz nebû, teqîna serîhildanek nû[46] hemû bi ser hev deh sal û çend meh nekêşa, şoreşa burjuwazî-demokratî ya gelê Îraqê[47] text û tacên rejîma paşatîyê bi carek ji holê rakir.

(45) Mihemmed Mehdî Kubbe, serokanîya ku navê wê derbaz bû, rûpel: 218-219.

(46) Mebest jê ew serîhildana ku di sala 1952'an de qewimîye.

(47) Mebest jê şoreşa 14'yê Tîrmehê ye.

MIJARA DANZDEHAN

# ÇEND RÛPEL JI DİROKA ÇÎNA KARKER A KURD

Kêm nivîskarên me û yên bîyanîyan ser karkerên Kurd sekinîne(*). Em dûr neçin, tu berhemên Mamoste Emîn Zekî yê dîroknivîsê me yê mezin de, kêm an zêde navê karkerên Kurd derbaz nebûye. Bêguman ev jî valatîyek din e ji wan dehan valatîyên ku di dîroka me ya nivîsandî de hene. Lê valatîyek mezin e. Ez wisa dizanim ez ê ji rastîyê dûr nakevim ger ez bêjim edebîyata kurdî jî gelek mixabin ji vê valatîya han bêpar nîne. Karkerê Kurd jî wek rewşenbîr, gundî û hemû xelkê din xwedî dil û hest in, dilê wan wek hemû karkerên din saf û hestê wan a wek ê wan bilind in, ew jî ji tevan zêdetir xwîdan dirijin û ji tevan zêde diwestin û wextê wan kêmtir in, ji ber vê kêmtir behsa xelkê dike û zêdetir behsa westîn, derd, ezîyet, nebûnî û bêmafîyê dike û hez ji alîkarîya hemû qewmandinan dike. Tehl li ba wê tehltir e û şêrîn li ba wê şêrîntir e. Ji hemû xwarinan lezzet digre. Wek tevan, ne dûr e hîn jî zêdetir, hez ji çavên belek, lêvên sor û hinarikên pirrxal bike, dema bi-

(*) Sibata 1979'an li kovara Rewşenbîrî Nwê de hatîye belav kirin (rûpel: 8-14).

xwestaya çavên wê jî dikarîn bibûna wek ya bazê!. Hejmarên wan zêde û problemên wan pirtir in, ji ber vê, jîyana wan tijî çîrokên bêmîsal, destanên saf û tabloyên rengîn in.. Heyf e destê edîbên Kurdî ku pelên gulên wê yên nazik ku jîyana tenik a mejî ya êş û ahrana tehl nivîsandîye , bi zû negihîje gewher û elmasên vê xezîna han a dewlemend!

* * *

Em ê di vê gotarê de hewil bidin, bi kurtî çend milên serekî ya çêbûn û hatina holê ya çîna karker a Kurd bixin ber çavan ku dûr nîne bala xwendevanan bikişîne.

Di serdema herî kevin a şaristanîyeta mirovatîyê ve karker û karbidest hene. Lê heta peydabûna nîzama sermayedarîyê, di tu wext û tu cîyek de ev karkerên han ên belav û welav di ci-vakê de nebûne hêzên bingehîn ên berhemanînê. Li gel peydabûna sermayedarîyê re du çînên nû hatin holê: burjuwazî û karker. Ji ber ku peywendîya sermayedarî li Awrupa berê ciyên din durust bû, her li wir dor û berê sedsala 14 û 15'an cara yekem di dîroka mirovayetîyê de çîna karker wek hêzek dîyar a civakê hat holê(1).

Di piranîya welatên din, bi taybetî li Rojhilata Navîn û Nêzîk de, çîna karker gelek piştî van cîyan çêbû. Sebeb û awayê durustbûna wê jî ji ya van deran gelek cihêtir e. Li Awrupayê, guherîn û serûbinîyên nav civakê çîna karker durust kirin, lê li welatên Rojhilat van guherînên han ji bo ku bibin sebebê têkelbûna nav bazara sermayedarîyê, kêmtir rol lîstin. Di sedsala 19'an de têkelbûnên lehîyên welatên Rojhilata Navîn û Nêzîk bi bazarên sermayedarîya cîhanê re destpê kir. Ev û gihîştina hejmarek destkevtîyên pîşesazîyên nû yên Awrupayê, bûn sebebên danîna kevirên hîmî yên durustbûna çîna karkerên piranîya welatên vê navçê.

---

(1) Yekem car di dîroka mirovatî de peywendîya sermayedarî li Florensaya Italya durust bû, ji ber vê li vir jî yekem zîldana herdu çînên nû yên civakê; proletarya û burjuwazî peyda bûn.

Li Kurdistanê, ev bûyerên han ji ber hinek sebebên girîng, heta derecek ji van welatan paş de ma. Ya yekem, peywendîyên zêde tund ên hêzên derebegî û jîyana paşdemayî ya koçerî û nîvçe koçerîya nav civaka Kurd bû. Ya din, nebûna melbendekê serbixwe bû ku kel û pelên (kelmelên) Kurdistanê û berhemên mamûl ên pîşesazîyên Awrupayê tê de bicive, pêwîstî hejmarekê zêde karker û çend kompanyan be.

Lê li hemberê vê de, mercên din ên pêwistî yên ji bo durustbûna vê çîna nû di sahê de bûn. A yekem dewlemendîya Kurdistanê ye ku berhemên zîraet û heywanan di nîvê duyema sedsala 19'an de gihîştin çend bazarên girîng ên Awrupayê. Kel û pelên durustkirî yên wan jî bi awakî hêsan gihîştin dûrtirîn bajêr û gundên alîyên me. Heta berê nîva duyema sedsala 19'an, Îngilîzan kompanyên taybetî di bajarên wek Dîyarbekir de damezrandin. Ne vala ye ku G. Napier pêncî sal berî niha (di 1919'an de-Elîşêr) navê Kirmanşa danîye bêndera kel û pelên Îngilîz û Hindîyan(2).

Ya duyem, pêşdaçûna bajarên Kurdan û hêzbûna peywendîyên bazirganîya wan li gel bajarên din û pêşkevtina pîşesazîyên xumalî ne. Di vê rîyê de demek dirêj Kurdistan mil bi milê melbendên din ên Rojhilata Navîn û Nêzîk gavên ber bi pêşçûnê de avêt. Di riya hejmar û muqayesekirinê de em bi dilek xweş dikarin bêjin ku di Qerna Navîn de bajarên Kurdan di gelek milan de wek bajarên din ên Rojhilat, fireh dibûn û ciyê xwe digirtin. Gerokê Tirk ê navdar û serokanîya hêja Ewlîya Çelebî (1611-1679) ku di nîva sedsala 17'an de hatîye Kurdistanê, di cilda çaran a "Seyahetnama"(3) xwe de behsa hejmarek bajarên mezin ên wek Dîyarbekir û Bedlîsê kirîye. Wek ew bazar û karwanserayên Dîyarbekrê ku ew behs dike, wî çaxî di gelek kêm navçên Rojhilat de hebûne. Li gor gotina

(2) G.Napier, "The Road from Baghdad to Baku", The Geograhical Janrnal. London, Vol LIII, No: 1. January 1919, p.18.

(3) Deh cild e û ji bo behsa welatên Rojhilata Nêzîk û Navîn a dor û berê dawîya Qerna Navîn serokanîyek hêja ye. Ewlîya Çelebî beşek zêde ji jîyana xwe di nav navçên Împaratorîya Osmanî û çend welatên Awrupayê de borandî ye.

wî,12 germavên (hemamên) giştî li Dîyarbekrê hebûne û 140 mal jî germavên wan ên taybetî bi xwe hebûne. Li Bedlîsê, 5 germavên giştî û 600 jî yên ku germavên taybetî tê de hebûne. Ev hejmarên han ên dawîn, belgên gelek bi mana yên dewlemendî û refahê ne(4).

Dor û berê 150 sal piştî Ewlîya Çelebî, nûnerê bi nav û deng ê Îngilîz ê li Iraqê C.J. Rich, behsa çend bajarên din ên Kurdistanê kirîye. Gotinên wî jî belgên dîrokî ne di derbarê guherîn û ber bi pêşdeçûna bajarên Kurdan de. Sine, 5 000 mal nivîsandîye ku çend kêm jî bêthesêbkirin nifusa wî ji 20 000 kesan derbaz dibe. Dema ku em vê bi nifusa hin bajaran re bidin muqayesekirin mana vê hejmara han a zêde hîn baş tê fêmkirin. Hejmara danîştiwanên bajarê Qudsê, di sala 1814'an de dor û berê 12 000, di sala 1831'an de ya Bexdadê nêzîkî 20 000 û ya 'Emman a paytextê Urdunê di sala 1880'an tenê hezar kes bûye(5).

Peywendîya bazirganî ya navbera bajarên Kurdistanê bi xwe û ew melbend û navçên nêzîkî wan bûn, bi peywendîyên qonaxa derebegî xerab nebûn. Li gor serokanîyên kevin heta sedsala 19'an jî Stenbol, Şam, Heleb û Beyrut heta derecek zêde li ser mî û bizinên Kurdistanê rêve diçûn. Tenê ji bajarê Stenbolê re her sal milyon û nîv serî pez ji Kurdistanê diçû. Ew ordîyên mezin ên ku di bin serokatîya Ibrahîm Paşayê kurê Mihemmed Elî yê mezintirîn fermanrewayê Misrê ku salên 1831-1832 û 1839'an êrîş birin ser Surîyê, li ser pez û dewarên Kurdistanê

---

(4) Li gor gotina Şemseddîn Samî, hejmara danîştiwanên Mîrektîya Bedlîsê 30 hezar kes bûye. Serokanîyên din li dor û berên 50 hezaran dinivîsin. Binêre: Şemseddîn Samî, Qamusu'l E'lam, cilda duyem, rûpel: 1329.

M.Y.Şemsî, Şerefnama Şerefxanê Bedlîsî wek Serokanîya Dîroka Gelê Kurd, Baku, 1967, rûpel: 16.

(5) Binêre: L.N.Katlov, Peydabûna Tevgera Netewî-Rizgarîxwazî li Rojhilatê Ereb, bi zimanê Rusî, Moskova, 1975, rûpel: 90-91.

Hejmara danîştiwanên 'Emman a paytextê Urdinê, îro ji milyonek derbaz dibe.

dijîyan(6). Berê ku sedsala borî xelas be, tenê ji Stnenbol, Heleb û Bexdadê re her sal sê milyon pezên Kurdistanê dihatin. Ji Bendera (lîman) Samsunê re jî tenê salê, 20 milyon hêkên Kurdistanê dihatin(7). Durustkirina Pira Qilyasan ji alîyê dewlemendek Silêmanîyê ve, tenê karek xêrê nebû, hekene dibû di cîyê Qilyasan li Tancero durust bikira, ji ber ku ava wî zêdetir û metirsîya lehîyan jî zêdetir bû.

Eynî bi vî awayî, pîşesazîya xumalî ya Kurdistanê, berî têkelbûna nav bazara sermayedarî ya cîhanê, demek baş pêş de çû û qet ji pîşesazîya welatên dor û berên xwe kêmtir nebû. Cilbergên netewî û birek urf û adet, bi taybetî hêvînek baş a vê ber bi pêşveçûnê bûn. Cardin di cilda çaran a "Seyahetnama" Ewlîya Çelebî de gelek belgên bi qîmet û bi mana di vî warî de dest dikevin. Li gor gotina wî, di seranserê cîhanê de mîsalên wek zêrkerîya Dîyarbekrê kêm bûne. Wek dibêje, karê berrik û çêkirina xaliçe û debaxxanên Bedlîsê deng dabûn, bi derecek wisa ku "çermê wir dîyarî dibirin Fransayê".

Piştî dor û berê 200 salan, yanî nîvê sedsala 19'an Taylor ê gerokê Awrupî di wê kitêba xwe ya ku bi navê "Geştek di Kurdistan de" belav kirîye, behsa mitayên hevrîşm a Dîyarbekrê dike û başîya wî bi hevrîşmên Helebê re muqayese dike, dibêje ew erzantir difroşin, ji ber vê ew navçên dikevin ber Dîyarbekir û Behra Reş, bazara wan germ e(8). Ji bo vê mijara ku em behs dikin baştirîn nimûne ev yeka han e ku li bajarê Silêmanîyê bi navkirina taxek bi navê "Sabunkeran", tiştek manadar e. Qasek berê Şerê Cîhanê yê Yekem, dehan aîlên

---

(6) Ji bo van hejmaran binêre: Peter Lerx, Lêkolîn di Derbarê Kurdên Iranê û Kildanîyên Bakur ên Bab û Bapîrên Wan, bi zimanê Rusî, kitêba yekem, Petersburg, 1856, rûpel: 24.

(7) Binêre: B.Nikitine, Les Kurdes, Paris, 1956, p. 185.
A.R. Ghassemlou, Kurds and the Kurdistan, Prague, 1965, p.104.

(8) Binêre: W.L.Wilçewski, "Jîyana Aborî ya Kurdên Koçer ên Pişt Qafqasê û Navçên Nêzîk di Nîva Duyem a Sedsala 19'an de", bi zimanê Rusî, kovara Etnografya Sovyet, hejmar: 5-6, 1936, rûpel: 150.

(xêzanên) vê taxê bi çêkirina sabunê ve mijûl dibûn(9) û salê bi kêmasî 500 ton dianîn bazarên bajêr û der û dorên wî û çend melbendên din, heta ji vir jî digihîşt bajarên wek Bexdad û Tebrîzê(10).

Li Kurdistanê jî bi awayê navçên din ên Rojhilata Nêzîk û Navîn, têkelbûna bi zû di nîva duyema sedsala borî di nav bazara sermayedarîya cîhanê, li ser pîşesazîya xumalî tesîra mirinê kir ku tek û tûk dikir ber bi qonaxa manîfakturîyê(11) ve biçe. Karê binemala Mutabçî ku li Silêmanîyê cuwal durust dikirin, bi serê xwe nivçe-manîfakturî bû; karkeran bi heq tê de kar dikirin, heta derecek wasitên hilberînî yên pêşkevtî bikar dianîn, teqsîma kar(12) tê de sîma xwe ya ronak wergirtibû(13). Curê durustkirina topên hoste Receb li Rewandizê nimûnek din a vê rastîyê ne. Nav û dengê topên ku ji bo Mîrên Rewandizê durust dikir deng dabûn(14). Piranîya wan 80 topên ku li alîyê Musilê hebûn, destkarê karkerên Rewandizê bûn. Hêjayî gotinê ye, ew madenên ku ji bo durust kirina topan bi-

---

(9) Li gor hejmartina sala 1947'an li Silêmanîyê tenê 5-6 kes bi çêkirina sabunê ve mijûl dibûn. (Binêre: "Îhsa el-Sukkan", el-cuz'i sanî, Bexdad, 1954, rûpel: 163).

(10) Ji derveyî sabunê berhemên din ên pîşesazîya xumalî ya Kurdewarî digihîştin bajar û welatên din (Binêre: R. Berliner und Borchardt, Silberchmidsarbeiten ans Kurdistan, Berlin, 1922, p.8).

(11) Manîfaktur gotinek e ku ji du kelîmên latînî pêkhatîye: "Manus" yanî dest û "factura" yanî çêkirin. Gihîştina pîşesazîya xumalî bi qonaxa manîfakturîyê, yekemîn gava girîng e a ber bi peywendîya sermayedarî de. Manîfaktur bi Erebî "urşe" ye.

(12) Li gel peydabûna peywendîyên sermayedarî, dabeşkirina kar zêdetir qayîm dibe. Di vê qonaxê de bi gelemperî karê çêkirina berhemek diket ser milê kesek yan ferdên aîlek hemû. Dabeşkirina kar dibe sebebê başbûn û zêdebûna berhem.

(13) Dr.Emîn Mutabçî vê behsa han ji min re neqil kirîye, nîyeta wî heye ew jî di vî warî de gotarek binvîse.

(14) Topên wisa tê de bûn ku dirêjîya wan sê metre û lulên wan ji 45 santîman kêmtir nebûn.

kar dianîn li dor û berê Rewandizê bi wasita karkerên kirîgirtî dihatin derxistin(15). Ji alîyê çêkirina berr, cacim û çoxe de jî guherîn ber bi çêbûnê de bûn.

Lê heta van cure pîşesazîyên han jî nedikarîn xwe li ber lehîya kel û pelên erzan û baştir ên kargehên Awrupayê ragirin, ji ber vê, di pey hev de dam û dezgên xwe pêçan. Kartsov, sala 1896'an de wiha nivîsandîye: "Wextek çoxên Kurd bi nav û deng bûn, Jê niha qumaşên Îngilîzan bi carek wan kirîye tengîyê"(16).

Ew yek du dikanên fişekan ên ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, xwedîyê wan li Silêmanîyê bi ziktêrîyek nemir-nejî dijîyan, paşvemayên (bermayên) 150 dikanên ji xwe mezintir bûn ku Mark Syks berî şerê li wir dîtine(17).

Her çawa be, di van cure ciyên karên pîşesazîyên xumalî ve mijûl bûn û gavên baş ber bi pêş ve avêtin, qalikên pêşîn ên tenik ên çîna karkerên Kurd dihat xuyakirin. Di milek din de bela vê pîşesazîyê li dahatuya çîna karkerên Kurd ket, ji ber ku beşên zêde kargerînên wê çûn nav rêzên wê. Bindestîya derebegî jî ji alîyê xwe ve bi hezaran cotkarên rût, reben, belengaz û birçî anîn bazara karê bajaran û ew jî, bi taybetî ji ber erzanîyê, bûn serokanîya herî girîng a durustbûna çîna nû ya civakê. Hejmara van cure kesên han ku li hinek navçan ji wan re hejar (feqîr, reben, belengaz-Elîşêr)) digotin, carên wisa hebûn zêdetirî nîvê daniştiwanên vê melbendê pêkdihatin. Li gor hinek serokanîyan, wan li navçek wek Şino (Uşnû) yê nêzîkî Mahabadê, ji sedî 80'yê hêza kar pêkdianîn (ji 12 000 10 000 kes)(18). Nimûnek wiha tenê, dikare di Qerna Navîn li Îngîl-

---

(15) Binêre: Enwer Mayî, El'êkrad Fî Behdînan (Kurd li Behdînan), Musul, 1960, rûpel: 3.

(16) A.Kartsov, Not di Derbarê Kurd de, bi zimanê Rusî, Tiflîs, 1896, rûpel: 24.

(17) Binêre: C.J.Edmonds, Kurds, Turks and Arabs, London, 1957, p.80.

(18) Binêre: G.B. Akopov, "Derbarê Karektera Axa Taybetî ya Kurdistana Îro de, kovara "Xeberên Akademîya Zanyarî ya Ermenîstana Sovyet", bi zimanê Rusî, Erîvan, hejmar: 5, 1964, rûpel: 67.

tere hebe, yanî dema ku ji ber sebebê qezenca zêde ya heywanan, dewlemend û desthilatdarên vî welatî zevîyên xwe dikirin çêrîngeh û bi vî awayî bi hezar cotkar bê cî û war diman û ber bi daristan, deşt û bajaran ve diqewirîn û bê dirûngeh û gîya bi bermayên xelkê dijîyan, ev yek e ku hestê Thomas More(19) yê bi nav û deng wisa lerzandîye ku "Utopya" binivîse û gotina xwe ya bi nav û deng : **"Nêzîk e mî însanan bixwe"** bêje. Di vir de ya ecêb eva han e ku derd û ezîyeta feqîrên Kurd jî hestê şairan bilind kirîye û behsa vê yekê kirine ka çawan birçîtî li Kurdistanê zehmetîyê ji bo tevan anîye û bi revên mezin ve ber bi fabrîkan ve(20) hatine(21).

Hejmara feqîrên bajêr û bi taybetî ya gundîyên Kurdistanê ewqas zêde bû ku di daxilê quweta hatinên wan bazarên kêm ên nav welat de nebû feyda beşekê gelek kêm jî bide. Bi herîçêkirin û hemalîyê pê ve karek din ê wisa dest nediket. Ji ber vê, bi hezaran feqîrên Kurd berên xwe dan ber bi bajarên mezin ên wek Stenbol û bi hemû curê kar û bihayan qayîl dibûn (berê Şerê Cîhanê yê Yekem hejmarek bê hesab ji hemalên rût û reben ên Kurd di bazarên Stenbol, Bexdad û yên bajarên din de bûn). En wisa hebûn ku ji ber belengazîyê diçûn bajarên biçûk ên wek Heleb, Şam, Beyruta Lubnanê û Edene ya Tirkîyê, yan navçên wek Aqçem û Qerebaxa Azerbeycanê. Lê îmkanên karê bazarên van cure navçe û bajaran jî ewqas tunebû alîkarîya vî xelkî han ê zêde bide ku di ser de jî dibûn sebebê bêkarîya wan. Ji ber vê, her zû hejmarek ji van bi naçarî çavên xwe kirin welatên derve û xwe bi destê felekê ve berdan û gelek ji van Deryayê Atlasê borîn û gihîştin axa Amerîkayê. Piranîya van kesan xelkê Dêrsimê bûn(22).

---

(19) Sîyasetvan û nivîskarê bi nav û deng ê Îngilîz Thomas More (1478-1535) damezrênerê bîr û bawerîya sosyalîzma Utopî têt hesêb kirin.

(20) Dîyar e mebesta wî fabrîkên derveyî Kurdistanê ne.

(21) Binêre: G.B.Akopov, serokanîya ku navê wê derbaz bû, rûpel: 67.

(22) Binêre: W.Vilçêvski, "Derbarê Peywendîya Zîraet (Kişt û Kal) li Kurdistanê", kovara Problemên Zîraetê, bi zimanê Rusî, Mos-

Ji ber hebûna kanîyên madenê li navçên Kurdewarî û dor û berên wî, berê Şerê Cîhanê yê Yekem ji bo peydabûna karê kirîgirtî li wan deran sebebek arîkarî bû. Wî çaxî beşê zêde yê karkerên hewza madenên Zonguldaxê Kurd bûn. Kurdên Colemêrgê hesin, sifr (baqir) û zernêx derdixistin û ji ber vê, navê yek ji van navçên wî bû Meydana Zernêxê. Beşek ji van zernêxên ku li vir dihatin derxistin, dişandin bazarên derve. Li gor hejmarek serokanî, salê 30 000 qenter (qenterek 56,452 kîlo ye-Elîşêr) ji vî madenî dihat Stenbol, Bexdad û Hindîstanê(23). Her wî çaxî hejmarek Kurd bûbûn karkerên hewzên madenên nêzîkî Kifrê ku berhemên salane yên karên wan, berê Şerê Cîhanê yê Yekem û salên şer de hezar ton dibû(24).

Bûyerên Şerê Cîhanê yê Yekem, bûn sebebê berfirehbûna hejmarek karkerên Kurd ên curek hessas. Kurdistan bi xwe bû yek ji wan bingehên şerê yên dîyar ên Rojhilata Navîn û eskerên çar dewletan rijîyan ser. Agirê şerê piranîya wan navçên ku nêzîkî Kurdistanê ne jî girt. Wek aşkera ye teknîk gelek bi zû rolek mezin di vî şerî de lîst, ji ber vê, di her çar alîyan de dest avêtin çêkirina rê, ban û damezrandina bingehên eskerî. Bi hezaran feqîrên Kurd di wan ciyan de bûn karker. Ev bûyera han a nû, bi temambûna şerê dawî lê nehat. Ji bo nimûne sala 1925'an zêdetirî 2250 Kurd li Iraqê karkerên riya hesin bûn(25). Li gor hinek serokanîyên bawerpêkirî, nîva salên 1920'î de ev karkerên han ji sedî 23'ê hemû karkerên Iraqê

---

kova, cilda 1 û 2, 1932, rûpel: 130.

Musa Kazim Paşazade, Ilhan, Adat-ı Ekrad, Stenbol, 1921.

Min ji Dr.Nacî Ebasî wergirtîye, ku di wextê xwe de li bajarê Detroitê rastî grubek wan karkerên Kurd hatîye.

(23) Binêre: W.L.Vilçêvski, "Jîyana Aborî ya Kurdên Koçer ên Pişt Qafqasê", rûpel: 151.

W.L.Vilçêvski, "Derbarê Peywendîya Zîraet li Kurdistanê", rûpel: 130.

(24) Binêre: Abdurrezaq Hesenî, El-Iraq Qedîmen we Hedîsen, cuz'i sanî, Sayda, 1958, rûpel: 61.

(25) Binêre: Iraq Railways, Administration Report for the year 1924-1925, Baghdad, 1925, p.16.

yên rîya hesin bûn(26). Gelek ji van hejmaran jî zêdetir ku ev yeka han di vir de jî îspat dibin ku piranîya xetên rîya hesin a wî çaxî ya Iraqê li Başûr û navenda welat (mebest Kurdistana Iraqê ye) de bûn û ji derveyê Ereban(27) û Kurdan hejmarek zêde Hindî (1 142), Iranî, Ermenî, Asurî, Tirk û yên din, karkerên van dezgên han bûn.

Cardin piştî Şerê Cîhanê yê Yekem hejmarek yekcarî zêde ji feqîrên Kurdan bûn karkerên neft û damezrandina borîyên wan, durust kirina rê, ban, xanî û tiştên din. Dawîya salên 1920'an li hemû Iraqê 4250 kes bi durustkirina rê û banan ve mijûl dibûn(28) ku hejmarek zêde ji van karkerên riya navbera Kerkuk-Silêmanî, Kerkuk-Hewlêr, Hewlêr-Musil, Hewlêr-Rewandiz-Rayat bûn. Îngilîzan qîmetek zêde didan riya dawîyê, yanî Hewlêr-Rewandiz-Rayat, ji ber ku ji derveyî qîmeta wê ya stratejîk, dixwestin viya bikin yek ji wan wasitên herî girîng ên girêdana bazarên rojavayê Iranê bi cîhana sermayedarîyê ve, çiqas ji wan bê xwestin ewqas peywendîya aborî ya vî welatî bi Sovyet re kêm bikin(29).

Karkerên Kurd, yekser dilsozîya xwe ya kar û imkanên hînbûnê gelek bi zû nîşan dan. Gelek belgên ecêb ji bo vê rastîya han di dest de hene. Ez wisa dizanim ku ji tevan girîngtir di vî warî de hev û du girtina nirxandina karbidestên Îngilîz û Almanya nin, demek ku du kozikên cihê de dijî hev sekinîbûn. Almanî di destpêka Şerê Cîhanê yê Yekem bi lez ketin çêkirina wê beşê proja navdar a xeta riya hesin a Bexdadê ku hîn temam nebibû. Bi vî awayî xetek di navbera Bexdad û Se-

(26) Binêre: Report by Britannic Majesty's Government to the Conucil of the League of Nations on the Administration of Iraq for the year 1926, London, 1927, p.29.

(27) Hejmara wan 4 059 kes bû, yanî du car ji Kurdan kêmtir.

(28) Binêre: Report of the Majesty's Government in the United Kingdom of Great Britain and Northern Ireland to the Council of the League of Nations on the Administration of Iraq for the year 1931, London, 1932, p.66.

(29) Ji ber sebebê nêzîkbûnê, bazirganî ya navbera Rusya û navçên Qafqasê gelek zû de zêde bû.

merra de kêşan ku karkerên Kurd jî di çêkirina wê de beşdar bûn. Nivîskarê Almanî Dagobert di vî warî de wiha nivîsandîye:

Muhendisên Almanyê di nav Kurdan de *"baştirîn û dilsoztirîn karkeran dîtine"(30)* .

General Haldane yê fermanrewayê hêzên Îngilîzan li Îraqê dor û berê eynî wextî, bêyî ku bizane Dagobert kî ye yan raya muhendisên Almanyê çîye, bi eynî awayî behsa karkerên Kurd kirîye û rizabûna xwe ya zêde li hemberê wan nîşan daye(31). Her ji ber vê jî qet dûr nîne ku rojaneya karkerên Kurd ji yên din zêdetir be. Wî çaxî hinek dezgan dema ku yên wek van digirtin kar di cîyê 14 'ane, rojê nêzîkî 21 'ane didan (32). Ji vê jî manadartir ev nimûna han e: Dezga rîya hesin a Îngilîzan li Îraqê di salên 1920'an de du cur karkerên wan hebûn. Ya yekem ew karker bûn ku bi karên esasî ve (capital works) mijûl dibûn, a duyem jî ew bûn ku çêkirina xetên nû de kar dikirin. Sala 1924-1925'an, ji 2 274'ê karkerên riya hesin ên Kurd tenê 729 kesan di curê karê duyem de bûn û qismê mayî yên din (1 545 karker) di curê yekem de kar dikirin(33).

Aşkera ye ev rastîya han nebûye sebebê tehl ku pelçiqandina karkerên Kurd ji ya hevalên wan kêmtir be, ji ber ku bi eksê vê, hejmarek serokanîyên wê demê wisa nîşan didin ku hinek caran û ji ber çend sebebên taybetî, pelçiqandina karkerên Kurd tundtir bûye. Di gişt navçên Bakurê Îraqê de rojaneya karkeran ji yên navçên din kêmtir bûye. Wek mîsal karkerên kompanya madenên neftê, divîya heftîyê 54 seet kar bikin û li hemberê vê 7 heta 10 rupîyan distendin çi heye ku karkerên çinînê li Bexda û kakerên Bendera Besrayê heftîyê 48 seet kar

---

(30) Dagobert von Mikusch, Mustefa Kemal between Europe and Asia, trans. by J. Linton, London, 1932, p.360.

(31) Binêre: A.L. Haldane, The Insurection Mesopotamia, London, 1922, p. 108.

(32) Binêre: El-Merkezu'l Wetenî Lîl Wesaîq, Bexdad, reqem 80/19, Establishment General.

(33) Iraq Railways, Administration Report for the year 1924-1925, p.16.

dikirin û beramberê vê heryek ji wan 3 heta 6 rupî zêdetir distendin(34). Rewşa kar û rojaneya karkerên Kurd ên ku bi karên avayî, rê û banan ve mijûl dibûn jî gelek ji vê xirabtir bû. Ew gelek caran bi banga sibê diçûn kar û bi banga îşayê re dest jê berdidan û beranberê vî karî hemû ser hev, rojê 18 fils distendin. Wek Îngilîzan bi xwe jî vê yeka han qebul kirine, ev perê han tenê têra "beşê nan û cigara wan nedikir"(35).

Bi ser vê de karkerên Kurd, wek karkerên navçên din, demek dûr û dirêj nekarîn xwe ji peywendî û adetên derebegî xelas bikin. Gelek caran ev karkerên han ji bo karên zîraet û alîkarîya kes û kusên xwe vedigerîn gundên xwe. Piranîya wan, beşek ji qezenca karkerîya xwe her wek carên din didan axa û serokeşîrên xwe.

Di dawîyê de em vê yeka han jî bêjin ku gîyana biratîya karkerên Kurd di destpêkî de geş bûye, ji ber ku hemû ji wan, çi yên li ser erda xwe û çi yên vir dûr, mil bi milê karkerên din de xebat kirine, ezîyet û bindestîyê tam kirine. Xweştirîn belgê vê rastîyê ew gotinên ku bi temambûna rîya Hewlêr-Rewandiz-Rayat re li ser kevirek hatine nivîsandin:

*"Em ku bi hezaran kes in û bi erebî, ermenî, ingilîzî, hindî kurdî, rusî û tirkî diaxivin, me vê riya han ji bo xizmeta hemû gerokan bê qeza û bela çê kir!"(36).*

Lîsta navê van zimanan li dezga riya hesin a Îraqê digihîje 16 navan. Ji derveyî van ên jorê ev navên han jî hene : suryanî, misrî, farisî, tunisî(37), îtalî, yunanî û macarî (hungarî)(38). Li Gawurbaxê jî havîna sala 1946'an dengê zelal û xwîna paqij a karkerên Kurd, têkelê nav deng û xwîna pîroz a birayên xwe bû û bi awazek bilind rûpelek gelek hêja nivîsandin!

---

(34) Report for the year 1926 p.29.

(35) A.M. Hamilton, Road through Kurdistan, The Narrative of an Engineer in Iraq, London, 1937, p.61.

(36) Binêre: J.Morris, The Hashemite Kings, London, 1959, p.57.

(37) Dîyar e vir de mebest ji Misrî û Tunisî welat e, ne ziman.

(38) Îraq Railways. Administration Report for the year 1924-1925, p.16.

# MİJARA SÊZDEHAN

## XELATA "MÊJÛ"

Pêşkêş e ji bo wan kesên ku tiştek di kîsê wan de nîne û gelek bi esl û esasên xwe tên zanîn, ji bo wan e ku gelek di kîsê wan de heye bi esl û esasên xwe nayên zanîn!

Dîyar e kes nebûye, kes nîne û kes nabe ku ji dil û can hez neke tişta binivîse bi dilê xwendevaran nebe, wiha nebûya kesek qelem nedibir ser kaxezê. Ev bidilbûna han li seranserê cîhanê pan û belav mezintirîn encam e ji bo herkesek berhemê bîr û bawerî, pênûs û bêxewîya şevan bike dîyarîyek hêja ji bo grubên hevzimanên xwe, lê ji bo Kurdek ji vê jî zêdetir e(*) .

Qasek berê niha, ji çend milan de ji min re hat gotin ku berêz Dr.İbrahîm Hilmî daxwaz dike da ku biçim serîlêdana wî. Roja yekemîn a Cejna Qurbanê berê xwîşk, dost û yaran min berê xwe da derîyê yek ji wan ê ku jê re dihat gotin, mezin û wekî em jî jê re dibêjin, pêşengê gruba rewşenbîran. Bi yekcarî destpê kir:

**"Lawê min, kitêba te ya Mêjû bi dilê min bû, piştî xwendinê min biryar da ku tu bikevî nav kitêbxana min, va ye niha ve ez çend belge û berhemek pêşkêşî te dikim".**

---

(*) Ev gotar ji wan gotaran e ku dibin temamkerê çapa duyem a wê kitêba min a ku min di sala 1983'an de bi navê "Mêjû" weşand. Ev gotar di rûpelên 10-15'yên hejmara 14'an a kovara Karwan di Teşrîna Duyem a sala 1983'an de hatîye weşandin.

Wê gavê ger mirov di cejnek Remezan an Qurbanê de berê xwe bidaya Kurdistanê yan her navçekê din axa Musilmanan, bi vê curê cejnek kesek din nedigîhand perê asîmanan. Bi vî awayî ez bi piştîyek cewher, mirarî û bawerî ve vegerîyam û min bi vê çav û dilê çend dostek xwe tijî ronî kir, va ye kurtîya yekemîn berhemê wê dîyarîya bi qîmet dikim nav weşanên rewşenbîrên me yên îro.

## Yekem : ÎCAZA ŞÊX SERACEDDÎN JÎ HACÎ RESULÊ NEQŞÎBENDÎ RE

Dr. Îbrahîm Hilmî ji binemalek naskirî ya ji bajarê Silêmanîyê ye(1). Kurê Hacî Fettahê kurê Mele Qedrîyê kurê Hacî Resulê kurê Mehmed Axayê kurê Gudrun Axayê kurê Rustem Axayê kurê Zorab Axayê kurê Zulal Axayê Mergeyî ye. Zulal Axa yek ji wan danzde siwarên Merîwanê re bû ku Pîremêrdê nemir di destana xwe de çend carek bi taybetî navê wî bibîr anîye(2) .

Dema ku Birahîm Paşa bingeha bajarê Silêmanîyê danî, merkeza Mîrnişîna (mîrekî, derebegî, fermanrewatî-Elîşêr.)

---

(1) Sala 1909'an li Silêmanîyê ji dayîk bû. Di destpêkî de li hucrê li ba Xoce Efendî xwend û vêca çû dibistanek destpêkî û sala 1925'an temamkir. Sala 1932'an dibistana navîn li Bexda xelas kir û ji bo temamkirina xwendina xwe çû Qahîrê û sala 1937'an li vir lîsa (bakelorya) beytarîyê xelas kir û salek şûn de çû Tirkîyê û roja 25'ê Teşrîna Duyem a sala 1940'an li vir doktora bakterîyolojî ya nexweşîya heywanan wergirt. Piştî vegerê û heta roja teqawidîya (xanenişîn) xwe ya 23'ê Gulana sala 1964'an memur bû, wek yekî destpak ê bêhempa navê wî belav bû. Gelek qîmet bi dîroka Kurd dida û di vî warî de çend gotarên wî di rojnama "El-Teaxî" de hatine belav kirin (Ji bo kurtîya jînama wî binêre: Mehmud Cindî, Daîretu'l Me'arifu'l Îraqîyye'l-'Am, cilda yekem, Bexdad, rûpel: 15).

(2) Binêre: Pîremêrd, Diwanze Siwareyî Merîwan, çapa sêyem, Silêmanî, 1983, rûpel: 8,10 û 33.

Baban ji Qelaçolan anî vir. Mehmed Axayê nevîyê Zulal Axa [3] yek ji wan mirovên maqûl bû ku bi mal, zarok û tekya xwe ve hat bajarê nû yê Kurdistanê. Piştî danzdeh salan, yanî dor û berê sala 1796'an, Xwedê Resul Axa da Mehmed Axa.

Navê Resul, gelek bi zû wek xortek kêrhatî, zîrek, mêr, welatparêz û ji Xwedêtirs belav bû û wî berê xwe da Mekke û Medînê. Piştî vegera xwe bû Hacî Resul. Her bi vî awayî riya Neqşîbendîyê ket serî û bû murîdek wî yê dilsoz. Gelek ser de derbaz nebû, Hacî Resul tekyek li teniştê mala xwe durust kir û hemû erkê rêvebirinê girt ser milê xwe.

Deng û behsên Hacî Resul ket ser devê mirovên hêja yên bajêr û dor û berê wî. Sewda Neqşîbendîyê bû pûşî ( kermêş) û ket kevlê (post), bi lez berê xwe da Biyare û çû xizmeta Şêx Seraceddîn. Dilê Şêxê mezin ê Neqşîbendî wî ser Hacî Resul rûdine û gelek bi rêz ve îcaza îrşadê didê. Deqa vê îcaza gelek bi qîmet ku niha temenê wê digihîje tam150 salan[4] , yekemîn dîyarîya hêja bû ji bo "Mêjû".

Pîvana îcaza Şêx Seraceddîn 34x21 santîm e û ji 23 rêzan pêkhatî ye, bi destxetê zana û şairê bi nav û deng Mele Hamid ê katibê Şêx, bi xetê farisî hatîye nivîsandin. Pênc rêzên destpêkî erebî, yên din farisî ne. Muhr û îmzayê Şêx Seraceddîn li ser milê çepê ye. Eva deqa destpêkî ya erebîya wê ye :

**"Elhemdû lîllahî ellezî ce'ele qulube ewlîyaehû elkamilîne mehka lîneqît el-wucûd**

**we sîr qubulîhim 'elametûn lîqubulîhî wel îqtîdaî bîhedahum murqad lîl 'urûc îla 'ela**

**me'aric eşşihûd wemeyyeze mîn beynîhîm essade el-'Elîyye el-Neqşîbendîyye wexessehum**

**bîmezaye lateuddû wela tuhze mînha înne nîhaye seîr el-turûq munderîc fî bîdayetîhim**

**feyuqassû 'ela haza şe en kemal terîqetîhim we hal nîhayetîhim...".**

Piştî vê destpêkê cardin bi farisî behsa rêbaza

---

(3) Hemexayan jê re digotin.

(4) Sala 1251'ê koçî dike 1835'ê zayînî

Neqşîbendîtî û milên wî yên taybetî dike ku çawan ser bingeha dînê Islamê hatîye damezrandin û qet tiştek ji dûrê dînê tê de nîne û heta yên di terîqetên din de, di rîya çilekêşan û rîyazîkirinê ve peyda dibin, li ba Neqşîbendîtîyê di rîya hevrêyîya mirovên baş û pîrên terîqetê ve tên holê. Piştî vê tê ser behsa Hacî Resul û dibêje yek ji wan kesan e ku bi dil pêsîr girtê rêbaza Neqşîbendîyê bû û hemû payek wê rêbazê xelas kir, "gihîşt dayîra wilayeta piçûk", ji ber vê ku bi fermana cîhana gîyanê pîran û terîqetê nîşanê xelkê bide rîya pîran bigre û "xitma xocan" bike. Piştê vê dibêje hêvîdar in Hacî Resul di vê rîyê de gelek bilind be û em dozê ji wan kesan jî dikin ku daxwaza wan a girtina rîya rêbaza Neqşîbendîyê heye, dest bidin destê wî û ji wî hînbin û îstîfadek ji hevrêtîya wî bikin, ji ber ku tijî bereket û bexteweri ye.

Piştî wergirtina vê belgê, Hacî Resul hîn zêdetir ket hewildan ji bo berfirehbûn û belav kirina rêbaza Neqşîbendîyê, vî karî han dijîtîya grubek desthilatdarên navçê li hemberê wî peyda kir, ji ber vê naçar bû bajarê Silêmanîyê bicî bihêle û berê xwe bide Gergeder a navça Surdaşê ku gundê wî bû û heta dawîya jîyana xwe li vir niştecî ma. Piştî mirina wî ya sala 1286'ê koçî (1869/1870'yê zayînî) meytê Hacî Resul tînin Silêmanîyê û li Gira Me'fwan a Gorristana Seywan diveşêrin.

Berê ku Hacî Resul Silêmanîyê bicî bihêle, tekya xwe dispêre Mele Osmanê Balexî ku zanayek naskirî û ser rêbaza Neqşîbendî û xwedî îcaza Şêx Bahaddînê xelîfê Şêx Seraceddîn bûye û piştî koça dawîyê Hacî Mele Elîyê kurê wî têt ser ku ew jî zanayek hêja bûye û ji wir şûn de êdî tekya dibe "Tekya Mele Elî" ku heta niha jî maye.

## Duyem : MİHEMMED ELÎYÊ MEZİN Û KURD

Hemû ansîklopedî û kitêbên dîrokê yên nû yên Misrê, dema ku behs têt ser Mihemmed Elîyê Mezin dibêjin bi eslê xwe Arnawud (Albanî), daniştiwanê bajarê Qewele[5] û di destpêkî

[5] Di serokanîyên İngilîzan de "Qewele" dinivîse. Dûr nîne Qole ji "qel'e" ya Erebî hatibe. (Tirk jî Kavalalı Mehmet Ali dibêjin-

de tutinfiroş bûye.

Dor û berê xelasîya sala 1949'an ji bo bîranîna sedsalîya koça dawîyê ya Mihemmed Elîyê Mezin, nivîskarê bi nav û deng ê Misrî, Ebbas Mehmud 'Eqad, bi navê kovara "El-Musewwer" hevpeyvînek taybetî li gel cîgirê Faruq Paşa yê wî çaxî yê Misrê kirîye ku ji ber navê bapîrê xwe yê mezin navê xwe danîye Mihemmed Elî. Dema ku behs hatîye ser regeza Mihemmed Elîyê Mezin, cîgirê textê Paşayê Misrê, wiha gotîye:

*"... Di derbarê binemala 'Elewî* (6) *ez ê ji te re tiştek bêjim ku dikare bibe sebebê ecêbmayîna gelek kesan. Wisa belav e goya ev binemala han li nêzîkî Qole ya welatê Arnawudê de* (7) *durust bûye lê ya ku min di riya kitêbek Qazîyê Misrê yê dewra Mihemmed Elîyê Mezin ve zanîye, ev binemal di bingehîna xwe de ji Dîyarbekra welatê Kurdan hatîye, ji vir babê Mihemmed Elî û du birayên xwe çûne Qewele, piştî vê yek ji mamê Mihemmed Elî çûye Stenbol û mamê din jî ketîye pê bazirganîyê û tenê babê Mihemmed Elî li Qewele maye. Mîr Helîm jî* (8) *regeza binemala me digihand Dîyarbekra welatê Kurdan û ev yeka han jî gotina qazîyê Misrê xurttir dike".*

Wisa dixuyê ev gotinên Mihemmed Elî yê cîgirê textê paşatî yê Misrê yê wî çaxî, têlê hestê Ebbas Mehmud 'Eqad şidandîye, ji ber ku wek bi xwe jî nivîsandîye, ew jî bi eslê xwe Kurd bûye. 'Eqad, her li wir berê xwe dide nevîyê Mihemmed Elîyê Mezin û jê re dibêje:

**"Ev şeref û şanazîya han bes e ji bo welatê Kurdan ku du qehremanên nemir daye cîhana Îslamê: Selaheddîn û Mihemmed Elîyê Mezin...".**

---

(6) Mebest binemala Mihemmet Elîyê Mezin e ku gelek caran li Misrê bi nisbet navê diduyan ê hevedudanî Mihemmed Elî re digotin 'Elewî.

(7) Mebest Welatê Arnawudan (Albanya) e.

(8) Yek ji nevîyên Mihemmed Elîyê Mezin bû.

Ev zanyarîya han a ku kêm tê zanîn, di rûpela 56'ê hejmara 1311'ê roja 25'ê Teşrîna Duyem a sala 1949'an, "El-Musewwer" de hatîye çapkirin ku Dr. İbrahîm Hilmî bi wî awayî di kitêbxana xwe de wek belgek dîrokî parastîye. Di eynê hejmarê de gotarek Hebîb Ceınatî bi vî navnîşanê belav bûye : "Kurd Dixwaze Dewleta Xwe Damezrîne" û tê de bi taybetî behsa Mahabad û Qazî Mihemmed kirîye.

Binemala Mihemmed Elîyê Mezin bi regez Kurd be yan nebe qet vê rastîya han naguhere ku tu ferq di navbera gelan de nîne û Kurd jî ji tu kesî kêmtir nîne, hel û merc, rewşa wan, qonaxa cîyê gel, serdar û qehreman di pêvajoya dîrokê de tên dîyar kirin. Wisa dixuyê gelek ji wan Kurdên zîrek û çalak ên ku rewşa jîyana Kurdewarî ya berê wan, nekarîye tînîtîya wan bişkîne, berê xwe dane navçên din û li wir bi kêrhatîyên xwe yên şexsî gihîştîne bilindtirîn paye û derecan.

Ji bo zêdetir ronîkirina vê mese lê ez dibêjim çi xortên ku ji navçên bi qamîş ên Asya, daristan û sehrayên (bîyaban) Afrîqa li gel berfehmîya xwe bibin nav malbatek dewlemend a İngilîz, dema ku mezin be wek wan kesên der û dorên xwe bi kevçik û çetel nan dixwe, bi kêr fêkî paqij dike, pîpo dikêşe, simokîn li xwe dike, wek wan diaxive û dicole, mimkun e gelek ji wan zêdetir jî bibe pisporek navdar. Aşkera ye ku ger zarokek çavşînê Swêdî jî bînin navçek bi qamîş a paşdemayî dema ku mezin be, pêxas digere, nexwendewar û paşdemayî dimîne û ji her tiştî zêdetir hez ji goşt, masî û hêtê (ranê) ordekan dike. Ger em bêjin Mihemmed Elîyê Mezin li welatê Arnawudan bimaya, mimkun bû bibûya bazirganek dewlemend û bi nav û deng, lê nedibû ew mirovê sîyasî yê zîrek ku karî du car eskerên Sultanê Osmanîyan bişkîne û bigihîje navçên nîvdorgeha Ereb, Sudan û Surîyê û wisa lê bê ku hemû dewletên mezin hesaba wî bikin. Bêguman ne vala ye ku yekî wek Marks gotîye: *"Misra Mihemmed Elî, perçek ji welatê berfireh ê Osmanî ye ku imkana jîyan û manê tê de heye"*.

Hêjayî gotinê ye ku Mihemmed Elî, demek kin berê koça dawîyê hînê xwendin û nivîsandinê bûye!

## Sêyem : YEKEM SALA "GELAWÊJ"

Destpêka sala 1961'an hevrêyê min ê hêja Dr.İzeddîn Mustefa Resul du dîyarîyên gelek bi qîmet dan min, a yekem şeş cildên bîranînên Mamoste Refîq Hilmî[9] û ya duyem jî hejmarên "Gelawêjê" yên sala sisîyan bûn.

Bi vî awayî, ez evdal bim (ez gorî bim, ez reben bim...- Elîşêr), hejmarên sala yekem û a duyem a vê kovarê ku li ba min tune bûn ketin destên min û hejmarên sala yekem jî Dr.İbrahîm Hilmî pêşkêşî min kirin û bi vê curê valatîyek mezin di kitêbxana min de tijî bû.

Min naveroka her "deh" hejmarên "Gelawêj" a sala yekem binçav re derbaz kirin[10] . Ez bawer nakim kes hebe ku vê yeka han îtîraf neke, weşandina "Gelawêj"ê bi rastî bûyerek mezin a jîyana rewşenbîrîya hevdem a Kurd e. Dîyar e her ji ber vê jî "Gelawêj" gelek bi zû di nav xwendevarên hindûr û yên derveyê welat de deng da. Edmonds, piştî weşandina sê hejmaran, di derbarê wê de wiha nivîsandîye:

**"Gelawêj, stêrkek herî geş a asîman e, li ba Misrîyên kevin mizgînîya derîyê xêr û bereketê bû. Naveroka sê hejmarên pêşîn ên wê, mizgînîya vê yeka han in ku navê Gelawêj bi xwe li ser e".**

Li ba min beşên piranîya gotarên "Gelawêj"ê hêjane ne ku yan wek xwe yan bi bi destkarîyekî kêm cardin di rojname û kovarên kurdî de bên belav kirin.

## Çarem : "LEHİSTAN"A MEHMUD CEWDET

Yek ji wan kitêbên hêja yên ku berêz Dr.İbrahîm Hilmî pêşkêşî "Mêjû" kirin, "Polonya-Polende ya Lehîstan" a Xwedê

---

(9) Cilda yekem, Xwedê jê razî be, Refîq Himî bi xeta xwe ve pêşkêşî Kak İzeddînê xoşewîst kirîye.

(10) Hejmarên 5-6. û 11-12. ên sala yekem a "Gelawêj" bi hev re derketine.

jê razî be Mehmud Cewdet e ku di rûpela 312'ê "Mêjû" de navê wî derbaz dibe û demek e bûye yek ji wan berhemên kurdî yên hêja.

Dr.İbrahîm, wek hemû rewşenbîrên salên xwe bi dilek rêz û gîyan ve behsa wan welatparêzên dilsoz dike ku roja 20'ê Teşrîna Duyem a sala 1937'an li Bendîxana Navendî ya Bexdayê de hatin îdam kirin û mirina wan hindurî herkesî hejand û têlên xam yên şairan coland. Kesek nîne ku Xwedê jê razî be, Mehmud Cewdet naskiribe û behsa azayetî, dilpakî, destvekirî û dilpiçûktîya wî neke.

Mehmud Cewdet, tenê efserekî (zabitek) jêhatî, alîkarvanek dilsoz ê Şêx Mehmud, dostek nêzîk ê Simko û muhacirê destê Major Soanne nebû, eynî wextî ew yek ji wan bûye ku bi nivîsandin jî xizmeta gelê xwe kirîye. Di pê xwe de çend gotar û du kitêbên mezin hiştîye, ya yekem berhemê C.A.Sêlmentî yê Rojavayî ye, derbarê Babî û Behayî de ye ku kirîye kurdî û bi navê "Behaullah û Dewra Nû" di sala 1933'an li Bexdad belav kirîye û 336 rûpel e. Ya duyem jî ev kitêba han e ku Hezîrana sala 1936'an bi navê "Polonya-Polende ya Lehîstan" e[11] ku wî nivîsandîye, lê gelek mixabin firset neketiye destê wî bi xwe da ku belav bike. Sala 1940'an de, yanî sê sal piştî mirina wî, di Çapxana El-Me'arîf a Bexdadê li gel xerîteyek sîyasî ya Polonya çap bû. Ev kitêb 237 rûpel e, hecma wê biçûk e (12x17 cm.).

Di vê kitêbê de ku bi piştevanîya sê kitêbên tirkî, serokanîyek frensî û yeka erebî nivîsandîye, Mehmud Cewdet behsa gelek milên jiyana aborî, civakî, sîyasî û çarenivîsa dîroka Polonya dike. Ev behsa dawîyê, gelek dîqqeta nivîskarî kêşa ye, wisa dixuyê wek Kurdek birînên wî kola ye û nava wî şewitandî ye. Di kitêba Lehîstan de ji her tiştî zêdetir hest xwe ragirtin, "jîyanhezî" û serî netewandina Polonîyên azadîxwaz dike, ew ên ku di dirêjahîya qonaxên sedan salên dîrokê de bi destê ezîyeta Avusturya (Nemse) û bi taybetî Rusya û Prusya de bûn.

Xwedê jê razî be, wî behsa Lehîstan bi kurdîyek rewan

---

(11) Navê kitêbê bi vî awayî çapkirîye.

hûnandîye û bi awakî zanistî çêkirî ye û hewil daye ku di vê riyê re gotinên nû ji bo kurdî çêke yan wergerîne. Mesela "awrêj" ku tê mana "mesb el-nehir", "lîman" yanî "el-minaî", "qral" û "qralîçe" yanî "el-melik" û "el-melike" û "an" yanî "el-sanîye" û "pîştan" yanî "el'êcyal" bikar anîye.

Şerê Cîhanê yê Duyem û dagirkirina Polonya ji alîyê Nazîyan ve, ji bo belavkirina Lehîstan firset zanîye ku pênc beşên pêşîn û heta rûpela 210'an nivîsandina wî bi xwe ye. Herçî beşê sêyem a kitêbê ye (rûpel: 211-237), behsa wan serpêhatîyên Polonya dike ku piştî wefata Mehmud Cewdet qewimîne, lê gelek mixabin qet tu cîyek kitêbê de behsa nivîskarê vê beşê han nehatîye kirin. An ne hevalên wî yên nivîskar evan milên "Lehîstanê" ji bo wî ronî dikirin.

## Pêncem : DÎROKA KOYE

Min destpêka beşa "Kurtîya Bîblîyografya Dîroknivîsa Kurdî" ya kitêba "Mêjû" de gotîye :

**"Ev bîblîyografya han tenê gavek destpêkî ye, qet dûr nîne kêmasîyên zêde tê de hebin.. û ez rastî gotarên bi qîmet nehatibim yan destê min negihîştibe wan". Vêca bi zimanê "babê mezin ê dîroknivîsê Kurdî Şerefxanê Bedlîsî" ve ji "zanayên mirovî, dilpak û hêja" bi hêvî rica ye ku "gelek bi kûrî ser nivîsandinên min bisekinin û ger tiştek ber çavên wan bikeve bi awakî merdane muqayese bikin, ji xwe ger şaşîtî yan jî bîrçûnek min tê de bibînin bê ku ser henekan bikin, li gel min hevaltîyê bikin û em bi perçek nûtir û baştir pîne bikin"**(12).

Mamoste, hevrê û birayê min ê yekcarî xoşewîst Mes'ud Mihemmed, yekem kes bû bi vî hestî diqeta min kişand ku di bîblîyografya "Mêjû" de "Mêjûyî Koye ya Koyîsencaq" a Mamoste Tayer Ehmed Hewêzîm bibîr anîye. Her wê rojê jî di nav dîyarîyên bi qîmet ên Dr.İbrahîm Hilmî de ev kitêba han ket

(12) Binêre: rûpela 258-260'ê "Mêjû".

berçavê min.

"Mêjûyî Koye", sala 1962'an li Bexdad hatîye çapkirin[(13)], wê salê min li derveyî welat dixwend, ji ber vê ev kitêb neket destê min û birayên wek min[(14)] ku wî çaxî li ser dîroka Kurdî xebat dikirin. Gelek milên ku li ser hatine sekinandin, bibûna serokanîyên ronîkirina wan behsên ku em di têzên xwe de li ser sekinîne. Gelek mixabin piştî vegerîna xwe jî li tu cî "Mêjûyî Koye" ber çavên min neket, wiha nebûya helbet ev valatî nediket "Mêjû" jî.

Lê li gel vê de jî hewce ye ez vê yeka han îtîraf bikim ku ev gotinên min ji bo wê yekê nîne ku ez xwe pê biparêz im, qet nebe ji ber ku Mamoste Nerîman di rûpela 133'ê "Bîblîyografya Kitêbên Kurdî" de bi awakî vekirî behsa "Mêjûyî Koye" kirîye. Her çawan be, dilê min dixwest gelek berhemên din ên wek "Mêjûyî Koye" hebûna û vêca bila min jibîr bikirana!

## Şeşem : GOTİNA DAWÎ

Dîyarîyên bi qîmet ên Dr.İbrahîm Hilmî Fettah ji bo "Mêjû" gelek ji van jî zêdetir in ku me çend nimunên wan di vê gotarê de xist ber çav, ez hêvîdar im ku bikarim îstîfade jê bikim û ez ji Mamê Birahîm re hêvîya temenek dirêj û tenduristîyê dikim.

---

(13) Tahir Ehmed Hewêzî, Mêjûyî Koye ya Koyîsencaq, cilda yekem, Bexdad, 1962, 159 rûpel, ji bo derketina vê gotarê, kak Tayer namek sipehî ji min re şand, ku niha wek xelatek nazdar a "Mêjû" min hildaye. Daxwaza min, Xwedê hez bike, li gel çapa duyem a "Mêjû" de çap bikim.

(14) Mebesta min Dr.Kawıs Qeftan û Dr.Ehmed Osman in.

MİJARA ÇARDEHAN

# FATME MİHYEDDÎN : PERİYA PÊŞENG Û ESKERA BÊ NAV

Di salên xwe yên zaroktîyê ve, me ewqas navê perî û perîzadan sehkirîye ku heryek ji me wênên xweşik di mêjîyê xwe de ji bo perîyan kêşa ye. Perîya rehmetî li ba herkesî jinek nerma giran a rehsivik û porspî bû. Ew kesê ku dixwaze di jîna xwe de perîyek bi çavên xwe bibîne dikare biçe li ba Fatme Mihyeddîn ku gelek mixabin ne tenê serbaz, belko eskerek bê nav a Kurd e.

Temenê wê ji 80 salan derbaz bûye(*) , lê li gor ser çav û axaftina wê ji 80'yan kêmtir e. Mirov qet li cem (li balê) aciz nabe, xurcek (heybek) tijî serpêhatîyên mirarî û cewherên ronî ye. Cewher û mirarîyên sade û bêemsal, bi xwîdana pîroz a nav çavan û dilsozîya nav kûrîya gîyanê, bêxewîya şevan, jana jîyana Kurd a avzêrkirî ye.

Dor û berê sedsalek berê niha, Fatme, di bajarek wek Bexdayê de çav berdaye rîya dibistana "İttîhad û Teraqî"yê. Dûr nîne li vir yeka bi serê xwe ya ji bajarê Silêmanîyê be. Şer sekinî û gelek derbaz nebû text û tacê Dewleta Osmanî têk çû, Fatme ya xamekeç li gel babê xwe ku heta wî çaxî karbidestê Dezga Rejî(1) ya titunê bû, vegerîya welat.

**Gelek bi zû perê dilê Ehmed Begê Fettah Beg ê şair, bi tîra eşqa Fatma şox û şeng lêxist. Fatme ku bi xwe jî hez ji şiîr dikir(2) ket nav şairan û bû mêvanê dîwanxana Kurdperwe-**

---

(*) Ev gotara han di rûpelên 15-18'yên "Rewşenbîrî Nwê" hejmara 73'an a Adara sala 1973'an de hatîye belav kirin.

(1) Di sedsala 19'an de Kompanya "Rejî" ya Frensî berhem û firotina titûna İmparatorîya Osmanî bi tevayî girtibû dest. "Rejî" wek dezgeyek, ji serî heta binî nav Dewleta Osmanî de bibû navek belav.

(2) Di ciwantîya xwe de bi Tirkî şiir gotîye.

ran.

Gelek ser de neçû Şêx Mehmudê nemir rûpelek gelek hêja ya

xebata gelê Kurd weşand û navçek girîng a welat ji zulm û zordestîya İngilîzên dagirker rizgar kir. Ehmed Begê Fetah Beg, bû Wezîrê Darayî ya Şêx. Jinek wek Fatme ku jina wezîr jî bû, li gor urf û adetên civakê ya wî çaxî nedibû ku agahdarîya hemû tiştan be. Lê pişt re wan jibîr kirin, piranîya xelkê dilxweş û aşiqê serxwebûnî û nemana xerabîyên Major Soane û mirovên wî bûn. Qet kesekî Ehmed Begê bi vî awayî bi gurc û aza nedîbû, ji bo mizgeftê jî bûya wiha nedikir. Ji ber ku dilê wî ber Şêx Mehmud êşa bû, lê ji bo Kurd û xizmeta pîşewa qet tiştek dil de nema û xwe ji bo karkirinê amade kir. Zû bi zû şîkayetên ji destê İngilîzan û planên wan hatin xuyakirin, xwezî İngilîz ji halê Kurdan têgehiştana û henek û qeşmerîyan bi wan nekirana. Destpêkî de dijî wan rikoyî nebûn, hêvîyek wan a mezin ji bo alîkarîyê hebû!

Hemû serwet û hebûnên dezgên Şêx di nav kasa jina Wezîrê Darayî de bûn. Bi bacên titun û gişt hatinên din ve ancex digihîşt 60 hezar rûpîyan ku dike 5-6 hezar dînarê îro!(3) , lê çi heye yên wisa jî hebûn wijdana xwe dixistin bin pîyê xwe û serweta Heme Qedrî bi çend rupîyekê karbidestê biçûk ê Kurd dipîvan. Ev serveta han jî ku bibû sitrîyên çavê çavbirçîyan bi sebebê dilpakî û sadetîya Fatme ve li gel hemû nivîna helal a Ehmed Beg, wek hêka paqijkirî ket destê İngilîzan. Dema ku êrîşa bê wext anîn ser bajêr firset bi wê ket tenê 3 lîrên xwe bibe û kasê girt û bi hêvîya ku gelek ser de naçe vegerin, wek xwe di cî de hişt.. Mixabin wiha derneket. Bi mehan vî gundî û wî gundî gerîyan. Her gelek sehkirin, ev hebe tunebe heywanek wek rovî û çetên zarokên bêkesên xwe talan kirine. Dema ku vegerîya bajêr bi naçarî demek baş jîyana xwe bi ziktêrîya rojane bir serî...

**Perdek din a jîyana Fatme ku heta mirinê pê îftixar dike, eva han e: yekem jina Kurdên İraqê ye ku bûye mamoste û tam 35 salên jîyana xwe bi wê perrê dilsozîya xwe ve bi sedan**

(3) 100 hezar rûpî dikir 7 448 pawenê sterlîn.

keçên Kurd perwerde kirîye. Wek savayên ber sînga xwe li wan nêrîye. Di destê wê de bûya hemû keçên Kurdan hînê

xwendin û nivîsandinê dibûn. Ev perda jîyana wê gelek serpêhatîyên ecêb û tijîmana ne. Ez wisa dizanim her rûpelek wê, hêjayî weşanê ne(4).

Niha jî li ba wê wisa ye, ew roj e ku Xwedê jê razî be Şêx Nurîyê Şêx Salih ê şair û xizmê wê, ket hindûr û ji hemû caran germtir pê re ket axaftinê. Qet bi vî awayî nehatibû dîtin. Ji rewşa wî ve dixuya ku ji bo kar û armancek girîng hatîye. Ket behsa xwendin û xwendewarî û methê Fatme ku yeka dinyadîtî ye û dikare rê nîşanî kesên din bide. Gelek jî meth û senayê Ehmed Begê Tewfîq Beg kir û got ku gelek hez bi pêşkevtina Kurdan dike.. Piştî vê Şêx ê şair dûr û dirêj bi gotin û lefzek şêrîn ji xwîşka Fatme re dixwîne û têt ser armanca hatina xwe:

**"Ehmed Beg dixwaze dibistanek a keçan li Silêmanîyê veke û ji xeynê Guzîde Xanim a jina Ebdulezîz Yamulkî û te pê ve kesek nîne ji bo vî karî. Tevizînek di laşê min de hat û ketim derya xeyalan... Rast e xwendin tiştek baş e û babê min vê yeka han gelek caran di guhê me de dixwend û min bi xwe jî ji xêr û başîyê pê ve tiştek ji xwendinê nedîtîye. Lê dê xelkê bajêr ji me re çi bêje?. Min çiqas rastîyê dikoşa, nedikarî qerarê razîbûnê bidim. Lê wî mil danenî, ket handana min, dizanî ku ez yeka xwedêperest im ji ber vê jî gelek zêde ayet û hedîsan têkelê nav axaftinên xwe dikir. Cennetê bi hûrîyan ve ji min re**

---

(4) Weşandina bîranînên pêşrewên dîroka Kurd û jîyana rewşenbîrên me, wezîfek mezin e ketîye ser milên xwedî pênûsên dilsoz ên gelên me. Ev bîranînên han serokanîyên hêja yên îro û rojên me yên bê nin. Gelek ji wan jî kîsê me çûne û kêm ji wan mane. Heta niha çend carek min behsa vê mijarê kirîye. Bi qasî quweta xwe çi firset di vî warî de ketîye destê min, min jê îstîfade kirîye. Wextê xwe de min bîranînên - Xwedê jê razî be- Mamoste Ismaîl Heqqî Şaweys berhev kirin, ew çû bîranên wî man baqî. Min beşek ji bîranînên mamoste Fuad Mestî û Ehmed Xwaca jî nivîsand. Hêvîdar im bi dilê we bin û bibin hander da ku yên mayîn ji kîs neçin.

dikir temînat. Hêdî hêdî ez nerm bûm û min belênî da. Bi vî awayî, qasê ku bibîra min de maye, sala 1926'an yekemîn derîyê dibistana keçan li Silêmanîyê hat vekirin. Ehmed Beg ji bo navê min navê dibistanê danî "El-Zehra"(5) ku di nav xelkê de "Zehra" jê re digotin. Cîyê wê nêzîkî Mizgefta Mezin bû, niha jî dibistana Gulale ya keçan tê de ye".

Guzîde Xanim mudîra û Fatme jî tik û tenê mamostê "Zehra"yê bûn. Herduyan berpirsîyarîya wê erkê girtin ser milên xwe ku li gel erkên îro gelek cuda bûn.. Çiqas navê Guzîde Yamulkî derbaz dibû, çavên wê tejî rondik dibûn:

"Guzîde, Kurda Tirkîyê û jinek kamil û têgihiştî bû, demek dirêj li Stenbol jîya bû, gelek bi germî xizmet dikir û vê yeka han jî min gelek han dida. Bi rastî ew nebûya min dikir ez hişê xwe winda bikim. Ji ber ku her zû devê xelkê yên paşdemayî li me vebûn, hezar û yek gotinan ji me re digotin. Vê yeka han kiribûn eyb ku dema keç diketin hindûr 'eba û pêçên xwe derdixistin!. Me gotinên ji van xirabtir jî sehkirin. Gelek dayîkan bi tirs û lerz keçên xwe dianîn û her ev yeka han tenê dima ku em ji wan re kirasê Qur'anê li xwe kin da ku dilnîya bin em ê agahdarî şerefa wan bikin ku bi xwendin lekedar nebin. Dayîkên wisa hebûn pirsên wisa dikirin ku mirov nikare bêje".

Dayîkên dilsoz ên Kurd xwe dane ber pêlên rojên borî yên ecêb, lê bi xwe jî :

"Sinifa yekem a dibistana me ya sava, yekcar ecêb bû. Yên wisa tê de hebûn ku temenê wan 20 û bawer bike ji 25'an jî derbaz dibûn. Bi serpêçên xwar, kilawên xweşik û bi soravkirî dihatin. Li gel ên wisa rûdiniştin ku keçên wan dihatin hesêbê. Lê hemû ji bo hînbûnê dihatin, bi dil xwe helak dikirin. Feqîr û dewlemend bi hev re bûn. Niha jî di bîra min de ye, min porteqal ji xwendevanan re birin, ên wisa hebûn nedizanîn porteqal çî ye, bihîn dikirin û pê dilîstin. Heta min bi destê xwe ji wan re paqij kir û min wan têgîhand ku fêkî ye û tê xwarin".

Hestê veşartî ya xwendewarîyê, zêdetir cote mamostên Zehrayê dicoland. Hez dikirin û hewil didan tiştek wan ji

---

(5) Ji "Fatimetu'l Zehra" tê.

yên kurran û mêran kêmtir nebe. Vir de dayîka Kurd taqet daye ber xwe û germtir bûye, wisa dikir dixwest ku xwe îspat bike, vêca nizanim hestê wê dikir ku em bi hemû hişî xwe ve bikevin perestgahîya dilsozî û fedakarîyek ji bo perîyek ji xelkê xwe re yan na? Eva han girîng nîne, mimkûn e wiha nebe, lê bira ji ber dilê wê ya nazik ez jî hewil didim xwe û xwe hîşyartir nîşan bidim:

"Her ewqas me bihîst ku Fuad Reşîdê mamostê kurran şanogerîyek a "Neronê Zordar" pêşkêş kirîye û bi vî karê han hestê gelek kesan bizwandîye. Li ser vê em jî ketin sahê û me xwest gavek hîn baştir bavêjin. Em tev li ser bîr û rayek bûn da ku behsa meselek wisa ya nav civaka xwe bikin ku hemû rojan em tûşî qurbanên wê dihatin. Lê kesek ji me nivîskar nebû, ji ber vê me pena bir ba Şêx Nurî û ewî jî li ser pêşnîyara me şanogerîya "Dayîk" ji me re amade kir. Me dibistan da girtin û perdên xwe vekirin. Nêzîkî heftîyek jinên bajêr berê xwe danê û bi meraq li "Dayîk" nihêrtin. Behîca, xwîçka min rola Dayîk û Şefîqa Seîd(6) ku xwendevanek hîşyar a dibistana me bû, rola doktor dilîst. Aşkera bû li têla dilê nezanîyê dixistin".

Heta îro jî çi bi xwe çi xwîşka wê, naveroka "Dayîk" jibîr nekiribûn ku beşek wê bi şiîr hatibû nivîsandin.

"Dayîka nexwenda bi xeletî dermanek etaran zorî bi zarokê xwe dide xwarin, derman tesîrek xirab li zarokê dike. Li ser vê hawar, qêrîn û girîn ji dayîkên reben ên taxê (gerê) diçe û tên nêrînê. Yek ji wan porspîya zîrek a cîranê wan bi kelebez dikeve hindûr û dipirse:

**Çî ye em grîye û zarîye**
**Bo çîte hawar û telaşy?**
(Çî ye ev girîn û zarîn
Bo çî ye hawar û telaş?)
Dayîk bi awakî şerpezetî:
**Her gîz xewî nebû minîş**

---

(6) Behîce Mihyeddîn û Seîde Şefîqe, du pêşrewên din ên meydana xwendevarîya jinên Kurd in. Sedan keçên Kurd li ber destên wan û grubek xwîşkên wan de hînê xwendin û nivîsandinê bûn ku piranîya wan derecên bilind ên xwendinê temam kirine.

**Çum damê tozêk şîleyî xaşxaş**
(Bi tu awayî xewa wî/wê nedihat û min jî
Dayê hinek şemayê xaşxaşê)
Cîranê wan dema vê seh dike bi lez diçe pê doktorê bajêr.
Doktor bi eynî awayî dipirse:
**Çî ye em grîye û zarîye**
**Bo çîte hawar û telaşy?**
(Çî ye ev girîn û zarîn
Bo çî ye hawar û telaş?)

Dayê :

**Her gîz xewî nebû minîş**
**Çum damê tozêk şîleyî xaşxaş**
(Bi tu awayî xwewa wî/wê nedihat û min jî
Dayê hinek şemayê xaşxaşê)

Doktor :

**Ca**
**Kê be toyî wot dewayekî zerîf û baş e**
**Tulfî wa qabîl dermanî wek xaşxaş e?**
**Xra ke em dermaneyî biderê**
**Belku be carêk çareyî bikrê**
**Îtir her gîz lew dewayaneyî nedeytê**
(Vêca
Kî ji te re got dermanek zerîf û baş e
Tifalên wiha qabilê dermanê wek xaşxaş e?
Zû rabe vê dermanê bidê
Belko bi carek kêr bê
Edî carek din ji van dermanan nedê)

Dayîk :

**Tobe bê, tobe bê ya Rebî**
**Heta mawm dermanî wayî nedemê"**
(Tobe be, tobe be ya Rebbî

Heta hebim dermanek wiha nedimê".)

Ger wijdana me hebe û em bi hemû milan de, li meselê binêrin, hewce ye em vê yeka han îtîraf bikin ku yekemîn di şanogerîyê de jinên me ji mêrên me birine (7) .. Mamostê yekem di vê gotina xwe de bixeq bû. Min nexwest ez zêde wê aciz bikim, hat ser bersîva min a duyem :

"Guzîde Yamulkî sê sal berpirsîyarî kir ku ew çû Bexdayê Zehraxan a keça Mistefa Yamulkî dor û berê sê salan cîyê wê girt û dawîyê nêzîkî 30 salan kar û barên dibistanê ketin ser milên min. Rewşenbîrên wî çaxî yên bajêr piştgirîya me dikirin. Carek nêzîkî ber Derîyê Serayî yekî ji hêdîka ve destê xwe li pişta min xist û ji min re got 'aferîn, hezar car aferîn, we serê me bilind kirîye..' dema ez vegerîyam, min lê nêrî, Pîremêrdê Şair e. Pîremêrd, gelek tiştên din gotin, dixwest ku hemû malek bike dibistan û dar di dest de bikeve gîyana wan dayîk û babên ku zarokên xwe nadanin ber xwendinê...".

Axaftina dawî ya mamosta me ya yekem:

"Niha jî, her çend çavên min jar in, guhên min giran û bîra min kêm bûye, lê car û caran dibînim ku keda min vala neçû ye û keç ketin rêzên birayên xwe û mil bi milên wan jîyana nû ji bo nevîyên xwe yên bên vedihûnin".

Serbaz û eskerên me yên wek Fatme gelek in, qet nebe bira em car û baran wan bibîr bînin, ku wextê wê bê em heykelên wan ên gelek bi şanazî (îftîxar) di nava dilê xwe de daçikînin û tiştên ku nayên zanîn ji wan hînbin da ku ji kîsên me neçin.

---

7) Rewşenbîrên Kurdên Tirkîyê ji ber çend sebebên taybetî û gelemperî ve, berê me derîyê gelek huneran xistine. Berê Şerê Cîhanê yê Yekem ewan şanogerîyê bi Kurdî danîne. Li gel vê jî jinên Kurdên Îraqê di vê sahê de yekemîn in.

## MİJARA PANZDEHAN

# MATENEDARAN AN CEWHEREK Jİ CEWHERA ROJHİLAT

Ermenî(*) yek ji gelên herî kevnare yên ser zemîna cîhanê ne(1) . Berê Îsa, Ermenî xwedî jîyanek pêşkevtî bûn. Welatê wan Ermenîstan yek ji wan welatan e ku bi bermayên dîroka kevin ve gelek dewlemend e, heta niha gelek bermayên kevin tê de hatine dîtin.

Ermenî, wek gelên din ên Rojhilatê di destpêkî de tiştê ku dixwestin, ser kevirên qeraxên çîyan bi kolandinê dinivîsandin. Beşek ji van nivîsînên kevin hatine dîtin û naveroka wan hatine zanîn. Lê du sebebên nû her ji kevin de tesîrê kirîye ser pêşdeçûna nivîsandin bi zimanê Ermenîyan. Ya yekem, belavbûna dînê Mesîhî bû ku di destpêka sedsala 4'an ve dînê resmî yê Ermenîyan ne, ya duyem û girîngtirîn jî di xelasîya sedsala 4'an de danîna alfaba taybetî ya zimanê Ermenî bû(2)

---

(*) Ev gotara han di rûpelên 7-10'ên kovara Beyan, hejmar: 30, Teşrîna Yekem a sala 1975'an de hatîye belav kirin.

(1) Beşê zêde yê zanyarîyên vê gotarê, ji alîyê nivîskar bi xwe ve li Matênederan de hatîye berhev kirin. Beşên din jî ji hinek serokanîyên din hatine girtin, bi taybetî ji kitêba; G.W. Abgar, The Matenadaran, Erevan, 1962.

(2) Misorp Maştots alfaba Ermenîyan danî. Ev alfaba han heta niha jî di nav Ermenîyan de gelek belav e û hemû sal, bi taybetî li Ermenîstana Sovyetê bi sedan kitêb, rojname û kovar pê tên weşandin. Misorp Maştots yek ji wan mirovên mezin ên Ermenîyan e ku bi heq îftîxarê pê dikin.

Di zemanê kevin ve lawên hîşyar ên Ermenîyên xwedî dîroka tijî bûyer û karesatên kevin, Ermenîyên xwedî edeba esîl, Ermenîyên xwedî fêrgehên ayînîyên cur bi cur û dêrên mezin û biçûk, ketine weşandina hemû milên jîyana rewşenbîrî ya bab û bapîrên xwe û ji bilî van, ser dema xwe de zanayên Ermenîstanê di destpêka sedsalên Navîn ve ketine wergerandina berhemên felsefî û zanistî yên gelên din ser zimanê xwe yê zikmakî. Bi vî awayî demek gelek dirêj ve bi nivîsandin û belavbûn helgirtin û parastina destnivîsan di nav Ermenîyan de bûye karek zanistî-edebî yê rewac û layîq. Beşê herî zêde yê van destnivîsan li kitêbxanên xwendegeh û dêran de hatine parastin. Mezintirîn ciyê parastina van destnivîsên han bi navê Matênederan e ku di sedsala 5'an, li Eçmadzîn a nêzîkî Erîvanê hatîye damezrandin. Bi vî awayî xezîneke bi cewherên gelek dewlemend li Ermenîstanê de durust bû ku niha yek ji serokanîyên hêja yên herî girîng ên dîroka kevin û navîn a gelan têt hesêb kirin û her ji ber vê jî bûye xezîneke bi qîmet ji kesên îro re. Wek mîsal gelek destnivîsên kevin ên wisa tê de hene ku wextê xwe de bi zimanên din hatine nivîsandin, lê niha tenê wergera wan a Ermenî mane û esil û wergerên wan ên ser zimanên din ji sebebên aşkera têkçûne.

Di vî warî de zerarên Ermenîyan kêm nebûne. Tenê dagîrkerên Selçukîyan di sala 1170- an de, zêdetirî deh hezar destnivîsên Ermenîyan îmha kirin. Di wextê qetlîama Ermenîyan a dema Osmanîyan de (salên 1894-1896, 1909-1915)(3) hejmarek gelek zêde destnivîsên Ermenîyan ên hêja bûn qurbana hestê korane yê grubek karbidestên kurtbîn ku bi vî awayî zerarek mezin gîhandin xezîna rewşenbîrî ya mirovatîyê . Lê ji bo ku qîmeta fikir û jîyanê li ba Ermenîyan wek hev bû, karîn ji ber sebebê vê bîr û bawerîya han a mezin û zîrekîya xwa ya bê mîsal û dilsozîya xwe ya bê sinor, bi bihayê zêran beşek zêde ji cewherên vê xezînê rizgar bikin. Li vir ez ê tenê nimûneyek pir manedar di vî warî de bidim:

---

(3) Nivîskarê vê gotarê, hinek beşên kitêba "Kurdistan di Salên Şerê Cîhanê yê Yekem de" ji bo vê meselê amade kirîye. Her wiha binêre: Kovarî Korrî Zanyarî Kurd, hejmar 3, cild 2, rûpel: 75-157.

Ermenî, di sala 1170'an şûn de bi dilsozî ketin pê wan cure destnivîsên xwe yên ku Selçukîyan têk birin yan zeft kirin. Di sala 1205'an de karîn bi çar hezar dîrheman ku ji bo wê serdemê perek yekcar zêde bû, yek ji wan destnivîsên xwe yên bi qîmet ji Selçukîyan bikirin ku heta niha jî maye, bi hecim û giranîya xwe ve mezintirîn destnivîsê Ermenîyan tê hesêb kirin. Di wextê qetlîama sala 1915'an de jî du pîrejinên Ermenîyan karîne wê destnivîsê rizgar bikin. Her yek ji wan beşek wê girtine ser xwe û ber bi Ermenîstana Bakur a ser Rusyayê bi rîyên cuda de ketine rê. Yek ji wan gihîştîye cîyê xwe, ya din jî jiber ta, nexweşî û birçîbûnê di rê de mirî ye, lê berê ku bimre vê perçê di çalek de veşartîye. Qasek şûn de gerokek Awrupî li wan deran bi tesadufî çend rûpelên wê destnivîsê di destê zarokên wê navçê de dibîne, bi çend lib şekiran devê wan şêrîn dike û wî dibin ser çalê. Dema ew mirovê gerok digihîje Ermenîstana Rojhilat, xelkê wir bi vê bûyerê dihesin û hewil didin carek nû de vê perçê bikrin û naçar dibin navbera xwe de 400 hezar pawen berhev dikin.

Bi vî awayî bi hezar belayî serê wan de hatî ve, Ermenîyan karîne wan hebûnên xwe yên mezin biparêzin. Piştî wê ku Ermenîstana Rojhilat di sala 1828'an şûn de bû beşek ji Rusya Awrupayî gawur ayînî firseta parastina destnivîsên Ermenîyan ji carên din gelek zêdetir bû, her çendîn li wir jî beşek kêm ji wan destnivîsan birin dezgên zanyarî yên Moskova û Petrogradê.

Li gel damezrandina Komara Ermenîstana Sovyetê, qonaxek din a nû di berhevkirin, parastin û lêkolîna destnivîsên kevin ên Ermenîyan de destpê kir. Ji Kanuna Yekem a sala 1920'an şûn de Matênederan kirin dezgehek dewletî. Demek kurt piştî vê, ew 4660 destnivîsên ku di sala 1915'an de biribûn Moskova, paşde anîn li Matênederan. Ji sala 1939'an ve cîyê wê jî guherandin bajarê Erîvanê ya paytext. Di sala 1959'an şûn de Matênederan ji bo lêkolîn û parastina destnivîsên kevin bûye enstîtuyek serbixwe. Koşka xweşik a Matênederan(4) îro li ser

(4) Ev koşka han ser awayê avayîsazîya Ermenîyan a kevin hatîye çêkirin û ji bo pêwistîya parastina destnivîsan hemû malzeme tê de ne.

cîyek bilind, li bajarê Erîvanê dinêre û cewherên bi qîmet ên ku tê de ne her yek bi awayek serpêhatîyên gelek hêja û zanistî ji bo nevîyên xwe yên îro û rojên bên diparêze.

Hejmara destnivîs û perçe destnivîsên Matênederan ji 15 000 zêdetir e (berê Şerê Cîhanê yê Yekem ji 5 000 kêmtir bû), dor û berê 13 000 ji van bi ziman û alfaba ermenî ne, yên din bi yunanî, erebî, farisî, tirkî, hindî, rusî, hebeşî û zimanên din in. Kevintirîn perçedestnivîsên Matênederan ên sedsalên 5, 6 û 7'an in. Yek ji van destnivîsan Încîlek e ku di sala 887'an de hatîya nivîsîn. Mezintirîn destnivîsa Matênederan 32-34 kîlo û 609 rûpel e, sala 1201'an hatîye nivîsîn û ji rêzek gotarên dêrê, nivîsên dîrokî û felsefî pêk tê. Nivîsînên vê destnivîsê, nêzîkî pêwistîya 700 postên golikan bûye. Giranîya biçûktirîn destnivîsê, tenê 14 gram û 104 rûpel e û salnamek a kilîsê ye. Ev destnivîsa han a hêja di sala 1436'an de li ser postê karik ên nazik (hîn ji dayîk nebûyî) hatîye nivîsandin.

Bi nirxandin pesnê destnivîsên Matênederan nayên dayîn. Berê hemû tiştek di saya van destnivîsan de beşên rûpelên mezin û girîng ên dîrok, edeb û jîyana civakî ya gelê Ermenî ya qonaxên cuda cuda hatine parastine û di rîya van re tên zanîn. Ji derveyî van, ev destnivîsên han tijî ji zanyarîyên bi qîmet ên derbarê jîyan û dîroka gelên Rojhilata Navîn in, bi taybetî ew ên ku bi Ermenîyan re cîran in, gelek ji wan jî di derbarê navçên Qefqasê, Îrana Sefewî, Împaratorîya Bîzansî, dewletên Ereb ên Îslamî û şer û êrîşên Xaçperestan, Moxol, Teter, Selçukî, Tirk û gelek ên din in.

Beşê herî girîng ê destnivîsên Matênederan ji bo behsa dîrok hatine amade kirin. Dîroknivîsên bi nav û deng ên Ermenî gelek nivîsên bi qîmet di pey xwe de hîştine ku evên han bi destnivîsên herî hêja yên naskirî yên cîhanê re tên muqayese kirin. Wek nimûne: yek ji wan dîroknivîsê sedsala 5'an destnivîseka xwe ji bo behsa belavbûna dînê Mesîhî li Ermenîstanê de amade kirîye. Destnivîsa "Dîroka Xelîfan" behsa wan serpêhatîyan dike ku di dema fermanrewatîya Ereban a di navbera salên 632 û 1788'an de qewimî ne. Her di Matênederan bi xwe de jî dor û berê 600 destnivîs hene ku bi alfaba erebî, bi zimanê erebî, farisî, tirkî û yên din hatine

nivîsandin. Navê İbnî Sîna, Şehabeddînê Şîrazî, Fîrdewsî, Hafiz, Se'dî, Nîzamî û gelek navdarên din ên Rojhilat di gelek destnivîsên vê dezgê de dikevin berçav.

Hejmarek zêde wêne û nîgarên rengareng ên kevin di Matênederan de hatine parastin, hinek ji wan di sedsala 5'an de hatine çêkirin û hemû belge û nîşanên hestê hunerîya bilind a Ermenîyan in. Ew rengên ku ji bo çêkirina van nîgaran bikar anîne, bi sedan sal in wek xwe man e, dîyar e ev yeka han jî bi serê xwe di warê kîmyagerîyê de nîşana pêşkevtinê ye.

Bi rastî behsa Matênederan, cewherên Matênederan, kitêbxana Matênederan û bi sed hezaran belgên ku di Matênederan de hatine parastin, karê gotarek biçûk nîne(5) .

Gelê Kurd jî wek yek ji wan cîranên herî nêzîk û têkelî Ermenîyan, di Matênederan de beşa xwe heye. Di gelek destnivîsên kevin de navê gelên Zagrosê, Medîyan û Kurd bi xwe heye û behsa navçên Kurdewarî hatine kirin. Em qet dûr neçin Mînorsky yê bi nav û deng di nivîsîn û lêkolînên xwe yên derbarê Medî û Kurdan de feyde ji kitêbên dîroknivîsê mezin ê Ermenî Movsîs Xorînatsî (Maysay Xorênskî) wergirtîye(6) ku wî di sedsala 5'an de nivîsandine û nivîsên wî di Matênederan de hatine parastin.

Ji derveyî vî milê girîng, birek destnivîs û perçedestnivîsê taybetî ya li ser Kurdan, ya bi kurdî di Matênederan de hene. Tiştê ku ji bo me nû balkêş be ev e ku di birek destnivîsên Ermenîyan de çend rêzên kurdî, bi alfaba Ermenî hatine nivîsandin. Yek ji van destnivîsan derbarê rêzimana Ermenî de ye û di sedsala 15'an de hatîye nivîsandin, lê çend duayên bi erebî, farisî û kurdî tê de ne. Her wiha İncîlek bidestnivîs

(5) Gelek tiştên Matênederan hêjayî gotinê ne. Bi gelek dîqqet destnivîsan di germîyek taybetî de diparêzin. Ji 120 kesan zêdetir li Matênederan kar dikin, ji van 20 kes doktora û 7'ê wan xwedî doktora zanistî ne. Her sal hejmarek zêde kitêb û gotarên zanistî yên bi qîmet ji alîyê Matênederan ve tên belav kirin.

(6) Di vî warî de binêre: F.Minorsky, "El'Ekrad Ehfadu'l Medîyyîn", Kovarî Korrî Zanyarî Kurd, hejmar: 1, cild: 1, rûpel: 552-566.

bi zimanê Kurdî û tîpên Ermenî heye ku dûr nîne di sedsala 18'an de hatibe nivîsandin.

Ji derveyê van herduyan, hin destnivîsên gelek girîng ên derbarê Kurdan de di Matênederan de hatine parastin. A yekem destnivîsa hejmara 1799'an a beşê erebî ye ku destnivîseke rêk û pêk a Şerefnama Şerefxanê Bedlîsî ye. Ev destnivîsa han di sedsala 18'an de li ser 412 rûpelên mezin û bi 21 rêz hatîye nivîsandin. Ez wisa dizanim ku ew kesên ku li ser Şerefnamê nivîsîne, heta îro behsa vê destnivîsa han a Matênederan nekirine.

Ya duyem, destnivîsa hejmara 612'an a beşê erebî ye ku destnivîsek girîng a hêja ye, kêm têt naskirin û li ser eşîra Dunbulîyan e(7) .

Ev destnivîsa han 253 rûpel e û pîvana rûpelan 15x25 santîm e, di sala 1850'an (1260'ê koçî) li Tehran, di Medresa Mîrza Salih de ji alîyê Elî Ekberê Huseynê Tefreşî yê kurê Hacî Seyîd İsmaîl ve hatîye nivîsandin û ji sê beşan pêkhatîye : Navê beşê yekem Eşaretu'l Mezahıb (İşaretên Mezheban-Elîşêr), a duyem İşaretu'l Edyan (İşaretên Dînan-Elîşêr) e û ev herduyên han nivîsên Rustem Xanê kurê Ehmet Xanê Dunbulî ne û bi xetê neste'lîq hatine nivîsîn. Beşê sêyem di dawîya rûpelên destnivîsê de ye û navê wê Tarîxa Denabîle (Tarîxa Dunbulîyan-Elîşêr) ye û ji alîyê Ebdurrezaqê kurê Necef Qulîxanê Dunbulî ve hatîye nevîsîn, ev beşê han temam nîne û bi xetê "nesx" hatîye nivîsandin.

Di beşê yekem û duyem de Rustem Xan behsa dîn û dîroka

(7) Cara yekem E.D. Papazyan, bi zimanê Ermenî û di bin navê "Serokanîyek Nû Derbarê Dîroka Gelê Kurd de" gotarek di derbarê vê destnivîsê de (di hejmara 8'an a sala 1967'an di Kovara Akademîya Zanyarî ya Ermenîstanê de) belav kir.
Multecîyên Ermenîyan di 1916'an de vê destnivîsa han li gel xwe anîne û ev ketîye destê Prof.Aşot Efanisyan, wî jî wek dîyarî şandîye ji Matênederan re.

eşîra Dunbulîyan dike, her wiha behsa Şahên Îranê yên berê Îslamê û Bermekîyan jî kirîye û Dunbulîyan bi nijad bi wan ve girêda ye. Wan behsên ku ji bo bûyerên dawîya sedsala 18'an û destpêka sedsala 19'an amade kirîye, qîmetek wan a gelek hêja heye, bi taybetî ji ber ku, ew tiştên ku nivîskar behs dike, yan bi çavên xwe dîtîne yan tê de beşdar bûye. Li qerax û perawêzên vê destnivîsa Matênederan de Rustem Xan bi xetê xwe têbînî nivîsî ye û hinek cîyan rast kirîye û vê yeka han jî, bêguman, qîmeta destnivîsê zêdetir kirîye. Eva demek e rêvebirên Matênederan bîryarê belavkirina vê destnivîsê dane.

MİJARA ŞANZDEHAN

# KURD Û ÇİRÛSKEK DÛR A AGİRÊ ŞERÊ DUYEM

Li gor naveroka xwe du cur şer hene: Şerên heq û şerên neheq (*) . Ya yekem ji bo serfirazî û azadîyê ye û ya duyem jî ji bo zulm, zorî û dagirkirinê ye. Lê çi ev û çi ew, di hêla zerar û zîyan de, di hêla rûndikên çavan û xwîn de yek in.

Şerê Cîhanê yê Duyem ku nêzîkî şeş salan ajot (İlon 1939-Gulan 1945) mezintirîn facîa ye ku heta niha însan û hemû cîhan rast hatîye. Ger em van gotinan bixin çarçova reqeman bi vî awayî derdikeve:

72 dewlet têkelî vî şerî bûn (di Şerê Cîhanê yê Yekem 33 dewlet), 110 milyon kes bi çek tê de beşdar bûn (Şerê Cîhanê yê Yekem 74), 1384 mîlyar dolar tê de çû (Şerê Cîhanê yê Yekem 208), dor û berê 50 mîlyon însan tê de hat kuştin (Şerê Cîhanê yê Yekem 10), nêzîkî 28 mîlyon însan tê de seqet bûn (di Şerê Cîhaê yê Yekem de 20).

Almanya ji ber sebebê mexlubbûnê û Yekîtîya Sovyet jî ji bo

(*) Ev gotara han di rûpela 1 û 17'yê kovara Beyan, hejmara 29'an, İlona 1975'an de hatîye belav kirin.

ku Hîtler heta sala dawî ya şerê, nêzîkî ji sedî 75'ê hêzên xwe yên şerê biribû ser wan, di vî şerî de ji hemû milan zêdetir tûşî zerar, zîyan û wêranîyan bûn. Sala dawîyê ya şerê jî, yanî piştî danîna cepha duyem ji alîyê Welatên Sondxwarî yên Rojava ve, hîn dor û berê ji sedî 67 hêzên çekdar ên Almanya di cepha Sovyet de şer dikirin. Ew zerara ku li Yekîtîya Sovyet ket nîşanek bê mîsal û tik û tenê ya rûndikên çavan û xwîna şer e:

Ji ber sebebê Şerê Cîhanê yê Duyem 1710 bajarên mezin û yên biçûk ên Sovyetê hatin kavil kirin û 70 hezar gund jî li gel ax û malên wan ve wêran bûn, bi vî awayî 25 mîlyon kes bê cî û war man. Di salên şerê de 32 hezar dezgên pîşesazîyên vî welatî û 65 mîlyon kîlometre riyên hesin ji bînî de ji holê rabûn. Di hêla peran de Yekîtîya Sovyet 500 mîlyar dolar zerar kir, yanî ji sisîyan yekê zerarê hemû şerê hîn zêdetir. Nêzîkî nîvê kuştî û seqetên şer, ên Sovyet bûn.

Derd û belayê Şerê Cîhanê yê Duyem hemû quncikên cîhanê girt, yên nehatin kuştin yan beşdarê şer nebûn, birçîtî, nebûn û nexweşîyê tam kirin.

Neteweyê Kurd ê hêja jî beşa xwe ji vî girt û hinek din hejar bû. Rast e Kurdistan wek di Şerê Cîhanê yê Yekem nebû yek ji wan melbendên şer, ji ber vê jî ji yên din kêmtir tûşî zerar, zîyan û mirinê bû, lêbelê li gel vê jî, ew jî wek hemû gelên Rojhilata Nêzîk û Navîn ji ber sebebê bûyer û hedîsên şer ve tûşî gelek derdan bû. Çirûskên Şerê Cîhanê yê Duyem di gelek milan de, bi gelek awan tesîrê gelê Kurd jî kir. Ca li vir de em behsa meselek biçûk bikin, eva han behsa çirûskek wî şerî ye ku nayê nehatî zanîn û ku bi hezaran kîlometre ji me dûr, lê tesîra jîyana rewşenbîrîya me kirîye.

**Ivan Yûgev**, lawekî xwîngerm û exlaqbilind ê Sovyet bû. Di xwendinê de zîrek û di nav hevalên xwe û civatê de xoşewîst bû. Gelek zû, ji dûr ve derd, ezîyet û çarenivîsa gelê Kurd bala vî lawê kêşa û piştî temamkirina unîversîtê dest bi hînbûna zimanê kurdî kir û bû xwendevanê doktora beşê dîrokê û bi çalakî li ser Kurdan dest bi amadekirina nama doxtora xwe kir. Lê gelek mixabin, gelek di ser de neçû agirê Şerê Cîhanê yê Duyem vêket û piştî demek kurt welatê wî jî girt...

**İvan Yûgev**, wek piranîya zêde ya lawên Sovyetê, çek avêt milê xwe û li gel hevalên xwe ber bi şer de, ji bo parastina axa welat û şerefa gelê xwe ket rê...ber bi mirinê de çû û venegerîya...bi hinek zimanê kurdî û bi gelek xoşewîstîya Kurdan ve serî danî!!

Bêguman **İvan Yûgev** bimaya îro dibû yek ji Kurdnasên Sovyetê yên wek Xalfîn, Lazerêv ku bi aktîfî xizmeta lêkolîna dîroka Kurd dikin... Ger şer bimre û aşîtî bijî, bi hezar û hezaran kesên wek **İvan Yûgev** xweştir dê baxê jîyanê vedin û elbet wî çaxî Kurd jî, çiqas dûr be jî, ji bîhna wî bêpar nabin!!.

# ENDEKSA NAV Û CÎYAN(*)

## NAV

### A

Abgar, G.W. : 223(p).

Adilî Şêx Selam : 138.

Adolf Hîtler : 93.
Binêre : Schicklgruber, Adolf.

Afxanî : 41(p).

"Agirbesa Mondrosê" : 97.

Akademîya Orbelî : 121.

Akademîya V.A. Gord levskî : 33(p), 34.

Akademîya Zanyarî ya Azerbeycana Sovyetê : 20.

Akademîya Zanyarî ya Rusya : 22.

"Akademîya Zanyarî ya Kurd" : 30, 51, 112.
Binêre : Korrî Zanyarî Kurd.

Akademîya Zanyarî ya Sovyetê : 32, 33.

Akopov, G.B. : 200(p), 201 (p).

Alman, Almanî : 25, 82, 203.

Amerîkî, Amerîkîyan : 82, 83, 84.

Areland, P.W. :140.

Ararat : 61.

Arnawudan : 67, 209(Albanî).

Artakserkses : 13.

Asquith : 167.

Asurî : 189, 203.

Atatürk : 60 (p).
Binêre Mistefa Kemal.

Awhanisyan, N. Prof: 140

(*) Ew navên wek Kurd û Kurdistan ji ber ku gelek cîyan de derbaz dibin me dernexistin. Nav û cîyên di perawêza (notên binî) de derbaz dibin me li hemberê wan di nav kevanê de tîpa "p" nivîsand.

(p).
Awrupî, Awrupîyan : 22, 25, 27, 35, 47, 79, 134, 158, 192(p), 225.
Azerî : 20(p), 28, 42.

B

Baba Îshaq : 41, 42.
"Babu'l Mu'ezzem" : 181 (p).
Balêse (kovar) : 7(p), 11(p).
Bangî Heq : 137.
Bangî Kurdistan : 129, 130, 131,137(rojname).
Banka Merkezî : 89(p).
Barbe, G.A. : 25.
Batas, Batasyan : 144.
Bazara Bazazan : 168.
Babî : 213.
Bedirxanî, Bedirxanîyan : 59, 97, 112, 120(p), 121, 127.
Bedleys (Bed+Leys) :49.
Babî : 213.
Behayî : 213.
Behdînî, Behdînîyan : 159.
Behîca : 220.
Binêre : Behîce Mihyeddîn.
"Behaullah û Dewra Nû" : 213.
Behîce Mihyeddîn : 22(p).
Bendîxana Navendî ya Bexdayê : 213.
Benîto, Mussolînî : 94.
Berdeqareman : 136(p), 159.
Berkes, Nîyazî :66(p).
Bermekîyan : 229.
Beşa Kurdî Leqa Lenîngradê : 20.
Bevin, Ernist : 188.
Beyandir : 51.
Beyan (kovar) : 223(p), 230(p).
Beyatî (eşîr) : 144,
Bexdûz : 135.
"Bîblîyografya Derbarê Mesela Kurd" : 19(p).
Bîbliyografya J.S. Musael-

yan : 21(p).
Binêre : Bîblîyografya Kurdnasîyê.
Bîblîyografya Kurdnasîyê : 21(p).
"Bîblîyografya Kitêbên Kurdî" : 215.
Bîblîyografya Rojhilat (kovar) : 43(p).
Bîll, Kapîten : 161.
Bîll, X. : 161.
Bîll, Mîster : 101.
Binêre : Bîll, Kapîten.
Binemala Bebe : 114.
Binemala Celîzade : 116.
Binemala Mihemmed Elîyê Mezin : 211.
Binemala Mutabçî : 199.
Birahîm Xan : 166.
Binêre : Birahîm Xanê Delo.
Birahîm Xanê Delo : 101 (p), 143.
"Birayetî" : 140, 171(p).
Bîzansî, Bîzansîyan : 36, 37, 38(p).
Bonapart, Napolyon : 80.
Bond, Kapîten : 104.

## C

Cadey Ber Sera : 111.
Caf, Cafan (eşîr) : 104, 143.
Cafer Eskerî : 96, 146, 173.
Cejna Qurbanê : 206.
Celadet Bedirxan : 125, 127(p).
Celal Baban : 142.
Celê (binemala Celê ya Koyê) : 114.
Celal Baban : 142.
Cemal Baban : 180, 182.
Cemal İrfan : 135.
Cemal Xeznedar : 131(p).
Cemîl Medfe'î :183.
Cemîl Saîb :135.
Cem'îyetî Kurdistan : 129, 130.
"Cem'îyyetu'l-Ehd" : 159 (p).
Cengîz Xan : 161.
Chetraws : 153.

Charmoy, F.B, Prof. : 25, 26.
Chîrer, Wilyam : 93(p).
Churcill, W. : 101.
Civata Milletan : 112.
Binêre : Koma Milletan.
Cîgerxwîn : 112.
Cuhî, Cuhîyan : 110, 156, 163, 169.
Curzon, Lord : 98.
Binêre : Curzon, Lord Nathaniel.
Curzon, Lord Nathaniel : 98(p).

## Ç

Çalak Talebanî : 119.
Çapxana Hukumetê : 131.
Çapxana El-Me'arif a Bexdayê : 213.
"Çapxana Kurdistan a Mahabadê" : 132.
Çar : 32.
Çmî : 80(p).

## D

Dagobert : 204.
Dail Mil (rojname) : 153.
Danişmend,Danişmendan : 37(p).
Dantisg, B.M. : 167(p).
Dautsîg, B.M., Prof. : 58(p).
"Dayî Cezayîr" : 54.
"Dayîk" : 220.
Dawide (eşîr) : 166.
Delê Ebbas : 166.
"Deng û Behsên Rojhilata Navîn (kovar) : 20(p).
"Derîyê Vekirî" : 83.
Derek : 48.
Derîyê Bilind : 114, 120, 121, 127.
Binêre : El-Bab el-'Alî.
Derîyê Serayî : 222.
Detroît : 202(p).
"Derîyê Vekirî" : 83.
Dewleta Asurîyan : 14.
Dewleta Dostkîyan : 38.
Dewleta Medîyan : 15, 17.
Dewleta Osmanî : 114(p),

120, 121, 216.
Dewleta Selçukîyan : 37.
Deylamî : 41.
Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê : 81, 82, 83, 85, 87, 89(p), 98(p).
Dezga Parastinî ya Belgên Kevin: 154.
Dezga Rejî : 216.
Dezga Rîya Hesin a İngilîzan : 204.
Dezga Rojhilatnasî ya A-kademîya Zanistî ya Azerbeycan û Ermenîstana Sovyetê: 58.
Dêtawc : 166.
Dize, Dizeyan : 145.
Dîyarbekra Welatê Kurdan : 210.
Drasat Fî'l-Tarîx we'l-Asar(kovar) : 169(p).
"Dîroka Xelîfan" : 226.
Dunbulî, Dunbulîyan : 229.

## E

Eagleton, W. : 60(p).
Ebbasî : 8, 35.
Ebbas Mehmud 'Eqad : 210.
Ebdulhemîdê Duyem, Sultan : 120, 124, 127, 128.
Ebdulhemîd, Sultan : 124.
Binêre : Ebdulhemîdê Duyem, Sultan.
Ebdulhemîd Han-i Sani, Sultan : 124.
Binêre : Ebdulhemîdê Duyem, Sultan.
Ebdullayê kurê Kerîmê Fettah Begê Hemewendî : 107.
Ebdulezîz Yamulkî : 76, 218.
Ebdulezîzê kurê Mistefa Paşa : 129.
Ebdurrehman Bedirxan : 127.
Ebdulwehîd Kerem, Dr. : 142.
Ebdurrehman Seîd : 125.

Edîb Ezîz : 134.
Edward, B. : 143.
Ebdulrezaq el-Hesenî : 87 (p), 144(p), 158(p), 178(p), 180(p), 191(p), 202(p).
Ebdulmecîd, Sultan : 52, 181(p).
'Ebdulwehab Mehmud : 174.
Ebdurrehman Axayê Sorekeşîra Şirnaxî :102.
Ebdurrehman Hacî Marif : 31(p).
Ebdurrehman Paşa : 114, 115.
Binêre : Ebdurrehman Paşayê Baban.
Ebdurrehman Paşayê Baban : 114.
Ebdurrehman Paşayê kurê Mihemme Paşayê kurê Xalid Paşa : 113.
Binêre : Ebdurrehman Paşayê Baban.
Ebdureqîb Yusif : 38.
Ebdurezaq el- Hilalî : 110 (p).
Ebdurrezaqê kurê Necef Qulîxanê Dunbulî : 228.
Ebu Leys : 48, 49.
Edmonds, C. J. : 117, 125, 138(p), 156(p), 200(p), 212.
Ehmed Begê Towfîq Beg : 129.
Ehmed Behcet : 129.
Ehmed Osman, Dr. 215(p).
Ehmed Begê Fettah Beg : 216, 217.
Ehmed Begê Tewfîq Beg : 218.
Ehmed Xwaca : 133, 138, 218(p).
Elaeddîn Keykubatê Yekem, Sultan : 37, 39, 40, 41.
Elaeddîn : 42.
Binêre : Elaeddîn Keykubatê Yekem.
Elaeddîn Saccadî : 117, 118, 125, 186(p).
"El-Bab el-'Alî" : 114(p).
El-Dîblomasîyyetu'l Wefdîyye we 'Esbetu'l

Umem
El-Sîyasetu'l Duwelîyye (kovar) : 87(p).
El-Ehrar (Ên Azadîxwaz) (partî) : 174, 175.
El-Ereb (rojname) : 158, 162(p).
El-êxbar : 189(p).
El-Îstîqlal (Serxwebûn) (partî) : 174, 175.
El-Îttîhadu'l-Wetenî (Yekîtîya Niştiman) (partî) : 174.
"El-Firat" : 147, 151, 156, 161, 164, 169.
El-Hîlal (çapxane) : 121.
"Elîfba" (kovar) : 152(p).
"El-İstîqlal" : 147, 151, 169.
El-Merkezu'l Wetenî Lî'l-Wesaîq : 154.
"El-Musewwer" (kovar) : 210, 211.
El-Şe'b (Gel) (partî) : 174.
El-Terîq (kovar) : 69(p)."
El-Wetenu'l-Dimûqratî (Nîştimana Demokrasî) (partî) : 174.
"El-Teaxî" (rojname) : 207(p).
El-Xed (mucelle?) (kovar) :190(p).
El-Zehra" : 219.
Binêre : "Zehra".
Elî Axa yê Kurd : 52.
Elîyê Bapîraxa : 129.
Elî Kemal : 130.
Elî el-Werdî, El-Dr. : 15(p).
Elî, îmam : 47.
Elî Paşayê kurê Muştaq Baba : 53.
Elîşanê kurê Mehmud Paşa : 46.
Elî Şefîq : 105(p).
Emîn Mutabçî, Dr. : 19(p).
Enstîtuya Rojhilatnasî ya AkademîyaZanistî ya Sovyetê : 58.
Enwer Mayî : 200(p).
Enwer el-Maî : 159(p).
Binêre : Enwer Mayî.

Ereb, Erebî : 7, 8, 11, 15, 16, 27, 37, 42, 44, 115(p), 118(p), 120(p), 205(p), 208, 226, 227.
Erebên Şiî : 147.
Ermenî, Ermenîyan : 26 (p), 27, 35, 37, 46, 50, 69, 203, 205(p), 223, 224, 225, 226, 227.
Erşed 'Umerî : 176, 183.
Ertuşî (eşîr) : 74.
Esbetu'l-Umem : 111
Binêre : Komela Gelan.
Eshabêkehf : 118
Eşîra Delo : 143, 166.
Eşîra Dunbulîyan : 228.
Eşîra Goyan : 161(p).
Eşîra Kelhurê : 147.
Eşîra Koçgirî : 46.
Eşîra Sencawî : 147.
Eşîreta Surçî : 101.
Eşîra Şikakan : 106.
Eşîra Zewbe'î : 145.
Ethem Efendî : 129.
Etienne Marc Quatremère : 22.
Etnografya Sovyet (kovar) : 198(p).
Ewlîya Çelebî : 28, 50(p), 196, 197. 198.
Eyubî : 39.
Exramovîç, R. T. : 58(p).
Ezîz Xan : 159.
'Ebdullah el-Feyyaz, El-Dr. : 158(p).
'Ebdulîlla : 181, 182, 183.
'Ecem : 112.
Elewî : 210.
Binêre : Binemala Mihemmed Elîyê Mezin.
'Efanîsyan, Aşot, Prof. : 228(p).
'Emare (eşîr) : 155.
'Erbete (gund) : 190, 191.

F

Fadil Huseyn, Dr. : 97(p), 180(p).
Faîq Begê Maruf Beg : 129.
Fakulta Hiquqê : 179, 180.

Fakulta Dermansazîyê : 181.
Fakulta Tibê : 181.
Faris Efendî : 134.
Fayiqî Tapo : 147.
Faris, Farisan, Farisî : 7, 8, 9,10, 11, 12, 13, 14, 15, 16, 17, 20, 22, 23, 27, 35, 9, 116, 118, 130, 205, 208, 226.
Faîq Begê Maruf Beg : 129.
Faris Efendî : 134.
Faruq Paşa : 210.
"Fatimetu'l Zehra" : 219(p).
Fatme Mihyeddîn : 216.
Fatme : 216, 217, 218, 219, 222.
Binêre : Fatme Mihyeddîn.
Fayiqî Tapo : 147.
Fazil Cemal ê Wezîrê Derve : 179.
Ferhad : 38.
Fermanrewatîya Bedlîsê : 29.
Fermanrewatîya Cezayîrê : 54(p).
Fermanrewayê Misrê : 197.
Fermanrewatîya Venedîkê : 80.
Ferîq Behrî Paşa : 53.
Fetah Beg : 99.
Feyaz, Feyyaz : 158, 166.
Feyselê Yekem : 101, 104, 169.
Firdewsî : 227.
Fir'ewn : 161.
Fîtzgîbbon, Kapîten : 103. (Capitan Fitzgibbon)
Frensizî, Fransiz, Frensî, Ferenkan : 16, 21, 22, 23, 25,26, 81, 82, 83, 84, 112, 120(p), 131(p) 146.
Frên, X.D. : 22, 30.
Fuad Mestî : 218(p).
Fuad Reşîd : 220.

G

Garabêtê Ermenî : 112.

Gelawêj (kovar) : 184, 186, 212.
Gelên Asya û Afrîka (kovar) : 121.
Gelên Zaxrosê : 227.
Gerdî (eşîret) : 146.
Germîyan (eşîret) :41.
Germek : 47.
Gewereş : 48.
Geylanî : 118.
Ghassemlou, A. R. : 62(p), 76(p), 198(p).
Giraçîkovskî, Y. Yu :33.
Gira Me'fwan : 209.
Grekî, Grekîyan (Orîman) : 13, 79.
Grînhaws : 159.
"Girrûgalî Mindalanî Kurd" : 132.
Gîw Mukrîyanî : 125.
Goristana Şêx Ebdulqadirê
Goyje : 138.
Goyî, oyan (eşîret) : 140, 161.
"Gotebêjê Şoreşê" : 168(p).
Goristana Babu'l Mu'ezzem : 185.
Goristana Seywan : 209.
Gordlevskî, V. A. (Gord levskî Vladîmîr Aleksandrevîç) : 31, 32, 33, 34, 35, 38, 39, 40(p), 41, 42, 43, 44, 45, 46, 47, 48, 49, 50, 51, 52, 54, 55.
Guneş : 52.
Gurganî : 41.
Gurcî : 35, 41.
Gurî (eşîret) : 41.
Guzîde Xanim : 218, 219.
Binêre : Guzîde Yamulkî.
Guzîde Yamulkî : 219, 222.
Gökalp, Zîya : 66.

H

Hacî : 42.
Hacî Axayê Fethullah : 129.
Hacî Axayê Fethullah :

129.
Hacî Kak Ehmedê Şêx : 115.
Hacî Kak Ehmedê kurê Şêx Maruf : 115.
Binêre : Hacî Kak Ehmed.
Hacî Kak Ehmed : 115, 116.
Hacî Kak Ehmedê Şêx : 115, 116.
Bnêre : Hacî Kak Ehmed.
Hacî Mele Ebdullayê Celîzadeyê Koye : 116.
Binêre : Mele Ebdullayê Celîzade.
Hacî Mele Elî : 209.
Hacî Mele Eshedê babê Hacî Mele Ebdulla : 119.
Hacî Resul : 208, 209.
Hacî Resulê Neqşîbendî : 207.
Binêre : Hacî Resul.
Hacî Qadirê Koye :125,126.
Hacî Musa Begê Mîrzazade : 62.
Hacî Hesenê Şêrwanî : 52.
Hacî Seyîd Îsmaîl : 228.
Hacî Şêx Fewzî Efendî : 62(p).
Hafiz : 53, 227.
Binêre : Hafizê Şîrazî.
Hafizê Şîrazî : 53.
Hakkî, Naşît : 43.
"Hakîmîyetî Millî" (rojname) : 43(p).
Haldane, A. L. : 143(p), 161(general), 204(general), 204(p).
Hamîlton, A. M. : 61(p), 65(p), 205(p).
Hasretyan, M. A. : 69(p).
Hamawarî Kurd (kovar) : 132.
Harun Reşîd : 79.
"Hawar" (kovar) : 110, 112,
125(p), 132.
Hawarî Kurdistan : 132.
Hawarî Kurd : 132.

Hawarî Niştiman (kovar) : 132.
Hay, Kapîten : 145.
Hebeşî : 226.
Hebeş, Hebeşan : 79.
Hebîb Cematî : 211.
Hejar : 30.
Helale : 132.
Hemdulla Qezwînî : 28.
Heme Axayê Ebdurrehman Axa : 134.
Heme Ehmedî Taha :186.
Heme Qedrî :217.
Hemexayan : 208(p).
Binêre : Mehmet Axayê nevîyê Zulal Axa.
Henderson (Hendirsin), Mîster : 110.
Binêre: Henderson, A.
Henderson, A. : 110(p).
Hepsexan : 97.
Binêre : Hepsexanê Neqîb.
Hepsexanê Neqîb : 97(p).
Herekol Ezîzan : 125.
Binêre : Celadet Bedirxan.
"Heres el-İstîqlal" : 142.
Hesen : 51.
Hesenî : 158, 166.
Hesenê kurê Nureddîn : 24.
Hevalên Akademîya Zanyarî ya Heyran : 47.
Hêrbîlo : 21.
Hindî : 203, 205, 206.
Hindîye Matbaasi : 124.
Hindûyên Pencabî : 153.
Hiseyîn Ewnî :62.
Hiseyn 'Elî : 184.
Hîtler : 88, 92, 93, 94, 230.
Binêre : Schicklgruber, Adolf.
Hoste Receb : 199.
Hukumeta Bexdayê : 114.
Hukumeta Komara Tirkîyê : 61.
Hukumeta Îranê :106.
Hukumeta İraxqê : 106.
Hulagû Xan : 39.
Husameddîn : 45.

Huseyn : 46.
Huseyn Huznî Mukrîyanî : 133.
Huseyn ê Şerîfê Mekkê : 169.
Hûn, Hûnên : 161.

İ

İbnu'l-Dînar : 40.
İbrahîm Paşayê kurê Mihemmet Elî : 197.
İbrahîm Hilmî, Dr. : 206, 207, 211, 212, 214, 215.
İdrîsê Bedlîsî, Mele : 44, 45.
İdrîs, mele : 44.
Binêre : İdrîsê Bedlîsî, mele.
"İhsan el-Sukkan" : 199(p).
İngilîzî : 16, 21, 100, 205(p).
İngilîz, İngilîzan : 56, 57, 58(p), 61, 67, 73, 74, 82, 84, 97, 100, 101, 102, 103, 104, 105, 106, 108, 109, 110, 121, 128, 129, 133, 134, 136, 137, 138, 140, 153, 155, 156, 157, 162, 172, 177.
"İntelligence service" ya Brîtanya : 189.
İntiqam Matbaasi : 124.
Ireland, P. W. : 167(p).
İshaq Fuat, Dr. 125.Ireland, P. W. : 167(p).
İstyaczo : 17.
İzeddînê Keykawusê Duyem, Sultan : 39(p).
İzeddîn Mustefa Resul, Dr. : 212.
İzzet Beg : 138.
İzzet Begê Osman Paşa : 129.

Î

Îbnî Sîna : 226.
Îcaza Şêx Seraceddîn : 207.
Îlhan, Musa Kazim Paşazade : 202(p).
Împaratorîya Bîzansî : 226.

Împaratorîya Osmanî : 9.
Îndîanên Sor (Kizilderîlî) : 10.
Îndra Gandî : 11.
Încîl : 226, 227.
Îndo-Awrupî : 12, 16, 17.
Înönü, Îsmet : 69, 98.
Îrana Sefewî : 226.
Îsayî : 36, 44, 45, 100, 109, 163, 168.
Îsa, pêxember : 47, 168, 223.
Îskender : 48, 49.
Îslam, Îslamîyet : 8, 15, 79.
Îsmaîl Heqqî Şaweys : 218(p).
Îtalî : 16, 205.
"Îttîhad" : 64.
Binêre : Îttîhat Terakkî.
"Îttîhat û Terakkî" : 216.

J

Jaba, Aleksander : 25.
Jîyanewe (rojname) : 139.

K

Kamuran Alî Bedirxan : 66.
Kamuran Bedirxan : 127(p).
Binêre : Kamuran Alî Bedirxan.
Karduxî : 13, 15.
Kartsov : 200.
"Karwan" (kovar) : 78, 149(p), 206(p).
Katlov, L. N. : 142, 144(p), 146(p), 166, 197(p).
Kawis Qeftan, Dr. : 215(p).
Katib Çelebî : 21, 28.
Kela Amedê : 40.
Kela Bedlîsê : 48.
"Kemalî" : 57(p).
Kemalîst, Kemalîstan : 57, 60, 61, 64, 65, 66, 67, 69, 70, 71, 72, 97, 104, 105, 136.
Kemal Fuat, Dr. : 117, 118, 126.
Kemal Mezher Ehmed, Dr. : 96(p).

Kemal Mezher, Dr. : 20(p), 49(p), 58(p).
Binêre : Kemal Mezher Ehmed, Dr.
Kemser : 47.
Kerîm Begê Fettah Begê Hemewendî : 104, 137.
Kerîmê Rustem : 131.
Kerîmê Xesrew Beg : 166.
Kerîmê Heleke : 5.
Keykawîsê Duyem, Sultan : 39.
Keyxusrevê Duyem, Sultan : 39, 40, 41.
Keyxusrevê Sisîyan : 40.
"Kurdistana Kevin" : 13.
K. Kurdo : 22(p).
Ksnenefon (Xenephon) : 13, 15.
Kildanî (Keldanî), Kildanîyan : 9, 168.
Kitêbxana Akademîyê : 123, 132.
Binêre : Kitêbxana Korrî Zanyarî Kurd.
Kitêbxana Bodleîan : 23, 24.
Kitêbxana Ebdurehman Paşa : 114.
Kitêbxana Korrî Zanyarî Kurd : 123.
Kitêbxana Liqa Unîversîta Rojhilatnasî ya Sovyetê ya li Lenîngradê : 122.
Kitêbxana Marburg ya Almanya Rojava : 122.
Kitêbxana Niştimanî (Milllî Kütüphane) ya Enqerê : 122.
Kitêbxana Giştî ya Lenîngradê : 24, 25.
Kitêbxana Stenbol : 24.
"Kolonyalîzma Nû" : 192.
Komîta Serokatîya Kongra Erzirumê : 61.
Komela Bilindbûna Kurdistan (Kürt Tealî Cemîyetî) : 128.
Komela Bilinbûna Jinên Kurd (Kürt Kadınları Tea-

li Cemiyeti) : 128.
Komela Gelan : 73, 78, 81, 82 (Leaque of Natıons), 83, 84, 85, 86, 87, 88, 89, 90, 91, 92, 93, 94, 95, 96, 97, 99, 100, 101, 104, 105, 107, 108, 109, 110, 111, 112, 173, 177.
"Komela Kurdistan" (Kurdistan Cemîyetî) : 128, 129.
Binêre : Cem'îyetî Kurdistan.
""Komîta Erzirumê" : 76.
"Komunîzma Cîhanî" : 192.
Komela Netewên Yekgirtî : 174.
Kompanya "Rejî" ya Frensî : 216(p).
Komara Ermenîstana Sovyetê : 225.
Komara Mahabad : 132.
Komela Ehdî Îraq : 146.
Komelî Eqwam : 112.
Binêre : Komela Gelan.
Komîta Giştî : 84, 85, 87, 92.
Komara Îspanya: 92.
"Komîta Kêmayetîyan" : 96.
Koma Milletan : 96.
Kongra Vîyanayê : 80, 81.
Kongra Aşîtî ya Parîsê : 82, 84, 87, 92, 95.
Kongra Lozanê : 98.
Kongra Stenbolê : 62.
Konsolosxana Rusya : 49.
"Kongra Netewên Rojhilat" : 65.
Korniyenko, R. P. : 70(p), 71(p), 72(p).
Kongra Qahîrê : 101.
Konsolosê Brîtanya yê Kirmanşanê : 147.
Koşka Şahane : 177.
Kovara Akademîya Zanyarî ya Ermenîstanê : 228.
Kovara Gelên Asya û Afrîka : 28(p).
Kovarî Korrî Zanyarî

Kurd : 31(p), 112(p), 113(p), 115(p), 116(p), 119(p), 129 (p), 224(p), 227(p).
"Kurdistan" (rojname) : 120, 121, 122(kovar), 123, 124, 125, 126, 127, 128, 132 (kovar), 138 (rojname).
Kurdên Colemêrgʌ/ : 202.
Kurdnasîya Sovyetê (Kurdnasên) : 30, 232.
Kyros (Kîros) : 13.
Binêre : Kyrosê Mezin.
Kyrosê Mezin : 14, 17.
Küçük Silêman Paşayê Bexdayê : 114.
Kürt Te'amîmî Maarîf ve Neşrîyat Cemîyetî : 128.

L

Lazerêv : 232.
Lerx, Deter : 198(p).
Leylan (eşîret) : 166.
Lawê Şêx E. Fetah : 127(p).
Lichmen, Kapîten : 145, 146, 161 (kolonel).
Lînç : 47.
"Licnetu'l 'Eqelîyye" : 96(p).
Binêre : Komîta Kêmayetîyan.
Liqa Musilê ya "Komela 'Ehd" : 159, 160.
Binêre : Cem'îyetu'l-'Ehd".
Longrigg S. H. : 140, 143, 144, 164, 178, 186(p), 189 (p).

M

Macarî (Hungarî) : 205.
Macîd Mistefa : 138.
"Medher" : 45(p).
Binêre : E'raf.
Makkant, Kapîten : 104.
Malcolm, J. : 21, 22.
Mamoste Emîn Zekî : 115, 116, 118, 122(p), 125, 194.
Binêre : M.Emîn Zekî.
Marko Polo : 80.
Marksîzm : 20(p).
Marks : 211.

Maruf Xeznedar : 31(p), 117, 125.

Maştots, Misorp : 223(p)

Matênedaran : 223, 226, 227, 228, 229.

Mayesîef, P. P. : 69(p), 72(p).

Mecîd kurê Elîyê Hemewendî : 135.

"Meclisa Netewî ya Mezin" a Tirkîyê : 62.

Med, Medî, Medîyan : 9, 10, 14, 15, 17, 227.

Medresa mîrza Salih : 228.

Mehmud Cindî : 207(p).

Mehemedî Mele Kerîm : 125.

M.Emîn Zekî : 12, 18, 38, 110(p), 115(p).

"Mehkema Edalet ya Nav Dewletan" : 96.

"Mehkemetu'l 'Edlu'l-Duwelîyye" : 96(p).

Mehmed Axayê nevîyê Zulal Axa : 208.

Mehmed Axa : 208.

Binêre : Mehmed Axayê nevîyê Zulal Axa.

Mehmed Şirîn : 49.

Mehmud Cewdet : 159, 212, 213, 214.

Mehmud Paşa : 46.

Mehmudê Beyazîdî, Mele : 25.

Mehmud Xan : 103.

Binêre : Mehmud Xanê Dizlî.

Mehmud Xanê Dizlî : 102, 108, 144.

Mehmud Xanê Serokê Gundê Dizlê : 103.

Binêre : Mehmud Xanê Dizlî.

"Mektebu'l-Sewre" : 146.

Mele Hamid : 208

M.Elî Ewnî : 38(p), 122(p).

Mele Ebdullah : 116.

Mele Ebdulkerîmê Muderris : 117.

Mele Ebdullahê Celîzade :

119.
Mele Selîm Efendîyê Hîzanî : 49.
Melik Kamilê Eyubî : 39.
Mem û Zîna Xanî : 126.
Memet (Mihemmed) Şemsî : 20, 28, 30, 197(p).
Mendelî : 143.
Merwanî : 39.
Mesîhî (dîn) : 223, 226.
Mesîh Îskender : 5
Mes'ud Mihemmed : 116 (p). 214.
Metbe'a Cerîdeya Kurdistanê : 124.
Metbe'a Cem'îyeta Tifaq û Qencîya Musilmanan : 124.
Metbe'a el-Hîlal : 124.
Meydan : 47.
Mewlud : 164.
Mihemmed Begê Ehmed Begê Mihemmed el-Xal : 115(p).
Mihemmed Elî : 210, 211.
Mihemmed Elîyê Mezin : 121, 209, 210.
Mihemmed 'Ewde : 188.
Mihemmedî kurê Şêx Riza : 118(p).
Mihemmedê kurê Şêx Yusifê kurê Şêx Mewlanayê kurê Şêx Omer : 114.
Mihemmed Mehdî Besîr : 166, 168.
Mihemmed Mehdî Kubbe : 175(p), 179(p), 183, 188, 192, 193(p).
Mihemmed Reza Şebyî : 183.
Mihemmed Sedr: 183.
Mihemmed Zuhdî : 134, 139.
M. Khaddurî : 181(p).
"Millet" (partî) : 63.
Minorsky : 112, 227.
Misrî : 205, 210.
Mistefa Beg : 147.
Mistefa Ebdullah : 187(p).
Mistefa Kemal : 57(p), 60,

61, 62, 63, 64, 68, 103,
105 (p).
Mistefa Nerîman : 143.
Mistefa Paşa Yamulkî :
129, 130, 131.
Mistefa Şewqî : 131.
Mizahim Paçeçî : 187.
Mizgefta Mezin : 219.
Mizgefta Eyyub : 52.
Mizgefta Qublanîye : 168.
Mizgefta Seyîd Sultan Elî :
168.
Mizgefta seyîd Hesenê
Muftî : 129.
Mîrektîya Bedlîsê : 197(p).
Mîrnişîna Baban : 207.
Mîrnişîna Danişmendî :
37.
Mîr Helîm :210.
Mîrên Rewandizê : 199.
Mîrên Rewandizê : 199.
Mîller, A. F. (Miller Anatolî Fîlîpovîç) : 56, 57.
M. Nurî : 130.
Mîrnişîna Baban : 113.
Mîrnişîna Konyayê : 37.
Binêre : Mîrnişîna Selçukî.
Mîrnişîna Selçukî : 37, 40,
41, 42, 43.
Mîran (eşîret) : 75.
Mîrlîva Mistefa : 130.
Binêre : Mistefa Paşa
Yamulkî.
Mîthet Paşa : 152.
Mîrza : 24.
Mîqdet Midhed Bedirxan :
121, 123, 124, 126, 127, 128.
Modî, General : 150.
More, Thomas : 201.
Morris, J. : 205(p).
Motkî, Motkan, Mut
(eşîret) : 62.
Mott, M. : 104.
Moxol, Moxolî Moxolîyan
: 35, 37, 39, 42, 43, 226.
Muhemmed Bendî Cemîl
Rojbeyanî : 110(p).
Muhemmed Mustefa,
Muhemmed (pêxember) :

135, 168.
"Munezzemetu'l 'Emel-lu'l-Dewlîyye" : 95(p).
Binêre : "Rêxistina Cîhana Kar".
"Munezzemetu'l Sihhe'l-Alemîyye" : 96(p).
Muradê Sêyem, Sultan : 28.
Musa Efendî : 143.
Musealyan, J. S. : 21(p).
Musilman, Musilmanan, Musilmanî : 9, 17, 35, 44, 45, 50, 79, 80, 100, 207.
Mussolînî : 90, 92, 94.
Binêre : Benito, Mussolînî.
Mustefa Subhî : 64.
Muştaq Baba : 52, 53.
Muzexana Brîtanya : 24.

## N

Nacî Ebbasî, Dr. : 202(p).
Napîer, G. : 196.
Nazî, Nazîyan : 88, 91, 92, 214.
Nehru : 11.
Novîçîyev, A. D. : 35(p), 43(p), 63(p), 70(p), 71(p).
Nemrud : 50.
Nerîman : 215.
"Neronê Zordar" : 220.
Neqşîbendî, Neqşîbendîyan, Neqşîbendîtî : 62, 160, 208, 209.
Nexweşxana Mecîdîyê : 181.
Newroz : 1865.
Nezar (kovar) : 186(p).
Nikitine, B. : 198(p).
Niştiman : 132.
Nîzamî : 227.
Nûrî Seîd : 176, 177, 183, 187.
Nurî Ebdurezaq Huseyn : 184(p), 190(p).

## O

"Observer" (rojname) :

167.
Orbelî, İsuv Abgarovîç : 26, 121.
"Ordîya Dehhezaran" : 13.
Osmanê Balexî, mele : 209.
Osmanî, Osmanîyan : 28, 32, 37, 39, 43, 44, 49, 54, 62 (p), 68(p), 75, 128, 150, 152, 153, 154, 155, 157, 162, 163, 172, 181(p), 211, 224.
Oxuzên Asya Biçûk : 44.
Oxuz : 35.
Oxuz Xan : 135.
Oxuzên Tirkman : 35.
Özdemir Paşa : 105.
Binêre : Elî Şefîq.
Özdemir Bey : 105(p).
Binêre : Elî Şefîq.

P

Pambuk Baba : 53.
"Pan Îslamî" : 64.
Parlamentoya Brîtanya : 155.
Parlamentoya Osmanîyan : 62.
Parsî : 17.
"Partîya Demokrasî" : 87(p).
Partîya Demokrat a Kurdistan : 178.
Partîya Gel : 178.
Partîya Ehrar : 183.
Binêre : El-Ehrar.
Partîya Gel : 181(p), 187.
Binêre : El-Şe'b.
Partîya İstîqlal : 183, 188, 192.
Binêre : El-İstîqlal.
Partîya Karker : 110(p).
"Partîya Komarî" : 87(p).
"Partîya Komunîst" :64.
Partîya Komunîst : 178.
Partîya Wetenî-Dimuqratî : 183.
Binêre : El-Wetenu'l-Dimûqratî.
Paşayê Baban : 114.
Binêre : Ebdurehman Paşayê Baban.

Papazyan, E. D. : 228(p).
Paulîs, A. : 99.
Pehlewî : 130.
Peymana Portsmouth : 177, 178, 180, 183, 184, 190, 192, 193.
Peymana Sala 1930'an : 174, 176, 177, 190.
Peymana Sewr : 64(p), 98.
Peymana Versaîlles : 84, 88, 92, 93.
Pêncwîn : 137.
Percy (Persî) Koksî : 169.
"Peymana Bexda" : 192.
Pêşder (eşîret) : 104.
Pêşkewtin (rojname) : 134, 135, 136, 154, 159(p), 162(p), 164.
Pira Qilyasan : 198.
Pîremêrd : 133, 207, 222.

## Q

Qacarî : 121.
Qadir Axayê xelkê Pîşderê : 138.
Qadirî Muderrisî : 132.
Qanadê Kurdo : 30, 112.
Qazî Ehmedê Xefarî : 28.
Qazîyê Misrê : 210.
Qazî Mihemmed : 211.
Qerna Navîn : 34, 44, 161, 196, 200.
Qezwînî : 41.
Qizilbaş, Qizilbaşî : 44, 45, 46, 47, 48.
Quran : : 45.

## R

Rambout, L. : 67(p).
Rastopiçin, P. F. : 19, 20(p).
Refîq Hilmî : 125, 128, 129, 130, 147, 168, 212.
Reich : 93.
Binêre : Reichstag.
Reichstag a Sêyem : 93.
Reichê Duyem : 93(p).
Reichê Sêyem : 93(p), 94.
Binêre : Reichstag a Sêyem.
Reichê Yekem : 93(p).

Reichstag : 93.
Reîs Efendî : 114.
Resul Axa : 208.
Reşad, Sultan : 163.
Rewşen Bedirxan : 122.
"Rewşenbîrî Nwê : 133, 194(p), 216(p).
"Rêxistina Cîhana kar" : 95, 96.
"Rêxistina Tenduristî ya Cîhanê" : 96.
Richardê Yekem : 164(p).
Riza Şah : 108.
Rîch : 113.
Binêre : Rich, C. J.
Rîch, C. J. :114, 197.
Rojhilata Îro : 187(p).
Rojhilatnasîya Sovyetê : 28(p), 31.
Rojhilata Şoreşgêr (kovar) : 19(p).
Rojî Kurdistan : 56(kovar), 137(rojname).
Rojî Nwê (kovar) : 66(p).
Rojhilata Nêzîk û Hindistan (kovar) : 75.
"Rojhilata Navîn û Nêzîk (kovar) : 156.
Romayî : 90.
Ronahî (kovar) : 112.
Rukneddînê Kiliç Arslanê Çaran : 39.
Rûm, Rûman : 38, 40, 79, 119.
Rusî : 19, 20, 21, 22, 25, 205, 226.
Rûnakî (kovar) : 122(p), 126.
Rustem Xanê kurê Ehmet Xanê Dunbulî : 228, 229.
Rynd, F. : 65.

## S

Sabir : 107.
"Sabunkeran" : 198.
Safrastîyan, A : 62(p), 74 (p), 75(p).
Saha Melik Feysel : 185.
Salih Cebr : 177, 179, 180, 181

183.
Salih Qeftan : 129, 133.
Salmon, Kapîten : 101, 143, 144.
Samî : 24.
Sason Efendî : 156.
Sayîs : 14.
Sebrîy Kake Reş : 138.
Seda el-'Ehrar (rojname) : 158, 160.
Sedullah Begê xelkê Sêrtê : 62.
Se'd Salih : 174.
Sefewî, Sefewîyan : 24, 44.
Sehîhê Buxarî : 114.
Seîde Şefîqe : 220(p).
Seîdî : 227.
Selaheddîn : 164, 210.
Binêre : Selaheddîn Eyyubî.
Selaheddînê Eyyubî : 132, 164(p).
Semerra : 203.
Sengaw : 144.
Serkewtin : 138.
Selam : 110, 111, 112(p).
Selçukî Selçukîyan : 29, 32, 36, 37, 39, 40, 42, 43, 44, 224, 225, 226.
Selçukîyên Asya Biçûk: 35, 38, 41, 42.
Selçukîyên Îraqê : 38.
Selçukîyên Îranê : 38.
Selîm, Sultan : 44.
Binêre : Selîmê Yekem, Sultan.
Selîmê Yekem, Sultan : 45.
Serîhildana kanunê : 171, 188, 189, 190, 192.
Serîhildana Şêx Mehmud : 108, 134.
Serîhildana Şêx Seîd : 58 (p).
Serokê "Encumena Nûneran" : 182.
Serokatîya Enstîtuya Rojhilatnasîya Akademîya Zonyarî ya Sovyetê : 58(p).
Settar Cebîr Nasir : 165(p).

Sewtu'l Ehalî (kovar) : 188(p), 191(p).
Sewtu'l 'Ehrar (kovar) : 179(p).
Seyîd Ehmedê Berzencî : 107. 138.
Seyîd Elîyê kurê Celaleddînê kurê Xews (Xaws) : 49.
Seyîd Mihemmed : 49.
Sêlmentî, C. A. : 213.
Sidînê Şems : 14
Binêre : Sîr Sidînê Şems.
Sidîq El-Demlûcî : 155.
Silêmanê Biçûk ê Paşayê Bexdayê : 113.
Simaîl Axayê Şikakî (Simko) : 102.
Simko : 106, 213.
Binêre : Simaîl Axayê Şikakî.
Simkoyê Simaîl Axa : 106.
Binêre : Simaîl Axayê Simaîl Axayê Şikakî (Simko) : 102.
Simko : 106, 213.
Binêre : Simaîl Axayê Şikakî.
Simkoyê Simaîl Axa : 106.
Sindî (eşîret) : 74.
Sivyaborgê : 32.
Siwarem : 47.
Sîd Axa : 160.
Skotî, Kapîten : 101.
Sîr Sidînê Şems : 13.
Soane, Major (Bînbaşî Soane) : 15, 134, 135, 136, 144, 154, 159, 162, 213, 217.
"Sunday Times" (rojname) : 167.
Sunnî (mezheb) : 45, 47.
Surçî, Surçîyan : 102, 144, 166.
Binêre : Eşîreta Surçîyan.
Suryanî : 35, 205.
Suqu'l Şuyûx (eşîret) : 155.
Swêdî : 211.
Syks, Mark : 156, 200.

Syks, Sîr Persî : 151.

## Ş

Şah : 13.

Şahê (Şahên) Îranê : 28, 228.

Şah Îsmaîl : 44.

Şahabeddîn : 49.
Binêre : Şêx Şahabeddîn.

Şah Tehmasb : 28, 50(p).

Şakir Wadî : 177.

Şakir Xesbak, Dr. : 127.

Şareban : 166.

Şari'û Reşîd : 185.

Şarlamanê Mezin : 79.

Şe'lan Ebu'l-çon : 166.

Şefîqa Seîd : 220
Binêre : Seîde Şefîqe.

Şehabeddînê Şîrazî : 227.

Şemseddîn Samî : 197(p).

Şemsî, Dr. 28, 29, 30.
Binêre: Memet (Mihemmed) Şemsî.

Seraceddîn : 209.

Şêrdil : 164.

Binêre : Richardê Yekem.

Şerefxan : 21, 23, 28, 29.
Binêre : Şerefxanê Bedlîsî.

Şerefxanê Bedlîsî : 19, 21, 22, 24, 27, 28, 29, 197(p), 214, 228.

Şerê Avbarik : 108.

Şerê Cîhanê yê Duyem : 84, 85, 88, 93(p), 95, 96, 171, 174, 214, 230, 231.

Şerê Cîhanê yê Yekem : 32, 44, 48, 49, 50(p), 57, 59, 70, 76, 81, 83, 84, 86, 88, 89, 93(p), 97, 109, 114, 122, 128, 129, 150, 152, 153, 155, 156, 157, 162, 171, 172, 198, 200, 201, 202, 203, 222(p), 226, 230, 231.

Şerê Derbendî Bazîyan : 136(p).

Şerê Japonya û Çîn :89, 109.

Şeweys : 65.

Şêx Arif : 53

Şêx A. Fetah : 127.
Şêx Bahaddîn Efendîyê Neqşîbendî : 160.
Şêx Bahaddînê xelîfê Şêx Nurî : 220.
Binêre : Şêx Nurîyê Şêx Salih.
Şêxên Berdeqareman : 97
.Şêx Ehmed : 103.
Şêx Elîyê Serkar : 129.
Şêxê Pîşewa (Şêx Mehmudê Berzencî) : 136.
Şêxê Talebanîyan : 117.
Şêxî Xanî (Ehmedê Xanî) : 126.
.Şêx Fewzî : 62.
Binêre : Hacî Şêx Fewzî Efendî.
Şêx Letîfê Seetçî : 139.
Şêx Mecîdê Şêx Arif : 134.
Şêx Mehmud : 99, 102, 104, 105, 106, 107, 137, 138, 139, 213, 216, 217.
Şêx Mihemmedê Gulanî : 129.
Şêx Mihemmedê Xal : 115.
Şêx Nurîyê Şêx Salih : 135, 218.
Şêx Rizayê Talebanî : 116.
Şêx Riza : 117, 118, 119.
Binêre : Şêx Rizayê Talebanî.
Şêx Qadir : 103.
Şêx Qadirê Sîyamensorî :144.
Şêx Seîd : 107.
Binêre : Şêx Seîrê Pîranî.
Şêx Seîdê Pîranî : 43.
Şêx Seraceddîn : 206.
Şêx Şahabeddîn : 49, 50
.Şêx Ubeydullah : 67(p).
Şêx Xerbîyê kurê Şêx Maruf : 103.
Şîrkuh, Blech Dr. : 60(p), 62(p), 127.
Şoreşa Bîstan : 102, 140, 146, 148, 149, 152, 153, 158, 159, 161, 163, 165, 166, 167, 168, 169, 170, 183, 193.

Şoreşa Kemalîstan : 60.
Şoreşa 1919'an a Şêx Mehmud : 103.
Şoreşa Oktobrê : 31.
Şukrî Heleke : 129.

T

Taha Baqir : 18.
Tahir Ehmed Hewêzî : 215.
Takvım-ı Vakayı (rojname) : 120(p).
"Tekya Mele Elî" : 209.
Talib Muştaq : 159(p).
Talebanî Talebanîyan (eşîret) : 143.
Tancero : 198.
Tasloce : 140.
Tasvır-ı Efkar (rojname) : 120(p).
Taşnaq, Taşnaqan : 62(p).
Tayer Ehmed Hewêzim : 214.
Taylor : 198.
Telekî Paul : 99.
Tercüman-ı Ahval (rojname) : 120(p).
Teter : 226.
Tewfîq Siwêdî : 174, 176.
Tewfîq Wehbî : 108.
"Textê Wan" : 50(p).
"Tevgera Kemalî": 57(p).
Tevgera Şêx Mehmud : 103, 105.
Têgeyîştinî Rastî : 163(p).
The Times (rojname) :70 (p),72(p).
"Times Iraq" (çapxane) : 182.
Tîmurê Leng : 161.
Tirk, Tirkan, Tirkî : 12, 14, 16, 21, 24, 27, 32, 35, 37, 41, 43, 54, 57, 59, 62, 63, 65(p), 67, 70, 73, 99, 102, 104, 118, 120, 123, 205, 213, 216(p),
Tirkên Bulgarîstan û Yugoslavya : 72.
Tirkên Ciwan (Jön Türk) : 68(p), 128.
Tirkmen : 189.

Tîyatroya Hewlêrê : 158.
Toynbee, Arnold J. Prof. : 67,68(p).
Tsîbulskîs, Prof. : 121.
Tunisî : 205.
Turanî, Turanîyan : 12, 66(p).
Tuzxurmatu : 144.

## U

Umîdî İstîqlal : 138.
Unîversîta Bexda : 7(p).
Unîversîta Gelên Rojhilata Nêzîk û Navîn : 20.
Unîversîta Indîyana : 98(p).
Unîversîta Lazerîyev : 32.
Unîversîta Moskova : : 32.
Unîversîta Oxfordê : 23.
Unîversîta Rojhilatnasî ya Akademîya Zanyarî ya Sovyet : 20, 32.
"Utopya" : 201.

## W

Weqifnama Ebdurrehman Paşayê Baban : 113.
Welatên Sondxwarî yên Rojava : 231.
Werdî : 158, 166.
Weste (Hoste) Salihî Silêmanî Cejnî : 138.
Weten : 138.
Weysî Beg : 162.
Weysî Qeranî : 114.
Wezareta Darayî (Malîye) : 75.
Wezareta Mihemmed Sedr : 186, 187, 188.
Wezareta Salih Cebr : 179, 182, 184, 187.
Wezareta Tewmînî : 188.
Wezîrê Darayî ya Şêx : 217.
Wezîrê Derve Fazil Cemal : 177.
Wezîrê Derve ya Brîtanya : 98, 110, 188(p).
Wezîrê Kar : 81.

Wezîrê Kar û Barê Hindûr : 182.
Wezîrê Kar û Barên Civakî :182.
Wezîrê Kolonîyan : 101.
Wezîrê malîyê : 182.
Wilayeta Bexdayê : 162.
Wilson, Arnold T. : 136 (p), 140(p), 145, 156, 166, 169.
Wilson, W : 82, 84, 87(p).
"Wilayeta Musilê" : 73, 97, 98, 99, 100, 167.
Wirsen af Einer : 99.

V

Vasîlîva : 20(p), 23, 27.
Binêre : Yefgîna Vasîlîva.
Vîlçewskî, W. L. : 58, 198 (p), 201(p), 202(p).
Volkov, M. : 22(p), 30.

X

Xaçperestan : 226.
Xalfîn : 232.
Xalid : 51.
Xalid Bekdaş : 188(p).
Xalis 118(p).
Binêre : Mihemmedî kurê Şêx Riza.
Xanê Çîn û Maçînê : 80.
Xanî (Ehmedê Xanî) : 112.
Xerbîyê Şêx Arif : 103.
Xestexana mecîdî : 181(p).
Xizir Îlyas : 46.
Xîyaseddînê Keyxusrev, Sultan : 39(p).
Xoce Efendî : 207(p).
Xorînatsî, Movsîs (Maysay Xorênskî) : 227.
Xoşnavî (eşîret) : 146.

Y

Yefgîna Vasîlîva : 20, 21, 24, 26.
Yekyetî : 138.
"Yekîtîya Meslekên Navnetewî" : 71(p).
Yekîtîya Niştimanî :

181(p).
Binêre : El-Ìttîhadu'l Wetenî.
"Yenî Sabah" (rojname) : 69.
Yunan Lebîb Rizq, DR. : 87(p).
Yunanî, Yunanîyan : 69, 120(p), 205.
Yûgev, Ivan : 232.

## Z

"Zehra" :219.
Zehraxan a keça Mistefa Yamulkî : 222.
Zekî Saîb : 135.
Zengene (eşîret) : 143, 166.
Zewalm, Zewalmî (eşîret) : 166.
Zimanê Rojhilat : 32.
Zîrnov, Wîlyamînov (Viladîmîr Viladîmîrevîç) : 23, 26.
Zulal Axa : 207.

# CÎ

## A

Afrîka : 90, 211.
Aksaray : 53.
Almanya : 82, 84, 85, 87, 88, 91, 92, 93, 94, 139, 203, 230, 231.
Amed (Dîyarbekir) : 34(p), 39, 40, 41, 43, 54.
Amerîka, Emerîka, Amerîka Yekgirtî : 10, 131, 170, 201.
Arnawudîstan (Albanya) : 94, 95.
Arjantîn : 84.
Aqçem (navçe) : 201.
Asya : 80, 211.
Asya Biçûk : 13, 35, 36, 37, 40, 41, 42, 43, 44, 45, 47.
Asya Navîn : 35.
Avusturya, Nemse : 25, 93, 213.
Awrupa : 22, 25, 27, 35, 80,

89, 91, 94, 131, 164, 170, 195, 196.
Azerbeycan : 27(p), 29, 36, 42.
Azerbeycana Sovyetê : 59.
Aland (grav) : 95.

B

Bako : 20(p), 66.
Bakûrê Çîn : 88.
Bakûrê Hewlêr : 104.
Bakûrê Rojhilata Çînê : 90.
Bakûrê Zaxo : 161(p).
Baqube : 142, 159, 166.
Başûrê Brîtanya : 122, 177.
Bayezîd : 53.
Bedlîs, Bîtlîs : 45, 48, 50, 53, 62(p), 75, 196, 197, 198.
Behdînan : 107(p), 140, 145, 155, 159.
Behra Reş : 198.
Belçîka : 99.
Bendera Besrayê : 204.
Bendera (lîmana) Samsunê : 198.
Beyrût : 188, 197, 198, 201.
Bexdad : 36, 38(p), 42, 49, 56, 97(p), 99, 103, 107, 108, 115, 118, 140, 163, 166, 197, 198, 199, 201, 202, 204, 207 (p), 213, 215.
Biyare : 208.
Brîtanya, Brîtanya Mezin: 21(p), 97, 98, 99, 101,103, 105, 106, 107, 108,109, 140, 153,167, 169, 177, 182, 186.
Bulgarîstan : 95.
Bursa : 47.
Buxara : 35.

C

Casene (şikeft) : 137, 138.
Cenevre, Geneva : 84, 96, 97, 99, 100(p), 112, 122, 127.
Cizîr : 54.
Colemêrg : 61.

Ç

Çekoslovakya : 94.

Çemçemal : 117.
Çîn : 43, 89, 90, 123.
Çîn û Maçîn : 89.
Çîyayê Nemrudê : 50.
Çîyayê Zagrosê : 9, 29.

D

Danîmarka : 84.
Derya Atlas : 201.
Derya Baltîkê : 95.
"Derya Me" : 90.
Derya Spî ya Navîn : 90.
Derya Sor : 90.
Deşta Helebçê : 103.
Deşta Şarezorê : 190(p).
Deştî Melik Feysel : 185.
Dêrsim : 43, 47, 62(p), 201.
Dihok : 107.
Dilêm : 161.
Dizlê : 103.
Dîcle (çem, rûbar) : 62, 73, 75.
Dîlman : 106.
Dîwanîye : 102.Dîyarbekir : 38(p), 39, 40, 43, 47, 50, 66, 128, 196, 197, 198.
Binêre : Amed.

E

Eçmadzîn : 224.
Edene ya Tirkîyê : 201.
Edîsa (Urfa) : 39.
Enqere : 43(p), 62, 68, 99.
E'raf : 45.
Erdebîl : 24.
Erebîstan : 37, 131.
Erîvan : 224, 225, 226.
Ermenîstan : 36, 37, 40, 223, 224.
Ermenîstana bakûr : 225.
Ermenîstana Rojhilat : 225.
Ermenîstana Sovyetê : 59, 223(p).
Erzîncan : 62.
Erzirum (Erda Rum) : 38 (p), 51, 53(p).
Eqre : 146.
Ewbiruk : 41.

F

Filistîn : 36, 187.
Fînlandîya : 88, 95.
Firat (çem) : 102.
Frensa, Frengîstan : 81, 82, 83, 85, 87, 88, 90, 13192, 93, 94, 170.
Folkston : 122.
Firata Navîn : 142, 144, 145, 166.
Florensaya İtalya : 195(p).

G

Gergeder : 209.
Gawirbaxî : 173, 176, 189 (p), 205.
Gira Me'fwan : 209.
Gola Wanê : 51.
Gurcistan : 39.

H

Hebeşîstan : 87, 90, 91, 94.
Heleb : 197, 198, 201.
Helebçe : 103, 104, 105, 190 (p).
Hemewend : 104.
Hewraman, Hewramanan : 102, 103, 104.
Hewlêr : 42, 99, 101, 106, 144, 145, 154, 160, 166, 184, 203.
Hîndistan, Hindûstan : 22 (p), 103, 104, 131, 150, 170, 196, 202.
Hîcaz : 165.
Hîzan : 49.

İ

İraq : 7, 9, 10, 13, 36, 42, 58 (p), 73, 74, 84, 87, 95, 97, 100, 101, 104, 106, 109, 110, 113, 134, 156, 157.

Î

Îngîltere, Îngîlîstan : 82, 83, 85, 87, 90, 92, 93, 98(p), 150, 164, 170.
Îran, Êran : 9, 10, 11, 12, 16, 22, 36, 58(p), 73, 74, 84, 103, 106, 112, 113, 203.

Îspanya : 84, 91, 92.
Îsvîçre : 84.
Îtalya : 80, 85, 90, 91, 92, 94, 95.
Îzmîr : 37, 120(p).
Îznîk : 37.

J

Japon, Japonya : 85, 88, 89, 90, 94, 123.

K

Kayserî : 37.
Kerbela : 46, 140, 166.
Kerkûk : 99, 104, 117(p), 118, 134, 140, 143, 145, 164 (p), 176, 182, 189, 203.
Kifrî, Kifrê : 101, 104, 139, 143, 144, 147, 166, 202.
Kilîkya : 47.
Kilîs : 24.
Kirmanşa : 196.
Konya : 37, 42.
Korfo (girav) : 95.
Koye : 116, 118, 119, 144, 184.
Kuweyt : 103.

L

Lehîstan : 213, 214.
Lenîngrad : 30(p), 43(p).
Lîtvanya : 95.
Londra : 88, 91, 93, 98, 99, 105, 122, 167.
Loristan : 29.

M

Macarîstan : 99.
Mahabad : 211.
Medîne : 208.
Mekke : 208.
Melazgirt : 36.
Menazgirt : 36
Binêre : Melazgirt.
Merîwan : 207.
Meydana Zernêxê : 202.
Mêrdîn : 44.
Mêrgesor : 48.
Misir : 9, 84, 87, 105(p), 121, 122, 123, 127, 165.

Moskova : 88, 225.
Musil : 57, 62, 97, 99, 100, 107, 115, 145, 147, 203.

N

Nasirîye : 102, 108.
Navçên Qafqasê : 203(p), 226.
Navça surdaşê : 209.
Necef : 140, 151, 155, 166, 184.
Nemrud : 50.
Nêhrî : 106.
Nodê : 115.
Norveç : 84.

P

Parîs : 22, 84, 88, 91, 93.
"Paytextê Bakûr ": 80(p)
Pekîn : 80.
Pekîna Asya : 80.
Binêre : Paytextê Bakûr.
Peterborg : 22, 24, 25.
Petrograd : 225.
Pîran : 108, 137.
Pişder : 144.
Polonya : 95, 213, 214.
Portsmouth : 177.
Prusya : 213.

Q

Qahîre : 38(p), 121, 123, 188, 207(p).
Qelacux : 47.
Qelaçolan : 208.
Qerebaxa Azerbeycanê : 201.
"Qewele" : 209(p), 210.
Qilyasan : 198.
Qirx : 117.
Qizrabat : 142.
Qole : 210
Binêre : "Qewele"
Quds : 197.

R

Ranye : 185.
Rayat : 203.
Ren (çem) : 92, 93.
Rewandiz : 61, 105(p), 106,

144, 199, 200, 203.
Rojhilata Anadolê : 44.
Rojhilata Ereban : 188.
Rojhilata Navîn : 19, 23 (p), 26, 59, 137, 150, 170, 176, 202, 226.
Rojhilata Navîn û Nêzîk : 7, 36, 149, 175, 176, 183, 188, 195, 196, 199, 231.
Rojhilata Nêzîk : 58(p),
Romanya : 99.
Rumadîye : 145.

S

Salîzya Bakûr : 95.
Sarî Almanya : 95.
Semawe : 102, 156.
Semerkent : 35.
Senendej : 115(p).
Sero : 147.
Silêmanî, Silêmanîyê : 99, 101, 103, 104, 106, 11, 112, 115, 116, 117(p), 118, 129, 130, 131, 133, 134, 136, 137, 138, 140, 144, 154, 157, 158, 178, 182, 185, 190(p), 198, 203.
Sine : 115, 197.
Sîwas : 37, 46(p).
Sora, soran : 112, 126.
Sovyet, Sovyetîstan : 19, 20(p), 21, 27, 30, 31, 56, 86, 87, 88, 203, 231.
Stenbol : 47, 52, 53, 70, 72, 99, 114, 118, 120, 122, 127, 128, 129, 197, 198, 201, 202, 210, 219.
Surîye : 36, 40, 42, 51, 73, 74, 197.
Swisre (Îsvîçre) : 84, 122.
Swêd : 84, 95, 99.
Sudan : 123.
Surdaş : 137.

Ş

Şam, Şamê : 110, 122, 126, 127, 165, 188, 197, 201.
Şino (Uşnû) : 200.

T

Tebrîz : 44, 199.

Tehran : 44, 228.

Taleban : 117(p).

Tele'fer : 146.

Tetwan : 50.
    Binêre : Textê Wan.

"Textê Wan" : 50(p).

Tirkîye : 14, 32, 33, 35(p), 48, 51, 57, 58(p), 59, 63, 64, 65, 66, 67, 71, 72, 72, 73, 74, 75, 76, 95, 97, 98, 99, 100, 113, 127, 207(p).

Trabzon : 64.

Tokyo : 88, 89.

Turkîstan : 135.

U

Urfa : 39
    Binêre : Edîsa

Urdun : 197.

Urmê : 44.

V

Venedîka Awrupa : 80.

Versaîlle : 92, 153.

Vîyana : 25.

W

Welatê Arnawudan : 210 (p).
    Binêre : Arnawudîstan.

Wan : 50(p).

Washington : 82, 83, 87.

X

Xabur (çem) : 73.

Xelat : 42, 51.

Xelîc : 29.

Xelîfekî : 48.

Xaneqîn, Xaniqîn : 142, 143, 147, 166, 186, 189.

Xinis : 47, 49.

Xoresan : 42.

Y

Yekîtîya Sovyet : 84, 85, 87, 230, 231.

Yugoslavya : 95.

Yunanîstan : 13, 72, 95.

## Z

Zara : 46.
Zaxo : 13, 74, 107, 185.
Zerefşan (çem) : 35, 42.
Zêya Mezin (çem) : 147.
Zonguldax : 71, 72, 202.

## NAVEROK


Daxuyanîyek Kurt ........................................ 3

Pêşgotina Nivîskar ........................................ 5

Mijara Yekem :
Rola Kurdan Di Dîroka Şaristanîyetê de ................ 7

Mijara Diduyan :
Balkêşanek Dîrokî Li Ser Zimanê Me .................... 11

Mijara Sisîyan :
Şerefname Di Kurdnasîya Sovyet de .................... 19

Mijara Çaran :
Kurd Li Ba Gordlevskî ........................................ 31

Mijara Pêncan :
Li Ser Karaktera Serîhildana Mezin
a Sala 1925'an ........................................ 56

Mijara Şeşan :
Komela Gelan (Cemiyetî 'Ekwam) û Kurd ........... 78

Mijara Heftan :
Çend Belge Ji Dîroka Kurdistanê ........................ 113

Mijara Heştan :
Yekemîn Çapxana Kurdî Ya Bajarê Silêmanîyê .. 133

Mijara Nehan :
Cîyê Gelê Kurd Di Şoreşa Bîstan de .................... 140

Mijara Dehan :
Şoreşa Bîstan Sebeb, Netîce û Qîmeta Wê .......... 149

Mijara Yanzdehan :
Li Ser Serîhildana Mezin a Kanûna Duyem a Sala 1948'an û Cîyê Gelê Kurd Di Wê Serîhildanê de .......... 171

Mijara Danzdehan :
Çend Rûpelek Ji Dîroka Çîna Karker a Kurd ....... 194

Mijara Sêzdehan :
Xelata "Mêjû" .......... 206

Mijara Çardehan :
Fatme Mihyeddîn : Perîya Pêşeng û Eskera Bê Nav .......... 216

Mijara Panzdehan :
Matenedaran An Cewherek Ji Cewhera Rojhilat .......... 223

Mijara Şanzdehan :
Kurd û Çirûskek Dûr a Agirê Şerê Duyem .......... 230

Endeksa Nav û Cîyan .......... 233

Naverok .......... 273

**PIRTÛKÊN ÇAP Û WEŞANXANA APEC YÊN KU HATINE ÇAPKIRIN**


**KEN Û GIRÎN**
*A. Tigrîs - R. Motkî*
*
**IQDÊ DURFAM**
*Şêx Eskerî*
*
**DAL** (Helbest)
*Şêrko Bêkes*
*
**NAVÊN KURDÎ**
*Amed Tigrîs*
*
**HERDÛBAT**
*Mele Zahîdê Dîyarbekrî*
*
**MEHMED ARIFÊ CIZÎRÎ KEWE RIBAD E**
*Sevgan Abdulhekîm*
*
**KUZEY KÜRDİSTAN'DA SOSYO-EKONOMİK YAPININ NİTELİĞİ ÜZERİNE**
*S. Aydoğmuş - A. Nas*
*
**Gulbijêrek ji Helbestên Şêrko Bêkes**
*Wergêr: M. Mayî*
*
**O BİR DAĞ ÇİÇEĞİYDİ**
*Xorto*
*
**SİVEREK'TE BİR GECE VAKTİ**
*Xorto*

Navnîşana xwestinê:
APEC-TRYCK & FÖRLAG
Box 3318, 163 03 Spånga/Sweden
Tel. 08-761 81 18 * Fax. 08-761 24 90

*Pirtûka dersê ji bo pêngavên navîn û bilind*

**DÎROKA KURD Û KURDISTANÊ**


Navnişana xwestinê: APEC-TRYCK & FÖRLAG
Box 3318, 163 03 Spånga/Sweden




*Pirtûka dersê ji bo destpêka cografyayê*

**KURTERASTÎ**

Navnîşana xwestinê: APEC-TRYCK & FÖRLAG
Box 3318, 163 03 Spånga/Sweden



# Navên Kurdî




## Amed Tîgrîs

Şêx Eskerî

# IQDÊ DURFAM



Stockholm 1989

Gulbijêrek ji Helbestên

# Şêrko Bêkes



Wergêr: M. Mayî

Stockholm 1991

ISBN: 91 87730 11 1

Weşanên APEC-TRYCK & FÖRLAG